

**T.C.**

**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**

**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**

**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**İsa YILMAZ**

**ZEMBİLFİROŞ HİKÂYESİ ÜZERİNE BİR İNCELEME**

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**Muş - 2016**



**T.C.**  
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**  
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**  
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**İsa YILMAZ**

**ZEMBİLFİROŞ HİKÂYESİ ÜZERİNE BİR İNCELEME**

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**TEZ YÖNETİCİSİ**  
**Prof. Dr. Abdullah KIRAN**

**Muş - 2016**

**K. T.**

**ZANÎNGEHA MUŞ ALPARSLANÊ**

**ENSTÎTUYA ZANISTÊN CIVAKÎ**

**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**Îsa YILMAZ**

**VEKOLÎNEK LI SER ÇÎROKA ZEMBÎLFIROŞ**

**TEZA LÎSANS A BILIND**

**RÊVEBIRÊ TEZÊ**

**Prof. Dr. Abdullah KIRAN**

**Mûş - 2016**

## SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Muş Alparslan Üniversitesi Lisansüstü Eğitim ve Öğretim Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Zembilfiroş Hikâyesi Üzerine Bir İnceleme” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım.

Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

Tezimin sadece Muş Alparslan Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

Tezimin ..... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

İsa YILMAZ

  
03.11.2016

## TEZ KABUL TUTANAĐI

### SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĐÜNE

Prof. Dr. Abdullah KIRAN danışmanlığında, İsa YILMAZ tarafından hazırlanan bu çalışma ~~25.10.2016~~ 25.10.2016 tarihinde aşğıdaki jüri tarafından. Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

**Başkan** : Prof. Dr. Abdullah KIRAN

İmza

**Jüri Üyesi** : Yrd. Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN

İmza

**Jüri Üyesi** : Yrd. Doç. Dr. Canser KARDAŞ

İmza

## NAVEROK

NAVEROK.....	I
KURTE .....	III
ÖZET.....	IV
ABSTRACT.....	V
PÊŞGOTIN .....	VI
KURTEBÊJE .....	IX
DESTPÊK.....	1

## BEŞA YEKEM

### NIVÎSKARÊN ÇÎROKA ZEMBÎLFIROŞ

1.1. FEQIYÊ TEYRAN .....	5
1.1.1. Çima jê re gotine Feqî? .....	6
1.1.2. Feqiyê Teyran Di Kîjan Heyamê De Jiya Ye? .....	9
1.2. MELE HUSEYNÊ BATEYÎ .....	15
1.2.1. Nasnavên Wî .....	16
1.2.2. Heyama Bateyî .....	17
1.3. MIRADKANÊ BAZÎDÎ .....	24
1.4. BELAVBÛNA ÇÎROKA ZEMBÎLFIROŞ .....	26

## BEŞA DUYEM

### DI NAV EDEBIYATA KURDÎ DE CIYÊ ÇÎROKA ZEMBÎLFIROŞ

2.1. JI ALIYÊ WEKHEVÎ Û CUDATIYAN VE ÇÎROKA ZEMBÎLFIROŞ .....	37
2.1.1. Danberhevkerin û Cudakirina Çîroka Zembîlfiroş a Mîrad xan, Feqî û Bateyî .....	38
2.1.2. Ji Hêla Têşeyê ve Metna Zembîlfiroş .....	47
2.2. JI ALIYÊ TÊGEHÊN NEDÎTBAR Û MOTÎFÊN ÇÎROKÊN EVÎNÎ VE DESTA -NA ZEMBÎLFIROŞ .....	48
2.2.1 Ji Aliyê Têgehên Nedîtbar ve Çîroka Zembîlfiroş .....	48
2.2.1.1. Ji Aliyê “Evîn” ê ve Mijara Zembîlfiroş .....	48
2.2.1.2. Ji Aliyê “Namus” ê ve Mijara Zembîlfiroş .....	54
2.2.1.3. Ji Aliyê “Xiyane” ê ve Mijara Zembîlfiroş .....	64

2.2.1.4. Ji Aliyê Têgeha “Xewn” ê ve Mijara Zembîlfiroş.....	69
<b>2.3. JI ALİYÊ MOTÎFAN VE ÇÎROKA ZEMBÎLFIROŞ .....</b>	<b>70</b>
2.3.1. Koç /Cîh Guhertin.....	70
2.3.2. Bedewî .....	71
2.3.3. Saray-Qesr.....	77
2.3.4. Zindan .....	78

### BEŞA SÊYEM

<b>Jİ ALİYÊ DEM, WAR Û LEHENGAN VE RASTIYA ÇÎROKA ZEMBÎLFIROŞ</b>	
<b>3.1. SERDEM Û WARÊN QEWİMÎNA ÇÎROKA ZEMBÎLFIROŞ .....</b>	<b>79</b>
<b>3.2. LEHENG Û NASNAVÊN DESTANA ZEMBÎLFIROŞ .....</b>	<b>81</b>
3.2.1. Zembîlfiroş .....	81
3.2.2 Xatûnê an Gul Xatûn.....	89
3.2.3. Mîr .....	99
<b>3.3. DI FOKLORÊ DE QONAXÊN CUDA YÊ ÇÎROKA ZEMBÎLFIROŞ .....</b>	<b>101</b>
3.3.1. Li Gorî Emînê Evdal Serpêhatiya Çîroka Zembîlfiroş.....	104
3.3.2. Li Gorî Hesên Reşîd Amêdî Serpêhatiya Çîroka Zembîlfiroş Amedî.....	111
3.3.3. Li Gorî Mele Ûsîf Mihemmed Serpêhatiya Çîroka Zembîlfiroş.....	122
3.3.4. Nivîsandina Şemo Qasim ya ku Wegera wê Hallocî Larê Kiriye.....	128
3.3.5. Helbesta Dengbêj Hiznî.....	136
<b>3.4. HEVBEŞIYA ÇÎROKA ZEMBÎLFIROŞ Û ÇÎROKA ÛSIF Û ZELÎXE .....</b>	<b>142</b>

### BEŞA ÇAREM

#### GUHERTOYÊN ÇÎROKA ZEMBÎLFIROŞ

<b>4.1. DESTXETÊN NIVÎSKÎ.....</b>	<b>146</b>
4.1.1. Zembîlfiroşa Feqiyê Teyran .....	148
4.1.2. Zembîlfiroşa Melayê Bateyî .....	160
4.1.3. Zembîlfiroşa Mîradxanê Bazidî.....	163
<b>ENCAM.....</b>	<b>188</b>
<b>ÇAVKANÎ.....</b>	<b>190</b>
<b>PÊVEK / EK.....</b>	<b>194</b>
<b>KURTEJIYAN .....</b>	<b>217</b>



**KURTE**  
**TEZA MASTIRÊ**  
**VEKOLÎNEK LI SER ÇÎROKA ZEMBÎLFIROŞ**

**YILMAZ, İsa**

**Şewirmend: Prof. Dr. Abdullah KIRAN**

**2016, 217 Rûpel**

Edebiyata kurdî a devkî qedîm e û gelek dewlemend e. Çîroka kurdî a devkî jî xwedî dîrokeke dûr û dirêj e. Lê edebiyata kurdî ya nivîskî û bi taybetî roman û çîroka kurdî ya modern a nivîskî hêj nû ye. Ji ber hin astengî û qedexeyan di derbarê klasîkên kurdî de xebat û lekolîn gelek kêr hatine kirin. Gelek helbest û berhem ber bi jibîrkinê ve çûne an wenda bûne. Ji ber vê yekê di vî warî de kemasî gelek zêde ye û hewcedariya lekolînên rêk û pêk pewiste.

Regeza sereke ku me di derbarê vê mijarê de lekolîn kir eve ku di nav serpêhatiyên evînî de xwedî cîyek giring a çîroka Zembîlfiroş heye û ji çîrokên din vediqete. Serpêhatiyê de dildar jin û yê dilketî jî mêr e. Ji ber ku mijar evîn û yê dildar jî jin e derhaqê vê efsanê de serpêhatiyên cur bi cur hatine nivîsandin û di nav gelê Kurdan de bi awayek folklorîk hatiye jiyandin. Her çiqas di nav kurdan de belav be jî demek dirêj nehatiye nivîsandin û bi awayek wêjeyî li ser rûpelan cîh negirtiye. Bi dengbêji hatiye jiyandin, ji ber vê yekê gelek tişt lê hatine zêdekirin an kêr kirin.

Me di teza xwe de ewil qala çîrokê kir ku bi destê kî hatiye nivîsandin. Di nav du navên girîng Feqiyê Teyran û Melayê Bateyî de heyam û dem hate vekolîn kirin. Di beşa duyemîn de li ser motîf û teşeyên çîrokên evînî di vê çîrokê de çawa cîh digrin hate nitirandin. Gelo rol/cîh guhertina dildar û dildêr bandorek cawa li ser serpêhatiyê tesîr kiriye hate vekolînkirin. Herî dawî jî Zembîlfiroş di nav dengbêjan çîma evqas ber belav bûyê, lê çî hatine zêdekirin û kêr kirin me vê jî xist teze ku ya wêjeyî û devkî de wekhevî û cudatî derkevin holê.

**Peyvên Sereke:** Jinên Evîndar, Helbestên Klasîk yê Kurdan, Evîna bêsûd, Zembîlfiroş, Mutasawwufên Kurdan, Feqiyê Teyran, Meleyê Bateyî, Mîradxanê Bazidî

**ÖZET**  
**YÜKSEK LİSANS TEZİ**  
**ZEMBİLFİROŞ HİKÂYESİ ÜZERİNE BİR İNCELEME**

**YILMAZ, İsa**

**Tez Danışmanı: Prof. Dr. Abdullah KIRAN**

**2016, 217 Sayfa**

Sözlü Kürt Edebiyatı kadim ve zengin bir kültüre sahiptir. Sözlü Kürt hikâyesi de tarih içerisinde yerini almış ve köklü bir yere sahiptir. Ama yazılı Kürt Edebiyatı ve Modern Kürt Edebiyatı daha yenidir. Bazı engel ve yasaklar sebebiyle Klasik Kürt Edebiyatı üzerine çalışmalar çok az sayıdadır. Birçok klasik de yok olmakta veya unutulmaya yüz tutmaktadır. Bu alanda var olan eksiklik ve yetersizlikler yerinde ve derinlemesine araştırmaları mecbur bırakmaktadır.

Bizi de bu araştırmaya iten ana unsur Kürtler içerisinde ayrı bir yeri olan aşk konulu hikâyeler içerisinde çok ayrı bir yer tutan Zembilfiroş hikâyesinin farklı nüshalarını bir araya getirmek ve incelemektir. Zembilfiroş Hikâyesi diğer aşk hikâyelerinde geleneksel bir rol alan kadının dilber, erkeğin ise âşık olduğu model/rol motifinden ayrılarak rolleri değiştirip erkeğin maşuk kadının ise âşık olduğu bir metafora dönüştürür. Her ne kadar Kürtler arasında bu hikâye yaygınsa da uzun bir süre yazılı edebiyat sayfalarında yer almamıştır. Halk ozanları arasında yaşatılmış ve birçok şey ya eklenmiş ya da çıkarılmıştır.

Tezin ilk bölümünde hikâye öncelikle kim tarafından yazıldığı üzerinde durulmuştur. Feqiye Teyran ve Mele Bateyi'nim dönemleri araştırıldı. Sonrasında aşk hikâyelerindeki motif ve şekiller bu hikâye de nasıl yer etmiş bunun üzerinde duruldu. Acaba âşık ve maşukun cinsiyette yer değişimi hikâye üzerinde nasıl bir etkide bulunmuştur araştırıldı. Son kısımda da ozanlar arasında bu hikâye neden bu kadar yaygındır, hikeyeye eklemeler ve eksiltmeler nelerdir araştırıldı. Ayrıca hikâyenin edebi ve sözlü şekli yan yana getirilip bir karşılaştırma yapıldı.

**Anahtar Kelimeler:** Kadın Âşıklar, Klasik Kürt Şiiri, Karşılıksız Aşk, Zembilfiroş, Kürt Mutasavvıflar, Feqiye Teyran, Meleyê Bateyi, Mîradxanê Bazidî

**ABSTRACT**  
**MASTER'S THESIS**  
**A STUDY ON THE “STORY ZEMBLFIROS”**

**İsa YILMAZ**

**Advisor: Prof. Dr. Abdullah KIRAN**

**2016, 217 Pages**

This study holds a very special place in the love story titled viewed Zembîlfiros story. Zembîlfiros story; “Dilber” women involved in other traditional love story, the man is in love with model / role change roles motifs separated from the men's beloved woman into a metaphor for that love. Factors and results caused by this change are described in detail in the thesis. Topics that women love and love stories written in many different ways, the story of which has been kept alive in a folk style and the in The Kurdish people.

Motifs story is a love story that is rich in all the essential themes were hosting. First: Time Feqiyê Teyran 's story he wrote after the Melayê Bate and Miradxanê Bazidi literary pen is reflected from us.

These literary texts in our thesis we compare the content and meaning. In particular, the formation of causal part of the story which was written Miradxanê Bazidi period and has provided important information on people. Where the first hand sources were utilized A. Jābā research works in the collection. Thus, the relationship between the old manuscripts that date could be observed scientifically.

In the last part of the thesis of this legend as told by continuous and sung folk troubadours different variants of the artist took place.

Key issues identified at the end of the study are reported in the results section.

**Key Words:** Woman in love, classical Kurdish poetry, Unrequited Love, Zembîlfiros Kurdish Sufis, Feqiye Teyran, Mele Bateyi, Miradxane Bazıdı

## PÊŞGOTIN

Di nav destanan de bêguman ên ku herî zêde bala mirovan dikişînin, ên evînî ne. Ji destpêka mirovahiyê heta niha, mijara herî balkêş evîn û evîndarî bûye. Îcar di nav gelan de, gelek bûyerên evînî rû dane ku bi rêya vegotin û efsaneyan belav bûne û bûne navneteweyî. Destanên wekî Leyla û Mecnûn, Êsif û Zuleyxa, Xusrev û Şîrîn di nav gelek miletan de bi hezkirin hatine vegotin û belavkirin. Çawa ku ev çîrok û serpêhatiyên evînî, ji wêjeya gelekî derketine bûne malê wêjeya herêmekê an jî parzemînekê, bi heman awayî carinan nehatine nasîn û di nav gelê xwe de tenê mane.

Çîroka ku bûye mijara xebata me, çîrokeke bi vi rengî ye. Gelê Kurd jê re dibêje “Zembîlfiroş”. Serpêhatiya Zembîlfiroş her çiqas ji aliyê rojhilatnasên biyanî ve hatibe nivîsîn û wergerên çîroka wê yên mîna zimanên Erebi, Alman û Rûsî hatibe kirin jî; mixabin ew bi têra xwe li dinyayê nehatiye nasîn. Ev ne li dinyaya dûr, ne jî li bal cîranên Kurdan nehatiye bihîstin. Bêguman di vê rewşê de rola Kurdan û kêmbikaranîna wan a nivîsê heye; lê belê ev yek, lêkolînerên ji mîletên din jî nekiriye.

Di nav Kurdan de navê Feqiyê Teyran, Meleyê Bateyî û yê Mîradxanê Bazidî gelek hatiye bihîstin. Ew jêderk û çavkaniyên gelek girabuha û dewlemend in. Kurd bi van navan serfiraz û serbilind in. Bi xwe çandek an dewletek bi wêje, helbest, zanîst û folklorê dewlemend xwe dide nasandin û bibîrxistin. Ji xwe ev yek jî mezinbûn, qedr û qiymeta ferzan, âlim, nivîskar û rewşenbîrên xwe nîşan dide. Çîroka Zembîlfiroş jî bi navê van sê kesan ve xwe dide nasandin.

Vê çîrokê; ji ber ku ji hemû çîrokên Kurdan û yên neteweyên din cudatir e û tê de rola jin û mer guheriye, bandorek erênî li ser edebiyat, helbest û folklorê kiriye.

Di nav çanda Kurdan de ev çîroka evînê bi hestên Kurdan, bi awayekî cuda jî jiyaye. Îman, ehlaq û azadiya neteweyekê di şexsê Zembîlfiroş de xwe nîşan daye. Zembîlfiroş, bûye sembola şexsên exlaqbilind ên ku li ber nefsa xwe serî natewînin û ji heramiyê dûr in.

Bi saya vê çîrokê mirov him derseke exlaqî digire, him di nav serpehatiyê de tehm û bêhna edebiyatê hîs dike û him jî li hember rewşa evîna Xatûnê, li ber evîn û evîndarîyê xemgîn û dilkul dibe. Ev çîrok ji zargotiniyê derketîye, tesîreke mezin li ser edebiyatnasan kirîye û bûye îlham ji bo dengbêj, muzîsyen û wêjevanan.

**Di Beşa Yekem de,** nivîskarê çîroke hate zelalkirin. Ev çîrok cara yekem ji destê kê hatiye nivîsandin û ji destê kî derketiye, di beşa ewil de ev yek hat lekolînkirin. Di vê beşê de navê nivîskarên çîrokê û wateya navê wan jî hate diyarkirin. Di nav gel de zêdetir li ser navê Feqiyê Teyran nediyariyek heye û gelek tişt lê hatine zêdekirin. Bi arşîv û belgeyên cur bi cur me ev yek zelal kir. Piştî bi destê van nivîskaran çîrokên hatine nivîsandin çiqas rast in û ev destxet rastiye de ye wan in an na, diyar bû. Di nav destxetan de nezîkî û dûrbûn jî çiqas e, di bin banê vê babetê de me nîşan da.

**Di Beşa Duyem de,** çîrok bi awayekî berfireh hat hûnandin. Ji aliyê wekhevî û cudatiyan ve dahûrîna çîroka Zembîlfiroş hate kirin. Di navbera nivîsên Feqiyê Teyran, Melayê Bateyî û Mîradxanê Bazidî de wekhevî û cudatiyên çîrokê hatin berawirdîkirin. Ji aliyê din hîm û esasên xebatê, di vê beşê de hatin avakirin û him jî agahiyên berfireh hatin dayin. Ji aliyê ruxsarê ve danasîn û dahûrîna guhertoyên çîroka Zembîlfiroş hatiye kirin û di çarçoveya vê yekê de, li ser jiyandî nivîskarên guhertoyan; navlêkirina berhemên wan; hejmarên bend û risteyan; ziman û şêweyên guhertoyan û ji aliyê şiklên nezmê ve li ser guhertoyan hat sekinîn. Di binbeşa pey vê de, ji aliyê naverokê ve mijar, raman û peyamên guhertoyan hatin ravekirin. Ji aliyê têgehên dîtbar û nedîtbar ve mijar hate vekolînkirin, di pey re têşe û têgehên wan hatin zelalkirin.

**Di Beşa Sêyem de,** derheqê çîroka Zembîlfiroş de, zanînen zeman û mekan, li gorî çavkaniyên Tarîxa Kurdistanê hatine dayin. Di vê beşê de mebest ew bû ku ji nav pelên dîrokê, şexsiyeteke rastîn a Zembîlfiroş derkeve. Ji bo em ji kesayetiya Zembîlfiroş agahiyên rastîn bigirin, riyeke din hate pejirandin. Ew jî pirtûkên dîrokê bûn. Me di pirtûkên dîrokê de li dîroka Merwaniyan kola da em şopa Zembîlfiroş ku bi navê xwe ye rastîn Mîr Seîd e, bibînin. Di gelek berhemên de em rastî navê Mîr Seîd hatin û me ew berhem û naveroka wan diyar kir. Lê di tu berhemên de behsa bûyera evîna Zembîlfiroş tunebû. Di vê beşê de hate destnîşankirin ku serpêhatiya Zembîlfiroş û Gulxatûnê di sala 994ê zayînî, serdema Merwaniyan (Z. 985-1086) de li Farqîna Amedê qewimiye. Xaleke din a girîng ew bû.

Di vê beşê de, di derheqê lehengên çîrokê de agahî hatin dayîn û piştî jî di nav nivîskarên me de behsa Çîroka Zembîlfiroş çawa hatiye kirin, ew hat zelalkirin. Di paşxala din de jî pîrsa “gelo di nav vê serpêhatiyê û ya Êsif û Zelîxa de wekhevîyek çawa heye” hate bersivandin û beşek din hate veqetandin.

Di amadekirina vê tezê de keda gelek kesan li ser min heye. Helbet ev rûpel wê derfetê nade ku ez navê hemûyan li vir bibîr bînim. Lê divê ku ez bi taybetî ji bo çend kesan sipasiyên xwe pêşkêş bikim.

Di serî de ji mamoste Prof. Dr. Abdullah Kıran re sipas dikim. Wî bi fikr û ramanên xwe, azadiya xebatê da min û şewirmendiya min kir. Her weha ji Doç. Dr. Murat Kayrî, Nevzat Eminoglu, Umît Işık re jî sipas dikim. Deriyê wan her li min vekirî bûn. Wan bi bêhna xwe ya fireh li min guhdarî kirin û bi pêşniyazên xwe alîkarî dane min. Bi taybetî hevalê min Abdullah Koçal, Cûneyt Ayaz û Kudbeddin Yay re spas dikim ku di redakte û sererastkirinê de alîkariya min kirin.



## **KURTEBÊJE**

Amd. : amadekar

b. : berg

b.c. : bêcîh

d.d. : dîroka dîtinê

b.d. : bêdîrok

bnr. : biner

b.n. : berhema vavborî

h.b. : heman berhem

h.g. : heman gotar

h.c. : heman cîh

hwd. : her wekî dî

hj. : jimare

d.m. : dîroka mirinê

r. : rûpel

s. : sal

t.ç. : teza çapnebûyî

wer. : wergêr

weş. : weşan, weşanxane

kov : kovar

rop : roportaj

FT : Feqiyê Teyran

MB : Mîradxanê Bazidî

yd. : yên din

z. : zayînî

## DESTPÊK

Hinek gotinên me yê kurdan hene ku di çirokan de derdikevin pêş. Gelek çîrok li ser jînên kurdan hatine gotin, ev çîrok wek çîrokên rastî (real) tên bi nav kirin. Di jiyana rojane de, ev bûyer hatine serê mirovan û di civatan de derbas bûne, ji ber hinde wek neynika civatê ne. Ji aliyê dîrokî ve derheqê sal û demên bihurî de, ev çîrok me gelekî ronî dikin, qewimandinên ku em di van çîrokan de rastî wan tên, dikarin wek qewimandinên bûyî bên hesabî. Ji ber di edebîyata klasîk a kurdî de destan, çîrok, fabl û hikayatên (mesnewî, qesîde...) hikmetî gelek in, edebyatnasan xwestiye ku bi vê yekê civaka Kurd bête perwerdekirin û mirovên xwedanaqil him dinya hem axîreta xwe bi hêsanî binasin û qezenc bikin.

Dema mirov destanên Kurdî baş analîz dike û lê hûr dibe, di nav van destan û serpêhatiyên bi nav û deng de mirov rastî serdestiya jinan tên, jin xwedî erk û berpirsîyar in, di sazîkirin û pêşketina bûyerên van destanan de roleke mezin dilîzin, ew tim û daîm li dijî neheqî û bêdadiyê disekin û li ber xwe didin. Di van destanan de tekoşîneke jinan heye. Jinan bi xwîna xwe be jî, bi bedewî û rêzaniya xwe be jî di dinyaya van destanan de ji xwe re textek ava kirine. Ji bo bicîhanîna daxwaz, hêvî û xewnerojên xwe tim bi ya xwe kirine, bédilî, dudilî an jî bêgavî di biryarên wan de kêmtên dîtî, ew di vî warî de gelek serhişk in, gelek caran ji bo dilketiyê xwe dimirin, canê xwe didin, mecnûn dibin, qet nebe di goran de xwe digihînin hev. Ji ber vê yekê jî, di van destanan de em rastî trajediyên mezin tên. Di destanên kurdan de em dibînin bê reng û tehrê bûyerên bingeşîn, çawa bi destê wan diguherin an jî ew bi xwe dibin bayîsê bûyerên girîng. Di pêkanîna avakirina bûyerên destanê de û di warê zelalbûna peyama di van berhemana de, em dikarin bêjin ku jinên pêşengiya civaka xwe dikin roleke berbiçav dilîzin.

Di hemû şax û guhartinên van destanan de, jin di rêyeke rast, pozîtîf, qenc û di rêyeke konstruktîf de dimeşin. Him ji bo azadiya xwe, him ji bo azadiya welatê xwe, him jî ji bo mafê mirovan, em dibînin ku ew çawa xwe davêjin nava agirên gur. Dema mirov van destanan hemûyan û şaxên wan dide ber hev, mirov dibîne ku di naveroka van berhemana de gelek babetên hevpar û heveng hene. Ji ber vê yekê di her çîrokê de û bi baldarî jî di vê çîrokê de divê cihê jinan bi awayekî kitekit were nirxandin.



Ev çîrok çîroka Êsif û Zelîxa ya Misrê tîne ber çavan.<sup>1</sup> Çiroka Zembîlfiroş de mijarên ku dişibin ya Êsif û Zelîxayê jî nixandin. Temayên ku dişibin hevdu û yêncuda jî bi awayekî tematîk hatin nixandin. Hikayeya Êsif û Zelîxa yê helbet ji ber ku him di Qur'anê de derbas dibe him jî di nava kultura kurdan ya devkî de cihê xwe digre û di gelek dîwan û meclisan de jî dihate gotin, bo kurdan wekî çîrokek xerîb nahête hesabandin. Lê ji bilî wê, ji bo edebiyata kurdan taybetiyek din tê de heye ku belkî di nava temamê edebiyata cihanê de, edebiyata kurdî derdixe pêş. Ew jî çîroka Zembîlfiroş e ku bi her awayî nebe jî ji gelek aliyan ve dişibe hikayeya Êsif û Zelîxayê.<sup>2</sup> Hem bi awayê vehonandinê hem jî bi hin epîzod û motîfan ve di navbera herdu çîrokan de têkiliyên girîng hene.

Çîroka Zembîlfiroş cara ewil bi destê âlim û zanayê mezin Feqiyê Teyran hatiye nivîsandin. Ji ber ku Feqiyê Teyran alîm û abîdeyekî Xwedan tirs e, hemû helbestên xwe de evîn û evîndariya mezin şopandî ye.<sup>3</sup> Çawa ku ji helbestên Feqî tesewif û îrfan difûre û bêhna Eşqa îlahî jê tê û mijarên cur bi cur ku bi awayekî wêjeyî hatine nivîsîn di vê helbesta wî ya Zembîlfiroş de jî şarezayî, zanistî û pisporiya wî ya helbestvanîyek bêhempa xwe dide der. Danek ji vê deqê ku di sala 1856an de bi destê Mela Mehmûdê Bazîdî hatiye nivîsîn û wî jî gihandiye ber destê qonsulê Rûsya yê li Erziromê Aleksandr Jaba, piştî wî bi xwe jî gihandiye pirtûkxaneyê Lenîngrad yanî Petersburg a li Rûsyayê.<sup>4</sup>

Gelo nivîskarên din ên vê çîrokê kî ne? Dî derheqê vê yekê de gengeşiyek li ser Melayê Bateyî heye. Li gor hin lêkolîneran derheqê mijara ku ev berhem ya Melayê Bateyî ye guman hene. Li gor hin lêkolîneran varyantên ji aliyê wî ve hatine nivîsandin şaş in û ne rast in. Lê belê bi piştgiriya Zanîngeha Mêrdîn Artûklûyê di arşîvên ku gihastin ber destê me de, her du nav jî cih digirin. Di vê arşîvê de ya Feqiyê Teyran û ya Melayê Bateyî jî hene. Lê ya rastî jî naveroka berhema Bateyî û Feqî heman e.

Prof. Dr. Qanatê Kurdo dibêje: “Di sala 1978 folklorîsta kurdnasa Sovyetê Jakêlin Şûrênovna Mûsaelyan xebata xwe de ya bi navê Kurdkaya Poêma Zembîlfiroş î yê folklorî ango Destana Kurdî Zembîlfiroş û Şovêd wê Folklorî par kir. Ew li vê xebata

<sup>1</sup> J.S. Musaelyan, Zembîlfiroş, **Poema Kurdî û Şaxên wê Yê Edebî û Folklorî**, Rohat Alakom (wer.) Stockholm, Nûdem, 1994, r.86.

<sup>2</sup> Selîmiyê Hîzanî, **Yûsuf û Zuleyxa**, Ayhan Geverî (wer), İstanbul, Nûbihar, 2013, r.35.

<sup>3</sup> Necat Zivingî, **Analîz û Lêkolînek Li Ser Hikayeta Zembîlfiroş**, İstanbul, Banga Heq, 2012, r.23.

<sup>4</sup> Prof. Qanatê Kurdo, **Tarîxa Edebyata Kurdî**, Stokholm, Enstîtuya Kurdî Ya Parîsê, 1983, r.65.

xwe de mijûlî lêgerîna destana Ehmed Mele Batê û şovêd wê zargotinê bûye. Ew li xebata xwe de nivîsîye ku yên ji destnivîs Ehmed Mele Batê li nav destnivîsên Kurdî de li kitêbxana Saltîkov-Şêdrîna destnivîsek din jî heye, ew destnivîs bi destê Mûrad Xan Bayêzîdî hatîye nivîsandin û bi reng, rû û naveroka xwe ve mîna destnivîsa Ehmed Mele Batê ye, lê li sedsalîya XVIII da bi nûve hatîye vejîyandin û tezekirinê. J.S.Mûsaelyan xeynî wergerandin û şirovekirina şovêd nivîsarêd Ehmed mele Batê, Mûradxan Bayezêdî wusan jî mijûlî lêgerîna naverok û kêş û qafîya li hev anîna rêz û bendêd deh dozde şovêd zargotin yê Zembîlfiroş dibe, wan raberî hev dike û pevgirêdana wan nîşan dike û tîne ber çavan.”<sup>5</sup>

Çawa me got Zembîlfiroş cara yekem ji aliyê Feqiyê Teyran ve hatiye nivîsîn piştê ji aliyê Melayê Bateyî û cara sêyem jî ji aliyê Miradxanê Bazîdî hatiye nivîsandin. Di sala 1978an de Kurdnasa Sovyetê Jakêlîn Şûrênovna Musaelyan di teza xwe ya doktorayê ya bi navê Zembîlfiroş û Şovêd wê Folklorî de li ser destnivîsa Zembîlfiroş ya Melayê Bateyî ku li pirtûkxaneya Saltîkov-Şêdrîna a Leningradê ye û varyantên Zembîlfiroş ên din jî sekinî ye. Li Petersburgê di jimareyên Kurd 27, 45, 28, 36, 26an de nusxeyên Zembîlfiroş ê hene. Piraniya van nusxeyên Zembîlfiroş bi bal Melayê Bateyî ve tîne nîsbetkirin. Herwiha di mecmu’ya jimare 26’ê de jî digel helbestên helbestvanên din, Zembîlfiroşa Melayê Bateyî û helbestên wî yên din jî hene.<sup>6</sup>

Digel helbestên Feqiyê Teyran û Melayê Bateyî, çavkaniyeke ku li ser hîkayeta Zembîlfiroş hatiye nivîsandin jî kitêba Miradxanê Bazîdî ye ku di sedsala 18an de hatiye nivîsandin. Ev pirtûk di sala 1967an de li Kurdistana Iraqê ji aliyê Giw Mukriyanî ve bi navê Çîrokî Zembîlfiroş li çapxaneya Hewlêrê hatiye çapkirin. Di pey re hinek lêkolîn li ser vê kitêbê hatine kirin. Di van xebatan de xuya dike ku Zembîlfiroş yek ji mîrên Merwanîyan e. Kurê Ebu Nasir Ahmed e ku navê wî Seîd e. Ji aliyê hozanvan Miradxan Bazîdî li sala 1776an a zayînî hatiye nivîsîn û vehandin. Ev deqe bi rêka mela û derwêşan û sofîyan gihastibû Kurdistana Başûr û Şêx Beşîr Şêx Mihemed Tahir Brîfkanî Rkawî di sala 1967an yê ev deqe daye Gîw Mukriyanî.

Bêguman berhem ji destê kê derketibe, hatibe nivîsandin bi usul û wateya xwe bandora nivîskar bi awayekî diyar xwe dide hîskirin. Ji ber vê yekê di lêkolîna me de mijara ewil derheq nivîskarê vê çîrokê de ye. Li gor lêkolînên me yên dûvedirêj me

<sup>5</sup> h.b.r. 66

<sup>6</sup> Zivingî, **Zembîlfiroş**, r.23.

bawerî pê anî ku serpêhatiya Zembîlfiroş cara ewil ji destê Feqiyê Teyran derketiye û paşê jî bi awayekî nivîskî Miradxanê Bazîdî ev helbest nivîsandiye. Ji ber ku derbarê navê Melayê Bateyî de şik û guman hene em ê di teza xwe de li ser muqayese û analîza helbesta Zembîlfiroş a Feqiyê Teyran û Miradxanê Bazîdî bisekinin. Lê car din hawcêyî gotinê ye ku di nav arşîva A. Jaba de ev destxeta Melayê Bateyî heye û Musaelyan û Qanaatê Kurdo jî qala wê dikin, lê belê ji ber ku di nivîsarê de li gor destxetên din yê Bateyî hev girtinek tune ye guman ji vê angaştê heye.

Feqiyê Teyran bi ilm û zanîn û aliyê xwe yê edebî ve rûspiyekî civatê jî ye. Di helbestên wî de tirs û baweriya Xwedê her tim difûre. Ji ber vê yekê heman bandor li ser çîroka Zembîlfiroş jî tê hîskirin. Li gor Bazîdî zêdetir temayên dînî xwe dide hîskirin û di çarçoveya helalî û heramiyê de çîrok xemilandiye. Miradxanê Bazîdî li gor helbesta Feqiyê Teyran bi awayekî cihêreng behsa serpêhatiya Zembîlfiroş dike. Wekî me ji jor jî şîrove kir helbesta Feqiyê Teyran bi awayekî ol û îrfanî hatiye hunandin.

## BEŞA YEKEM

### NIVÎSKARÊN ÇÎROKA ZEMBÎLFIROŞ

#### 1.1. FEQIYÊ TEYRAN

Li gor Qanaatê Kurdo navê wî bi rastî Mehemed Feqî bûye, yan jî Mehemed Feqî Teyran bûye, ewî bi xwe li ser nivîsarin xwe navê xwe kurt dinivîsî: Mîm-Mihê. Alêksandir Jaba dinivîse navê din Mîm Mihiye, Mehemed Feqî Teyran.<sup>7</sup> Feqî\* weliye Xwede ye û kerametê wî hebûne û zimane hemû teyran zanibûye, loma je re gotine Feqiye Teyran.<sup>8</sup> Navê Feqe Mihemed e. Ji gundê Warezûr girêdayî Colemergê ye li wir hatiye dinyayê.<sup>9</sup> Li gor Abdurrahman Adak navê bavê wî Ebdulah e. Di nava gel de wekî Feqiyê Teyran meşhûr bûye. Muhtemelen ji ber ku piştî feqîtiyê melatî nekiriye, navê feqîtiyê li ser maye. Dîsa muhtemelen ji ber ku ji teyran zehf hez kiriye û di helbestên xwe de zehf behsa wan kiriye, bi teyran ve hatiye nisbetkirin û jê re hatiye gotin Feqiyê Teyran.<sup>10</sup> Navê Feqiyê Teyran yê rast û esasî Muhammed e. Hindek caran di nav helbestên xwe de navê xwe yê rast bi kar aniyê. Wekî di helbesta xwe ya digel Melayê Cizîrî, Feqî û Mela de wiha dibêje:

Gul im di destê xaran

Bi ismê Muhammed nav im

Bilbil im di gulzaran

Ji işqê lew zerbav im

Weke di çarmalîkiya jor de jî baş xuya dibe ku navê Feqiyê Teyran yê esasî Muhammed e.<sup>11</sup>

Vê hema hema hemû kesên ku li ser Feqiyê Teyran tiştê nivîsîne diçespînin. Ji bo nimûne; Abdurreqîb Êsîf dibêje ku: Feqiyê Teyran, navê wî Muhammed e û di helbestên xwe de bi nîşana Mîm û Hê behsa xwe dike, lê hinek caran navê xwe

<sup>7</sup> Kurdo, **Tarîxa Edebyata Kurdî**, r.70.

\* Feqî: Kesê ku ji bo xwendinê ji mala xwe diçe devereke din da bixwîne, jê re feqî yan feqe tê gotin. Ew feqiyê ku ji bo xwendine diçû medreseyan hicrake, ji dersdare wir daxwaz dikir ku cih bide wî. Eger dersdar cih bidana wî, ew li wir dima û dixwend. Eger cih nedanaye, feqî ji wir diçû devereke din. (Zeynelabidîn Zinar, **Xwendina Medresê**, Stockholm, Pencînar, 1993, r.39).

<sup>8</sup> Abdurreqîb Yusîf, **Şairên Klasîk ên Kurd**, Sweden, Jîna Nû, 1988, r. 29.

<sup>9</sup> Adak A. Baluken Y. Acar H. "Gora Feqiyê Teyran", *Nûbihar Akademî*, s. I, hj.1, s. 2014, r.109-118.

<sup>10</sup> Abdurrahman Adak, **Destpêka Edebyata Kurdî ya Klasîk**, İstanbul, Nûbihar, 2013, r.212.

<sup>11</sup> M. Xalid Sadî, **Feqiyê Teyran Jiyan Berhem û Helbestên Wî**, İstanbul, Nûbihar, 2013, r.19.

Muhammed nivîsiye.<sup>12</sup> Zeynelabidîn Zinar, navê Feqiyê Teyran, ê esasî Muhammed e. Ew kurê Şêx Ebdullayê Muksê ye.<sup>13</sup> Li gorî ku Selîm Temo vediguhezîne me, feqî weke malbat ji tebeqeyeke sosyolojîk a bilind hatiye, ew mîr bûye<sup>14</sup>, mîrekî ji Hekariyê bûye ji xwe şanenava wî ya weke Mîr Mihemed jî vê agahiyê piştrast dike û dipeyitîne. Li mîrekî bifikirin ku li hemberî mîr û axayan derdikeve, dev ji çîna xwe berdide û çîna bindest, xizan û ketî yan diparêze.<sup>15</sup> Herwisa Prof. Qanatê Kurdo, di Tarîxa Edebiyata Kurdî de, Bleç Şerko di el Qeziyet el Kurdiyye de, Minorskî di Ansîklopediya Îslamê de, Bazil Nikitin di Kûrtler de gotine ku, navê Feqiyê Teyran, Mihemed e.

Baş eşkere ye ku navê Feqiyê Teyran Muhammed e û ev tişt jî bêguman e. Nasnavê wî yê navdar Feqî, Feqe an jî Feqiyê Teyran e. Gelê Kurd û lêkolînêrên klasîkê wêjeya kurd jî bêhtir ji navê wî yê rast Mihemed, wî bi nasnavê wî Feqiyê Teyran dinasin. Dema ku Feqiyê Teyran bi navê xwe naête naskirin û ji navê xwe bêhtir bi vî nasnavî tê naskirin, divê em bizanin ka wateya vî nasnavî çi ye?

### 1.1.1. Çima jê re gotine Feqî?

Di nav medreseyan de ji van pirtûkan şeş bi tevayî kurdî ne. Yên din jî erebî ne. Pirtûk bi rêzê ji hêsanî ber bi zorê ve diçin. Di van pirtûkan de feqe, serf û nehew, hedîs, tefsîr, fiqh, mantiq, siyer, edebiyat û belaxetê dixwîne. Kesê ku vê xwendinê heta pirtûka Camî bidomîne ew hê jî feqî ye. Ger Camî bixwîne û xwendina xwe bidomîne êdî ew talib e. Talibê ilm û zanînê ye. Talib dema pirtûka dawiyê Cem'ul Cewamî qedand û bi ser ket, îcaze digire dibe seyda. Kesê îcaze nestandibe, melatî û seydatiyê neke jî, çendî ku xwendibe jî, bila xwendibe, an çiqas zana be jî, bila zana be, ew di nava gelê me de hêjî feqe ye. Yanî xwendevan e.

Di troykaya<sup>16</sup> helbesta klasîk a Kurdî de hiyarerşiya ku ji Feqiyê Teyranî re ketiye feqîtî ye, ji ber ku Ehmedê Xanî weke şex û Melayê Cizîrî jî weke melle cih ji xwe re çêkiriye, ê ku feqî maye an jî xwe feqî hiştiye Feqiyê Teyran bi xwe ye. Ev statuya wêjeyî ne ji mecbûriyetekê, ji xwezîpêanîna wî qewimiye; lê ev rewş ne ji ber

<sup>12</sup> Abdurreqîb Yusîf, *Şairên Klasîk ên Kurd*, r.29.

<sup>13</sup> Zinar Z., *Nûdem*, hj. 3, 1992, r. 52,58, 84.

<sup>14</sup> Selim Temo, *Antolojiya Helbesta Kurdî*, Îstanbul, Agora, 2007, hj. II, r.1367.

<sup>15</sup> Rênas Jiyan, *Feqiyê Teyran Hemû Berhemên Wî*, Îstanbul, weş. Belkî Klasîk, 2008, r.10.

<sup>16</sup> Troyka: Peyveke bi Rûsî ye, erebeya ku bi sê hespan tê kişandin.

kêmasiya wî ya wêjeyî, ji ber dîlnizmî û civakparêzî ya wî bi xwe ye, ew jî weke Socratesî, bi tenê bi tiştêkî baş dizane, ew tişt jî nezaniya wî ya hertiştî ye.<sup>17</sup> Tiştê ku mirov bêhtir pê bawer bike ew e, ku feqetî di nav ehlê medresê de cihekî nû ye. Ango kêmtirîn cih di medresê de feqetî ye. Her çendan ku feqe ji nav refên alemê derketibe û ketibe nav refên ehlê ilm û zanîn û xwendinê jî, hê feqe biçûk e, di vî karî de hê jî negihaştîye rêza seydatiyê û di nava xelkê de cihê xwe yê taybetî newergirtiye. Ji ber wê, ew ji çîna xelkê derketiye, lê hê negihaştîye çîna zanînê. Êdî di nav herdu çînan de ma ye, ew navçîn e. Ger li ser xebata xwe bisekine dê ji çîna xelkê derkeve û here çîna xwendevanan. Ger xwend û xwendina xwe neqedandibe jî carekê ew navê xwendevaniyê ketiye ser û heta dawiyê dê bi wî navî were nasîn.

Herwisa mirov dikare bêje ku ev nasnavê Feqî, ji bo nefsi biçûkkirin û nefsbîçûkdîtina wî ye. Lewra Feqiyê Teyran çawa xwendevanekî xurt be jî, di dema wî de zanayên xurttir hebûn. Di dema Feqiyê Teyran de hem li Cizîrê û hem jî li Hîzan û Bedlîs û Hekariyê zanayên qewî hebûne. Dibe ku Feqiyê Teyran di nava kenkenan û giregirên ilm û zanînê de xwe herdem bi feqetî daye naskirin. Bi vî awayî hem xwe ji âlim û zanayan kêmtir jimartiye û hem jî bi jiyana xwe nîşan daye ku temenê xwendinê nîn e. Mirov heta dawiyê feqî ye. Ji bo ku nefspîçûkkirina wî gotina wî ya ku ligel Melayê Cizîrî, tu roj î ez hetav im, delîleke giring e. Bi vî gotinê mirov baş dizane ku wî herdem xwe ji zanayên din kêmtir dîtiye. Dîsa di nav helbestvanên kurd de, ji Feqiyê Teyran û Feqe Reşîdê Hekarî pê ve kesekî feqîtî ji xwe re nekiriye nav. Ji ber bi dil û caniya mirovahî, dîlnizmî û xwe mezinbûnê û nefsi biçûkdîtina xwe ne.<sup>18</sup> Vêca em binêrin ka Feqiyê Teyran ev nasnavê xwe yê giring û navdar di nava helbestên xwe de bi çi awayî bi kar aniye. Feqiyê Teyran di helbesteke xwe de, xwe wiha dide nasîn.

Nesaxê bêjan ez im

Taziyê uryan ez im

Ê bi kul û derdan ez im

Mecrûhê ji qehran ez im

E xurîşîran ez im

---

<sup>17</sup> h.b. r. 9.

<sup>18</sup> Zeynelabîdîn Zinar, “Feqiye Teyran”, *Nûdem*, hj. 3, s. 1992, r.84.

Feqiyê Teyran ez im<sup>19</sup>

Di van malikên jor de tê dîtin ku Feqiyê Teyran xwe wek Feqiyê Teyran daye naskirin. Nasnavê xwe bi rastî bi kar aniyê ku Feqiyê Teyran e.

Baş e, em dizanin ku Feqe, Feqî ji xwendevaniyê tîn, navê Feqî ji feqetiyê hatiye, lê ev Teyran çi ye?

Bi gotina Celadet Bedirxan, Feqehê Teyran, bi zimanê teyran dizanibû ji lewre navê Feqiyê Teyran lê kirine. Li gor Bedirxan ji bo çîroka Feqe û Zimanê Teyran de şîroveyek balkeş dîke û vê yekê ji xwe re dîke burhan û vê çîrokê ji devê Şêx Evdîrehmanê Garisi parve dîke<sup>20</sup>

Di pirtûka Feqiyê Teyran ya Rênas Jiyana de jî mijar bi vî şiklî ye. Mîtosa Teyr û Zêran de derbas dibe : *“Di gereke Feqî de rêwiyekî çavbirçî li Feqî rast tê û rêhevaltiye bi Feqî re dîke. Di rêwîtiyê de rêwiyê çavbirçî bi sirra Feqî dihise. Gava ku digihîjin bajarê ku ew diherinê rêwiyê çavbirçî jê diqete û diçe li cem hukimdarê bajêr giliyê Feqî dîke. Hukimdar, ji Feqî dixwaze ku bi teyran re biaxîfe û ji wan hînî cihê xizneya bajêr bibe, heger na ji ber derewa Feqî ew ê wî ceza bike. Feqî bi şertê ku hukimdar mehekê hemû teyrên çiyayê wî bajarî xwedî bike fermana hukimdarê qebûl dîke. Di hevnasîna pêvajoya mehekê de hukimdar jî di nav de hemû gelê bajêr bi dilsozî û mezinahiya Feqî qenaet û baweriyê tînin. Piştî ku mehek diqede, di şeveqa dawîn a wê mehê de, li çolê, ji teyrên bajêr teyrikeke gellekî xweşik cihê gencîneyê ji Feqî re dibêje. Diherin wî cihê dikolin xizneyeke pîrr mezin jê derdikeve.*

*Gelê bajêr li rêhevalê Feqî yê çavbirçî tê xezebê û ji ber ku bêbextiyeke pîrr mezin li Feqî kiriye serê wî jê dikin. Serê rêwiyê çavbirçî dixin aliyekî mêzîne û aliyê din jî bi zêran dadigirin, lê çiqasî pîrr zêran dixinê jî dikin û nakin serê rêwiyê çavbirçî û zêr beranberî hev nabin, hertim ê giran serî derdikeve. Gava ku Feqî tê hinek ax berra çavên serî dide, wê çaxê serî sivik dibe û giraniya zêrekî bi tenê jî têra giraniya serî dîke”.*<sup>21</sup>

Gelo Feqî rastî jî zimanê teyran zanibû an na, lê rastî ne di cihê baweriyê de ye ku Feqiyê Teyran zimanê teyran zanibe û ji ber wê ev nasnav li wî hatibe kirin. Herwisa

<sup>19</sup> Sadînî, **Feqiyê Teyran**, r. 416.

<sup>20</sup> Nûredîn Êsîf, “Klasîkên Me An Şahîr û Edîbên Me En Kevin”, *kov. Hawar*, hj. 33, 1941, r.812, 813.

<sup>21</sup> Jiyana, **Feqiyê Teyran**, r.12-13.

ji aliyê zanistiyê ve tiştekan baş nîn e ku mirovekî wekî Celaledet Bedirxan çîrokekê ji xwe re spartek bipejirîne û bigihêje wê qinyatê ku Feqiyê Teyran bi zimanê teyran dizanî.

Derbareyî vê peyva Teyran de A.Ûsif bi xwe ev gotina di dîwana xwe de nivîsiye ku, Feqî, xelkê gunde Teyran e. Ev gunde han dikeve navbera Mukse û Hîzanê lê li ser Hîzanê tê hesabandin. Ev gundê han hin jî heye û di nav daniştvanan Mukse û Hîzane de bi vî navî te nasîn. Feqî yek ji daniştvanan vî gundî ye, ne ku wekî dîroknasan; Emîn Zekî, Bleç Şerko û Elaeddîn Secadî nivîsîne, ne xelkê Makûye ye. Ji ber ku nave gunde wî Teyran e. Her wiha eva han jî ne rast e ku wan nivîsiye dibejin: Feqî weliye Xwede ye û keramete wî hebûne û zimane hemû teyran zanibûye, loma je re gotine Feqiye Teyran.<sup>22</sup> Ev yek ji bo me gelek balkêş e û ji bo werê nirxandin ev yek girîng e. Lê belê, A.Ûsif, paşê ev gotina xwe red kiriye. Piştî Dîwana Kurmancî hatiye weşandin, A.Ûsif nameyek ji bo P. Elîxan û Seîd Dêreşî şandiye û tê de gotiye ku: Feqe, xelkê Muksê ye, ne ku xelkê Teyran e.<sup>23</sup>

### 1.1.2. Feqiyê Teyran Di Kîjan Heyamê De Jiya Ye?

Li gor Qanaatê Kurdo ew ji Muqsê welati Hekarîyê li sala 702 hîcri (1375-76) hatiye dinê.<sup>24</sup> Abdurrahman Adak jidayîkbûna Feqî de dibêje, Feqiyê Teyran helbestvanekî herî girîng yê sedsala XVI û XVIIan e.<sup>25</sup> A. Yusîf di divana xwe ya bi navê Şaîrên Klasîk ên Kurd de jidayîkbûna Feqî de dibêje, Feqî di navbera salên 707-775'e hîcrî (1307-1375'e mîladî) de jiyaye.<sup>26</sup> Li gor Wesfî Hesên Rdênî, Feqiyê Teyran di navbera salên 1590 û 1660î de jiyaye.<sup>27</sup> Dîsa li gor Zinar jî Feqî di sala 1590î de ji diya xwe çebûye û di sala 1660 î de jî çûye dilovaniya xwe. Li gorî gotinên di nav xelkê de, navê bavê wî Şêx Evdie ye. Û bi esl û koka xwe, ji Miksa Hekarîyê ye.<sup>28</sup> Kovara

<sup>22</sup> Yusîf, *Şaîrên Klasîk ên Kurd*, r. 29.

<sup>23</sup> Sadîni, *Feqiyê Teyran*, r. 21.

<sup>24</sup> Kurdo, *Tarîxa Edebyata Kurdî*, r. 70

<sup>25</sup> Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, r. 211

<sup>26</sup> Yusîf, *Şaîrên Klasîk ên Kurd*, r. 29

<sup>27</sup> Wesfî Hesên Rdênî, "Beyta Zembîlfiroş" [*kov. elektronik*], Dihok- Irak, *Spîrêz*, 2008, hj.282, (d.d. 03.06.2014) r.19.

<sup>28</sup> Zeynelabidîn Zinar, *Nîmûne Ji Gencîneya Çanda Qedexkirî*, Yekîtiya Nivîskarên Kurd, Swed, 1991, r. 52.



Hêvîya Welêt nivîsîye ku Feqîyê Teyra di sala 1302 de bûye û 1375 de jî çûye dilovanîya xwe.

Lê belê hin tarîxên eşkere li holê hene, ku Feqî bixwe di helbestên xwe de gotine dema ku wî û Melayê Cizîrî li ser hevdu helbest gotine, Feqî gotîye, zanin meddahê kê me, di hezar û yek û sihan? Eva bi vê yekê diyar dibe, ku Feqîyê Teyra di sala 1031 (Mîladî 1621) an de sax bûye.

Beyta diduyan jî, ew e ku wî di şîna Melayê Cizîrî de gotîye. Tarîxa di wê malikê de jî dike 1050 (1640)

Ev tarîxa 1041, eger hicrî be, dike 1631 ê mîladî. Ev bi van tarîxan, newekheviya wan tarîxên ku me li pêş behs kirin, derket holê. Lê N. Mackenzie di pêşgotina pirtûka Şêxê Senanî de nivîsîye ku Feqîyê Teyra di sala 1590 î (1000-1070 hicrî) de çêbûye û di sala 1660 î de jî mirîye û kovara Roja Nû jî di jimara 16, 1987 de, mîna Dr. N Mackenzie nivîsîye.<sup>29</sup>

Heke xemxwarekî toreya kurdî, li ser jiyana wan helbestvanan vekolînek, lêgerînek kiribe em dikarin ew tiştê hatibe gotin, ji xwe re spartek û serkanî bipejirînin. Wan jêder û çavkaniyên li ser babetê hatine nivîsîn berfireh bikin, da ku bi awayekî çêtir rohnîyekê bixine ser babetê xwe. Ji bilî vê heke pirtûkek, nivîsek, an jî helbestek ji wan helbestvan û hozanên ku mirov babet li ser vekirî mabe û em gihiştibin wê spartekê, wiha ye ku mirov bikare rastîyekê jê derbixe. Wekî li cem gelek klasîkên me diyarokek heye ku ewan bi xwe sala ji dayikbûna xwe, jiyana xwe, cihê jiyana wan lê derbas bûye, kesên navdar yên dema xwe, hinek bûyerên giring ên dîrokî yên hevçaxê xwe, navên padîşah û kemandarên dema xwe, şerên mezin yên çaxê xwe û navê dewletên çaxê xwe nivîsîne. Helbest li ser van tiştan vehonandine, an jî navên wan, dîroka wan di nav helbestên xwe de bikar anîne. Dîsa gelek caran salên nivîsên xwe, salên tevavkirina helbest û berhemên xwe diyar kirine. Bi vê yekê jî bi alîkarî û dûrbîniya wan, rohnîyek wek sîtavkê dikeve ser çaxa jiyana wan. Mirov dibêje ku wan hizir kirine û zanîne ku dê rewşa kurdan wiha lê were û dê nakokî di navbeyna zana û wêjevanên kurd de çêbibin. Heta ku wan bi xwe di derbareyê tiştên wiha de gelek tiştên bi rûmet nivîsîne. Wekî helbestvan û feylesofê mezin Ehmedê Xanî sala jidayikbûna xwe ji bo me wiha diyar kiriye:

---

<sup>29</sup> h.b.r. 53.

Lewra ku dema ji xeybê fek bû

Tarîx hezar û şêst û yek bû

Ango di dema ez ji zikê dayikê hatime der, sal hezar û şêst û yekê (1061) mişextî bû. Ev sala 1061ê koçî dikeve beramberî 1650-1651 ê zayînî. Eve jî sala jidayikbûna serkarê hozanvanên kurd Ehmedê Xanî ye.<sup>30</sup>

Herwisa sala tamamkirina pirtûka xwe ya bi nav û deng Mem û Zînê jî nivîsiye. Dîsan Ehmedê Xanî di helbestên xwe de behsa M.Cizîrî<sup>31</sup>, Elî Herîrî û Feqiyê Teyran kiriye da ku em bizanin ev hersê helbestvanên hêja pêşiya Xanî jiyane.

Bîna ve riha Melê Cizîrî

Pê hey bi kira Elî Herîrî

Keyfek wê bi da Feqîhê Teyran,

Hetta bi ebed bi mayî heyran<sup>32</sup>

Wekî Ehmedê Xanî Melayê Cizîrî jî sala jidayikbûna xwe û gelek dîrokên din ji bo me nîşan kirine di nava helbestên xwe de.

Şêx Ehmed Cizîrî sala jidayikbûna xwe bi jimara ebedê wiha bikaraniye di helbesta Newaya mutrib û çengê/fixan avête xerçengê de:

Ji herfan mah û salî ma

Nehat der şiklê falî ma

Wate ji bêjeya herfên mah û salî me û şiklê falî me derneketine der, di nav hev de mane, li ser hev tîn jimartin. Ku bi jimara ebedê dibe 974ê koçî, beramberî 1566ê zayînî.

Feqiyê Teyran û Melayê Cizîrî hevçaxê hev in û herduyan bi hev re helbest gotine. Helbesta bi navê Feqe û Mele<sup>33</sup> de em dibînin ku Feqe û Mele hevçaxê hevdû ne û heman heyamê de jiyane. Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran navbera wan de pêwendiyek giring heye û pêk vê girêdayî ne. Jiyanê yekî ji wan dema eşkere bibe jiyanê yê din jî

<sup>30</sup> M.Emîn Bozarşan, **Mem û Zîn**, Îstanbul, weş. Deng, 2010, r.8.

<sup>31</sup> Meleyê Cizîrî weke Feqî bernavka xwe bi kar dianî

Rohniya çehvên Melayî ew tecellaya te dayî

Ya ji Ehmed dil rewayî dil ji min bir dil ji min (Adak, Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk, r.186 ).

<sup>32</sup> Bozarşan, **Mem û Zîn**, r. 62.

<sup>33</sup> Sadînî, **Feqiyê Teyran Jiyan Berhem û Helbestên Wî**, r.163.

ronî dibe. Lewra wana hem behsa xwe kirine hem jî behsa pêş û paşiyên xwe kirine. Ji ber vê ye ku ew mînakên jor hatin nivîsîn.

Feqiyê Teyran jî di gelek helbestên xwe de salên nivîsandina wan destnîşan kirine. Herwisa Feqiyê hêja ji bilî vê yekê jî, hinek dîrok, bi tîpan û bi peyvan li dû jimara ebcedê nivîsîne. Ji wê dîroknivîsîna wî jî, zanîneke nû ji bo me diyar dibe. Herwekî sala mirina Melayê Cizîrî wiha bi kar aniye di helbesta Îro Qewî Girya Me Tê de:

Heft eyn û lam ji hev bûn cuda

Şînî û girîn dîsa te da

Ango ji, heft eynan ku lam jê cuda, bibe û, şînî û girî tev bibe, dîroka wefata Melayê Cizîrî, ku bi gorî jimêra ebcedê dibe 1050ê koçî, beramberî 1640ê zayîni derdikeve.

Piştî van agahdariyan divê em bêne ser mijara xwe ku ew jî Feqiyê Teyran e. Lê herwekî me li jor jî gotibû; ferz bû ku dema bûyin û mirina Melayê Cizîrî hatiba tesbîtkirin. Lewra Melayê Cizîrî digel babetê me pêwendiyek giring heye; Feqe û Mele hevalên hev in û digel hev helbestek di sala 1031 an de, li Cizîrê nivîsîne. Ev helbesta wan, danberhevek giringtirîn ji helbestên klasîk ên kurdî ye. Helbest ji 50 şeşmalkiyan pêk hatiye. Helbesta, Feqe û Melê spartekek giring e ji bo me ku em bikarin bêjin Feqiyê Teyran û Melayê Cizîrî hevçax, hevnas û hevalên hev in. Ev gotine jî tiştên ku heta niha di derbareyî van herdu giregirên wêjeya kurdî de hatine gotin, gelekani ji wan red dike.<sup>34</sup>

Mijareke din a dîroka koç kirina Feqiyê Teyran e ku wê mijarê zelaltir bike. Heta niha dihat zanîn ku gora Feqî Miksê ye. Lê belê gora Feqiyê Teyran li devera Şandîsê hat dîtin.<sup>35</sup> Li ser mezêlê Feqî de agahiyên berfireh hebûn. Li ser kevîrê gora wî wusa tê nivîsin:

*“Ev kesê navê wî Muhemmede û bi navê Feqiyê Teyran navdar bûye, di sala 1041 de çuye dilovaniya Xwedayê xwe û benda af û maxfîreta Wî ye.”<sup>36</sup>*

<sup>34</sup> h.b. r. 15 -18.

<sup>35</sup> Yüksel, Müfid, “Feqiyê Teyran, Feka Tayran’ın Mezar Şahidesi”, 13.09.2013, (<http://mufidyuksel.com/>), (d.d. 15.03.2014 ).

<sup>36</sup> Adak A. Baluken Y. Acar H. “Gora Feqiyê Teyran”, *kov. Nûbihar Akademî*, 2014 s I, hj. I, r.109-118.

Bi awayek din: Ev gor a dilşad, rehmetî, bexşandî û mihtacê rehmeta Xwedê, Mihemedê navdarê bi Feqehê Teyran e ku di sala 1041 ê de koçî dawiyê kiriye.

Ev belge bi tîpên erebî hatiye nivîsandin û di dawiya menzûmeya Feqiyê Teyran a bi navê, Dilo Rabe de ji aliyê mustensixê menzûmeyê ve hatiye nivîsandin. Belge ji aliyê Celîlê Celîl ve hatiye bidestxistin.<sup>37</sup> Di vê belgeyê de weha behsa Feqiyê Teyran hatiye kirin: Navê Feqe Mihemed e. Ji gundê Warezûrê ye û li wir hatiye dinyayê. Li gundê Şandîsê ku li ser qezaya Nemira (navê eşîreke Xîzanê ye) ye hatiye veşartin. Heçî Warezûrê, ew jî li ser qezaya Miksê ye.

Belgeyek din jî bi zimanê Osmanî ye û di salnameya wîlayeta Bedlîsê de di sala 1316/1898an de li Bedlîsê hatiye weşandin. (*Bitlîs Vilayetine Mahsûs Salnamedir. İkinci Def'a. Sene-i Hicriye-i Kameriye: 1316, Bitlîs Vilayet Matbaasi, r. 174*) Li gorî vê belgeyê Şandîs li ser nahiyeya Uçumê ye. Uçum niha jî gundekî Xîzanê ye, nêzî Nûrsê ye. Di vê belgeyê de weha behsa Feqiyê Teyran hatiye kirin: Ê li nahiyeya Uçumê li gundê Şandîsê Feqiyê Teyranê ku di zimanên Farisî û Kurdî de xwediyê helbestên dilkêş û bihikmet e veşartî ye.

Pelgeyek din jî di salnameya wîlayeta Bedlîsê de di sala 1310/1892an de hatiye weşandin. (*Salname-i Vilayet-i Bitlîs, Birinci Def'a. 1310, r. 190*). Di vê belgeyê de hatiye îfadekirin ku gora Feqiyê Teyran rojên înan û duşeman ji aliyê girseya xelkê ve dihat ziyaretkirin. Lê li gorî vê belgeyê gora Feqî li nahiyeya Spayîrtê ye. Lewra di beşa Nahiyeya Spayîrtê de ev agahî hatiye dayîn. Ji vê jî tê fêmkîrîn ku Gundê Şandîsê ku gora Feqî li wir e, berê (dema ku salnameya yekem hatiye çapkirin ku sala 1892 ye) li ser nahiyeya Spayîrtê bû, piştê (dema ku salnameya duyem hatiye çapkirin ku sala 1898 e) bi nahiyeya Uçumê ve hatiye girêdan. Di vê belgeyê de weha behsa Feqiyê Teyran hatiye kirin: Li ziyaretgeha Şêx Teyran û Şêx Sînan ku di nava tixûbê Nahiyeya (Spayîrtê) de veşartî ne, rojên înan û Duşeman ji her aliyê ve gelek ziyaretvan kom dibin.<sup>38</sup>

Ji devê X. Sadînî jî dîtina çîroka kevirê gora Feqî û xwendina nivîsa li ser kevirê gorê jî bi wî awayî ye: “Hevalê min Mûfid Yûksel 13 Îlona 2013 an li ser malpera xwe de “kevirê mezêlê Feqiyê Teyran” weşand. Nivîsên li ser kevir rast xwendibû lê belê

<sup>37</sup> Seîd Dêreşî, *Dîwana Feqiyê Teyran*, Ankara, Lîs, 2011, r.2.

<sup>38</sup> Adak A. Baluken Y. Acar H. , “Gora Feqiyê Teyran”, *Kovara Nûbihar Akademî*, 2014, hj 1, r.109-118.

sala mirina wî li gor min ne rastbû ango mirina wî H. 1031 an hatibu xwendin ev yek jî li gor lekolînê min 10 sal beriya mirina wî dihat xuyakirin. Ji ber vê yekê jibo di cîh de kevirê gorê bibînim û lekolînê rast derênim 26 Îlona 2013 an ber bi Hîzanê bi rê ketim. Ev mezel li gundê Dayilar mezra Şandisê yê Hîzanê bu. Bi kelecaneke mezin gihiştme gund lê belê roj çûbû ava ez jî wê şewê di nava kelecaneke mezin mala mîxtarê gund Îhsan Demîr derbas kirim. Danê sibê em çune mezelê bimbarek. Gelek kelecane bibûm. Dema Surea Fatîhayê dixwendim jî çavê min li ser kevirê gorê bû û dîroka li ser hatibu nivîsandin dixwendim. Belê ne şaşbûm. Dîroka li ser 1041 bû. Jibo vê yekê pîştrast bikim wene yên kevir heman demê de min şand hevalê xwe lekolîner-nivîskar mamoste Sinan Hakan û mamosteyê zanîngeha Van Yûzûncû Yil ê Dr. Mehmet Top. Her du jî gotinên Mûfîd Yûksel pîştrast kirin û teza min nerast dergistin lê belê min înad kir û dev ji vê bernedam, ji ber ku di Erebi de jimara 3 ê li ser kevir rastî jimara 4 ya Farisî hatibû nivîsîn. Di ser de helbestê Feqî yê wekî, Şexê Sen'an û Dili Rabe Dilo Rabe de sala 1041 an de hatibûn qedandin. Eger li gor xwendinên wekî dostê min bûya û ev dîrok rastî de 1031 bûya wê hemû tezê min yê derhaq mirina Feqiyê Teyran de pûç derketibûna. Xwedê kir ya min rast derket. Pîştire van wene yan mamosteyê YYÛ Dr. Edîp Yilmaz re parvekirim ku di derbarê kevirê mezelan de pîspor bû. Me dît ku li ser kevir kelaka şahiyeya jor de nivîseke wusa hebû:

Haza merqadu es-se'îd el-merhum, el-mexfûr, El- muhtaç ila rehmetullahî te'ala Muhemmed el-meşhûr Feqeh-î Teyran Fi sena 1041 (1631-1632M.)”<sup>39</sup>

Bi kurdiya xwe; ev kesê navê wî Muhemmed e û bi navê Feqiyê Teyran navdar bûye, di sala 1041 de çuye dilovaniya Xwedayê xwe û benda af û maxfireta Wî ye.”

Li vê derê dibe ku pîrsek werê rojevê, werê pîrsîn ji pîrsek rast e. Çima du heb gorên Feqiyê Teyran hene?

Di navbera Miks/Bahçesaray û Şandisê de gengeşiya “gora Feqî ba meye” heye. Feqî beriya mirina xwe li gundê Şandisê ê bicîh dibe. Piştî demekê jî li vê derê çûye ber rehma Xwedê. Mirovên Feqî jibo cinazê tîna Şandisê û meytê Feqî dîxwazin. Lê belê şênîyên Şandisê naxwazin bidin û dibêjin “Feqî mevanê me ye.” Di nava her du gundiyan de gengeşî derdikeve. Piştî cendek jibo vê yekê çareser bikin hâkim tayîn

<sup>39</sup> Sadînî, X. , “Feqiyê Teyra'nin mezar taşı bulundu/ Kevirê Gora Feqiyê Teyran hat dîtin”, 28.10.2013, (<http://www.ilkehaber.com/haber/feqiy-teyranin-mezartasi-bulundu-27816.htm>), (d.d. 02.02.2014 ).

dikin( li gor hin rîvayetan jî hakîm bi xwe Feqiyê Teyran e ku tê xewna gundiyeke û vê yekê peşniyazî wana dike.) Hâkim du heb tabut/darbest amade dike. Meytê Feqî dixê nava yekî, heman giraniyekê jî dixê nava darbesta din û ji herdu aliyan re dibêje “werin heryekî we yekê bibin û binax bikin. Bi vî awayî ev mijar tê çareserkin.<sup>40</sup>

Wekî encam ji her sê belgeyên ku di serî de hatine weşandin tê fêmkirin ku gora Feqiyê Teyran li gundê Şandîsê ye. Şandîs di sala 1892yan de li ser nahiyeya Spayîrtê ye û di sala 1898an de li ser nahiyeya Uçumê ye. Niha hem Spayîrt, hem Uçum, hem jî Şandîs gund in û li ser qezaya Xîzanê ne. Xîzan navekî xwe yê dî bi navê “Nemira” jî heye. Her weha ji belgeya sêyem jî tê fêmkirin ku weke kevneşopiyekê gora Feqiyê Teyran her hefte rojên înan û duşman ji aliyê xelkê herêmê ve dihat ziyaretkirin û bi çavê kesekî pîroz lê dihat nêrin.

Ji nivîstekên li ser kêla gora Feqiyê Teyran jî tê fêmkirin ku Feqî di sala 1041/1632yan de koçî dawiyê kiriye. Mîr Huseyn ji eşîra Nemira ye û mîrê Xîzanê ye. Bavê wî Mîr Şeref Beg mîrekî navdar bûye. Mîr Huseyn, di sala 1117/1705an de, piştî koça Feqî ya dawiyê bi qasî 76 salan gora wî ava kiriye. Mîr Huseyn di heman salê de li Xîzanê ji bo mesrefên gora Feqî weqfêk jî saz kiriye û ji bo micêwirên gorê 50 qurûş ratib tayîn kiriye. Katibê nivîstekên gora Feqî Îbrahîmê Miksî ye û rûba'iyê Omer Xeyyam bi Farisî li ser kêlê nivîsandiye. Ev jî nîşan dide ku Omer Xeyyam wê serdemê di nava rewşenbîrên Kurdan de kesekî pêbawer bûye. Divê ev jî bê gotin ku mîrên Xîzan, Miks û Spayîrtê ji heman malbatê ne. Xuya ye ku têkiliya hatina Feqiyê Teyran ji Miksê bal bi Xîzanê ve bi vî yeke re heye.<sup>41</sup>

## 1.2. MELE HUSEYNÊ BATEYÎ

Çîroka Zembîlfiroş ku dibêjin a Meleyê Bateyî ye hin guman û niqaş henin. Her çikas di derbarê Meleyê Bateyî nakokî hebe jî<sup>42</sup>, jibo hin çavkaniyan de derhaq destnivîsên wî yê Zembîlfiroş hene emê di lekolîna xwe de cîh bidine vî alimî nav û deng jî. Lê belê koleksiyona A. Jaba de helbesta Meleyê Bateyî cîh digre û emê di dawiya teza xwe de van destxetan parve bikin.

<sup>40</sup> h.b. (d.d. 18.06.2014 ).

<sup>41</sup> Adak A. Baluken Y. Acar H. “Gora Feqiyê Teyran”, *kov. Nûbihar Akademî*, 2014, hj 1, r.109-118.

<sup>42</sup> Xalid Sadinî, -Nivîskar û Lekolîner-, Hevdîtina bi mijara “Çîroka Zembîlfiroş a Meleyê Bateyî”, Ankara, (03.05.2014).

Gelo zanîna heyama Batê çima hewceye? Em zanîn ku heke heyama Feqî û Batê eşkere bibê jidayîkbûn û mirina wana were eşkerekirin cara ewil serpêhatiya Zembîlfiroş bi destê kî ve hatiye nivîsandin wê derkeve holê. Ji ber ku hin lekolîner derbarê Bateyî de gotine beriya Feqî hatiye dinê. Ji ber vê yekê hewceye heyama Meleyê Bateyî were eşkere kirin.

Navê Bateyî:

Bi sê babetan navê Melayê Bateyî tê zelalkirin:

- a. Li ser binemala wî bi xwe, ya ku neviyên keça wî Zulfê heta îro jî parastine ku niha jî li cem mala Hecî Mihemedê Şembî ye, bi destê xwe nivîsiye; sahibûhû we malîkûhû Huseyîn bîn Mustefa, yanî, xweyî û xudanê vê Huseynê kurê Mistefa ye.
- b. Li ser hemahîlka li cem mala Cemîl Axayê Giravî neviyê Mela Huseyn, Mela Dirbaz nivîsiye; Sewedehû Mela Dirbaz bîn Mela Tahir bîn Huseyn, yanî yê ku reş kiriye Mela Dirbazê kurê Mela Tahir kurê Huseyn e.
- c. Xelkê gundê Bateyê û yên deverê hemî Bateyî bi navê Mela Huseynê Bateyî dizanin û dinasin. Em dizanin, ku gora wî jî li gundê Bateyê ye û niha jî ziyaretgeha alemê ye.<sup>43</sup> Li gorî gotinan, navê wî yê asasî Mele Hiseyn e. Lê me nezanî, ku ka çima bi navê Ehmed hatiye navdarkirin. Mele Ehmed, bi gundê xwe yê Batê hatîye navdarkirin. Lewra ku jê re tê gotin Mele Ehmedê Bat.<sup>44</sup>

### 1.2.1. Nasnavên Wî

Ji bo Mela Huseynê Bateyî nasnavên em ji berhemên wî dizanin; Bateyî, Melayê Bateyî û Feqîrê Bateyî ne. Ji ber ku di berhemên wî yen ta niha bi dest me ketine de ev nasnav hene. Lê nasnavê wî yanî mexlesa helbestvaniya wî Bateyî ye. Lewra di dawiya hemî helbestên wî de ev nasnav heye. Çend mînak:

- a. Di helbesta “Ya Îlahî Ez Xerîb im” de:

Av û xwîn barîn peyapey

Daîma bedhal e Batey

<sup>43</sup> M.Xalid Sadinî, *Meleyê Bateyî Jiyana Berhem û Helbestên Wî*, Nûbihar, İstanbul, 2011, r. 19.

<sup>44</sup> Zeynelabidîn Zinar, *Nîmûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî*, Yekîtiya Nivîskarên Kurd, Swêd, 1991, r. 33.

Saîlim rehmê fiza key

Mam di nav qewmê xerib

**b.** Di helbesta “La Hewle La Quwwete” de:

Batey tu bikî bê xern

Digel sirra xwe muhrem

Wexfir lî zenbî werhem

Entel Xefûr ur Rehîm

Ji bilî Bateyî, her wî bi xwe di nav helbestên xwe de nasnavên xwe wekî Melayê Bateyî jî nivîsiye. Mînak:

Di helbesta “Çiriya Paşî û Pê” da de:

Ji çiriya paşî û pêda

“Melayê Bateyî” kanê

Sefer kêşa bi Miksê da

Li ser wextê zivistanê<sup>45</sup>

### **1.2.1. Heyama Bateyî**

Wekî piraniya kesayetên Kurdan digel ku agahiyên wekî jidayîkbûn û wefata wî yên derbarê jiyana wî de ne hatine qeydkirin. Li gor Aleksander Jaba<sup>46</sup> Batê 1417 miladî

---

<sup>45</sup> h.b. r. 20.

<sup>46</sup> Alexander Auguste Jaba an bi awayekî din August Dementievîç Jaba (bi Polonî: August Kosciesza Zaba) di sala 1801 de li Kraslavê di malbatek katolîk arîstokrat de ji dayik bûye di navbera salên 1824 - 1828 de li Unîversîta Vîlenskî ku bi wezaretê derve ve girêdayî bû bi beşa zimanên rojhilatê xwendîye. Piştê di konsolxaneyên Rûsyayê de li Yafa, Selanîkê û Smyrna (navê îro, Îzmîr) xebitiye. Ji sala 1848 heta sala 1866 an li Erziromê bûye konsolosê Rûsyayê. Di salên 1853-1856 de ketîye şerê Kirimê paşê di ser daxwaza mudûrê muzeya Asîya yê Borîs Andreyevîç Dorna dest bi fêrbûna zimanê Kurdî kirîye bi vê munasebetê li wir dostaniya wî bi Melle Mehmûdê Bazîdî, Ehmed Xan û gelek zanayên Kurd re çê dibe, û mirov dikare bêje ev dibe sebebên ku wêjeya Kurdî zengîntir dibe. Li ser adet çîrok û edebiyata Kurdan lekolîn kirine û ew di sala 1860 ê de di kovara Fransî “Recueil des notices et récits de la littérature et des tribus du Kourdistan” de dane çap kirin. Her weha ferhengek dest nivîsa Jaba Kurdî-Frensî, Frensî-Kurdî hin nehatîye çapkirin heye. Di sala 1879 de Jaba Ferhenga a Kurdî Frensî amade kir, paşê bi lêzedekirna alimê Almanî Ferdinand Justi ku Kurdîya wê bi tîpên erebî û transkripsîya wê ya latînî ji alî Jaba de hatîye amadekirin, hat çap kirin. Jaba gelek sûd ji Bayezîdî û zanyarên Kurd ên din wergirtîye. Di sala 1866 dawî li karê wî tê û li Îzmîrê bi cîh dibe. Di Sala 1894an li



de hatiye dinê.<sup>47</sup> Ev dîrok li ser kevirê gora mele jî hatiye nivîsandin. Lê kovara Hêviya Welêt (r: 65) nivîsiye, ku Melê Batê di sala 1465 an de çûye dilovaniya xwe.<sup>48</sup> Bi melûmetîyêd A. Jaba Ehmed mele Batê li gundê Batê welatê Hekarîyê sala 820 hîcrê (1417) ji dayka xwe bûye ê sala 900 hîcrê (1491) çûye rehmetê,<sup>49</sup> an li gor lekolîna walitiya Colemêrgê ( ku li ser kevirê gora wî de jî ev dîrok heye) 1494 e. Nivîskare bi navudeng M. Emin Zeki Beg jî di Tarîxa Kurdistan de nivîsiye ku, Bateyî di nav salen 1417-1495 an de jiyaye. M. Emin Zeki Beg li gotina xwe didomîne: "Bi rada edebi ya diduyan Dîwan li Mewlûdeke wî hene. Mewlûda Bateyî di 1903an de li Berlinê A. Von Le Coq çap kiriye. Piştê jî li Misre Kurdizade Ehmed Ramizê Licî çap kiriye."<sup>50</sup>

Nave vî helbestvanê Kurd ê bi navûdeng ê eslî Huseyn e. Ji nişteciye (daniştwane) gundê Bate ye ku dikeve nezîkî Geliye Teyarê yê bajare Hekari ye.\* Ez dibem qey gunde Maronise nezî gundê Batê ye. Bateyî ji eşîra Ertûşîyan e. Niha jî ji nesla Melaye Bateyî kes mane û min hinek ji wan dîtine. Li ba wan belave ku nave Bateyî yê eslî Huseyn e.<sup>51</sup>

Lê belê kê m zêde derketiye meydanê ku Melaye Bateyî di sedsala hijdehem de jiyaye. Nerîna ku berê Mela Bateyî wekî helbestvanê sedsala XVan dihat nîşandan şaş e. Rastî vê jî cara ewil Qanaatê Kurdo di tarîxa edebiyata kurd de hatiye nîşandan. Ev nerîn li ser esase agahiyan A. Jaba yên ku di rîsaleya helbestvanên Kurdan de di sala 1860 î de destnîşan kirine ava bûye ku li gorî vê Melaye Bateyî di navbera salen 1417 û 1495an (me vê yekê jor bi çavkaniya Qanatê Kurdo nîşan daye) de jiyaye. Piştî Jaba jî û gelek kesên dî jî ev agahî dúbare kirine. Lê ji van argumanên jêrîn derdikeve hole ku Melayê Bateyî ne di sedsala XVan de, lê di sedsala XVIIIan de jiyaye. Her wekî dema

---

Smyrna (Îzmîrê) dimire. ( Ekrem Önen, -Alk. Doc. Dr- "Alexander Auguste Jaba kî ye?", Ankara 13.04.2014 ).

<sup>47</sup> Ekrem Önen, -Alk. Doç.Dr-, "Di nav arşîvên Rûsyayê de jiyana Meleyê Bateyî", Ankara, (13.04.2014).

<sup>48</sup> Zeynelabidîn Zinar, **Nîmûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî**, Yekîtiya Nivîskarên Kurd, Swêd, 1991, r. 33.

<sup>49</sup> Kurdo, **Tarîxa Edebyata Kurdî**, r. 65.

<sup>50</sup> Zinar, *Kovara Nûdem* hej. 5, sal 1993, r. 70.

\* Hekkarî di dema xelîfetiya Ebbasiyan ya li Bexda û Buweyhîyan li devera Bexda û Mezopotamyayê û Eyyûbiyan mîrektiya Hekkariyê heye û roleke wê ya girîng di dîroka Kurdistanê de hebûye. Eger ji ber Selaheddînê Eyyûbî ji ber aqildar û kemandarê xwe Isa el Hekkarî be û eger piştî wî be mîrên piştî Selaheddînê Eyyûbî her dem ligel mîrên Hekkariyê meşweret kirine û wek eyaleteke sereke danûstandin ligel Hekkariyê kirine. Jixwe mîren Hekkariyê piştî êrîşa Moxolan ya li ser xelîfetiya Ebbasiyan û qirkirina Ebbasiyan malbateke Ebbasî ne. Ev malbata nêviyên Seraceddîn in. ( İhsan Colemêrgî, Hakkâri Tarihi ve Kültürü, <http://www.hakkari.bel.tr/Sayfa.aspx?ID=19> (d.d13.04.2014).

<sup>51</sup> Yusîf, **Şairên Klasîk ên Kurd**, r.50.

me behsa navê wî dikir, di benda yekemîn de ku wî li ser hemahîlka xwe nivîsîbû: “Sahîbûhû we malîkûhû mela Huseyîn bîn Mustefa,” naxwe Mela Huseynê Bateyî kurê Mistefa ye û Bateyî ye.

Lêbelê tu were bizane ka ev camêr kengî hatiye dinyayê û di nav kîjan demê de jiyana xwe borandiye? Xalid Sadinî di helbesta xwe ya bi navê Meleyê Bateyî derheq heyama mele de vê yekê dibêje: “Di nav jêderên bi dest me ketine de Tehsîn Îbrahîm Doskî û Ebdurreqîb Êsif tê nebin, tu kesî lêkolîneke bi ser û ber jî nekiriye. Ji ber hindê jî xeletiya A. Jaba, xeletiya vê beşê hemî ye.”<sup>52</sup>

Yê ku dibêjin, Melayê Bateyî di 1414ê mîladî de hatiye dinyaye û di 1495 ê mîladî de jî çûye ser dilovaniya xwe. Beşê din dibêjin 1675î paş ve hatiye dinyayê û heta 1700î jî li dinyayê bûye. Navê van kesan û berhemên ku nivîsandine ev in:

Prof. Sadik Bahaeddîn Amedî, di Hozanên Kurd û Mewlidnameya Bateyî de,

M. Abdussamed, di Mewlida Nebî de,

Prof. Qanatê Kurdo, di Tarîxa Edebiyata Kurdî de,

Abdurrahman Durre, Evîna Welat,

Zeynelabidîn Zinar, Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî,

Mûhemmed Emîn Zekî, Tarîxa Kurd û Kurdistan û Meşahîrul Ekrad,

Kemal Burkay, Kûrtler ve Kürdistan,

Bazil Nikitin, Kûrtler,

Minorsky, Kûrtler ve Kürdistan,

David N. Mackenzie, Kûrtler ve Kürdistan,

Mehmed Uzun, Despêka Edebiyata Kurdî,

Babê Zêrevanî, Kovara Nûbihar, hj. 87,

Elaeddîn Seccadî, Mejûyê Edebê Kurdi,

Hakkarî Yilligi, 2003

---

<sup>52</sup> Sadinî, *Meleyê Bateyî Jiyana Berhem û Helbestên Wî*, r. 22.

Û di gelek kovar û rojnameyên din de jî dibêjin Bateyî di sala 1414an de hatiye dinyayê, di 1491/1495an de çûye ber rehma Xwedê.

Û beşek din ku dibêjin Meleyê Bateyî sedsala 17. Jiya ye. Navê van kesan jî em dikarin bi vî awayî rêz bikin:

Prof. Dr. Marûf Xeznedar, di Mêjûyî Edebê Kurdî de dibêje Melayê Bateyî di 1675an de hatiye dinyayê,

Tehsîn Îbrahîm Doskî û Muhsin Îbrahîm Doskî, di pirtûka xwe ya bi navê “Melayê Bateyî Jiyan û Berhem” de, raya beşa yekemîn red dikin. Pêwendiya Bekir Begê Erzî û Mela Mensûrê Girgaşî, ji ber hindê jî pêwendiya Mela Mensûrê Girgaşî û Melayê Bateyî dinivîsin.

Feqî Huseyîn Sagniç, di “Dîroka Wêjeya Kurdî” rûpel 404-406an de behsa Melayê Bateyî dike. Rehmetyê Feqî Huseyîn behsa dema jidayikbûna Bateyî nake, lê di dawiya gotara xwe de dibêje, Melayê Bateyî di sala 1755an, di 66 saliya xwe de koça dawî kir. Ew jî tê wê me’nayê ku Feqê Huseyîn, di wê qenaetê de ye ku Bateyî di sala 1689an de hatiye dinyayê.

Amir Hassanpour, di pirtûka xwe ya pir giranbiha, “Kûrdistan’da Milliyetçilik ve Dil” de di rûpela 146an de, di nav tabloya 12. de Melayê Bateyî sedsala 17. nivîsiye ku bi qinyata wî jî Bateyî di vê sedsalê de hatiye dinyayê.

Ebdurreqîb Ûsîf, di Dîwana Kurmancî de behsa Melayê Bateyî kiriye û di beşa yekemîn de ku dibêjin Bateyî di 1414ê mîladî de hatiye dinyayê, qebûl nake. Paşê jî bi kurtasî wiha dibêje: “Ne dûr e ku Bateyî yan hemdemê Xanî yan jî piştî wî be.”<sup>53</sup>

Belê raya nivîskar û lekolîvanên me bi kurtasî wiha ye. Gelo kîjan rast e? Beşa yekemîn ê ku dibêjin Melayê Bateyî di navbeyna 1414-1495de jiyaye rast e, yan jî yên dibêjin di 1700î de jiyaye?

Gelo kîjan raste? Ebdurreqîb Ûsîf destnîşan kiriye<sup>54</sup> ez dibêjim: Ne mimkun e ku Melayê Bateyî berî Ehmedê Xanî jiyabe; naxwe dê behsa wî jî kiriba. Lewra Ehmedê Xanî di Mem û Zînê de behsa Elî Herîrî, Feqiyê Teyran û Melayê Cizîrî kiriye. Bateyî bi tu awayî ji van her sê helbestvanan kêmtir nîne. Hetta mirov dikare bêje ku ji

---

<sup>53</sup> h. b. r. 22–23.

<sup>54</sup> Yusîf, *Şairên Klasîk ên Kurd*, r. 51.

hersêyan jî pêşdatir e ku Xanî behsa wî bike. Ji ber ku Mewlid ji ber hizr û bîrên milletperweriya Xanî girîng e. Mewlid heta wê demê di qonax û dîwanên Kurdan de bi Erebi dihate xwendin, paşê Melayê Bateyî ev kiriye Kurdî. Her çenda ku Mewlid ‘adeteke bid’et jî be, di nava Mislimanan de her hebûye. Vêca bi qinyata min, dema Ehmedê Xanî Mem û Zîn tamam kiriye, yanî 1694ê de Bateyî hêj xortekî feqe bûye û li ber xwendinê bûye. Naxwe heke di dema Xanî de mesnewiyeke wekî mewlida Kurdî di medresan de heba ne gengaz e ku Xanî behs jê nekiriba.<sup>55</sup> Ez dibêjim di nav salên 1670 - 1750î jiyaye. Ji ber van egeran:

Melayê Bateyî di helbesta xwe ya bi navê “Bi Dil îro Xedeng im” de çarîneke wiha nivîsiye;

Du eslanan wereng hatin

Bi tabûr û tiveng hatin

Bi şimşîr û xedeng hatin

Qirên îna Musilmanan

Her wekî di vê çarîne de tê dîtin, Bateyî behsa tabûryanî çend liqên leşkerî û di destê wan de jî tiveng dike. Lêbelê li gor ansîklopediya Meydan Larousse tiveng/tivek piştî salên 1550î li Londonê îcad bûye. Helbet her xudan aqil û mantiqê dê qebûl biket ku heta ev tivenga ji nû îcad bûyî zêde bê çêkirin û ewqas zêde bibe ku êdî bikeve destê tabûrên leşkerî yên li Kurdistanê, qet nebe 100 sal dê derbas bibin. Ew jî tê vê wateyê ku Melayê Bateyî piştî salên 1650î yên mîladî hatiye dinyayê. Lê belê her wekî li hember vê agahiyê jî hin pirsgirêk henin ku di dema fetha Stenbolê de tîfing hatiye bikaranîn. Hetta di nav leşkerên Osmanîyan de beşek hebû ku navê wan “tûfekçîler” bû.<sup>56</sup> Ji ber vê hewce dike ji bilî vê divê hin tiştên din jî di destê me de hebin. Wekî em zanin Melayê Bateyî di gelek helbestên xwe de gelek peyvên ku di ser zimanê Tirkî re ketine zimanê Kurdî bi kar anîne. Wekî; qirmiz, çifte, yol, îlan, eslan, tabur, qûmaş, yaban, û hwd. Kesê helbestên Bateyî bixwîne, dibîne ku zêde peyvên Tirkî tê de hene. Ev peyv ne termên istilahanê edebî ne. Hemî jî peyvên hêsan û amiyane ne. Bi qinyata min ev tê wê me’nayê ku Melayê Bateyî piştgiriyeke xurt di gel zimanê Tirkî hebûye. Ev jî ew sal in dema ku Melayê Bateyî li Hekkariyê li medresa Bajêr mamoste bû. Lewra di

<sup>55</sup> Sadînî, **Meleyê Bateyî Jîyan Berhem û Helbestên Wî**, r. 25.

<sup>56</sup> John Kegan, **Savaş Sanatı Tarihi**, Füsün Doruker(wer.), İstanbul, Sabah Kitapları, 1995.

van salan de navbeyna mîrîtiya Hekkariyê û Osmanîyan gelek xweş<sup>57</sup> bû û herduyan bi hev re ligel Îranê şer dikirin. Ev sal jî ji salên 1690î paş ve ne. Naxwe ne mimkun e ku Melayê Bateyî bikare ewqas di Tirkî de mahir be ta ku di helbestên xwe de wiha lêkhatî peyvan bikarbîne.

Mela Mensûre Girgaşî di nîvê duyem sedsala XIIê hicri de di çaxê pîrîtiya xwe de bû ku ev jî beramberî 1737-1787ê mîladî, wate beramberî sedsala XVIIIan tê. Li gorî ku Melaye Bateyî bi Mela Mensûr re muşa'ere kiriye, lazim e ew jî di sedsala XVIIIan de li heyatê be.

Di dema zaroktiya Bateyî de çûyîna Ezdîn Şêrê mîrê Hekkariya ji bo gundê Bate ye û dîtina wî ya Melaye Bateyî ye ku wê demê Bateyî zarok bûye. Ev Ezdîn Şêr, kure Şerefxan Begê mîrê Hekkariya ye û neviyê Zekeriya Begê hevçerxê Şerefxanê Bedlîsî ye. Şerefxanê Bedlîsî dema “Şerefname”ya xwe di sala 1596an de nivîsandiye behsa vî Zekeriya Begî kiriye. Ji vê jî derdikeve meydana ku ev Zekeriya Beg di sala 1596an de li ser desthilatê bûye. Piştî vê tarîxê bi demekê Zekeriya Beg koçî dawiyê kiriye û piştî kurê wî û piştî jî neviyê wî (Êzdîn Şêr) bûne mîrê Hekkariyê. Ev jî dide nişandan ku heta Êzdîn Şêrê ku Bateyî bi zarokî dîtîye bûye mîr, bi ihtîmaleke mezin tarîx gihiştîye derdora 1700 î. Li gorî vê jî Bateyî di vê tarîxê de hê zarok e û piraniya temenê xwe di nîve peşî yê sedsala XVIIIan de derbas kiriye.<sup>58</sup>

Argumanekê dî jî ew e ku eger Melaye Bateyî berî Ehmede Xanî (1650-1707) bûya, Xanî dê di Mem û Zînê de behsa wî bikira. Ji vê jî derdikeve hole ku Bateyî ne beri Xanî ye. Bi gotineke dî Melaye Bateyî yan piştî koça dawiyê ya Xanî (1707) hatiye dinyayê, yan jî di dema nivîsandina Mem û Zînê de hatibe dinyayê jî wê demê zarok bûye, yan jî bi nav û deng nebûye.

Bateyî di mecmû'eyê helbestan ku di sala 1767an de hatiye nivîsandin de (ku Ebdureqîb Êsif ev berhevok dîtîbû û çapkirîbû) hene, lazim e Bateyî wê deme (1767) yan jî beri hingî li heyate be.<sup>59</sup>

---

<sup>57</sup> Târihten Sayfalar, “Top ve Tüfek Gibi Ateşli Silâhlar Osmanlı Ordusuna Ne Zaman Girmiştir?”, *Hakikat Aylık İslâm Dergisi*, Temmuz, 2007, hj. 167, r. 44-46.

<sup>58</sup> Sadîni, *Meleyê Bateyî Jiyan Berhem û Helbestên Wî*, r. 24.

<sup>59</sup> Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, r. 244-245.

Îro li gundê Bateyê û li gundê Qewalê du malbat/binemal xwe digihînine Mela Huseynê Bateyî. Yek ji wan mala Mela Mihemed ‘Eliye Qewalî ye. Ya din mala Temerê Bateyî ye.

Mala Mela Mihemed Eliye Qewalî: Mela Mihemed Salihê kure Mela Mihemed Elî sax e û îro li bajarê Colemêrgê jiyana xwe bi 70 salî didomîne. Ew dibêje: Mela Mihemed Salih kurê Mela Mihemed Elî, kurê Mela Mihemed Salih (Pismamê Mela Hamid melayekî meşhur bû, di deverê de) kurê Mela Mihemed Elî, kurê Mela Huseyn (birayê mela Dirbaz) kurê mela Tahir, kurê Mela Huseynê Bateyî. Ev binemal xwe bi vê rêzê digihînin Melayê Bateyî.

Mala Temerê Brahîmê Bateyî jî xwe digihînin Mela Huseynê Bateyî. Temer di 80 salî de emrê Xwedê kiriye. Ew jî dibêje: Temer kurê Brahîm, kurê Se’ d û kurê Evdilah, kurê Hecî, kurê Mela Evdilah, kurê Mela Dirbaz, kurê Mela Tahir, kurê Mela Huseynê Bateyî.

Li gor van bavikan eger her bavek 30-40 salan ji kurê xwe mezintir be, divê Mela Huseynê Bateyî heta sala 1760î jiya be. Ew jî eger 75 salî miribe divê 1680 hatibe dunyayê.

Melayê Bateyî du keç jî hebûne; Asmîn û Zulfê.

Asmîn, li gel Mistefayê kurê Melek hatiye zewicandin; berê li Basîfkê bûn, niha li Dihokê ne. Bistanekî gundê Bateyê li pişta spîndarê dabû keça xwe, niha jî milkê wan e û mirovên wan radikin. Zulfê, dapîra mala Hecî Mihemedê Şembî ye; niha li Mersînê dijîn. Lê ewqas dizanin ku neviyên keça Melayê Bateyî ne. Vêca eger mirovek ewqas zêde ji aliyen neviyên xwe ve bête nasîn, dibe ku hîn dûrtir be, loma kesîn dibêjin 1495 miriye.

Eger hûn îro biçin gundê Bateyê, hûn dê bibînin ku Mela Huseynê Bateyî di nav wî gundî de ewqas zindî ye ku yek dibêje sed sal berî niha jiyana xwe tamam kiriye. Lewra kaniya wî, selê nimêja wî, berê xilwa wî, kolkê xaniyê wî, mizgefta wî, medresa wî, gora wî û kurê wî hêj niha jî diyar in. Her wisa çîrok û serhatiyên wî hêj niha jî pir zindî ne.<sup>60</sup>

---

<sup>60</sup> Sadînî, **Meleyê Bateyî Jiyan Berhem û Helbestên Wî**, r. 28 – 29.

Îcar eger em hinek argumanen dî jî li ber çavan bigrin periyoda ku Melaye Bateyî tê de jiyayê kifş dibe. Li gorî ku helbestên Tarîxa ku Merûf Xeznedar jî ji bo jiyana Melaye Bateyî dibeje ku 1675-1760 e, bi van agahiyan re guncaw e. Wekî encam eger meriv van argumana tevan li ber çavan bigire, bi rehetî meriv dikare beje ku Bateyî di dawiya sedsala hivdehemîn hatiye dinyaye û heta bi nîve serdema duyem jî sedsala hijdehemîn jiyaye.<sup>61</sup>

### 1.3. MIRADXANÊ BAZÎDÎ

Navê Mirad Xan yê din Miradxanê Bazîdî ye. Bazîd bajarê ku lê hatiye cîhanê ye. Taybetmendiya Bazîdê ji bo Kurdan ev e ku piştî Ehmedê Xanî li wira cîwar bû, êdî bajar bû navendeke çand û wêjeya Kurdî. Gelek wêjevan, helbestvan û nivîskarên Kurd di Medreseya Ehmedê Xanî de gihîştin. Ji çend kesên navdar ku di vê Medreseyê de xwendin û bi nav û deng bûn yek jî, Mirad Xan e. Digel Mirad Xan helbestvan ê wêjevanên din ku di Medreseya Bazîdê de gihîştin evin Smayîlê Bazîdî, Mele Mahmûdê Bazîdî û Xelîfe Yûsiv.

Li Medreseya Bazîdê ku Ehmedê Xanî pirtûkxaneyek mezin tê de vekiribû, Mirad Xan jî mîna gelek hevdemên xwe, xwend û ji vê pirtûkxaneyê Ehmedê Xanî sêdeke mezin wergirt.

Li gorî agahiyên Mela Mehmûdê Bazîdî û li pey rêça wî Herekol Azîzan û Mînorsky Miradxanê Bazîdî, di sala 1150/1737an de ji dayîk bûye û 1199/1784an de li Bazîdê koçî dawiyê kiriye.<sup>62</sup> Jaba qala wî dike û dibêje: “Şahirê haştê Mirad Xan e ku di tarîxa hezar û sed û pênciyê da li Beyazîdê peyda bûye. Ewî jî miqderekî xezeliyat û eşharan bi zimanê kurmanci gotiye û di hezar û sed û nehê da merhûm bûye û di Beyazîdê da medfûn e û paşî wî ji kurmancan êdî helbestvan peyda ne bûne, heta niha”<sup>63</sup> berdewamiya kovarê de derbarê Miradxan de agahiyeke din nabê je. Li gorî Sagniç ew di sala 1743 an de hatiye dinyayê. Dîsa li gorî agahiyên ku Sagniç dide Miradxanê Bazîdî di medreseya ku Ehmedê Xanî li Bazîdê damezrandibû perwerde dîtiye. Ji pirtûkxaneyê ku Xanî li Bazîdê avakiribû istifade kiriye. Piştê li medreseyên Wan, Hekkarî û Bidlîsê xwendiyê.

<sup>61</sup> Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, r. 212.

<sup>62</sup> h. b. r. 266.

<sup>63</sup> A. Jaba, “Jiyana Miradxan”, *Hawar*, Şam, 1941, h.j. 33, r.11.

Bi vê çalakkûn û lêgerînên xwe de, hê di ciwaniya xwe de bû zanyar û wêjevanekî mezin. Daxwaza Mirad Xan ew bû ku di rêya Ehmedê Xanî de bibe helbestvanekî mîna wî. Pêşbikeve û helbestên xwe ji derdora xwe re bixwîne. Ji ber vê yekê xwe berdabû ser dîroka jînenîgariya Ehmedê Xanî ya wêjeyî. Mirad Xan Ehmedê Xanî baş naskiribû û jê re rêzdariyeke mezin digirt. Ji seydana feqîyan û pêşrewiya civatan zêdetir, kêfa wî ji nivîsandin û xwendina helbest û destanan re dihat. Dema em li berhemên wî dinihêrin, em dibînin ku di warê nivîsandinê de gihaye vê armanca xwe û pir serkeftî ye. Wî helbest, destan û çîrok xweş nivîsîne û di dema xwe de, li ser van beşên wêjeyê pir pêşketiye.

Mirad Xan di malikekê ji ya Zembîlfiroş de, dema nivîsandina vê destanê wiha diyar dike:

Sed û nehwêd sal bûriye

Paşî hezara hicrî ye

Mirad Xan dibit serhatiye

Bi şîr û bi gotineke xoş

Herwiha Mirad Xan di vê malikê de bi awayek vekirî dibêje, min ev destan sala 1190ê koçî nivîsiye. Ev sal beremberî sala 1776an a salnameya zayînî ye. Mirad Xan destana Zembîlfiroş bi 254 malikan nivîsiye. Lê ji 254 malikan 129 malik gihîştine dema me ya îroyîn. Li Petersbûrgê di van mecmueyan de heye: Kurd 27, Kurd 45, Kurd 28, Kurd 36, Kurd 26.<sup>64</sup>

Digel helbestên Feqiyê Teyran û Melayê Bateyî, çavkaniyeke ku li ser hîkayeta Zembîlfiroş hatiye nivîsandin jî kitêba Miradxanê Bazîdî ye ku di sedsala 18an de hatiye nivîsandin. Ev pirtûk di sala 1967an de li Kurdîstana Iraqê ji aliyê Giw Mukriyanî ve bi navê Çîrokî Zembîlfiroş li Çapxaneyê Hewlêr hatiye çapkirin. Di pey re hinek lêkolîn li ser vê kitabê hatine nivîsandin. Di van xebatan de xuya dike ku Zembîlfiroş yek ji mîrên Merwaniyan e. Kurê Ebu Nasir Ahmed e ku navê wî Seîd e. Ji aliyê hozanvan Miradxan Bazîdî li sala 1776an a zayînî hatiye nivîsîn û vehandin. Ev

---

<sup>64</sup> Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, r. 266.



deqe bi rêka mela û derwêşan û sofîyan gihaştibû Kurdistanê Başûr û Şêx Beşîr Şêx Mihemed Tahir Brîfkanî Rkawî di sala 1967an ev deqe daye Gîw Mukriyanî.<sup>65</sup>

Li gor şîroveya Mirad Xan, Zembîlfiroş şahzade ye. Lawê Şahê Amedê ye. Şahê Amedê serekê heft kişwaran e. Zembîlfiroş di heman demê de welîahdê bavê xwe bûye. Zembîlfiroş xewnekê dibîne û dev ji kêf û zewqa welîahdî û şahzadetiye berdide. Bi jin û zarokên xwe ve dev ji tekyana bavê xwe berdide, weke belengazan qesta bajarê Mêrdînê dike. Xwe li koxeke tarî digire û ji bo debara kufletê xwe dest bi çêkirina selik û zembîlan dike. Selik û zembîlên ku çêdike kolan bi kolan digêrîne û ji bo debara zarokên xwe dest bi firotina wan dike.

Berhema Miradxan a ku daye menzûmeyê Zembîlfiroş e. Bi qasî ku tê zanîn Miradxan di tarîxa edebiyata Kurdî de sêyem kes e (her çikas derheq Meleyê Bateyî de derheq destnivîs nehatibe dîtin jî em daxilî vê munaqaşayê an ha nabin) ku ev mijar bi awayê nezmê nivîsandiye. Her du nivîskarên dî Feqiyê Teyran û Melayê Bateyî bûn. Ji ber ku destanên bi vî rengî folklorîk ji aliyê gelek kesan ve tînin nivîsandin, dibe ku Zembîlfiroşên hin kesên dî jî derkevin meydana.

#### 1.4. BELAVBÛNA ÇÎROKA ZEMBÎLFIROŞ

Cara pêşîn Dr. Wetzstein, balyozê Almaniyayê li Şamê, ev çîroka ha ji mamostê xwe bihîstiye. Mamostê wî Kurd bû û ew hînî kurdî dikir.<sup>66</sup> Dr. Wetzstein ji devê wî û bi alîkariya wî vê çîrokê dinivîse. Paşê jî wê werdigerîne Almanî û di kovareke zanyarî de bela dike û rojhilatnas Albert Socin di gel hevalê xwe Eugen Prym, hin çîrok û stranên kurdî kom dikin. Wan werdigerînin zimanê Almanî, tevî ferhengeke piçûk û şirovekirinên pir helez û berbiçav wek pirtûkekê li Sant Petersburgê (Lenîngrada îro) diweşînin. Di vê pirtûkê de çîroka Zembîlfiroş jî heye. Lê ew çîrok bi du texlîtan e. Texlîta pêşîn ji devê çîrokbêjekî ye. Yê din jî ji destnivîsekê ye. Dema ku A.Socin vedigere Ewropayê, mamostê wî Dr.Wetzstein jê re destnivîsa ku wî peyda kiribû dişîne. Ew wê bi ya xwe ve dide ber hev. Pir cîhên wan li hev digrin. Lê pir cîh jî ji hev dûr in. Lê dîsan jî ew jê pir bêr û feydê dibîne.<sup>67</sup>

<sup>65</sup> Wesfî Hesên Rdênî, "Beyta Zembîlfiroş" [*çav. elektronîk*], *Spîrêz*, 2008, (15.01.2014), r.19.

<sup>66</sup> Oskar Mann, *Kurdên Mukrî*, Berlîn, Enstituya Kurdî ya Parîsê, 1906, r.9.

<sup>67</sup> Edîtorîa, "Bejeya Kurdan", *kov. Pale*, s. 2, hj. 3, sal 1979, r. 24.

Lê bê guman, sala 1967 an di warê çîroka Zembîlfiroş de saleke pir girîng e. Wê salê mamosteyê bi nav û deng Gîw Mukriyanî bi navê Çîrokî Zembîlfiroş pirtûkekê, bi tîpên erebî, bi kurmancî û soranî çap kir.<sup>68</sup>

M.B. Rûdenko li xebata xweda dinivîse, ku bi gotina A.Jaba dîwaneke mezin ya mele Batê ya şêrêd evîndarîyê heye, aşkeraye, ku her em hej du destanêd wîne, ew destan jî evin: Zembîlfiroş û Mewlûd<sup>69</sup> Di sala 1978 folklorîsta kurdnasa Sovyêta Jakêlin Şûrênovna Mûsaelyan dîsêrtasîya xwe da ya bi navê "Kurdkaya poêma "Zembîlfiroş" î yê folklornîyê vêrsî (yanê Destana kurdî Zembîlfiroş û şovêd wê folklorî) parve kir. Ew li vê xebata xwe de mijûlî lêgerîna destana Ehmed Mele Batê û şovêd wê zargirtîne bûye.

Ew li xebata xwe de nivîsîye, ku yê ji destnivîsara Ehmed Mele Batê li nav destnivîsarêd kurdî de li kitêbxana Saltîkov-Şêdrînada destnivîsareke din jî heye, ew destnivîsar bi destê Miradxan Xan Bayezîdî hatîye nivîsandin û bi reng û rû û naveroka xwe ve mîna destnivîsara Ehmed Mele Batê ye, lê li sedsalîya XVIII da bi nûve hatîye vejîyandin û tezekirinê. J.S.Mûsaelyan xên jî wergerandin û şirovekirina şovêd nivîsarêd Ehmed mele Batê, Mîradxan Bayezêdî wusan jî mijûlî lêgerîna naverok û kêş û qaffiya li hev anîna rêz û bendêd deh dozde şovêd zargotin yê Zembîlfiroş dibe, wan raberî hev dike û pevgirêdana wan nîşan dike û tîne ber çavan.<sup>70</sup> Vê pirtûkê bi çapa xwe re pir tişt ronahî kirin. Lê mixabin ku pir pirsên dijwar û tarî jî bi xwe re anîn. Pirtûk bi xwe ji du paran pek tê. Para pêşîn bi zaravayê soranî û ya dî jî bi zaravaye kurmancî ye. Para zaravaye soranî ji aliyê mamoste Mela Ehmed Kurê Heciyê Mela Mewlûdê Şinoyî û ya kurmancî jî ji aliyê hunermendê heja Miradxane Beyazîdî ve hatiye nivîsandin.<sup>71</sup> Lê sed heyf û mixabin ku di derheqê Mela Ehmed de tu tişt nehatiye gotin. Em nizanin, ku ev hozane xwedi huner ki ye u çi kes e? Herweha em nizanin, ku wî ev çîrok ji ku wergirtiye? Tiştê ku xuya ye ew e, ku wî ji ya kurmancî wernegerandiye. Ji ber ku pir ciyen wan li hev nayên. Lê belê em ji rêzikên dawîn yen helbesta wî derdixin, ku dema wî ev helbest nivîsandîye 53 salî buye. Ew di dawîya helbesta xwe de weha dibêje;

“Ya Reb her ê tu yî xefarî qedîr

<sup>68</sup> h. b. r. 25.

<sup>69</sup> Kurdo, *Tarîxa Edebyata Kurdî*, r.65.

<sup>70</sup> h. b. r. 65.

<sup>71</sup> Rdênî, “Beyta Zembîlfiroş”, r.19.

Ruhmim pê bikey kâtibim feqîr

Gunahim zor e wek pelki daran

Ruhmî tu zov e herwekû baran

Me'lûm e bonim be hesabî ebcêd

Penca û sê me bew Xuday semed.<sup>72</sup>

Herçendi ew dibeje, ku ez ê bi hesabê ebcêd bidim xuyakirin jî, lê dîsan tenê ji temenê xwe kad dike û dibêje ez 53 salî me. Li gor hesabê ebcêd tu tiştêkî rast, ku mirov bawer pê bike dernakeve. Wisan diyar e, ku dema wî ev çirok bi helbest nivîsandiye û dawî aniye, temenê wî gihaye 53 salan. Gelo wî kengî ev xebata giranbiha dawî aniye û gelo ew hîn dijî yan na? An ha tu afirandinên wî yên din hene yan na? Em ji van tiştan bê agah in.

Di pirtûka mamosteyê bi nav û deng Eladîn Sucadî de jî nave vî hozanî tune.<sup>73</sup> Herweha mamoste Gîw Mukriyanî jî di derheqa wî de tu tiştêkî nabêje. Tenê di pêşgotina pirtûkê de dibêje, ku "min para soranî ji Mela Ehmedê kurê Mela Mewlûdê Şînoyî wergirtiye."<sup>74</sup>

Li gor Xalid Sadînî jî çîroka Zembîlfiroşê Melayê Bateyî nivîsandiye. Lê nivîskar di pirtûka xwe ya bi navê "Mele Huseyn Bateyî Jîyan, Berhem û Helbestên Wî" ya ku sala 2011 an de nivîsandiye cîh nedaye Beyta Zembîlfiroş. Di pirtûka xwe ya bi navê "Feqiyê Teyran" de jî wusa dibêje : "Wekî Mela Huseynê Batêyî, li devera Hekariyê ji gundê Batê ye û ew bi navê gundê xwe tê nasîn; Batêyî. Dema navê Bateyî derbas bibe em dizanin ku ev Bateyî yê ku nivîskarê Mewlûda Kurdî û Zembîlfiroşê ye".<sup>75</sup> Di pirtûka xwe ya Feqiyê Teyran ya çapa 2003 an de cîh nedaye çîroka Zembîlfiroş lê belê çapa 7. ya sala 2013 an de serpêhatiya Zembîlfiroş cîh girtiye.<sup>76</sup> Em derbarê vê yekê de dema tekîlî danî bi xwe vê yekê anî zimên: Li ba me ji çapa 2. vir de ev çîrok cîh digre. Lê belê bi şaşî çapa 3. û 4. de nehatiye çap kirin. Çapên din de hatine çapkirin. Rastî tevahiya çapan de çîrok heman e.<sup>77</sup>

<sup>72</sup> "Bejeya Kurdan", *Kovara Pale*, sal 2, hj. 3, sal 1979, rûpel 25.

<sup>73</sup> Eladîn Sucadî, *Mejûy Edebî Kurdî*, Bexdad, weş. Maarîf, 1952, r. 21-23.

<sup>74</sup> h. b. r. 25.

<sup>75</sup> Sadînî, *Feqiyê Teyran Jîyan Berhem û Helbestên Wî*, r. 27-28.

<sup>76</sup> h. b. r. 399.

<sup>77</sup> Hevpeyvîn, Xalid Sadînî, "Çîroka Zembîlfiroş a Kî ye?", Ankara, 29. 05, 2014.

Em bi xwe dema serpêhatiya Zembîlfiroş mêze dikin cara ewil di destê kî ve hatiye nivîsandin zanin. Her vekî heyamên Feqî û Bateyî jiber vê yekê hatin lekolîn kirin. Şayet em bizanibin ji van çîrokên di destê me de kîjan herî kevn be û bi ûslub û teknîka xwe ve bi kîjan nivîskarî ve tekîldar be cara ewil di destê wî derketiye, bi wî kesî tê nasîn. Dibê pêşerojê de derbarê vê çîrokê de nûsxe yên nû werin bidestxistin, nivîskarên nû werin dîtin. Em vê baweriyêdene ku cara ewil ev çîrok bi destê Feqiyê Teyran hatiye nivîsandin ku dawiya çîrokê de qala “Mîm û He” yê dike.

Mîm û Hê li gorî renûsa Erebi her du herfen peşî yen nave wî Mihemed in.<sup>78</sup> Derbarê mijara “Mîm û Hê” yê de Sadinî di pirtûka xwe ya bi navê “Feqiyê Teyran; Jiyani Berhem û Helbestên Wî” de wuha dibêje: Hemî nivîskarên ku li ser Feqiyê Teyran peyivîne, li ser wê rayê ne ku leqeba wî ya navdar ‘Mîm û Hê’ ye. Feqiyê Teyran di helbestên xwe de ‘Mîm û Hê’ gelek caran gotiye. Mînakên vê leqeba wî pir in. Mirov dikare bêje ku wî hema hema di hemî helbestên xwe de ev ‘Mîm û Hê’ nivîsiye. Wek di dawiya helbesta “Îro ji Dest Husna Hebîb” de wiha dibêje:

‘Mîm û Hê’ aqil ve der da

Sicleya îşqê û derda

Lew qelem anî bi ser da

Me’fûyê xufra im ez

Di helbesta “Çar Kerîman” de

Ew ‘Mîm û Hê’ qelb û mitalan

Her bi wan fikr û xeyalan

Rast dikîpend û mîsalan

Şairê nesîhetê

Di dawiya helbesta “Feqe û Bilbil” de:

Ya heq tu fê ‘lan çêke

Me dûr ke ji asiyatan

Şewqê li ‘Mîm û Hê’ ke

---

<sup>78</sup> Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, r.213.

Bi litf û hem bi îhsan

Di helbesta “Qewî îro zeîfhal im” de:

Şehîdê ‘Mîm û Hê’ ism e

Ji işqê sotiye cism e

Li cama mey bû qisme

Şehîd bûm ez li dinyayê

Di helbesta “Dilo Rabe” de:

Em biçin heval bimînin

‘Mîm û Hê’ bîra xwe bînin

Fatihana ji me re bixwînin

Hewce û der intîzar e.

Herwekî di van çarmalkiyên jor de baş xwiya dibe ku ‘Mîm û Hê’ leqeba Feqiyê Teyran e. Ev leqeba ‘Mîm û Hê’ ne berî wî, ne jî piştî wî tu kesî bi kar neaniye. Ji ber vê jî em dikarin bêjin ku helbestek bi vî awayî di nav de ‘Mîm û Hê’ hebe, bêguman ev helbest ya Feqiyê Teyran e. Ango ‘Mîm û Hê’ diruşimek giring e ji bo destnîşankirina helbestên Feqiyê Teyran. Danberheva “Feqe û Mela” jî rastiya vê gotinê rast derdixe. Lewra Melayê Cizîrî di peyva yekem de dibêje Feqiyê Teyran:

Selamên milyaketan

Bêhedd û bêhisêb in

Şibhetê avê şetan

Ji Mela li ‘Mîm û Hê’ bin

Hilak in ji rehmetan

Derman ji “Lam û Bê” bin<sup>79</sup>

---

<sup>79</sup> Karadenîz, Alî (amd.), **Dîvana Meleyê Cizîrî**, İstanbul, Nûbihar, 2010, r. 489.

Di vê şeşmalkiya jor de eşkere dibe ku ehlê medresê, û dostê Feqiyê Teyran, leqeba ‘Mîm û Hê’ didine wî. Herwisa kifş dibe ku tu helbestvanên din jî ev mexlesa han bi kar neanîne. Lewra Melayê Cizîrî dibêje Feqî, ez te nas dikim tu ‘Mîm û Hê’ yî.

Mîm û Hê li gorî rênûsa Erebî her du herfên pêşî yên navê wî Mihemed in.<sup>80</sup> ‘Mîm û Hê’ kurtkirina navê Mihemedê Hekarî ye.<sup>81</sup> Li jor hatibû tesbîtkirin ku navê Feqiyê Teyran yê rast Mihemed e û xelkê Muksê<sup>82</sup> ye, ji devera Hekarî ye.

Bêhtir torevan û lêgerînkaran li ser çaxa jiyana Feqiyê Teyran nivîsîne di wê rayê de ne, ku Feqî xelkê Muksê ye. Muks jî ta sedsala pêşiya niha de li ser Hekariyê dihat hejmartin. Ji ber vê ye ku em dibêjin, ev ‘Mîm û Hê’ kurtkirina navê Feqiyê Teyran e ku Mihemedê Hekarî ye.

Heta îro xebat û nivîsên li ser Zembîlfiroş hatine kirin em dikarin wusa rêz bikin. Ji van çavkaniyan yên di destê me de peyda dibin jî henin yê peyda nabin jî.

Deqê Zembîlfiroşî: Feqiyê Teyran (1549 - 1643)

Deqê Zembîlfiroş: Mirad Xan Bazîdî Li Sala (1776) Şêx Beşîr Şêx Mihemed Tahir Birîfkanî (Rkawî) li sala (1967) ê ev deqe daye Gîw Mukrîyanî. Wî jî li heman salê li Hewlêr çap kiriye.

Aleksandir Jaba (Şeş Deq): Dema Jaba di navbera salên 1838 - 1869ê qonsilê Rûsyayê yê Tirkîyê bû, folklorê Kurdan kom kiriye. Ji wan şeş beyt çîroka Zembîlfiroş bû.

Uygin Porya û Albert Sosin: Van herdu lekolînerên Swîsrî dû çarmalikên Zembîlfiroş yên Kurdistana bakur kom kirine û di sala 1870an de di nav pirtûka xwe de bi zimanê Elmanî weşandine.

Pîtir Lîrx: Rojhilatnasê Rûsî di sala 1855 an de di dema seredana Mêrdîn - Urfa - Dêrsim - Mûş - Cizîr - Xerpêt - Erzerum kiribû hin beytên folklorî yê Kurdî tomar

---

<sup>80</sup> Adak, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk**, r.213.

<sup>81</sup> Sadînî, **Feqiyê Teyran Jiyan Berhem û Helbestên Wî**, r. 28.

<sup>82</sup> Muks bajarekî gelek biçûk e û di nav çiyayan de ye gelek baxçe û baxên wê hene û ava wê pîr e. Nezikî nivê ava Dicle ji wir tê. Ev ava han ji nav şikeftê dizê. Muks, berê gelek mezin bûye: Taxa Deştê, Taxa Nancoxê, Taxa Apirê Xaman û Taxa Bajêr taxen kevn en Muksê ne û niha xerabe ne. (Yusif, **Şairên Klasîk ên Kurd**, r.57).

kiribun. Di sala 1857 pirtûkek bi navê “Folklorê Kurdî” çap kirîye. Di vê pirtûkê de du beytên derhaq çîroka Zembîlfiroş de cîh digirin.

S. A. Begzadof: Rojhilatnasê Rûsî di sala 1891 li Tiflîs, li Curcîyê pirtûkek çap kirîye. Navê pirtûkê “Dîroka Kurdên Yêrîvan û Çend Beytên Folklorê yê Kurdî” Di nav pirtûkê de du beytên Zembîlfiroş henin.

Vun Lu Kuk: Sê deqêt Zembîlfiroş. Elmanî ye. Di sala 1901 an serdana Kurdistanê Bakur kir û çen beytên folklorî, gotinên mezinan, mewlûda pêxgamber û sê deqêt Zembîlfiroş kom kirin. Paşê van beytan di nav pirtûka bi navê “Çend Têkstê Kurdî” bi zimanê Elmanî di sala 1903an de çap kirin.

Hugo Makeş: Ev lekolînerê Elmanî parçek ji beytên Zembîlfiroş bi Kurdî û zimanê Elmanî pirtûka xwe a Têkstê Kurdî di sala 1920an de li Lenîngradê da. Wî ev deqe ji Kurdekî Mêrdînî wergirtibû.

Oskarman: Di sala 1906an de beyteke Zembîlfiroş bi zaravayê Mukirîyanî di pirtûka xwe ya bi navê Tehfe Mivfrîye de belav kir.

Casmê Celîl: Beytên Zembîlfiroş pirtûka xwe ya bi navê Folklorê Kurmanca de di sala 1936 an de çap kir.

Hacıyê Cindî: Di sala 1936 an de pirtûka xwe ya bi navê Folklorê Kurmancan de beytên Zembîlfiroş belav kir. Her wuha heman beytê di sala 1947an de bi zimanê Ermenî pirtûkek nivîsîbû û li wê derê belav kiribû.

Emînê Ebdal: Di sala 1947an de pirtûkek bi navê Folklorê Kurmancan nivîsî bû. Ji çîroka Zembîlfiroş jî hin beyt bi zimanê Ermenîkî di pirtûka xwe de da.

Hacıyê Cindî: Bi zimanê Rûsî 1962 an de Destanên Folklorê yê Kurdî pirtûkek nivîsî û li Moskoyê çap kir.

Y. Duna Yîsvkî: Ev zana û hozanvanê Rûsî beytên Zembîlfiroş di sala 1937 an de bi zimanê Rûsî di nav pirtûka xwe de da û ji Erebê Şemo wergirtibû.

Casimê Celîl: Beytên Zembîlfiroş di sala 1960ê de bi zimanê Kurdî li Yêrîvanê belav kir.

Vikender: Di sala 1959 an de Upsala li welatê Swêd de di pirtûka xwe de weşandiye.

Radyoya Kurdî li Yêrîvan: Di navbera salên 1959 - 1975 de di radyoya Kurdî ya Yêrîvanê de wek stran hatiye gotin û hatiye pêşkeş kirin.

Qenatê Kurdo: Di sala 1962 an çap bûye.

Serkîs Aykonî Ermenî: 1862 an de pirtûka xwe ya bi navê Folklorî Kurdî belave.

Mela Ehmed Hacî Mewlûd Şinoyî: Li deverên Şino û Mehabad rastî van bendan hatiye. Li sala 1967 an de daye Gîw Mukrîyanî.

Mihemed Tewfîq Wirdî: Bendên Zembîlfiroş yê Hacıyê Cindî wergêrand ser zimanê Erebbî. Di nav pirtûka xwe Qises Şî'rîye Kurdîye di sala 1965an de li Bexdayê çap kir.

Mihemed Tewfîq Wirdî: Beytek Zembîlfiroş di pirtûka xwe de di sala 1971 an de li Bexdayê çap kir û belavkir.

Gîw Mukriyanî: Di nav salên 1902 – 1977 de jiyaye. Dû bendên Zembîlfiroş di nav pirtûka xwe Çîroka Zembîlfiroş belavkir.

Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl: Beytên Zembîlfiroş di nav pirtûka xwe ya bi navê Folklorî Kurdan de çap kirin. Cara ewil 1973 an de li Moskowayê çap bû.

Ebdurrehman Mizûrî: Di sala 1973an di rojnameya Hawkarî jimara 182an de kurtenivîsîsek li ser beytên Mirad Xanê Bazîdî de belav kir.

Ebdurreqîb Êsîf: Gotarek di derbarê çîroka Zembîlfiroş de nivîsan. Di rojnameya Hawkarî jimara 188 an (12.10.1973) belav kir.

D. Xelîl Cindî: Li ser çîroka Zembîlfiroş gotarek. Di rojnameya Hawkarî jimara 233 an û di sala 1974 belav kirîye.

Faruq Hecî Emîn Amêdî: Kovara Ruşenbîrî, jimare 43, 44, 45, 46 an de di sala 1976 an de belav kir.

Hunermend Îsa Berwarî: Di sala 1977 an ev serpêhati li Bexdayê tomar kir.

Jaklîn Museylîyan: Pirtûka Zembîlfiroş li Moskowê di sala 1983 an de çap kir. Ev vekolînera Ermenî deh beytên Zembîlfiroş yê folklorî ji nav Kurdên Ermenistanê û Gurcistanê kom kirin û digel deqê Feqîyê Teyran û Deqên Mirad Xan Bazîdî û Deqê Emînê Ebdal û Hacî Cindî û Oygün Porîya û Albêrt Sosin berawird kirin. Herwesa di



pirtûka navbirî de herdû beytên Feqîyê Teyran û Mirad Xanê Bazîdî wergêrande li ser zimanê Rûsî.

Mihemed Emînê Osman: Di sala 1986 an bendên Zembîlfiroş di nav pirtûka xwe de ya bi navê Dîwana Meleyan de belavkirîye û ew deq ji Hisên Baclurî hatîye wergirtin.

Şîkur Mistefa û Enwer Qadir Caf: Van her dû rêzdarên beytên Zembîlfiroş yê Ordîxanê Celîl di nav Folklorê Kurdan de belav kir. Di sala 1979 an de ji zimanê Rûsî wergerandinê Kurdî. Li Bexdayê çapkirin.

Hunermend Ehmed Zêbarî: Di sala 1979 an de çîroka Zembîlfiroş li ser kasêtekê qeyd kiriye û weşandiye.

Sedullah Şêxanî: Bendên Zembîlfiroş li sala 1986an de di nav pirtûka xwe de belavkir û piştê Kak Sedalle Şêxanî ew bendên Zembîlfiroş li Rojnameya Hawkarî jimara 842 an de di sala 1986 an de belavkir û xwîyaye ku ev text ji devera Şîwan û Dîbsê gihîştibû wî.

D. Bedirxan Sindî: Çîroka Zembîlfiroş ya Mirad Xanê Bazîdî bi zimanê Erebî di kovara Nurûz El'raq jimare 2, 1986 an de belavkirîye.

Seid Dereşî: Zembîlfiroş yê Feqîyê Teyran. Li kovara Rojî Kurdistan jimara 65 di sala 1984an de belav kirîye. Tê zanîn Seîd Dereşî yekemîn kes bû ku li Kurdistana Başûr beyta Zembîlfiroş ya Feqîyê Teyran belavkirîye û vê bendê ji destê Mela Mihemed Emîn Berçî wergirtibû ku di sala 1923 an de jî hatibû nivîsîn.

Smaîl Sgêrî: Gotarek li Kovara Beyan jimara 155an de di sala 1989 an li Bexda belav kir. Deqek Zembîlfiroş li cem wî heye û ji Mihemed Mehmud Sîrê Nihêlî wergirtîye.

D.Me'rûf Xeznedar: Deqek Zembîlfiroş yê Feqîyê Teyran li Kovara Rewşenbîrî niwê jimare 126 sala 1990 li Bexda belavkirîye.

D. Welatû: Li sala 1986 dû deqet Zembîlfiroş ya Gîw Mukrîyanî li sala 1967 bi zimanê Kurdî li Hewlêrê çap kiriye.

Selîmxan Ebdullah Dulemerî Barzanî: Kovara Lalş jimara 12 sala 2002 xwîya kirîye ku deqekê Zembîlfiroş li cem wî heye û jiber kirîye.

Can Kurd: Di sala 1987an de pirtûkek belavkirîye. Çend deqên folklorî yên Zembîlfiroş yê Oygin Porîya û Albêrt Sosin yên sala 1887an di xwe de digre.

Tewfîq Osman Lubnan: Deqekê Zembîlfiroşî bi zimanê ‘Erebî li Kovara Xebat jimare 41 Adara 1999 li Lubnan belavkirîye. Ev- deqe di nav Kurdêt Şamê ber belav e.

Seyyîd Kazim Muslih: Gotarek li dûr serhatîya Zembîlfiroş yê Mirad Xanê Bazîdî li sala 1777 nivîsî careke dî li Kovara Awêne jimare 34 – 35an di sala 1997 an de belavkirîye.

Sadiq Bahauddîn Amêdî: Dû deqêt Zembîlfiroş di pertuka xwe de ya bi navê “Ji Folklorên Kurdî” li sala 2003 belavkirîne.

Jîlwan Tahir Hewlêrî: Beytek Zembîlfiroş kirîye şanogerî û di sala 1999an de ev şano li festivala peymangeha huner a ciwanan a Hewlêr hate lîstin.

Fariq Hefîd: Deqek Zembîlfiroş yê devera Silêmanîyê di nav pertuka xwe ya li Swêdê belavkirîye.

Wesfî Hesên: Gotara ya bi navê “Serhatîya Zembîlfiroş” di Kovara Dihok, jimara 9 sala 2000 de weşand.

Pîr Dawid Mexmûrî: Deqa Zembîlfiroş ya nebelavkirî ya devera Deştî Hewlêre di pertuka xwe de di sala 2004 an de belavkirîye.

Zîlan Reşo û Serdar Rewşen: Pirtûkek ya bi navê “Destanên Kurdî” li Swêdê 2002 an de weşand. Deqeq Zembîlfiroş tê de cîh girtiye.

Seîd Dereşî: Deqekê Zembîlfiroşî yê binecîh û berawirdkirî di dîwana Feqîyê Teyran sala 2005 an de li Dihokê çap kirîye.

Bayiz Ehmed Xoşnaw: Deqekê Zembîlfiroş yê devera Xoşnaw cîh digire. Li Kovara Aswî Folklor jimara 8an sala 2005 an de li Hewlêrê belavkirîye.

Ferhad Gomeşînî: Deqek Zembîlfiroş di kovara Aswî Folklor jimare 11 ya sala 2006 li Hewlêr belavkirîye. Ev deq yê devera Kwêsinceq e.

Şemo Qasim Denanî: Deqek Zembîlfiroş bi zorê ji nav Ezdîyan belav kiriye û di 2005 an de li Kovara Lalş jimara 23an de belavkir.

Receb Dildar Amedî: 2006an de li bajarê Dihok beytek bi navê “Efsaneyên Amedê” pêşkeş kir. Amadî bi serhatîya Zembîlfiroş kir ku serhatîyeka folklorî û zor kevnare li sinorê Dîyarbekirê peyda bûye.

A. Gernas: Bi pîtên latinî li kovara Roja Nû jimara 76 Swêd sala 1996 belavkir. Paşê Sertîp Mensûrî heman vekolîn wergêrand li ser pîtên Erebî û di Kovara Sirwe jimare 79 sala 1997an de belavkir.

Îdrîs Ebdullah Hewlêrî: Deqek Zembîlfiroş û çend beyt di Kovara Aswî Folklor jimara 24 sala 2007 an de belav kir.

Îdrîs Ebdullah Hewlêrî: Yê Pîr Dawid Mexmûrî di Kovara Aswî Folklor jimare 26 sala 2007 an de belav kir.

Kamran Îbrahîm Mela Xelîl Mişextî: Kovara Peyv jimare 41 Tirmeha sala 2007 an de beytên Zembîlfiroş belav kir.

Nîzar Agirî: Şîroveyek rexneyî ya bi zimanê Erebî li gor deqên Zembîlfiroş a Haciye Cindî di sala 1962 an de li Moskowê belavkir. Di nav pertuka xwe da “Kan Yamkan - Qîraet fî Hikayet Kurdîy ye” li sala 2006 ji aliyê weşanxana Darez Zeman li Dimeşqê belavkir.

Qeys Mihemed: Vekolîneka dirêj bi zimanê ‘Erebî li dor deqê Zembîlfiroş ye Muradxan Bazîdî li Kovara Zagros jimare 4 li dîmahiya sala 1997 belavkiriye.<sup>83</sup>

Gûlîstan Çoban: Bî Tirkî romanek çapkîr. Serpêhatiya Zembîlfiroş li vê dere bi mirektiyê bi dawî dibe. Di sala 2011 an de li Stenbolê hatiye çapkîrin.

Necatê Zivingî (Özdemir) :Bi navê Zembîlfiroş pirtûkek amade kiriye. Di nav pirtûka xwe de bi delilên ber çav nivîskaran dide nasandin. Pirtûk him bi komkirina çavkaniyan him jî bi uslûbek folklorîk hatiye amadekirin. Dawiya pirtûka xwe de wenyên Farqîn û cihên din jî cîh digre 2012 an de li İstanbulê hatiye çapkîrin.

M.Xalid Sadinî: Bi navê “Feqiyê Teyran Jiyan, Berhem û Helbestên Wî” de rûpela 399 an de helbesta Zembîlfiroş bi weşanxaneyê Nûbiharê sala 2013 an de çap bû ye.<sup>84</sup>

---

<sup>83</sup> Necat Özdemir, **Zembilfroş**, r.36.

<sup>84</sup> Di nav van çavkaniyan de hin behrem li ber destê me de henin yê tunene jî me li vê derê nivîsandin.

## BEŞA DUYEM

### DI NAV EDEBIYATA KURDÎ DE CIYÊ ÇÎROKA ZEMBÎLFIROŞ

#### 2.1. JI ALIYÊ WEKHEVÎ Û CUDATIYAN VE DAHÛRÎNA ÇÎROKA ZEMBÎLFIROŞ

Di çîrokên Kurdî de gelek realîteyên jîyînê hene, jîyîn timê dikele û jîndarîya van berhemên me gelekî ronî dikin, şemal û tîrêjên berfireh belav dikin, ji bo ku dinya me hîn jî xweşiktir bibe, me di nav ronahîke mezin de dihêlin, mesajên gelek xurt dighînin me, di rojên teng de tîr hewarîya me mirovan, ji me re dikarin bibin referansên pir giranbiha.

Ji bo ronahîkirina cîhê jinan di civata Kurd de, ev destan gelek rênîşandar in, cure cure materîyal û îmkanên folklorîk û edebî pêşkêşî me dikin. Dema mirov destanên Kurdî baş analîz dike û tê de kûr dibe, di nav van destan, serpêhatîyên nav û deng de em rastî serdestîke jinan tîr, jin xwedî erk û berpîrsîyar in, hevsazî û pêşketina bûyerên van destanan de roleke mezin dilîzin, ew timê li dijî neheqî û bêdadîyê radiwestin, ber xwe didin. Di van destanan de tekoşîneke jinan heye.

Jinan bi xwîna xwe ve be jî, di dinya van destanan de ji xwe re textek ava kirine. Ji bo bicîhanîna daxwazî, hêvî û xewnerojên xwe timê ya xwe kirine, bêdilî, dudilî an jî bêgavî di biryarên wan de kêmtê dîtin, ew di vî warî de gelek serhişk in, Gelek caran ji bo dilketîyê xwe dimrin, canê xwe didin, wek Mecnûn dîn dibin, qet ne be di gorê de xwe dighînin hev. Ji ber vê yekê jî, di van destanan de em rastî tradejîyên mezin tîr. Di destanên Kurdî de reng û tehrê bûyerên bingehîn, çawa em dibînin bi destê wan diguhirin an jî ew bi xwe dibin bayîsê bûyerên girîng. Di pêkanîna avahîya bûyerên destanê de û di warê zelalbûna mesaja van berheman de, em dikarin bêjin mîrxasên jinî roleke berbiçav dilîzin.

Hemû şax û guhartinokên van destanan de, jin di rêke rast, pozîtîf, qenc û di rêke konstruktîfde dimeşin. Hem ji bo azadîya xwe hem ji bo azadîya welatê xwe, hem jî bona mafên mirovî, cawa em dibînin ew xwe davêjin nav agirên mezin. Dema mirov hemû van destanan û şaxên wan rûberî hev dike, hemberî hev dike, mirov dibîne ku gelek babetên hevpar, heveng di naveroka van berheman de hene. Gelek caran mîrxasên jinî, mîrxasên mîrî dixin bin bandûr û kontrola xwe, mîrî ji xirabîyê, ji rojên reş diparêzin, rîyên rast nîşanî wan didin. Heta niha rûberîhevkirina destanên

Kurdî zêde nehatine pêkanîn. Ne tenê rûberîhevkirina wan, ev berheman îro çawa em dibînîn hê nehatine berev kirin, derbasî li ser kaxiz jî nebûne. Ji ber van dijwarîyan, îmkan û mecala li ser van berheman kar kirin, lêkolîn çêkirin jî bêguman jar û qels dikeve an jî pêk nayên. Dema mirov van berheman rûberî hev dike, mirov rastî zaniyarî, agahdarî û encamên gelek giranbiha tê. Ji ber ku ev hezaran sal e, ev berheman li ser zar-zimanê gel digerin, gel jî bawerî, gotin û ceribandînan xwe yê bi salan tevî van berheman kirine, ew dewlemend kirine, tehr û rengekî nûh dane wan, di dawîyê de ev berheman bûne dewlemendîke folklorîk. Motîva jinan, evîn û zewac-mêranîne di folklorê Kurdî de motîveke gelek xurt û fireh e.<sup>85</sup>

Çîroka Zembîlfiroşê jî hezar sale di nav gel de dihat gotin û ev serpehatî devên bav û bapîrê me ji me re divegotin. Jiber devkîbû û nehatibû nivîsandin jî gelek tîşt lê zede kirin an jî kêr kirin. Edebiyata nivîsandî li ser hîmê edebiyata devkî bilind dibe. Mînakên peşî yê edebiyata cîhanê devkî ne, dûre ew bûne nivîskî.<sup>86</sup>

#### **a. Ji Aliyê Naverokê ve Danberhevkirin û Cudakirina Çîroka Zembîlfiroş a Mîradxan, Feqî û Bateyî**

Beriya her tiştî her du weryantên cuda de bala me herî zêde ragihandina çîrokê ye. Feqiyê Teyran bi awayek oldar û îrfanî serpehatiyê vegotiyê lê ya Mîradxanê Bazidî de zêdetir bi awayekî rengîn çîrok hatiye xemilandin.

Bi devê FT çîrok bi hawîrdorê evîn û baveriyê ve hatiye xemilandin. Zembîlfiroşa FT de em dikarin helbestê bixin du beşa:

1. Serpehatiya naskirin û debara xwe domandin û bi vî awayî naskirina Xatûnê.
2. Hez kirin û tirsê Xweda û xwe sipartina ber dilovaniya Xwedê.

Lê belê MB bi xwe di çarçoveya çîrok nivîsandinê de gelek agahiyên balkêş radixe ber çavan. Di helbesta MB çîrok li ku derê derbas dibe û li ku derê diqede dibêje. Aktorên- lîstikavanên çîrokê zelalin, çava ketiyê vê reyê û guherandina rêya mîrzade bi awayek zela diyar dibe. Destpêk û dawîbûn bi awayek zela diyar e.

Ey dil werin dîsan bi coş

<sup>85</sup> Rohat Alakom, *Di Folklorê Kurdî de Serdestiyê Jinan*, Stockholm, Nûdem, 1994, r.66.

<sup>86</sup> Şerefxan Cizîrî, "Edebiyata Dewkî", *kov. Nûbûn*, hj. 84, 2007, r.70.

Carek ji caran mey binoş

Bikin qiseta Zembîlfiroş

Da seh bikin hikayetê

Li gor tê gotin û ji helbestan tê fêmkirin di tarîxên borî de lawê mîrekî hebû ku di nav kêf û şahiyê de dijîya. Li gor hinek rîwayetan navê wî Muhyeddîn e. Kurê Mîr Ebas e. Hinek jî dibêjin Zembîlfiroş kurê mîrê Mezrabotan e. Dibêjin Mîr Ebas bi eslê xwe ji Colemêrg bûye. “Zembîlfiroş mirovekî Kurd e. Navê wî yê dirûst li def jêderêt dîrokî Mîr Seîd Kurê Mîr Hesên Paşayê Diyarbekrî ye. Hindek jêdera xûya /ciriye ku serhatiya Zembîlfiroşê li sala 994ê zayînî li serdema dewleta Merwanî rû daye. Ewa hewçerx digel serdemê dewleta Hemedanî.”<sup>87</sup> Emê vê yekê di beşa “aktorên çîrokê” de zelal bikin û li gor me navê Zembîlfiroş diyar bikin. An diha zêde di vê bêşê de em nakevin hurguliyên.

Kar û barê wî kêf û nêçîr bû. Kêmasî û tûnebûn nedîtibû û ji kêf û reqsê pêve tu tîştêk nasnedikir.

Zembîlfiroş lawkê rewal bû

Bi kilfet û ehl û eyal bû

Husnekî Usif li bal bû

Heq rizaqê qismetê

Dema tê ber zewicandinê jê re keça mîrê Botan ( helbesta MB ev derbas nabe) tînin û bi rojan daweta wî dîkin. Sal derbas dibin û jê re du zarok çêdibin. Belê lawê mîr bi derbasbûna salan ji ciwanî û bedewiya xwe tîştêkî hûnda nake.

Ev halê Mîrzadeyê me heta dîtina xewnekê didome. Evareke îne xewneke gerîb dibîne. Piştî vê xewna ku agir bi dil û kezeba wî dixê, dest bi girî dike. Jina wî meraq dike û ji Mîrzadeyê nazdar sebebê giriyê wî dipirse. Mîrzade behsa xewna xwe dike, dibêje: “Min xewneke pir xweş dît. Di xewna min de di nav qesreke zêr de horî hebûn... Min xwest ez jî bikevime hundir, lê belê musa’de nekirin û wiha gotin: “Here li dinê bibe derwêş, li pey xwe rojî û nimêjan nehêle, xirqeyan girêde, dilê feqîran nehêle. Tu

<sup>87</sup> Wesvî Rdênî, “Beyta Zembîlfiroş”, 2008, (<http://www.spirez.org/ershif/2008/282/11-20.pdf>, r.16, ), (d.d. 03.02.2014)

dizanî ku mirin heye, ev qesr û bostan ji bona te ne. Malê dinê bêfeyde ye, ji bo vir kar û xebatê bike. ” Dewam dike dibêje: “Li aliyekî din min agirê cehennemê/dojehê dît ku dixwest min bişewitîne. Ji ber vê rewşê ez digrîm.”

Jina wî dixwaze Mîrzadeyê nazdar ji van xem û xeyalan xelas bike û jê re wiha dibêje: “Ey bîbika çavê min! Dev ji van tirsan berde. Bavê te bi xezîne û ‘eskerên xwe hakimê heft iqlîma ye. Rabe here nêçîrê, tajiye xwe berde, teyr û koviyên bikûje. Li gora dilê xwe kêf bike. ”

Mîrzade ji jina xwe re dibê: “Şîretên wiha li min neke, ev canê şêrîn emanet e. Rojekê emê bikevine qebra teng û tehl. Ezê di qebrê de çî bikim, çawa hesabê xwe bidim Xwedê”

Jina wî guh nadê û halê Mîrzade digihîne diya wî. Diya wî jî dibê gazî bav bikin û wezyetê wî re dibêje. Dibê: “Dinya li ber çavê kurê we reş bûye. Zû xeberê bidin hekîm û cingiran bila werin çareyekê jê re bibînin. ”

Dayika Mîrzade bavê wî îqna’ dike û siltan tevî wezîran dicive. Gazî Mîrzadeyê ciwan dikan. Bavê wî jê re dibêje: “Were li ser textê min rûnê, taca min bide serê xwe, hikum doraliya gel bike. ” Di pey vê rewşê Mîrzade hinekî disekine. Bi xizmetkarên xwe re li hespê xwe siwar tê û diçe nêçîrê. Di rê de li komekê rast tê ku darmeytek hilgirtine û dimeşin. Ji wan dipirsin... Dibêjin: “Ev darmeyta lawê walî ye. Xortekî xweşik û bedew bû. Vê sibehê wefat kir. ”

Mîrzadeyê ciwan ji hespê xwe peya tê û heta mezel tabûtê hildigre. Di vê navberê de heqîqeta mirinê û xewna wî tê bîra wî û hêstiran ji çavan dibarîne. Edî qebra teng û tarî dîtîye, kêf û nêçîr ji bîr kiriye.

Li ser vî halî demek diçe. Rojekê dema ji nêçîrê dizîvire di ber goristanekê re derbas dibe. Hestiyên miriyekî dibîne. Heta wê rojê tiştekî wisa bala wî nekişandibû. Ev dîtîna lê pir tesîr dike. Dîsa dikeve nav fikr û xeyalên kûr. Wê demê dîsa halê wî û mirinê tê bîra wî û difikire dibê: “Gelo ji bona çî ez hatime dinê?” “Ez çî dikim?” “Gelo wê dawiya min çawa be?”

Edî lawê mîr nasekine. Ji bona ku tobe bike û bibe derwêş ji bavê xwe iznê dixwaze. Lê belê bavê wî musade nake û wî bi dûrmayîna ji jin û zarokên wî ditirsîne. Mîrzade hem ji bona riza bavê xwe bistîne hem jî ji bona zar û zêçên xwe bi xwe re

bibe, pir li ber bavê xwe digere. Wezîr jî li vî halî dinêrin û ji bavê wî re wiha dibêjin: “Bila here. Halê feqîran fêma bike, qewet û jêhatî bibe. Wê dîsa were...”

Bavê wî dibîne ku çare tune, destûra çûyîne dide. Piştî mûsa’de distîne, Mîrzade bi kêf radibe destê bav û dayika xwe maç dike, dixwaze ku dayika wî jê re du’ a bike û ji xelkê xatir dixwaze.

Di vî navberê de bavê Mîrzade bi jina wî re diştegele, ji bona ku ew neçe. Jê re dibêje: “Heger tu û zarokên xwe jî pê re herin hûnê pê re bibine parsek û belengaz. Hûn feqîriyê dixwazin an text dixwazin?” Jina Mîrzade wiha dibêje: “Mîrzade taca serê min e. Jina bê mîrê xwe feqîr e. Ez bi qurbana wî bim, pê re diçim.”

Mîrzade êdî wê heyata bi kêf û nêçîr terk dike û li gor hinek rîwayetan şevkê bi dizî lê dixwe diçe.<sup>88</sup> Dîgîje welatekî gerîb ku li wir kes wî nas nake. Li gor MB tê Mêrdînê. Li gor hinek rîwayetan dibêjin Mîrzade ji welatê ku çûyê dizewice jî.

Qewîn ew lawê feqîr bû

Dayme Xwedê bîr bû

Pêşê xwe de jêr bû

Ew bi dest hebûse’netê

Welatê ku diçe, li wir debar bi çêkirin û firotina selika ye, keda helal di vî karî de dibîne û dest bi çêkirin û firotina selikan dike.

Selik an Zembîl: zembîl, zembeq, duşem(b)... lê farisî: zenbîl, zenbeq, dûşenbe... tê binavkirin. Zembîl an selik bi çîtîk, lew û tureyên mîwê yê tenik ve tê veçînîn an honandin, gelek caran destikê wê heye, xwarin, fêkî an ji bo tîştêk pê tê keşandin re tê gotin. Zembîlfiroş çîma karê zembîlan hildibijê re ev yek hewceye were gotin. Ji bo selikan sermaye ne hewce ye û ji bo van bifroşê jî tu erebe an amûr hewce nîne ji ber ku baweriya Zembîlfiroş rêya derweşan rêya peşerojê û rêya xilasbuna wî ye tu barekî hîlnade ser piştê xwe. Keda rojekê peyda dike û bi eyal û jina xwe re tenê wê dixwe.

---

<sup>88</sup> Dewleta Merwaniyan di navbera 983 û 1085an de li Farqînê hikum kiriye. Di pey re “Mîrîtiya Erdelan” ku hatiye avakirin ji neviyên dewleta Merwaniyan e. Li gor Şerefnameya Şerefxanê Bidlîsî bi navê “Erdelan” mîrzadeyek ji mîrekiyê û qesrê reviyaye. “Li sala 1007an de qesra mîrê Farqînê û kelha Zembîlfiroş ji layê mîr Ebû Nesr Ehmed Nasirûddewle bîn Merwan el Merwanî hatiye nûjenkirin û sexbêrkirin. Û dema gerokê navdar Yaqut Hemewî li sala 1217 yê zayînî çûye Farqîn Kelha Zembîlfiroş dîtibû û behsa ciwaniya wê di pirtûkê xwe da kiriye. (Wesfî Hesên Rdênî, Beyta Zembîlfiroş, Hewlêr, Spîrêz, 2008, r.16).



Tirsa rojêke din tune ye. Ji ber vê yekê dema ji Xatûnê direve û tê malê jin jê dipirse “ka tişteki xwarine tune ye” ev pirs firotina selika zelal dike. Li gor Zembîlfiroş rêya exretê de tu pisgirêka dinê nîne û barek ji hewce dike tune be. Şivan diçîne, dihovîne û jê zembîlan çêdike. Êdî navê wî “Zembîlfiroş” e. Zembîlfiroş tê me’na “Merivê selikan difiroşe”.

Heta vê derê li gor helbasta MB ye. Ji vê derê pê ve mesnewiya Feqî û Mîradxan nêzî hevdu ye.

Şixulê wî selik û tebeq bû

Qîmeta selkan wereq bû

Dayma ew rast heq bû

Pê debîrî kilfetê

Ew bi dest zembîl bi dest

Dibirê bazarê bi qesd

Xwarin nan dihat bi dest

Razî dibû qîsmetê

Êdî Zembîlfiroş di riya heqiyê de bi kedeke helal jiyana xwe diborîne. Gund bi gund, bajar bi bajar, kolan bi kolan digere û zembîlên xwe difroşe. Rojêke riya wî bi Farqînê dikeve. Dewleta Merwaniyan di navbera 983 û 1085an de li Farqînê hikum kiriye. Di pey re “Mîrîtiya Erdelan” ku hatiye avakirin ji neviyên dewleta Merwaniyan e. Li gor Şerefnameya Şerefxanê Bidlîsî bi navê “Erdelan” mîrzadeyek ji mîrekiyê û qesrê reviyaye. “Li sala 1007an de qesra mîrê Farqînê û kelha Zembîlfiroş ji layê mîr Ebû Nesr Ehmed Nasirûddewle bîn Merwan el Merwanî hatiye nûjenkirin û sexbêrkirin. Û dema gerokê navdar Yaqut Hemewî li sala 1217 yê zayînî çûye Farqîn Kelha Zembîlfiroş dîtibû û behsa ciwaniya wê di pirtûka xwe da kiriye.<sup>89</sup> Dema jina Mîrê Farqînê li ser bircê wî dibîne, aqil ji serê wê diçe û dikeve nav derd û kulan.

Her dema selka ku tîne

---

<sup>89</sup> Wesfî Hesên Rdênî, “Beyta Zembîlfiroş”, r. 16.

Xatûnek jorda dibîne  
Bi dil û can dihebîne  
Dil kete pêla muhbetê

Muhbetê keç mubtela kir  
Sur li carîyan aşkera kir  
Lawikî qelbim cuda kir  
Min ji eşqa xew ne tê

Dixwaze Zembîlfiroş ji rê derxe. Riwayetek heye ku dibêjin: dilê Zembîlfiroş dikeve keça mîrê Farqînê û dikeve sûretê Zembîlfiroşan da keçikê bibîne, lê dema diya keçikê Xatûn wî dibîne dilê wê dikeve Zembîlfiroş. Axir Zembîlfiroş xwe bi werîsekî ji bircê berdide xwar û vedigere Colemêrg. Lê xuyaye ku ev rîwayet ji şî'ran û xwendina dengbêjan re ne munasib e<sup>90</sup> Qerwaşekê dişîne pey û dibê mîr dixwaze selikan ji te bikire. Zembîlfiroş derdikeve qesrê. Derî li pişt tê girtin. Dibîne ku niyeta Gul Xatûn xerab e.

Xatûn dibê lawê beyanî  
Lew dibêm tu bizanî  
Min tu ji bo dilê xwe anî  
Da em bikin misilhetê

Her wek mesela Hz. Êsif ‘eleyhîssalam Zembîlfiroş jî tê îmtîhankirin. Li gor tê zanîn Hz. Êsif ‘eleyhîssalam xweşiktirînê însana ye ku di biçûkatiya xwe de li “Misrê” bi xulamî hatiye firotin û mezinek ji mezinên Misrê ew kiriye û ji jina xwe re diyarî kiriye. Navê jina wê “Zûleyxa” bûye. Dema Hezretî Êsif ‘eleyhîssalam ber bi xortaniyê ve hildikşe bedewtiya wî xweştir tê dîtin. Wê demê Zûleyxa aşîqî wî dibe û rojekê wî di odeya xwe de asê dike û dixwaze Hezretî Êsif ‘eleyhîssalam biya wê bike. Belê Xweda Hezretî Êsif bi rehm û kerema xwe distirîne û Hezretî Êsif ji wê kirinê dûr dimîne. Piştî

---

<sup>90</sup> Zivingî, *Analîz û Lêkolînek Li Ser Hîkayeta Zembîlfiroş*, r.18.

vê hadîseyê Zûleyxa wî davêje zindanê û Hezretî Ûsif neh salan di zîndanê de dimîne. Di dawiyê de Hezretî Ûsif bi sebr û rastiya xwe dibe mezin û mîrek ji mîrên Misrê, Zûleyxa jî evîna heqîqî nas dike û tobe dike...

Xatûnê ez tobedar im

Delalê ez tobedar im

Zarok birçîne li mal in

Ji Rebbê jorî nikarim

Mîna Hz. Ûsif ‘eleyhîssalam, Zembîlfiroş jî dike nake Xatûn dev jê bernade. Xwe sed rengî teqdîmî Zembîlfiroş dike. Her çiqas Zembîlfiroş li ber xwe dide jî belê Xatûn jê naqere. Axir bi behaneya destmêjgirtinê dertê û dixwaze bireve. Lê ciyêkî ku tê de karibe bireve nabîne. Li gor Zembîlfiroş ev xwest ne li gor adet û namusê ye. Ev yek jî ev ayeta hanê tîne bîra mirov: “Ji mirovan ra hezkirina jinan û zarokan û lod bi lod komkirina zêr û zîvan û hespê rewan û (pez û ) dewaran û çand û zevîyan hate xemilandin. Evanan derbasîya heyata dinyayê ye. Lê esil gîhandina cîyê xweş li cem Xweda ye.”<sup>91</sup>

Her wekî şeker di cam î

Wekî xwarina heram-te'am î

Bi ser û pîyan li min heram î

Tirsim ji roja axretê

Bê çare dimîne, gazî û hewara xwe bi bal Xweda ve dike. Bi devê FT jî ev bang zêdetir xweştir e :“Dîma û hem dil ku kerî / Dil şewwitî ew pûr girî / Ro da û efraz fikirî / Ban kire Şahê Qudretê / Ban kire wî Şahê Mubîn / Go: Ya Delîlel Hayirîn / Tu şad bikî xelqê hezîn / Xelas dikî ji zehmetê...” Û xwe ji bircê berdide xwar. Li gor ji rîwayetan tê zanîn Xweda Cebrail ‘eleyhîssalam dişîne û li hewa wî digre, bi nermîtî wî datîne erdê.

Li gor hîkayetê Zembîlfiroş ecr û mukafata rastiya xwe dibîne û bi lutfê Xwedê namire...

---

<sup>91</sup> Komîsyon, **Qurana Kerîm**, Al-î Îmran 14, Stenbol, weş. DÎB, 2007, r. 51.

Zembîlfiroş piştî ji bircê dikeve xwar bi xemxwarî ber bi mal ve diçe. Lewra wê rojê rizqê zarokên xwe bi dest nexistiye. Ev yek jî rêya seyrû sulekê nîşanî me dide: “ Ji bo sibê derdê rizqê xwe nafikir e”. Bi van xem û xeyalan digihîje mal. Dibîne ku zar û zêçên wî di nav kêf û şahiyê de ne. Xwarineke xweş li ber wan e û jê dixwin. Bi heyret ji jina xwe dipirse bê ev xwarin ji kur hatiye. Li gor Feqî herçend ev bûyer bi awayek mucîzevî pêk tê. Dema tenûr pêdikeve xwerin û vexwarin ji ser difurin û encama sebra Zembîlfiroş û malbata wî tê xelatkirin.

Jina wî dikene û dibêje: “Xwedê şandiye. ” Zembîlfiroş meraq dike bê bi çi awayî hatiye. Jina wî wiha dibêje: “Ey ‘ebdê Xwedê! Dema em li benda te bûn, sê siwar ber bi mala me ve hatin. Ji min pirsîn bê ev zarok yê kî ne ku wiha ji birçîna dinalin û radizin. Yek ji wan di şeklê mîran de bû. Zilamekî xwe şand û ev xwarin ji me re anîn.”

Piştî Zembîlfiroş xwe jê xelas dike Xatûn bi tenê di nav girî de dimîne. Ji xizmetkarên xwe re dibêje ku li çol û beyaran li Zembîlfiroş bigerin.

Di vê navberê de dibîne ku mîr ji dûr ve tê. Lê belê dilteng û ‘aciz e. Gul Xatûn ditirse û dipirse: “Mîrê min! Ev çi hal e? Gelo tu ji çi ‘aciz bûyî?” Mîr wiha lê wedigerîne: “Dema vegeê de, li çolê li malbateke feqîr rast hatim; ku ji feqîrî û birçîbûnê digiriyan. Min pirsî bê ew ‘eyalê kî ne? Gotin ku yê derwêşekî selikfiroş in. Ew meriv ji tîrsa Xwedê daîm bi cezbe ye; ku feqîrekî xirqepoş e. Ew jî di meraqa wî de bûn bê îro çima dereng maye. Ez dixwazim wan bînim di qesrê de bi cî bikim, bila bi halekî xweş bijîn. ”

Gul Xatûn kêfxweş dibe û dibê: “Em zû wan bînin û di cihekî nêzik de bi cî bikin. ”

Mîr gazî xulam û xizmetkarên xwe dike û dibêje: “Zembîlfiroş û ‘eyalê wî razî bikin da ku hûn wan zû bînine qesrê.” Xulam û xizmetkarên mîr bi lez diçin, Zembîlfiroş malbata wî tînin di qesrê de bi cîh dikin.

Piştî Adar diçe û meha Nîsanê tê, êdî li her derê kêf û seyran dest pê dikin. Mîr jî pêlwanên xwe dide hev û dertê nêçîr û seyranê. Gul Xatûn piştî emîn dibe ku mîr ji bajêr derketiye, xizmetkar û cariyeyên xwe dişîne da ku gazî jina Zembîlfiroş bikin. Piştî jina Zembîlfiroş tê, Gul Xatûn wê di odeyekê de heps dike û cilên wê li xwe dike.

Li aliyekî jinik di odeyê de bi girî û endîşe ye li aliyê din Gul Xatûn xwe dixemilîne û diçe mala Zembîlfiroş. Lê belê ji lêz û beza xwe xerxalên di piyên xwe de jibîr dike. Evarî Zembîlfiroş tê mal. Dinêrê ku mal û zarokên wî di xew de ne. Ew jî bi dilekî xweş diçe nav nivînê xwe. Lê belê dema xerxalan ferq dike, diverciniqe û fêm dike ku a di nav nivînan de ye ne jina wî ye.

Gul Xatûn dest bi ken dike. Lê belê Zembîlfiroş pê de dixeyide û dibê: “Zû ji mala min derkeve.” Her çiqas Gul Xatûn li ber xwe bide û wî bi hepskirinê bitirsîne jî, dibîne ku Zembîlfiroş bi qerar e. Xatûn bê çare bi diltengî û ‘acizî dertê diçe. Jina Zembîlfiroş berdide, dişîne. Zembîlfiroş ji jina xwe re dibêje: “Amadekariya xwe îşev bike. Emê ji van waran sibê derkevin.”

Roja din mîr ji seyranê vedigere. Emir dide xulamên xwe ku gazî Zembîlfiroş bikin. Dibê: “Wî bixemlînin û bînin. Lewra ji Siltan emir hatiye. Zembîlfiroş ji min xwestiye. Ew kurê padşah e.”

Zembîlfiroş dixemilînin û dişînin cem bavê wî. Zembîlfiroş digihê bajarê hikumdariya bavê xwe. Gel ji bo hatina wî dicive. Destê bavê xwe maç dike. Hemî kes dest bi şîkr û medhê Xwedê dike. Li bajêr şahî dest pê dike. Govend tê gerandin, weke qiyametê siwar hespan dajon, tiving têne berdan.

Zembîlfiroş dibe hakimê wî welatî. Hakimekî zana û adil. Bi tu awayî rê nade zilm û zaliman. Bi şev derwêşiyê bi roj padşahiyê dike.<sup>92</sup>

Heta vê derê serpehatî zêdetir li gor helbesta Mîradxanê Bazidî hate şîrovekirin. Dilpaqijî, helalî û namûs, çawa em dibînin kakilê felsefeya jiyîna Zembîlfiroş pêk tînin. Di dawiya destana Zembîlfiroş de çi tê serê Zembîlfiroş û Xatûnê? Bersîva vê pirsê angorî çend şaxên destana Zembîlfiroş ji hev cuda dibin:

A. Dema Xatûn pey Zembîlfiroş dikeve diçe mala wî, çawa em dibînin Xatûn jina Zembîlfiroş dixapîne, dikeve nav cihê mêrê wê. Ew lempê vedimirîne, Zembîlfiroş dema tê dikeve nav cihê xwe wekî razê, Xatûn ji bîr dike xirxalê lingê xwe derxe û Zembîlfiroş wê çaxê fam dike ku ew ne jina wî ye. Ew Xatûn e. Zembîlfiroş dibe teyrek di kulekê re difire diçe. Xatûn heft sal li pey wî digere, li serê çiyakî rastî şopa wî tê, dibine xûşk û bira, piştî çendekî, Xatûn dimire.

---

<sup>92</sup> Zivingî, *Analîz û Lêkolînek Li Ser Hikayeta Zembîlfiroş*, r. 17.

B. Li ser kaniyekê rastî hev tîn, Xatûn dixwaze Zembîlfiroş ramûse, dema Xatûn zimanê xwe dixwe devê Zembîlfiroş herdu jî dimrin.

C. Agir ji devê Xatûnê derdikeve, herdu jî dişewitin.

Ç. Diçin cennetê, digihêjin mirazê xwe.

D. Mîr dema pê dihesa wekî jina wî çûye bal Zembîlfiroş, lêdixe Zembîlfiroş dikuje.

E. Zembîlfiroş xwe ji qesrê de davêje perçe perçe dibe.

F. Dema Mîr dixwaze Zembîlfiroş bikuje, Xatûn dikeve navberê. Kêrê ji destê Mîr digre, zikê Mîr re dike, ew tê kuştin. Paşê Xatûn, Zembîlfiroş û jin-zarê wî bi tevayî diçin cîhekî wusan ku dengê axa û mîran li wir nayê.

G. Jina Zembîlfiroş û Xatûn dibine hêwiyên hev, bi hevra dijîn.<sup>93</sup>

H. Zembîlfiroş û Xatûn di nav xwe de peymaneke gîrêdidin wekî dest ji pêsîra hev berdin. Paşê Zembîlfiroş ji ber daxwaziya bavê, diçe bajarê Diyarbekirê dibe Mîr.<sup>94</sup>

Lê belê dem derbas dibe, wextê mirina wî jî tê. Wek hemî kesî ew jî ruhê xwe teslîm dike û bi vî halî diçe hizura Rebbê xwe. Axir li gor ji rîwayet û çavkaniyan jî tê zanîn ji bona rastiya bi Xwedê re, Zembîlfiroş dikeve nav nî'met û xweşiya cennetê, xelas dibe ji te'de û ezyetê... Dengbêj û stranbêj jî dibêjin: "Rehmê li dê û bavê vê cema'etê."<sup>95</sup>

### **b. Ji Hêla Têşeyê ve Metna Zembîlfiroş**

Ji hêla têşeyê ve metnên di destê me de ya Feqiyê Teyran û Mîradxanê Bazidî hema bêjin heman e

Ziman: Zimanê gel, hêsan û sivik e

Şêwe/ Teşe: Nezm

Şêweya Nêzmê: Destan( ji ber jimara çarînan zêde ye)

Yekeya Nezmê: Çarîn

---

<sup>93</sup> Kurdo, **Beytêd Kurdî**, r.65-70.

<sup>94</sup> Rohat Alakom, "Silîva; Bajarê Ku Heft Car Xerab û Heft Carî Ava Bûye", 03.05.20011, [www.kovarabir.com/tag/zembilfiros/](http://www.kovarabir.com/tag/zembilfiros/), (05.01.2014).

<sup>95</sup> *Pale*, "Beytên Zembîlfiroş", r. 34.

Pîvan/wezn: Hesabê pêçiyar ya 8'yî

Cura: Helbesta Evînî

Tema: Tesawuf

Şemaya Serwayê: aaab

## **2.2. JI ALİYÊ TÊGEHÊN NEDÎTBAR Û MOTÎFÊN ÇÎROKÊN EVÎNÎ VE DESTANA ZEMBÎLFIROŞ**

### **2.2.1. Ji Aliyê Têgehên Nedîtbar ve Çîroka Zembîlfiroş**

#### **2.2.1.1. Ji Aliyê “Evîn” ê ve Mijara Zembîlfiroş**

Di vê çîrokê de du xalên evînê derdikevine pêş;

(I) Rîsalet û sebr mêran dîkin ezîz û wan digehînine mirazan.

(II) “Vîn”ek heqîqî û riyazetek samîmî jinê digehîne mirazê û wê jî dîke ezîze”<sup>96</sup> lê ji adet û rê ya nefis û bênamusiyê dibe rûreşî û negihîştina miraza xwe.. Çawa ku di şexsê Êsif û babê wî de rîsalet û sebr bûye sebebê gihiştin û ezîziyê, di şexsê Zelîxayê de jî “riyazeta evînî” bûye sebeb ku ew hem ji gunehên xwe xilas dibe hem jî digihîje “hidayet”ê.<sup>97</sup>

Divê neyê jibîrkirin ku mesnewiyên evînî li gor gihiştin yan jî negeheştina aşiqan - yanî li gor wusletê- dihêne dabeşkirin. Li gor nêrîna vê eşqê, ya ku di edebiyata klasîk de, wuslet û gihiştin taybetmendiyek zeîf û bêkêr e ku vê eşqê bêqîmet dîke. Lewra eşq gava bi firqetê ve, bi negihîştinê ve encam da hingî ew eşq pîroztir e/dibe. Lê ev nêrîn pîranî di metnên tesewwûfî de têne dîtin û mesnewiyên ji bo şehzadeyan hatine nivîsîn yanî lehengên wê yên aşiq şehzade bûn pîranî bi gihiştinê ve xilas dibin. Lê di mesnewiyên evînî yên lehengên wan ne şehzade ne, gihiştin û wuslet ji bo dinyaya dî dimîne; wekî Mem û Zîn, Leyla û Mecnûn... Feqet divê bê zanîn ku evîndariya şehzadeyekî, ku ew namzedê siltaniya welatekî ye, lazim e bi wusletê bê encam dan, da ku ew evîndarî nekevite devê kesekê.

Di vî warî de çend çîrokên ku Alexander Jaba berev kirine û wek pirtûk weşandîye zêtir bala mirovan dikêşin, motîfên derheqa rewşa jinên Kurd, di van çîrokan de gelek xurt û balkêşin. Di Çîroka Heyştan de dilê du xortan dikeve keçeke bi

<sup>96</sup> Selîmiyê Hîzanî, **Yûsuf û Zuleyxa**, Ayhan Gevêrî (wer), r. 131.

<sup>97</sup> h. b. r. 13.

navê Bamîk. Navê van xortan yek Şimasî, navê yê mayîn jî Çolo ye. Cara pêşîn Bamîk didine Şimasî. Şimasî yekî dewlemend, Çolo yekî belengaz bûye. Lê belê dilê keçikê dikeve Çolo. Paşê ev herdu xort dikevîne qirika hev, herdu jî tîn kuştin. Di dawîyê de keçik jî bi xençerê xwe dikuje. Keçikê dibin li bal mezerê Çolo gor dikin. Di Çîroka Donzdehan de serpehatîya du birayên bêkar cîh girtîye. Dilê birayê mezin Hesên Axa dikeve vê keça bi navê Lalî Xanim. Paşê dema birayê wî yê piçûk Çeleng Axa vê keçikê dibîne, dilê wî jî dikeve keçikê, ev birayê piçûk listikekê tîne serê birayê xwe yê mezin, bira dev ji keçikê ber dide, birayê piçûk bi wê re dizewice, lê belê dilê keçikê birayê mezin Hesên Axa de hebûye. Di dawîyê de keçikê jehrê dixwe, dimire. Çîroka Nozdehan de paqijî, helalî, dilovanî û cesareta jinan tê zimîn. Angorî çîrokê de mirovek hebûye, li bajarê Bîtîlisê dima. Navê wî Cergo, navê jina wî jî Guzel Xatûn bûye, rojekê jina wî bi mêvanî diçe gundê mala bavê xwe. Demek derbas dibe, Cergo xulamê xwe dişîne pey jina xwe wekî hilde bîne malê. Navê xulamê Kirêt bûye. Xulam di rê de nêta xwe xirab dike, dilê wî dikeve jina axê, pêşkarî jinikê dibe. Jinik dema firsendekê dibîne, tîne Kirêt dikuje, herdu milên wî jî jê dike, dibe nîşanî mêrê xwe û xelqê dide, paşê herkes pesnê Guzel Xatûnê dide.<sup>98</sup>

Li gor vê hizra tesewwufî -ku dişibe “seyrî suluke”- çawa ku Êsif bi reya “îffet” û “sebr”ê ve bûye sembol û wisa ghiştiye Xwedê, Zelîxa jî bi reya “hidayetê” ew seyra xwe temam kiriye û ghiştiye Xwedê.<sup>99</sup> Êsifê kurdan Zembîlfiroş li gor rê û rêbaza seyri sîlukê digihîje miraza xwe ku ev bi xwe bê qaîde ji hemû tehmên dinê dide paş xwe û lê dide derdikeve lê Xatûnê jiber bajarî û jiber desthilatdar e qet nakeve azmuneke wusa û dawiyê de nagihîje armanca xwe. Li vê derê diyar dibe ku evîna Xatûnê li hember ya Zelîxayê evînekê bê sûud û çarçoveya wê teng û puç e. Helbestvan vê yekê li gor azmûna her du lêhengan dixemilîn û diweşînin nav helbesta xwe. Yanî ew ghiştin û wuslet temamî li gor hizrên helbestvanan pêşveçûne. Çawa Êsif û Zelîxayê de “evîn” bi her awayî fekiyên xweşik didin lê li gor tevgerên Xatûnê encam bi dilê Xatûnê dawî nab e.

Destanên Kurdî de babeta ku bala me zêtir dikşîne li ser xwe, ev berheman wek serpehatîyên evîndarîyê yê romantik li ser sînorên mirin-kuştinê şax vedidin, bi van

<sup>98</sup> Alakom, **Di Folklorê Kurdî de Serdestiyeke Jinan**, r. 46.

<sup>99</sup> Selîmiyê Hîzanî, **Yûsuf û Zuleyxa**, Ayhan Gevêrî (wer), r. 84.



bûyerên rûsar, xemgîn û nedilşa ve xelas dibin. Evîn reh e. Evîn ruh e.<sup>100</sup> Beşên van berheman yên fînalê, encamê gelek dramatik in.

Li dijî mijara Zembîlfiroş bi taybetî dumêr(dilketî) dibine evîndarê keçekê, bi keçikê ve dibin sê kesan, ev pêwendîyên sêserî-sêber demek tê, êdî her diçin berbi xirabîyê dimeşin. Ji van hersê kesan re tu rêke xelasîyê namîne. Ji her du raqîbên mêrîn yek tu gavekê şunda navêje, hebûna yekî tunebûna yê mayîn bi xwe re tine. Carcar hem jin, hem jî dilketîyê yekemin di vî şerê sêserî-sêber de tîn kuştin an jî, ji qehra dijwarîyên mayîn can didin, dimrin. Raqîbê duwemîn çawa em dibînin, pêwîst nîne dilketîk be, carcar jî ew dê-bav, ap an jî hêzên mayîn in, ew jî nigê dilketîyê yekemîn û jinan dixine soleke teng, dijwarî û serêşîyên mezin peyda dikin, ji bo ku du dil nebin yek, gelek caran jî xwîn dirije an jî dilketîk ji ber êş-jana dilan dimire. Di destanên Kurdî de bêguman gelek strukturên mayîn jî hene. Lê belê struktura herî balkêş struktura dramên sêserî an jî sêber in.

Di dawîya destanên Kurdî de, evîna du dilan gelek caran dibe sergêjî û serêşîke mezin, ji bo çareserkirina van serêşîyan çawa em dibînin mêrxasên van destanan canê xwe didin, dibin gorî, di nav van gorîyan de hejmara jinan zêtir e. Ji ber ku ew di bin zordestîke mezin de ne, di navbera du avan de dibînin, nizanin çi bikin û dihelin diçin, mirinê wek rîyeke xelasîyê hildijbêrin. Di destana Şêx Ferx û Hatûn Astî de her çiqas motîfên pro-jinîn hebin jî, bi taybetî mirina Astîyê vê struktura pêwendîyên dilketîyan gelek vekirî nîşan dide, bi taybetî beşa dawîyê. Dema Ferx û Astî mezin dibin, dilê wan dikeve hev, çawa em ji destanê fêr dibin, ew gelek ji hev hez dikin. Dilê yekî bi navê Uso jî dikeve Astîyê, ew hertim li pey Astîyê ye. Du xûşkên Astîyê jî hebûne, navê wan Naz û Nazdar in. Rojekê ev hersê xûşk û Ferx bi tevayî diçin hewz, avjenî dikin, xwe rûttazî dikin dikevîne avê. Ji ber ku Ferx avjenî nizanibûye, ew li qiraxa hewz disekine, li wan mêze dike. Piştî demekê bavê Astîyê, ji keça xwe dipirse wekî ew dixwaze mêr bike an na, eger dixwaze, bi kê re? Keça wî her çiqas dibêje ez mêr nakim jî, paşê bav jê derdixe ku dilê wê di Ferx de heye, dibêje "evin ji xwedêye" û keça xwe dide Ferx. Ferx paşê diçe Bexdayê, demeke dirêj li wir dimîne, Astî ji derdê Ferx ker-gêj dibe. Rewşa bavê jî xirab dibe, ji ber neçariye mecbûr dimîne keça xwe Astîyê dide şivanê xwe, navê wî Şaxol bûye. Ferx bi alîkarîya qulingan bi Astîyê re deng dike, jê re naman dişîne. Ji

---

<sup>100</sup> Mehmet Uzun, **Bîra Qederê**, İstanbul, weş. Îlhakî, 2007, r.37.

derdê dilan, Astî nexwaş dikeve, piştî demekê jî dimire, wek destana Leyla û Mecnûn ew kincên Leylayê xwe dike û xwe reş girê dide. Paşê Ferx vedigere, berî ku bê cîhê mala bavê Astîyê, ew rastî şivanekî tê, ew şivan Şaxol bûye, şivanê ku Astî bêdil girtine danê. Paşê Ferx jî vî şivanî fêr dibe ku, Astîyê can daye, çûye dilovanîya Xwedê. Destan, bi vê xebera tirş û tahl ve xelas dibe, êdî em pê nizanin çi tê serê Ferx? Piştî mirina Leylayê çawa Mecnûn jî dimire, sedî-sed dinya Ferx jî sero-bino dibe. Kes Astîyê nakuje, ew bi xwe can dide. Lê belê dema mirov rewşa Astî di nav de maye, mêze dike, wê çaxê mirov dibîne ku ew nemirîye, derdê dilan ew kuştîye, ew hatîye kuştinê. Ji ber ku berî nexwaş bikeve, can bide, ew bi xwere şer dike, bi mercên dorberê xwe ve şer dike, ber xwe dide, êdî dora wê ewqas teng dibe, dinya wê tarî dibe, tu rêke xelasîyê namîne, nikare ji êşa dilan bifilite. Ji ber vê yekê jî mirov nikare bêje Astî mirîye, bi rastî Astî hatîye kuştinê. Bi vê perspektîfê, bi vê nêrînê ve mirov rewşa ku jin di nav de nin, çêtir û baştir fam dike.<sup>101</sup>

Ji aliyê din gelek caran jin û mêr serî li hevdu didin û astengiyan ji ber xwe radikin. Ev yekîtî, destbirakî û dostayetî, çawa em dibinin wusan xurt e, ku di dawîyê de, zora wî dê wê herî xurt, Canpolat jî dibe, heft derîyê wî yên pola jî êdî kêrî tiştekî nayên, wek mêrê rojên teng Mîrze Memûd çawa wê keçika bedew Çilkezîyê ji destê Canpolat xilas dike, Çilkezîyê digihîne mirazê wê, em dibînin ku dawîya her çîrokekê de mizgînîya şahîyê bi lez diçe digihêje dê-bavan, mirov dikare bêje ku dawîya her çîrokekê de dîlanek heye.<sup>102</sup> Motîfa Mîrze Memûd di çîrokên Kurdî de wek xelaskarê jinên bindest yê herî bi nav û deng dikare bê hesibîn. Di çîroka Usifê Tenbûrvan de piştî gelek teqereqan Gulbarîn ji destê Canpolat tê xelas kirin, her çiqas Canpolat bi lêdanan nayê kuştin, di dawîyê da ruhê wî jê tê standin, paşê ew bêcan dimîne, dimire, Gulbarîn para Usivê Tenbûrvan dikeve<sup>103</sup> çîrokê de Gulbarîn alikariya Usivê Tenbûrvan dike û bi vî awayî Canpolat têk diçe. Di çîrokeke mayîn de vê carê keçeke mayîn tê xelas kirin, navê wê Bilbilhezar bûye<sup>104</sup> Wek van keçên bedew wek Çilkezî, Gulbarîn, Bilbilhezar... gelek keçên mayîn ji ber destê dêwan, hûtan difilitin, digihêjin bext û mirazê xwe. Bi kûrtahî mirov dikare bêje ku pirsax xelasî û azadîya jinan, kakilê pîranîya çîrokên ku li ser babeta zewac û evînê hatine gotin, pêk tîne.

<sup>101</sup> Alakom, **Di Folklorê Kurdî de Serdestiyêke Jinan**, r.71.

<sup>102</sup> Cindî, **Hikayetên Civata Kurdan I**, r.17-42.

<sup>103</sup> Stig Wikander, **Recueil de textes Kourmandji**, Sweden, Upsala University, 1959, r. 24-32.

<sup>104</sup> h. b. r. 35-38.

Civat di nav gelek salan de hatîye li ser wê bawerîyê ku ji alîkî de zewac, ji alîkî de yartî bi hev re nameşin, hebûna her pêwendîkê, tunebûna pêwendîya din bi xwe re tîne, civatê gotina xwe awa kurt birîye:

Kî hêvîya yarê ma, bêjin ma.

Jin, mêr ne fînoyê sor in, herro sere yekî bin.

Di nav van kesên ku terkeserî dinê dibin wekî keçekê ji xwe re bibînin, bi wê re bizewicin, gelek kesên şivan, gavan, kesên belengaz û xizan hene. Piranîya wan hewl didin, bi keca padîşah û paşan re bizewicin. Ji ber van bêgavî û neçarîyan, di nav çîrokên Kurdî de çîrokên ku li ser padîşah, paşan û hakimî cîhekî fireh digrin. Çima padîşah, paşa û hâkim? Bi van keçên bav-dewlemend re zewac, wek rêke xelasîyê hatîye dîtin, ew dixwazin ji wê belengazîya ku ew di nav de nin, zûtirê xelas bibin, bibin zavê kesên dewlemend, piştî xwe xurt bikin. Car caran jî keça paşa ji ber ku li ber bar û karê kasrê aciz e û ji xwesta ji dûrbûna siyasetê xilasbûn vê yekê dike. Keçên bedew li hember evînek bêhampa dihelin û xwe diberdin. Direvin terkê dinê dikin. Ev kesên belengaz li hemberî vê tevgerê evîneke ber bi mirinê ve keçe direvine çav tarî dike. Her çiqas ev karekî dijwar û çetin be jî, dîsa jî ew diçin an jî kesên mayîn dişînin xwazgîniyê keçên padîşahan.

Ji der keç û kurê padîşah vê carê padîşah bi xwe jî dixwaze bizewice. Carcar jî, çav ber dide jinên xelkê, dixwaze bi jinên mayîn re serê xwe bike yek. Her çiqas ew padîşah be jî, çawa em di çend çîrokan de jî dibînin, karê peyda kirina yarekê ewqas hêsan nîne. Gelek caran ew ji wezîrê xwe alîkarîyê dibîne, wezîr dişîne li bal jinan. Di dawîya van çîrokan de çawa em dibînin, ji ber femdarî, hiş û dûr dîtinîya jinan, ev padîşah bi hêsanî nagihêjin daxwazên xwe, lingê xwe dikin soleke teng û destê xwe dikin qûla mar. Di çîroka Jina Wezîr Ya Aqil de jî padîşah nagihêje daxwaza xwe. Dema padîşah mêze dike, wezîr ne mal e, diçe mala wî, çend gilîyan berjinikê re davêje, jinik nêta wî fem dike, jinik çend hêkan bi rengên cuda boyax dike, datîne pêş padîşah. Paşê jî padîşah dipirse wekî tî'ma kîjan hêkê zêde ye, dema padîşah dibêje tama hemûyan wek hev e, wê çaxê jinik nêta padîşah dide rûyê wî, dibêje jin jî hemû wek hev in, bi sergirtî dibêje ku, dest ji min berde, jin wek van hêkan hemû yek in.<sup>105</sup> Çirokek din de jî ya bi navê ê Jin û Padşa de, dile padîşahêkî dikeve jineke mêrkirî. Mêrê jinikê

---

<sup>105</sup> Ordixanê Celîl û Celîlê Celîl, **Zargotina Kurda**, r.229-231.

ji mal dur leşkerîya xwe dike. Padîşah dixwaze bi fend-fêlan ve hem jinê, hem jî mêrê wê bixapîne. Lê dema mêze dike ku jinik nayê rayê, naxwaze bi wî re razê, di dawîyê de hem jinikê, hem jî mêrê wê dikuje. Ew helalîya ku di navbera jin-mêr de heye, dibe kakilê naveroka gelek çîrokan. Ji ber vê bersîva jinikê, êdî ji destê padîşah tiştêk nayê, padîşah bi poşmanî paştaya vedigere, diçe qonaxa xwe. Di hemû van çîrokên vî tehrî de jî çawa tê xuyan, mal milk, dewlemendî, pere-pûl ewqas ne giring in, pêwendîyên mirovî, helalî, rastî û pakî timê di van çîrokan de serdikevin.

Di nav çîrokên Kurdî de em rastî jinên xirab jî tên ku bi xirabîya xwe ve hatine nasîn, wek damarî, xasî, hêwî, jintî, dayîkên bêbav û dilbikevir. Ji van jinan gelek di dawîya çîrokan de cezayê xwe dibînin û tên kuştin. Di çîroka Gulançikzêrîn de, dile padîşahêkî dikeve sê keçikên malekê, hersêyan jî, ji xwe re tîne. Padîşah ji ber bersîvên keça piçûk, zêtir ev keçikê hez kirîye. Lê belê herdu keçên mezin dest pê kirine dexesîya keça piçûk kirine. Demek derbas dibe, şerek derdikeve padîşah diçe şer, wê demê jî jina piçûk ducan bûye, ber hemlebûnê bûye. Piştî çend mehan, dema keça piçûk diwelide, herdu xûşkên mezin gazî pîrikeke bêîman dikin wekî bê alîkarîya keça piçûk bike. Dema keçik diwelide, ev pîrik li şuna zarokan, du cewrikên (tule, kudik) sa tîne nîşanî keçikê dide, zarokan jî dike sandoqekê dibin davêjine nav behrê. Dema padîşah tê, qala vê yekê dikin, padîşah dibêje li ber malê safêrekê çê bikin, jinikê û herdu cewrikên wê li wir girêdin. Sal derbas dibin, ew herdu zarokên padîşah yên ku avêtibûn behrê (Huseyîn û Gulîzer) ji mirinê xelas dibin, dema ev zarok rojekê qala serpêhayîya xwe dikin, paşê padîşah fêm dike ku ev zarokên wî yên jina piçûk in, herdu jinên wî yên mezin lîstikekê anîne serê jina piçûk. Paşa tîne van herdu jinên mezin ceza dike, jina piçûk jî azad dike.<sup>106</sup>

Di van çîrokan de diyar e ku her tim serpêhatiyên evînî ne li gor rê û rêbazên adet û usûlan e. Gelek caran dilketî rêyek nebaş de dimeşe ku heta bigihîje evîndara xwe. Lê belê ev car car bi astengiyên olî car car jî bi rêya civatê ve tê puçkirin. Mijara Zembîlfiroşî ev yek bi her awayî ne li gor rê û rêbazan tê rêvebirin. Lê belê li gor hin varyantên vê çîrokê de em dikarin bêjin evina Xatunê ne tenê şehvetî demeke bihurbar û puç e. Lê belê di her du varyantên çîrokê yê FT û MB Xatunê nagihîje evîndarê xwe û çîrok bi vî awayî dikede.

---

<sup>106</sup> h. b. r. 114-130.

### 2.2.1.2. Ji Aliyê “Namus” ê ve Mijara Zembîlfiros

Di nava kurdan de têgehên jinê û namûsê her bi hev re nîqaş dibin. Mirov dikare bibêje ku “namûs” bûye pîvana civakê. Bi demê re li ser vê têgehê çandek ava bûye. Di çanda devkî de li ser namûsê, bi dehan çîrok, kilam, biwêj û gotinên pêşîyan hatine gotin. Hemû karên “ne li rê” wekî “bênamûsî” hatine pejirandin. Hemû tevgerên “baş” wekî karên “binamûs” hatine pejirandin. Çîroka vê yekê digihêje hezar salan. Piştî heyama desthilatiya zilaman jin êdî qedrê xwe yê berê wenda dikan. Dikevin bin bandora zilaman. Di Rojhilata Navîn de jin bûye namûsa mêran. Tu kes nikare bi çavekî “nebaş” li jinê binere.<sup>107</sup>

Xatûnê jin e û bi jimbûna xwe ji hikayetên din ciyek cuda digire ev jî rastî “jin” buna wê ye. Ev bi xwe dixwaze reya xwe bi şehveta xwe ve biguherîne. Ji ber vê xalê form diguhere û mijar ser û bin dibe. Zuleyxeya duyemîn e Xatûnê, lê belê bêûud û bêhêvi serencam dawî dibe ev yek jî kemasiya wê bixwe ye. Em dikarin bêjin evîna wê li gor Zelîxayê evînek kême e û em dikarin bêjin bi tenê bi şehwetê ve tekildar e lê belê ev yek ji durî rastiyê qadek din derdixê peşîya me ev yek jî li gor destxetên di destê me de serencame çîrokê bi xwe ye. Gelo Xatûnê bi mêr bû an na, kemasiya mîr û bedewiya Zembîlfiros. Li vê derê di nav civatê de cihê malbatê û cihê jinê hewceyî nitirantînê ye. Çawa tê zanîn civatek, wek komên piçûk ji gelek malbatan pêk tê. Dema mirov hemû van malbatan berhev dike û digihîne hev, wê çaxê civatek saz dibe. Gelo ji bo selamet û pêşeroja her malbatekê, erk (wazîfe) û berpirsiyariya mezin kî hildide li ser milên xwe? Bersîva vê pirsê, mirov bi alîkarîya gotineke pêşîya ve dikare bide: avaya malê destê jinan e. Ev gotin him erkekê, him jî berpirsiyarîkê dispêre jinan. Jin hem ji bo parastina zarokan, hem ji bo birêve birina karên hundirê malê, wek paqijî, a- madekirina xwarinê û hem jî di efrandina berhem û mehsûlekê de timê aktif e. Gotineke mayîn dîsa dibêje: avahîya malê kebanî ye. Gotineke nêzîkî vê gotinê jî awa ye: jin dike malavayî. Dema mirov van gotinên pêşîyan baş, hûrû kûr analiz dike, bi hêsanî dibîne ku jin ne tenê avakarê malê ye, wusan jî îdara malê dike, malê diparêze: jin gol e, mêr çem e. Gotineke nêzîkî vê gotinê jî awa ye: mêr kanî be jin liç e, ango jin berev dike, depo dike û wek bankekê, roleke nîv-aborî jî dilîze. Peyva liç bona golên piçûk û berevbûna avê tê

<sup>107</sup> Tekin Çiftçi, “Di Kilamên Evînî Yên Dengbêjan De Temaya Jinê”, *Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê* tez. Mêrdîn 2012, r.61.

bi kar anîn. Ev herdu gotin jî berpirsiyarîke mezin dispêrine jinan, kebanîya malê dibe şênahîya malê: mal têr e, kebanî şêre.<sup>108</sup>

Rûmeta ku civata Kurd ewqas daye jinan, nedaye tiştêkî mayîn. Civatê jin wek nîşana namûsê ya herî mezin hesabandîye, peyva jin gelek caran cîhê namusê de tê bikar anîn, peyvên namûs û jin ketine zikê hev, wek gotineke pêşîya dibêje: mêrê Kurmanc boy namusê kevçî av de dixeniqîne. Dîsa gotineke mayîn giringîya namusê tîne zimên: namûs û xîret ne bi peran e. Mêr timê namusa jinên xwe li ser her tiştî re digirin, ji bo namusa xwe dikarin canê xwe jî bidin. Jin û namusa wê pirseke hebûn-tunebûna mêran e, gotineke pêşîya vê yekê gelek vekirî eşkere dike: namusa jinê, çeka mêr e. Namûsa jinê dibe namusa mêran jî: namûsa mêr jin xweyî dike.

Rûmeta jinan û jinên bi îffet her tim di dav cîvatê xwedî cîyekî bilindin. Bi kêmanî gotinên pêşîya û folklorê Kurdî tu cudatîk wek mirov nexistîye navbera jin û mêran, herdu cins jî wek mirov hesabandîye. Jin, di folklorê Kurdî de ru wext piçûk nehatine dîtin, rûmeta wan nimz nebûye. Her çiqas di jîyana rojane de jin carcar piçûk tînin dîtin, tînin zêrandin, pêpes kirin, hincirandin û ji aliyê mêran de zordestîke mezin dibînin jî, di jîyana folklorîk de em nikarin rastî dinyake wusan tarî û van ezîyetan bîn, xeletî ne xeletîya folklorê ye, ev rewşa xirab bi gelek faktorên mayîn ve gireda yî ye. Dema em çend gotinên pêşîya berçav dikin, em dibînin ku civatê de jinên bi îffet li ser her tiştî ne. “Jin dîwarê hundir e, mêr dîwarê derva ye.” Dema Cenabê PexêMBER qîza xwe Hz.Fatîma bi Îmamê Elî re dizewicîne ev yek dîsa dertê pêş. Hz.PexêMBER ji Îmamê Elî re “karên derve li ser mile te yê hundir jî yê kîza min Fatîma re ye. Ev yek jî dide xuya kirin di nav ciavatê bar bûye di par kar jî bi heman şiklî din av jin û mêran de par bû ye.

Gotina şêr, şêr e, çi jin çi mêr e, çawa em di gelek çavkanîyan de rastî wê tînin, êdî bûye nîşana wekhevîya jin û mêran, dema gilî tê serjînan, bêguman cara pêşîn ev gotina tê bîra mirovan, di nav Kurdan de gelek belav bûye, gotineke herî populer e. Ev peyvên zêrîn, bawerî û dîtinên civatê yê li ser rewşa jinan gelek bi vekirî dîyar dikin. Hemû ev gotinan nayê wê manê ku bi rûçik û karakterên xwe ve jin û mêr yek in. Civatê ev cudatîya jin-mêran jî tespît kirîye û çend sînor jî kişandine: jin jin gotî, mêr mêr gotî. Di zîmanê Kurdî de peyva serjînik, hinekî jî nezalalîya van sînoran nîşan dide,

---

<sup>108</sup> Alakom, **Di Folklorê Kurdî de Serdestîyê Jinan**, r.46.

ev peyva ji bo mêrê ku zêde serê xwe dixê karê jinan tê bi karanîn. Ji alîyê din, civatê wekhevîya jin-mêran bi zimanekî din, awa nişan daye:

Jin heye ji mêran zêde ye.

Kulfet heye ji sed mêrî zêde ye.

Jina baş ji hezar mêrê xirab çêtir e.

Ji kurê bêxîret, qîzeke kor paktir e.

Qîz hene heft kura nadin.

Qîza filan kesê xûna mêrekîye.<sup>109</sup>

Gotinên pêşîya wek neynika felsefeya jîyîna gelê Kurd gelek zaniyarî û agahdarîyên giranbiha pêşkêşî me dikin. Bi taybetî di warê pêwendîyên civakî û mirovî de, ev gotinên kurt, têr-tijî û mîna kûr, me ronî dikin û şîreta li me dikin. Kurdan bi kîjan felsefaya jîyînê ve li dorberê xwe, li cîhanê nihêrîne? Başî-nebaşî, pakî-nepakî û rastî-nerastî bi çi awayî ji hevhatine cuda kirin? Wek van pirsan mirov bersîvên gelek pirsên mayîn jî bi alîkarîya gotinên pêşîya, bi awakî gelek kurt dikare bide. Civatê bi xwe qiyametê gotinên pêşîya daye: gilîyê pêşîya, kevîrê xanîya.

Di nav gotinên pêşîya yê Kurdî de, beşeke wan çawa em dibînin li dora tema jinan berev û lod dibin, bi sedan gotinên li ser jinan di zimanê Kurdî de hene. Ev loda gotinên pêşîya derbareyî rewşa jinan de, gelek agahdarîyên sosyolojîk pêşkêşî me dikin. Bi saya van gotinên pêşîya mirov xwe bi hêsanî dirêjî serborîya civata Kurd jî dike, pêwendîyên jin-mêran, rewşa malê, malbat û jinê çêtir analîz bike. Bi vî tehrî, em van berhemên folklorîk ji xwe re dikarin bikin pêlekên û li ser rewşa jinên Kurd bighijin çend encam û nêrînên sosyolojîk-etnografîk. Dîsa bi saya van gotinan em dikarin xwe wek civat baştir binasin û bidin nasandin. Ew wek neynikekê ne, bi her alîyan ve dikarin civata Kurdî bînin li ber çavan. Bêguman her gotineke pêşî ya yekten ji deve yekî/yekê ji nişkave derneketîye.

Her gotineke pêşîya, serpehatî û çîrokeke wê heye, di dawîya bûyerek giring de peyda bûne. Pêwîstî û hewcedarîkê ew efirandine. Dema em tecrûbe û ceribandînen mirovan yê sedsale jî, li ser van etaban de zêde bikin, wê çaxê mirov dibine ku her

---

<sup>109</sup> h. b. r.50.

gotineke pêşîya li ser bingehên ked û zehmetekî aqilmendîyê peyda bûye, forma xwe ya dawî wergirtîye. Her gotineke pêşîya li ser jinan, raste-rast rewşa jinan tîne zimîn. Beşek ji wan jî, rewşa jinan dane ber çavan, lê belê li ser tiştên mayîn hatine gotin û wan tînin ziman. Ji ber ku li ser tema jinan şax vedane û jin jî xwe re kirine bingeh, ev beşa duyemîn ya gotinên pêşîya dîsa jî bala mirovan vedigerînin li ser rewşa jinan, wek mîsal dema mirov dibêje qîz mêvanê malêye, mirov dixwaze bêje keçek nikare heta mirinê di malê de bimîne, ji alîyê din jî ji bo tiştên derbasok jî mirov dikare vê gotina pêşîya bi kar bîne. Dema mirov tenê vê mana duyemîn bide ber çavan, kok û binyata peydabûna vê gotinê mirov nikare (wek rewşa keçan) bavêje alîkî.

Ev kok û binyatên çend gotinên pêşîya jî, ji bo ronîkirina vê analîza me ya li ser jinan gelek rênîşandar û kêrhatî bûne. Ji alîyê din, ji der gotinên pêşîya, ji bo xurtkirina çend nêrîn û bawerîyên xwe, me ji ferhenga hevbêjeyên (tabîr) Kurdî jî gelek îstîfade kirin.

Di nav hevbêjeyên Kurdî de, gelek hevbêjeyên derbareyî jinan de hene, wek gotinên pêşîya rê nîşanî me didin. Hejmara gotinên pêşîya yên Kurdî bi sedan in, ji van hin mînak evin: “Ew pîreke zemanî ye, gelek gilî bin wê de hene, Bira meriv here ser sêwîya neçe ser hêwîya, Jin çîqa rind be, dîsa mêrî tol e, Gula sûretê jinan, mêr e, 'Jin dinê de tu tiştî dizîva cem xwe xweyî nake, xen jî dilketîyê xwe. , Her kezî sorek, simbêl sorek li ber heye. Her kezî zerek, simbêl sorek li hember e. Heta dilê dê nekevê, qîzê nadê. Heta xanim xemilî, defû dewat kemilî. Jin bedewîya emir e. Jin çav li der e, mêr xalî li ser e. Jin dara şkestîye. Jin dîwarê hundur e, mêr dîwarê dervan e. Jin dibe bira bextê min hebe, bira çavekî min tune be. Jin dikare jina rê dagerîne, mêr nikare jina rê dagerîne. Jin dikare mêra mîna destmala ser destê xwe bigerîne. Jin dike malavayî. 'Jin dimire, mêr ser birî dibe. Jin gol e, mêr çem e. Jin ew e, zarê xwe xweyî ke. Jin hene, beranberî sed mêrî ne. Jin heye gula mêrê xwe ye, jin heye kula mêrê xwe ye. Jin heye, ji mêran zêde ye. Jin heye bira ye, jin heye bira bir e. Jin heye, zevîya bergunde. Jin jî hene jan jî hene, merhema dila jî hene. Jin jî heye jinkok jî heye. Jin jin gotî, mêr mêr gotî. Jin kelimêra ye. Jin kanîya jîyînê ye. Jin kela ye, mêr girtî. Jin ku heyenola marê nivkuştîye. Jin ku hez bike dikare kevir qûl bike. Jin stûna malê ye. Jin şûrê piştê mêrê xwe ye. 'Jin û mêr, tevr û bêr. Jina baş bêmene, birê mêrê xweye. Jin tenê xwe şerm dike, kesekî şerm nake. Jina baş ji hezar mêrên xirab çêtir e, Jina baş bi sebir e., Jina bedew bela serîyane. Jina bêxwedî har dibe, mêrê bêxwedî jar dibe. Jina bêxweyî



şerm nake. Jina bê zar dilê wê naşewite malê. Jina bî nakeve tu mala, Jina bî mîna meha Adarê ye, geh digrî, geh dikene. Jina bî dest berrûye. Jina çê meriva dike wezîr jina xirab meriva dike rezîl. Jina du dotan, dide xwe du lotan, ne li vir ne jî li Cizîra Botan. Jina kê baş e, mala wan timê dawet e. Jina kudkudo nekeve destê dijminê min. Jina kotî mêrê baş kotî dike. Jina baş mêrê kotî baş dike. Jina nedelal çavê mirovan diêşîne jina delal dilê mirovan diêjîne. Jina xirab, ne tê kuştin, ne jî tê berdan. Jina şermîn bi milletekî, mêrê şermîn bi kirasekî. Jina qenc seyd e, ya xirab qeyd e. Jina te kîderê, tu jî ji wê derê. Jina xirab bênamûsîya komê ye. Jina wî jin e, loma mala wî rengîn e. Jina zû radizê, mêrê xwe zû kal dike. Jinê bira meriva dikin şîva gura. Jinê bira nola gura. Jinê dil kir dîwar qûl kir. Jinê dil kir mêrê xwe sil kir. Jinê go: Bira ez jina mêrê çê bûma, bira ez rojekê rûyê dinê bûma. Jintîya hevra kire bilebil, bira hevra bûne derd û kul. Kebanî time bêpar in. Keç hefsar nabe. Keça mîran bi qelendê gavanan nayê. Keçik wek sêva darê ye, herkes kevira davêjê kî bêxe wî re ye. Keçik zîyaret e. Kî hêvîya yarê maye, bêjin maye. Kulfet diçe xûn, xûnê safî dibe. Kulfet şurê du dev e li piştê mêr. Kulfet ku heye parsûyê xar e. Kulfet neynika malê ye. Kulfet heye sed mêrîzê dey e. Kulfet heye cehdik e genim, kulfet heye genim dike ceh. Kulfeta bêesil pêşa xwe davê li serserê xwe. Kulfeta bî durû ye. Kulfeta çêbe, mêr jî perê çêdibe. Kulfeta destdirêj timê, rûreş e. Kur darê bavê hiltîne, qîz teşîya dayê hiltîne. Kulfeta dizî kir, wê bê berdanê. Kulfeta eslê wê cî, tîbean birçî, bikujî cî kî de naçî Kulfeta xirab mêran serberjêr dike. Kur li bavan diçin, qîz li dîyan diçin. Kurd ji gişka zeftir jina xwe, hespa xwe û çeka xwe hez dike. Li jina xwe hêcetê dibêjît: Tu çima qûna xwe li ber bêjingêra dihejînî. Mal têr e, kebanî şêr e. Mala bêjin mîna aşê xirabeye. Mala mêrêjinê wekî xezne bejî, dîsa çavê wê mala bavê ye. Mala ku jin nexwaş e, dere xwe kilît e. Malê de tune arvanok, navê jinê dînanok. Memik ê qîza zeynet in, kelaxê pîrê robet in. Mêrê Kurmanc gava têrxarya mirovan dikuje, ya jinekê direvîne. Merfîkî xirab e, ewî çiçikê dîya xwe gestîye. Meriv ser xîret û namûsa xwe dimire. Mêr jî hemû neyek in jin jî hemû neyekin. Mêr-jin hevrarik, xirab dibe ew malik. Mêrkanî bejin liç e. Mêra xwe avîtin kewara jin şandin hewara. Mêrê baş jina wîxurt e. Mêrê dujina durûye. Mêrê Kurmanc boy namûsê kevçî av de dixeniqe. Mêrî dujinik hêsîr e. Mêrik li jina xwe menîyan bû, digot gava hevîrdi qûna xwe dihejînî. Mirikê xirab, çiçikê dîya xwe gezîye. Mêrkin jî heye, mêmîrin jî heye. Namûsa jinê çeka mêr e. Namûsa mêmîrin xweyî dike. Ne jina belaş, ne xulamê be meaş, ne erdê kaş. Nejina kenokî, ne mêrê

şermokî. Parsûya jinê xar e, loma îtîbara wê tune. Pîr bi ganekî nabe qehbik. Pîrê bawer ne dikir mêrke, ku mêr kir dewa heftek û heştekan Mr. Qîz ewledê xelqê ye. Qîz çira xelqê ye. Qîz hene heft kura nadin. Qiz ku heye dara rez e, hatî-çûyî kewtîyê xwe davêjê. Qîz mêvanê malêye. Qîz zebeşê gîhiştîye. Qîza bêqelend ziman dirêje. Qîza filan kesê xûna mêrekîye. Qîzek nazand-gundek bezand. Qîzê kê hene, ew padşa ne. Qîztî çiqayî xweş e, bûktî gula geş e, wexta dikeve ber darê dergûşê, per û baskê wê diweşe. Reva jinê edetê dinê. Rewşê jinan kofîye. Rewşê qîza kezîn e. Ro çû dîza, bû fitara qîza. Şêr şêr e, çi jin çi mêr e. Şerê kûçikan li ser dêlan in. Şêwra jina bêrîya bizina. Usa mila hîm e, mîna qîza kezî. Xew nema li piçûka, fedî nema li bûkan. Yekî jina xwe berda bû, digot werê bibe yara min. Yê jinê berde li panîyê nanêre. Zar ya dê ye, ne ya bavê ye. Zarok ji bavê de êtîm namînînin ji dê de êtîm dimînînin. Zaru li ser milê dê mezin dibe. Zilam hertim dixwaze, lê herim nikare. Pîrek herim dikare, lê hertim naxwaze.<sup>110</sup>

Li her heremê angorî zarav û devokan şax û guhartokên wan jî hene. Hemberî hevkin, danber hevîna wan bêguman gelek balkêş û kêrhatî ye, xebateke wusan dikare gelek zaniyarî û ahahdarîyan derxe holê. Lê belê ev yeka xebateke bi serê xwe ye.

Ji nav gotinên pêşîya yê Kurdî de dema mirov motîfen zîhnîyetên jinparêz (pro-jin) hildiçîne, gotina ku bala mirov zêtir dikşîne li ser xwe, bêguman gotina jin kanîya jîyînê ye. Gelo civata Kurd çawa xwe gîhandîye vê bawerîyê? Ji bo peydabûna nîfşên nûh û berdewambûna mirovatîyê, bi anîna zarokan ve jin wek faktorekî produktîf, adan û fêdîkar hatîye hesabîn. Bi anîna zarokan, jin bûne nîşana bereketê, wan tam lezeteke nûh daye jîyanê. Wan mirovatî ji wundabûnê xelas kirine, anîne vê rojê. Dema mirov malbatên Kurdî yê pirzarok dide li ber çavan, ew hezkirina zarokan, wek evîn şiqitiye li ser jinan. Ev jinên pir zarok, ji alîyê civatê de awa hatina nasandin: maka nodik nod canûyî. Bi vî tehrî jinan, angorî civatê xemlek daye jîyanê, jîyan neqîşandîye. Ev hurmeta li dor jinan berev û tîr dibe, di gotineke din de dighêje dereceke bilind: jin bedewîya emir e. Bêguman ev gotinên zêrîn, cîhê jinan di civata Kurdî de bi şemal û bi tîrejeke gelek tûj ve ronî dikin, serbilindî û rûmeta jinan zêtir dibiriqînînin, nîşan didin. Anîna zarokan ji alîyê jinan de pêşkêşeke herî mezin hatîye hesabîn, zarok parçek ji canê xwe hesab kirine. Vê yekê hîsên merhemat, dilşewatî, destvekirîyê, parastin û

<sup>110</sup> Rohat Alakom, *Di Folklorê Kurdî de Serdestiyeke Jinan*, weş. Nûdem, Stockholm/ Swed, 1994, r. 65.

dilovanîyê li bal jinan zêtir kirîye. Vê realîtê, jin bi malê ve girê daye: jina bêzar dilê wê naşewite malê. Heta mirinê jî, pey zarokên xwe dikevin. Bi kurtî, wek gotineke mayîn dibêje: jin sebire.

Di civata Kurdî ya îroyîn de carcar dibe mirov rastî rêç û şopa van peyvên delal neyê, jîyîn dikare mirova dilsar û rûsar bike, lê belê tev van gotinên pêşîya, folklor tenê şîreta me dike, rîyên cîhaneke dilşa û şaneşîn nîşanî me dike, wek bîr-bawerî dimîne: berê textê ya jinan bûye. Ev gotina pêşîya ji alîkî de xirabîyên civata îro, kêmasîyên navbera jin-mêran rexne (krîtîk) dike, ji alîkî de pirên duh-îro-sibê bi tehrekî folklorîk ava û xurt dike. Ji alîyê din ev gotina pêşîya derbareyî lêkolîna bingehên malbatên maderşahî (jinhakim/dayîkhakim) de jî, derîkê li pêşîya me vedike, ji me re dibe alîkar.

Kurd zêtir çi hez dikin? Bersîva vê pirsê di nav romantîkiya Kurdan de veşartîye: Kurd ji gişka zeftir jina xwe, hespa xwe û çeka xwe hezdike. Gotine kemayîn vê gotina pêşîn hin jî zelaltir dike: mêrê Kurmanc gava têr xwar ya mirovan dikuje, ya jinekê direvîne. Hemû ev gotinan, beşekî folklorê jî pêk bînin, dîsa jî wek xemlên jinparêz, derbareyî "sîyarên rojhilatê" de me gelekî ronî dikin, çend materîyalên folklorîk pêşkêşî me dikin. Dema mirov dixwaze bighêje serfirazîkê û bibe xudane cesaretekî mezin, civatê çend motîvên alegorîk ji rewşa jinê û bedewîya jinê hilçandîye, daye ber çavan. Ev gotinên pêşîya jî nîşan didin wekî civatê rûmeteke çawa bedew daye jinan, çima jin wek pîvan ji xwe re hilbijartîye.

Bi xwazîya, dest nagihêje baqê kezîyan.

Dilê tirsonek sîngê gewr nabîne.

Dem a mirov hemû van gotinên pesndar yê ku derbareyî jinan de hatine gotin an jî rewşa jinan dane ber çav, ji xwe re xistine kok, lê belê babetên mayîn tînin zimîn, berev dike, mirov dibîne ku, jinan di nav folklor a Kurdî de ji xwe re textek ava kirine, bi serbilindî dijîn û timê dilşa ne, rû bi ken in.

Di çîroka Jina Wezîr Ya Aqil de û Jin û Padşa de jî me anî zimên ku jin û keçên zane, femdar, xebathez, qenc, helal û rastgo tînin me. Ew timê di van çîrokên de tînin pesinandin, di gelek rojên teng û dijwar de dibin kilîta serê mêrên xwe, rîyên qencîyê û xêrê datînin li ber mêran. Mêrên tiral, bêkêr, mêrên ku timê di mal de rûdinên û kar nakin, çawa em dibînin ji alîyê jinên xwe de tînin rexne kirin. Ev mêrên tiral carcar dibin

babetên pêkenokan. Di dawîyê de jinên van kesên tiral, mêrên xwe davêjin ber dêrî, ew terkeseî dinê dibin, diçin tevî nav bûyer, teqereq û gelek qewmandinan dibin.

Di çîroka Qîza Serwext de, serpêhatîya keçeke zane û famdar heye. Piştî gelek çetnayan ew dibe padîşah, teyrê dewletê tê serê wê rûdinê<sup>111</sup> Teyrê dewletê, bêguman ji ber serwextîya vê keçikê tê serê wê rûdinê, wek xelatekê mirov dikare bihesibîne. Bi gotineke mayîn bi vê motîfa teyrê dewletê, civat vê keçikê pîroz dike. Di çîroka Bûka Aqîl de vê carê bûkeke jîr bi jinbûna xwe ve dertê pêş, bûk tîne yek-yek gazî bîst kesan dike, sêvekê dixê berîka wan, her yekî re jî dibêje "ez te hez dikim". Piştî ev hemû bîst kes diçin ji vê bûkê re paletîyê dikin, ew dibêje "de bixebitin, ez heyrana xortê sêv cêbê de". Ji ber ku sêv cêba herkesî de hebûye, hemû bi xîreke mezin ve kar dikin, kar zûtirê diqedînin<sup>112</sup>

Civatê herçiqas cîhekî bi rûmet daye jinan jî, di navbera jina baş û nebaş de sînorek jî danîye. Bi vî tehrî hertim jina baş rûsipî kirîye jina nebaş jî rû reş kirîye. Civatê hemû jin nexistine takî terazîyê, ji vê xeletî û şaşîyê xwe parastîye, dûr maye. Ev herdu gotinên pêşîya derbareyî vê yekê de me gelekî ronî dikin: Jin jî heye, jin kok jî heye. Jin ser jinê re heye. Berî ku civat bala mirovan bikşîne li ser jinên nebaş, zêtir rewşa jina baş raxistîye ber çavan û motîva jina baş efirandîye, dibe ku di dan kurdan de jina nebaş ne li gor adet û kevneşopiya kurdan be, bi vî tehrî civatê xwestîye, bingeh û hîmên her malbatekê xweş bîn avîtin, sibê-dusibê, di pêşerojê de ji cîhê xwe nelivin, neliqin. Çend gotinên pêşîya bi taybetî li ser jinên baş hatine efirandin:

Jina baş bêmene birê mêrê xwe ye.

Jina baş namûsa mêrê xwe ye.

Jina baş dûrva kiviş e.

Jina baş sebir e.

Wek keça padîşah, wusan jî çawa em di çend çîrokên Kurdî de dibînin, kurê padîşah yê piçûk timê di rêke qenc de dimeşe, mêrxas e, fedakâr, rastgo û camêr e. Di çend çîrokên Kurdî de wek gelek caran tê dubare kirin, bi taybetî sê kurê padîşah hene, navê yê piçûk gelek caran Mîrze Memûd an jî Mîrze Mihemed e. Ji ber ku ew timê di

<sup>111</sup> Alakom, **Di Folklorê Kurdî de Serdestiyeke Jinan**, r. 17.

<sup>112</sup> Ordixanê Celîl û Celîlê Celîl, **Zargotina Kurdan**, r.205.

rêke rast de dimeşin, bi qencî, bi mêrxasîya xwe ve tên nasîn, peyva "mîrze" jî, wusan tê bawer kirin ku ji alîyê civatê de bi zanetî li ser navên wan kesan de hatîye zêdekirin. Di nav çîrokên Kurdî de gelek çîrokên li ser Mîrze Memûd û Mîrze Mihemed hatine gotin, hene. Ev herdû kes wek du mêrxasên çîrokîyên here navdartên bi nas kirin, ew xelaskarên jinên bindest in. Mîrze Memûd di gelek çîrokan de terkeseî dinê dibe, diçe dikeve nav gelek şer-dewên mezin, ji xwe re keçeke bedew peyda dike, tîne. Ji ber ku mêrxas, camêr e, gelek keçiktimê li ser wî bengî dimînin. Dema ew bi keçeke mayîn re mecbur bimîne, razê, ew şûrê xwe datîne navbera xwe û wê. Ev yeka jî, helalî, paqijî û dilovanîya Mîrze Memûd nîşan dide, ev şûr dibe nîşana helalîyê.

Civatê timê bawerîya xwe bi jina çê û baş anîye, cesaret daye wan, şahsîyeta wan xurt kirîye û pêşta birîye: Bira jina çê be, bira nav ordîya esker be. Keça bi esil li nav tabûra leşkerê Romî de bejî, kes pê nikare. Civatê herçiqas cîhekî bi rûmet daye jinan jî, di navbera jina baş û nebaş de sînorek jî danîye. Bi vî tehrî hertim jina baş rûsipî kirîye jina nebaş jî rû reş kirîye. Civatê hemû jin nexistine takî terazîyê, ji vê xeletî û şaşîyê xwe parastîye, dûr maye. Ev herdu gotinên pêşîya derbareyî vê yekê de me gelekî ronî dikin: Jin jî heye, jin kok jî heye. Jin ser jinê re heye. Berî ku civat bala mirovan bikşîne li ser jinên nebaş, zêtir rewşa jina baş raxistîye ber çavan û motîva jina baş efrandîye, bi vî tehrî civatê xwestîye, bingeh û hîmên her malbatekê xweş bèn avîtin, sibê-dusibê, di pêşerojê de ji cîhê xwe nelivin, neliqin. Çend gotinên pêşîya bi taybetî li ser jinên baş hatine efrandin:

Jina baş bêmene birê mêrê xwe ye.

Jina baş namûsa mêrê xwe ye.

Jina baş dûrva kiviş e.

Jina baş sebir e.

Civatê timê bawerîya xwe bi jina çê û baş anîye, cesaret daye wan, şahsîyeta wan xurt kirîye û pêşta birîye: Bira jina çê be, bira nav ordîya esker be. Keça bi esil li nav tabûra leşkerê Romî de bejî, kes pê nikare.<sup>113</sup>

Civatê sînoren namûsê û bênamûsîyê gelo angorî kîjan bingehan kişandîye? Dema mirov derbareyî vê yekê de çend bawerî, agahdarî û zanîyarîyan ji nav gotinên

---

<sup>113</sup> Alakom, **Di Folklorê Kurdî de Serdestîyê Jinan**, r.52.

pêşîya hildiçîne, li ser kûr difikire, mirov dibîne ku hem jin, hem jî mêr piştî zewac-mêrkirinê pêwîst in, hin "kincên nûh" li xwe bikin, gavên xwe bi pîvan bavêjin, li pey jin-mêrên mayîn negerin û çavên wan ne li der be: her kezîsorek, simbêlsorek li ber heye. Şaxeke mayîn ya vê gotinê jî awa ye: her kezîzerek simbêlsorek li hember e. Dema du kesan biryar girtin wekî bizewicin, pêwîst e li ser biryarê xwe bisekinin, di navbera wan de peymanek hatîye girêdanê: jin û mêr ne fînoyê sorin, her ro serê yekî bin. Çi jin, çi mêr be, herdu jî angorî vê peymanê nikarin wek rojên keçanî-xortanîyê pey yarên teze bin, pey dilketîyên nûh bin. Dema jin-mêr ji hev re ne helal bin, wê çaxê dubendî û serêşîyên mezin dikarin derkevin rûyê avê, ev serêşîyan heta mirin-kuştinê jî diçin. Di rewşeke awa de dîsa em tên li ser motîva "jina xirab" û "mêrêxirab". Ji bo çareserkirina vê êşa ku nayê kişandin, civatê derîk vekirî hîştîye: hevberdan (telaq).

Gotineke pêşîya bi vekirî ji bo jin-mêrên ku herro dikevîne qirika hev, ji wan re rîya xelasîyê nîşan dide: berdana jinê edetê dinê. Mirov nikare bêje timê jin dibin sedemên malxirabî û hevberdanê, civatê wusan jî kêmasîyên "mêrê xirab" jî nîşan daye, gotineke pêşîya derbareyî vê yekê de çarçavekê pêşkêşî me dike, bi kêmanî jinê rûsipî derdixe: çiqas jine rind be, dîsa mêrî tol e. Çawa tê xuyan ne tenê jin, dema li malê de nerehetî peyda bûn, mêr jî dibin sedemên hevnekirinê. Di çarçoveya bênamûsîya "jina xirab" gelek gotinên pêşîya hene:

Kulfeta bêesil pêşa xwe davê li ser serê xwe,

Dêlik ne bi ba be, kûçik nare cem,

Jinê dil kir dîwar qûl kir.

Tiştêkî balkêş jî ew e, di nav gelek bêjebendên (tabîr) Kurdî de, jinên xirab ji alîyê namûsê de bi tehrekî gelek tûj hatine rexne kirin, cudatîya wan û heyanan tune ye, ew wek dêlik, kelb, çêlekan hatine bi nav kirin. Ji ber ku li bal heyanan pîvanên edeb û ehlaq ji ortê rabûne, jinên xirab jî wek wan heyanan hatine dîtin:

Çêleka nava boxa.

Çêleka çil boxe.

Kelba heram.

Dêlka nava gund.

Dêlka doxê.

Bûye dêla ser cewra.

Dîsa çend bêjebend ji aliyê namûsê de jinan rûreş dikin, rexnan li wan dibarînin, wek:

Dawa xwe avîtine ser serê xwe,

Delinga xwe herimandin<sup>114</sup>

Gelek gotinên mayîn jî hene ku, cudatîya jinên baş û jinên nebaş eşkere dikin, li ser jinên nebaş, xirab rexnan dibarînin:

Axirîya diranê dêşe kişandin e, jina xirab berdan e.

Jin heye gula mêrê xwe ye, jin heye kula mêrê xweye.

Jin heye bira ye, jin heye birabir e.

Jin jî hene, jan jî hene, merhema dilan jî hene.

Jina çê meriva dike wezîr jina xirab merivan dike rezîl.

Kulfeta xirab mêran serberjêr dike.

Jina xirab bênamûsîya komêye.

Di civata Kurdî de, her wusan jî di gotinên peşîya de komeke jin, jinê herî xirabtir hatine hesibîn, bi taybetî jinên xebergerok, virvirî, dikin bilebil, zêde xeber didin, kûdkudo û pîrhevok di folklorê Kurdî de timê di nav kategorîya "jinên xirab" de cîh digrin. Carcar dema em rastî çend motîfên ku jina serberjêr dikin, rûmeta wan wunda dikin tên jî, ev gotinan ne hemû jinan, tenê ji bo jinên xirab hatine bi kar anîn.<sup>115</sup>

### 2.2.1.3. Ji Aliyê “Xiyanet” ê ve Mijara Zembîlfiroş

Mijara namûsê di nava eşîrên kurdan de mijara herî girîng e. Her çiqas ku têgeha “namûsê” berê ji bo gelek tiştan hatibe bikaranîn jî (wekî revandina hespekî, talana keriyekî hwd.), wateya wê ya teng, li derdora zayenda jinê ye. An jî revandina keçikekê, jinekê, bûkekê, kuştina jinekê mesela namûsê ye. Kuştina jinê ne tiştekî ku pir tê dîtin e.

---

<sup>114</sup> h. b. r. 60.

<sup>115</sup> h. b. r. 52.

Dema ku jinekê mêrê xwe bixapanda, ev yek weke “bênamûsî” dihate hesabandin. Di rewşeke weha de jin ji aliyê merê wê ve an jî ji aliyê malbata jinê ve dihate kuştin. Kuştina mêran, bi taybetî di şer de, ji aliyê civakê ve weke tiştêkî ji rêzê dihate hesabandin. Li gor bûyerê mirina hin kesan wekî lehengiyekê hatiye hesabandin û li ser wan gelek stran hatine çêkirin. Wisa hatiye ku bi gotina “berxê nêr, ji bo kêr” mêr ji aliyê civakê ve ji bo şer hatine amadekirin. Kesê ku ji axa xwe, ji bo mafê xwe bê kuştin îro jî wekî leheng tê hesabandin.<sup>116</sup> Ji ber vê Xwesta Xatûnê li gor civat, adet, namûs, helalî-heramî tê çî watê hewceye were zelalkirin. Di nav lekolîna me de mijara Êsîf û Zûleyxa bi formên hevneze ve xwe digihîjîne vê babetê ku xwesta Zûleyxa heta xalekê ne tiştêkî bêîffetî bû ango li gor ew lekolînerên ku dibêjin azîzê Misrê nemêr bû li mêranî li Zûleyxa re nekiri ye, dîsa jî gelo em dikarin bibêjin ji bo evîne ev yek rast e an na. Li gor îffet û namusê ji rastiye dûr e û ne li gor adete ye lê li ba Zûleyxa “Daye” ku her tim piştgirî daye Zûleyxa jî motîfek balkêş e û bêîffetiyê jê re reyek rast dide nişandayîn, werekiya wê derdixîne pêş. Ev çîrokên hatine gotin de tiştêkî ku bala mirovan dikşîne jî eve ku ev jinên pîr an jî cariyek her tim ba jina dildar cîh girti ye. Ev jin yan bi namûs û îffeta xwe tevdişerî û alîkarî dikin car car jî wek kesên bêîman û sêrbaz di nav koma "jinên xirab" de cîh digirin. Bi taybetî jî ev jin gelek caran pîr in.

Di çîrokên Kurdî de em rastî çend tîpên pîran tên. Pîr, di zimanê Kurdî de bi taybetî ji bo jinên ku salên wan bihurîne tê bi kar anîn, carcar ji wan re pîrejin jî tê gotin, di çîrokên Kurdî de ev pîr gelek caran famdarî, zanebûn û mêvanhezîya xwe ve tên nasîn. Çawa di çend çîrokan de jî xuya dibe, ev pîran kesên belengaz in, tenê dimînin, çavên wan li destê kesên mayîn in, rojên xwe dipên. Ev tîpên pîran gelek caran alîkar in, qencî û pakîye dixwazin, bextan û mirazan dighînin hev, suran re vekirîne, keç û xort dikarin bawerîya xwe bi wan bînin. Ji wan hinek jî dilreş in, timê li pey xirabîye ne, gilî-gotina digerin, gilîgerok in, xeybê mirovan dikin. Çawa me di çîroka Gulançikzêrîn de qala wê kir, hin pîr jî hene, bi taybetî dema zarokanîne de alîkarîya jinan dikin, ji wan rêpîrik(ebe) dibêjin, di çîroka Gulançikzêrîn de ew pîrika wek jineke neçe tê nasîn. Tîpeke mayîn jî pîrhevok in, ev kesan wek jinên çîrokî jî dikarin bînan nav kirin, time xirabîye dixwazin, xof û tîrsa wan timê li ser mirovan e, memikên xwe davêjine li ser milê xwe, pêşkarî mirovan dibin. Di jîyîna rojane de ev peyva, ji bo jinên bêter, bed, nebedew jî tê bi kar anîn. Di folklorê Kurdî de jana damarîyan, jana xasîyan,

<sup>116</sup> Tekin Çiftçi, *Di Kilamên Evînî Yê Dengbêjan De Temaya Jinê*, r.61.



jana hêwîyan û jana jintîyan wek çar motîfên bingehîn cîh girtine. Van herçar motîfan (damarî, xasî, hêwî, jintî) di nav folklorê Kurdî de sûretêkî "Jina Xirab" peyda kirine.

Ji bo vê çîroka Zûleyxa û Êsif de li gor hin şîrove û rîwayetên din, Potîfar bi xusûsiyeteke din derdikeve pêş, ew jî "nemêrbûn" a wî ye. Yanî ji aliyê munasebeta cinsî ve xwedî kêmasî bûye û li gor wan rîwayetan, Zelîxayê ji ber nemêrbûna mêrê xwe Potîfarî, meyla Êsif kiriye. Ya rastî ev kêmasiya Potîfar li gor vehonandina çîrokê ne tenê meseleyek şexsî ye. Lewra bingeha çîrokê arzûkirina Zelîxayê ye. Rindî û bedewiya Êsif li aliyekî, tesîra vê kemasiya Potîfarî jî serencama çîrokê diguherîne.

Li ser vê kêmasiya Potîfarî em di mesnewiyên de –rasterast- rastî agahî yan jî îmayekê nehatin. Ji ber hindê belkî di temamê edebiyata Rojhilatê de yê ku di berhema xwe de rasterast behsa nemêrbûna Potîfarî kirî, muellifê Êsif û Zelîxaya Kurdiya Zazakî, Şeyda 'Elî Hûnî ye. Lewra wî di vê mesnewiya xwe ya kurt de (di beytên 26-278 de) ev nemêrbûna Potîfarî wisa vegotîye:

Mêrdey Zûleyxa Qitfir û, 'ezîz Misir û, wezîr û,

Zaf axa w la ber nemîr û, hey weyn Êsif Ken'anî

Wu nemîr û, qic yi çin î, Zûleyxa ra va "Ya cînî,

Ma r' yew ewlad tepîş inî", hey weyn Êsifî Ken'anî. (Hûnî 59)

Li gor vê beytê bi xwe Qitfirê Misrê, ezîzê Misrê ji jina xwe re dibêje ji me re zarokêkî çêke. Li gor nemêrbûna ezîz ev yek ne mimkûn e. Rêya bêhffetiyê bi xwe mêrê Zelîxa nîşanî wê dike li gor vê babetê.

Derheq Potîfarî rîwayet û şîroveyek di jî heye ku ew jî piranî ji tefsîrên Qur'anê hatine standin ku li gor ayeta di Sûreta Êsif de derbas dibe (Êsif: 29) mêrê Zelîxayê li hember dirandina kirasê Êsif û daxwaza Zelîxayê xwe ji Êsif eciz nekiriye û wekî mêrekî jina xwe neparastiye û gotîye: "Ey Êsif tu dev ji wê ber de. Ey Zelîxa tu jî ji ber guneha xwe daxwaza bexşandinê bike. Ya rastî tu bûyî gunehkar." Sembol yan jî temaya "îqtidarê" ya di navbera Êsif û 'Ezîzê Misrê (Potîfar) de muhîm e. Ku li gor hin rîwayetan gava ku hukumdarê Misrê Reyyan, Êsif ji zindanê derxistî û zanî ew bêguneh e, Potîfar ji wezîfê ezl kiriye û li şûna wî Êsif te'yîn kiriye. Piştî mirina Potîfarî jî Êsif û Zelîxa digehine hev. Bi vî şiklî jî Êsif hem dibe xwediyê îqtidara Potîfarî ya siyasî hem jî li hember Zelîxayê kêmasiya îqtidara Potîfarî tekmîl û temam dike...

Ew rîwayetên wisa rast nebin jî îmkane didin ku mirov bikare li ser hikayetê ji aliyê psîkanalîtîk ve raweste. Herwisa piçûkkirina “reqîb”î hêzê didete lehengê sereke ku di çîrokê de Ûsif çiqas baş dihête teswîrkirin, Potîfar jî ewqas dihête nizimkirin. Lewra reqîb, li gor usûla mesnewiyan “reqîbekbaş”be jî hebûna wî ji bo hebûna yê aşiq e. Ji ber wê jî Potîfarî maşuq (Zelîxa) ji bo aşiqî parastiye.<sup>117</sup>

Di çend çîrokên Kurdî de bêbextî û nehelalîya jinan, bûye sedemê malwêranî, mal kambaxîyan. Bi taybetî jinên ku mêrkirî ne, lê belê bi mêrekî mayîn re serê xwe dikine yek, di van çîrokan de wek jinên rû bi tenî tên hesibîn, gelek caran jî, di dawîya çîrokan de tên kuştin. Ev jinên ku bi yar in, jinên ku nabin xwedîyê nefsa xwe, bi dizîka ve mêrên din re radizên, bi wan re şa dibin, di van çîrokan de gelek bi fesal gavên xwe davêjin, dek-dolap, fend-fêlên mezin tînin serê mêrên xwe, car car bi zanetî wek mîsal xwe nexwaş datînin, ji bo ku îmkana hevdiîna dilketîyê xwe peyda bike, mêrê xwe bona "dermanela" dişîne "welatê hat-nehatê". Lê belê di dawîya çîrokan de her tişt êdî eşkere dibe. Çîroka Ava Heyatê-Sêva Xelatê di vî warî de gelek balkêş e. Jinik xwe nexwaş datîne, dibêje mêrê xwe, tê herî ji min re Ava Heyatê û Sêva Xelatê bînî. Mêrik tivdarekê xwe dike, terkeseî dinê dibe. Diçe gundê mala xûşka xwe, xûşka wî zane ne av, ne jî sêveke wusan heye, dibêje birayê xwe jina te bi yârê, vegere here mala xwe! Ew te dixapîne. Paşê bira û xûşk dikevîne dilqê du gerokan, diçin dibînin ku gotinên xûşka wî rast in, jina wî bi yar e, herduyan jî dikujin<sup>118</sup> Di çîroka Benglîboz de, jineke padîşahê hebû ye, navê wê Sultan bûye, dema mêrê wê diçe şer, ew nêta xwe xirab dike, bi wezîrê padîşah re radibe-rûdinê. Hespekî padîşah jî hebûye, hespekî sêrbaz bûye, dikaribûye deng jî bike. Hesp, rojekê kurê padîşah re, qala dîya wî û wezîr dike, êdî pêwendîyên dîya wî û wezîr eşkere dibin. Di dawîya çîrokê de, ev jinek tê kuştin<sup>119</sup> Di çîroka Silo û Rehmo de hejmarê jinên bi yarîk her diçin zêde dibin. Silo di gomekê de xwe vedişêre, mêze dike dor bi dor sê mêrên çiptazî hatin gomê tevî pêz bûne. Ev kesan, yarîkên wê jina ku Silo di goma wê de xwe veşartîye, bûne. Dema mêrê jinekê tê, diçe gomê rastî çend kesan tê, Silo mêrik re dibêje, ev yarê jina te ne. Silo jî radibe diçe mala xwe, dêrî dixê jina wî dêrî venake, jina wî jî bi yar e. Jinik yarê xwe dike kûpekî, vedişêre. Piştî demekê mêr vî kûpî dibe difroşe, dide cihûkî. Cihû dibêje Silo, vî kûpî

<sup>117</sup> Selimiyê Hîzanî, **Ûsif û Zûleyxa**, Ayhan Geverî(wer) r. 98.

<sup>118</sup> Zeynelabidîn Zinar, **Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexkirî**, Stockholm/Sweden, weş. Nivîskarên Kurd, 1991, r. 247.

<sup>119</sup> Heciyê Cindî, **Hikayetên Civata Kurdan IV**, r.123.

bibe mala min, dema Silo kûp dibe mala cihû, mêze dike heft bûkên cihû heryek ji wan bi yarê xwe ve ketine nav kêf û henekan. Dema bûk çav li Silo dikevin, bembû davêjin li ser yarên xwe, wan vedişêrin. Paşê cihû tê malê, hertişt eşkere dibe. Di dawîya çîrokê de, yarê jina Silo û yarên heft bûkên cihû jî tên kuştin.<sup>120</sup> Çawa di çîrokê de jî tê xuyan, hem jinên bi yar, hem jî mêrên bi yar re îmkana jîyînê zêde namîne. Di çîroka Silqo de vê carê her çiqas Silqo jê derdixe ji na wî bi yar e, dinêre xortek di nav cîhê jina wî de ye, jinikê nakuje, tenê ber dide, paşê jineke din ji xwe re tîne.<sup>121</sup>

Çawa em li jor jî li ser sekinîbûn, di çîrokbêjîya Kurdî de mêrên tiral, şil-şed, timê li malê ne, kêrî tiştêkî nayên, bûne babetên gelek çîrokan, civatê ew kesan di nav koma "mêrên xirab" de bi cîh kirine. Wek mêran vê carê em rastî jinên wusan jî tên. Ev jinan jî tiral in, xebatekê nakin, her tiştî ji Xwedê, ji dorberê xwe hêvî dikin, di dawîyê de perîşan dibin, dikevin li ser zar-zimanan û dibin babetên çend çîrokan jî. Di Çîroka Mena Komekê Jî Gofî Hebe de dayîk û keçek hene<sup>122</sup> di çîroka Ardu de bav, keçek<sup>123</sup> û di çîroka Rîya Şixrê de jî pîrejinek, dotek û pişikêk heye. Hemû mêrxasên van hersê çîrokan jî, berî ku zivistan bê qet tivdarekê zivistanê nakin. Di van hersê çîrokan de dayîk, pîrejîn û bav dibêjin çawa hebe emê bimirin, ne hewce ye em kar bikin, hersê keçên van çîrokan jî difikirin, dibêjin emê heta wê çaxê ji xwe re mêrekî bibînin, emê bizewicin, di çîroka dawîn de pişik jî dibêje, dema ew mirin û zewicîn ezê jî herim mala cîranan, bibim pişikê wan. Lê bele zivistan tê, ne ev dayîk, pîrejîn û bav dimirin, ne jî keçê mêr dikin. Dema zivistan tê ev kesên tiral, cangiran gelek perîşan dibin, destê kesên mayîn dinêrin, ji bo ku ji xwe re ardu û xwarinê berev bikin, dikevîne çolan. Di dawîyê de mêze dikin ku jîyîn çawa ew difikirin ewqas hêsan nîne. Ji alîyê din çawa em dibînin babeta van hersê çîrokan jî gelek nêzîkî hev e, wek şax û guhartinokên hev in. Ev yeka jî nîşan dide ku, tema van çîrokan ji alîyê civatê de giring hatîye dîtin ku ev çîrok ewqas belav bûne, nav dane.

Xiyanet bi awayek din ji bo kesê sêyem yê fêlbaz an nakok ve jî tekîldar e. Ma mirov dikare bext bi bêbextan re avabike! Ji ber ku himê civata eşîretî li Kurdistanê li ser avaniya bext û bêbextiyê hatibû damezrandin. Etîka civata me ya kevnare li gora vê rastiya eşîretiyê bilind dibû û dibû yek ji nîrxên helî birûmet ku di civata kurdan de

<sup>120</sup> Zeynelabîdîn Zinar, **Xwençe VI**, r. 166.

<sup>121</sup> Heciyê Cindî, **Hikayetên Civata Kurdan IV**, r. 44.

<sup>122</sup> Ordixanê Celîl û Celîlê Celîl, **Zargotina Kurda**, r. 51.

<sup>123</sup> Hesenê Metê, **Ardû**, Stockholm/ Swêd, Çîrokên Gelêrî, 1991, r. 71.

çalak bû. Ev nirxên hanê him gelekî çalak bûn him jî dibûn îdeolojiyeke ku mirov dikarîbû helwestên kes an pê rûreş an jî rûsipî bikira. Ango ev nirxên hanê di civata kurdên eşîr de rola katalîzatoriyek sosyal dileyîstin. Heger navê bêbextiye li hinekan bibûya, wê gava wan kes an ji rûmeta xwe ya sosyal gelek tişt di civata kurdan de winda dikirin. Mirovê bêbext bêrûmet bûn. Kesên bêbext li ba civata xwe heramolî dibûn. Ev kesê bêbext, îxanetî her du evîndaran jî dike. Di vê kontekstê de mirov dikare wilo bibêje; Ez bahwer nakim ku tu evînperest karibe di Mem û Zîn de kirinên Beko Ewan bipareze! Ji ber ku Beko Ewan xaînê evînê ye! Kesê evîndar û paqij nikarin ji xwe re Beko Ewan bikin sembola evînê. Beko li ba mirovên kurd bûye weke sembola xerabiye, gelaciye, bexiltiye û rûreşîye... Dîsa ez bahwer nakim ku tu kesê welatparêz karibin kirinên Mahmudê Malakanî di Keleha Dimdimê de rasta rasta biparezin! Ji ber ku Mahmudê Malakanî, ji ber bexiltiya xwe doza gelê xwe difiroşe Farisan. Ji bona ku bibe xwediyê derfetekên sosyal ew doza welatê xwe diavêje dera ha. Ango ew ne welatparêz bû!.. Dîsa ez bahwer nakim ku tu xwedî bext karibin kirinên îskanê Gulîxanê di bûyera Seyra Gulisor de biparêzin! Ji ber ku Iskanê Gulîxanê doxînsist bû û bêbext bû.<sup>124</sup>

#### 2.2.1.4. Ji Aliyê Têgeha “Xewn” ê ve Mijara Zembîlfiroş

Xewn metaforek wusaye ku serencam bi wê dest pê dike. Di navaroka serpêhatiyên de ev yek bi awayek cuda xwe nîşan dide. Ev metafor serencama hikayetê û qedera lehengê me jî te’yîn dike. Rêya Zembîlfiroş bi xewnekê ve diguhere û macereya çîroka me bi xewnê dest pê dike:

Şevkî şevî îî bû

Xewnek ‘ecaîb dîtî bû

Li naw xewê da girî bû

Dil û hênav lê hate coş

Li vê derê motîfek Îslamî jî heye ku ew jî “şeva îî” ye. Ev jî diyare ku piştî Îslamiyê roja îî ji bo kudsiyeta hin tiştan di cî de ye û kompozîsyonê re tekîldar e. Xewn ji aliyê manevî ve neqşek balkeş e. Ji aliyê psikanalizm û metafîzîkê tê nitirandin û ji bilî vê nirxandinên olî jî bal dikişîne. Li ser xewnan nirxandinên zanistî zor û zehmetin lê belê

<sup>124</sup> Şerefxan Cizirî, “Di Nav Wêjêyê de Mijara Evînê”, *kov. Nûbun*, h.j. 84, Kanûna Paşîn 2007, r. 71.

li gor nirxandinan xewn; tecrube û jiyîna rojane bandora li ser hişê me bêfizîkî dîmênen wusa dide xuyakirin.

Di mesneviya MB şaxa xewnê heye di çîroka FT de em rastî vê teşeyê nayên ev jî çîroka MB hin rengîntir dike. Tiştê balkêş yê din jî eve ku xewnê şeva îne dibîne ev jî mijarê digihîne aliyê Îslamê. Evar, şev û roja îne demên pîroz û bimbarekin. Ev yek jî giringiya xewnê ji aliyê towbê û pirozbûnê mûhîm dike.

Di xewna xwe de dîtina mirinê destpêka macereya mîrzadeye jî. Xewna ku dibîne şehzade dixê nav ah û nalînan û tehm û çosa dinê ber çavan reş dike. Temaya mirinê bi gotinên Zembîlfiroş di nav çîrokê de her tim li hember Xatûnê dibe xucet.

## **2. 3. JI ALIYÊ MOTÎFAN VE ÇÎROKA ZEMBÎLFIROŞ**

### **2.3.1. Koç /Cîh Guhertin**

Cîh guhertin di nav tesawûfê de xwedî ciyek taybet digire. Beriya evîne hewceye cîh were guhertin. Mecnûn ji bo Leylayê welatê xwe terikan, Siyabend beriya evîndarî Xaçê bibe welatê xwe diterîkine û her awayî Êsif Nebî jî ji Kenanê tê Misrê. Ji bilî vê cih guhertinê de hatina cihê ku yê din cudaye jî balkeş e. Zelîxa Êsif li bazarê dibîne her wekî din Xatûnê jî Zembîlfiroş li taxê yanî bajar/ bazarê dibîne. Ev yek li gor çîrokên evîni motîfek e. Em dikarin bêjin li gundan bazar tune ye çawa dibe ku xort û keç li hevdu dibînin? Bersiva vê yekê jî ev e; ciyê seyran davet û ber kaniyan li hember bazarê cîh digre. Ev der cihê kombûn şa bun û hevdîtinê ye.

Temayen “bazar”, “jin” û “mekanê eşqê” giredayiye jiyana bajarî ve ye. Ji ber vê yekê mijara Êsif de jî ya Zembîlfiroş jî xwesta jinê bajar/bazar pêk tê. Bi vî rengî ev tema çiqas dişibine temayên çîroka Mêla Camî: Di vê çîrokê de jî Mêla Camî behsa du birayên dîndar dike, lê yek li bajarî û li bazarê jiyana xwe diborîne. Birayê dî li serê çiyayekî di xelwetxaneyekê de tenê bi îbadet û zikrê Xweda ve diborîne... Lewra ew ji “bajar”î ji ber tîrsa “guneh”ê dûr ketiye, lew li bajarî û bazarê “jin” hene. Birayê bajarî behsa zikra li serê çiyayê dike ji bo birayê xwe: “ya muhîm ew e tu li bazarê jî bikaribî Xweda ji bîra xwe dernexî” û bi wî şiklî ew birayê li çiya ye têt û li dikana birayê xwe çendekê disekîne. Li dikanê parzûnkek heye. Gava gunehê derkete meydanê ew parzûng didirîyêt û şîrê tede ye dirje. Wêca gava jinikek tê û birayê çiyayî jî wê dibîne û

çavê wî dikevê gozeka jinikê, ew şîrê di parzûnkê de ye dirije.<sup>125</sup> Ev mînak dişibe filmê “Bav Ezîz” jî. Li wê derê jî Hasan û Huseyn heye. Huseyn derwîş Hesên meyxos e, serxweş e. Lê belê dawîya filmê de yê ku evîndarê jinê dibe Huseyn, ê ku cilê derwîşane jî li xwe dike Hesên dibe.<sup>126</sup>

Wuslata Zembîlfirosê ewe ku ew bi xwe di dema tewba xwe ya nasuhî de her tim dinê de muxacîr e xwe wek muxacira dibîne. Ji bo wî tu derek ne muhim û ne wek ber deriyê Rabbê xwe ye. Bi vî şiklî jî di berhemên Îslamî de wusleta vê çîrokê zedetir li ser bingeha tesewwufê hatiye vegotin.

Di çîrokê de rîsalet û baweriya mirovan li ber diwana mezin ya Xwedê de çawa dike ezîz û wan digehînine mirazê wan û li gor orf û adetên tevnagere jinê çawa dixê nav dek û dolaban derdixê pêş. Çawa ku di şexse Êsîf û babe wî de rîsalet û sebr bûye sebebe gehestin û ezîziye, di şexse Zelîxaye de jî “riyazeta evînî” bûye sebeb ku ew hem ji gunehen xwe xilas bu ye hem jî bigehîte “hidayet”e. Lê belê ev yek ji şexsê Xatûnê de peyda nabe û dawîya çîroke jî bo Xatûnê neyînî diqede.

### 2.3.2. Bedewî

Yek ji temayên çîroke jî rindîtî ye ku hem seyra çîrokê hem jî qedera lehengan kifş dike. Eşq û evîndarî, îxanet, wuslet, hesûdî, heyrani hemû li dor motîfa rindîtiyê tê ne teswîrkirin û vegotin. Tiştê xweş û rind an jî kesê xweşik û bedew ji aliyê qiymetê ve muqeddes e.<sup>127</sup>

Beriya her tiştî du taybetiyên vê çîrokê hene ku wê ji yên din cudatir û xweştir dike: yek, evîndariya lehenga jin, yanî eşqa Gul Xatun e; ya din jî rindîtiya lehengê mêr, yanî bedewiya Zembîlfirosê. Ev herdu taybetî beraksê mesnewiyên din û çîrokan adetî yên vê cografyayê ne. Lewra di mesnewiyên de aşîq mêre, maşûq û bedew jin e. Ev taybetmendiya çîrokê jî li gor çîrokan din beşek din e.

Di çîrokê de helbet xala herî girîng bawerî û sadaqeta Zembîlfirosê ya li ber emrê Xwedê ye. Ev yek heta dawîya çîrokê jî devam dike. Ji aliyê din ev sebr û taeta

<sup>125</sup> Selîmiyê Hîzanî, **Yûsuf û Zuleyxa**, wer. Ayhan Geverî, r.39.

<sup>126</sup> Cîh guhertin bi lebatên mirovan û derûniya wan ve tekîldare. (Nacer Khemir, *Bav Ezîz*, Tunus, Typecast Films, 2005).

<sup>127</sup> Mehmet Uzun, “Ceco; Zarokê Welatê Xerîbiyê, Nêviyê Mîr Bedir Xan”, *kov. Nûdem* h.j.5, 1993, Sweden, r. 19.

Zembîlfiroş li hember ber bedewiya Xatûnê tiştê jineveger e. Xatûnê vê fehm nake û li gor dilê xwe tevdigere.

Xatûnê beriya ev xort dertê qesrê xwe dixemilîne:

Xudamî lezkir lezandî

Xwe bi derwîşî gihandî

Ew ji bo qesrê weşandî

Xatûnê xwe xemilandî

Jin, ji bo ku dilê evîndarê xwe xweş bikin û bala wan bikişînin ser xwe, serî li hin rêbazan didin. Ji van ya sereke lixwekirina cil û bergan e. Xweşikiya mirov berê bi cil û bergan xuya dibe. Xweşikiya keçikê helbet ne ji cil û bergan e. Lê cil û bergên xweşik jî, xweşikiya keçikê baştir nîşan didin. Paşê xemilandina rû tê. Kildana çavan girîng e. Ji ber ku kil, xweşikî, awir, reng û mezinahiya çavan diyar dike. Agirê evînê bi awirekê vêdikeve, ji wir xwe berdide nava dil. Lewma jî beriya ku keçik, bi awayekî, biçe serdana dilketî xwe dixemilîne. Ji guharan heta temeziyan, ji bisk û temboriyan heta xilxalê lîngan, divê her tişt lihevhatî be.<sup>128</sup>

Mesnewiya Feqî (FT) de pesn û metha Xatûnê tenê du çarmalîkan derbas dibe ji bilî vê tu derê ku Zembîlfiroş bedewiya Xatûnê bide em nabînin. Yek ji vê dema Zembîlfiroş dikeve hundir û li hemberî xwe Xatûnê dibîne tîne zimên, lê ev gotin ne ji Xatûnê re ru bi rû tê gotin, Feqî bi çavên Zembîlfiroş vê heyraniya xwe vedibêje:

Ew carîye pir lîp û bend e

Law bi bal mîran vexwende

Dît şîpalek lep ji qende

Qet kes nedabû wesfetê

Li vê derê bedewiya Xatûnê û şekl û şemala wê tê tasfîrkirin lê belê ne ji devê Zembîlfiroş ev dibarin, ji destê FT ev çarmalîk tîne nivîsîn.

Cara duyemîn jî li hember gotinên Xatûnê Zembîlfiroş nikare ber xwe bide ber gotin û li serve hatina Xatûnê vê yekê weke bersivekê dibêje:

---

<sup>128</sup> Tekin Çiftçi, *Di Kilamên Evînî Yên Dengbêjan De Temaya Jinê*, r.72.

Law dibê zulfê herî e

Ma pîruz be ew li mîr e

Çi heddê lawê feqîr e

Dest bidet vê muhebbetê

Herwisa di çîrokê de ji bilî bedewiya Zembîlfiroş xweşîkbûna Gul Xatunê jî mijarek herî girînge ango bi vê bedewiyê nav û deng e û wêrek e. Çawa ku Zembîlfiroş di çîrokêde şahzadeyê “biru qeytan, bejin rîhan, bibya çavan, lawê derwêş e muqabilê Zembîlfiroş Gul Xatun jî rindîtiya xwe dertê pêş. Çawa ji ber bedewiya Zembîlfiroş Xatunê dil berdabê jî li gor folklorê netevgerdariya keybanûyê ev yek pîşt rupîştê de maye. Lê xweşîkiya Gul Xatunê jî “sorgula sor, bejin wek dara zeytûnê, agra bitûnê, xoş mirhetê”ye. Feqî di helbesta xwe de ji ber vê yekê ji sînoren helal û heramî dernayê helbesta xwe bi motîfên dînî dixemilîne, lê belê MB bi awayek rengîn vê yekê vedibêje û helbesta xwe dixemilîne. Li gor MB Zembîlfiroş met û sena Xatunê wusa tîne zimên:

Xatûna gerden bi morî

Dem wekû sorgula sorî

Sîng û ber ji heddî borî

Tirsa min ji rebbê jorî

MB tema û teşeyên serpehatiyê her wuha li gor gelek şaxan xemilandiye. Bedewiya jinê endamên laşê wê bi awayek wejeyî, erotîk hatiye ziman û li gor vê yekê jî tu pirsgrêkek nîne li gor MB.

Xatûnê erê xatûnê

Tu bejin darî zeytûnê

Çav weku agra bitûnê

Tirsa min ji roja nexoş

Gotin û nivîsandin bi her awayî ne li gor kevneşopî an civatê be jî çîrokên hatine nivîsandin bi her awayî bejn û bala jinan û mêran her gav bala dengbêjan kişandiye. Di xwezayê de tiştê herî xweş çî be, dengbêjan bejn û bala dilketî şibandine wî/wê. Ev şibandin li gor taybetiyên dilketî û herêma ku lê jiyane diguhere. Bejn û bal pîranî



şibandine dar û beran. Her dara ku şibandine bejn û balê, bi xweşikiya xwe, bi dirêjiya xwe û bi bêhna xwe bala mirovan kişandiye.

Xatûna şeng û şepal e

Çav rewşa ya çav xezal e

Rû sor e gerden bi xal e

Min berde da biçme mal e

Zembîlfiroş li vê derê ne wek zahîd û arîfekî tevdigere bi mêraniya xwe medha Gul Xatûnê dibêje. Bi çavên mêrekî bedewiya jinê dibîne. Mijarek balkêş jî Miradxan dema bedewiya Gul Xatûnê dibêje gotinê tîne ser endamên xalên laşê Xatûnê û qala sing û memikan dike: “Dem wekû sorgula sorî, sîng û ber ji heddî borî”. Bi vê yekê afroûzma-erotîzmê dixê nav helbesta xwe. Di stranên Kurdî de tiştê herî balkêş, piraniya stranên ku li ser memikan hatine gotin ji devê jinan hatiye derketin. Zimanê Tirkî de jî tê xuyan tema memikan temayeke ne ewqas berbiçav e wek stranên Kurdî. Ev bi awayek vekirî bêasteng di stranên Tirkî de cîh nagire. Di helbest û stranên kurdî de memik vekirî û afroûzma jinê derdikevin pêş.

Civaka kurd, bi hezar salan e bi xwezayê re dijî, bi telesî û çavdêriyên salan bi taybetiyên wan sewalan û nebatan hisiyaye û di nava folklorê xwe de bi cih kiriye. Xweşikiya jina kurd di stranên de bi tiştên herî xweşik yê xwezayê hatiye destnîşankirin. Her beşek ji bedena wê şibandine tiştêkî din. Şibandina jinan ji gelek aliyên ve ye. Ji aliyê reng û bêhnê ve wekî kulîlka ne. Bi taybetî jî wekî gûl, beybûn, nêrgîz û sosina ne. Bêhna pir xweş ji wan tê. Ne hov in, wekî xezalan, werdekan, qazan û kewan nazîk in, ji hovan ditirsin. Her sewalekî aliyekî wan yê taybet heye. Hinek bi kubariya xwe, hinek sivikbûna xwe, hinek bi dengê xwe, hinek bi esaleta xwe navdar in. Di gelek kilaman de mêr bi rêya şibandinê pesnên dilketiya xwe didin. Helbestan de nivîskar di danasînê de her hûrgilîyê dihesibîne. Ji bo wî her aliyê keçikê hêjayî pesindanê ye: Nezera çavê wê kete kêrsim û dîdar û bejna Edê ye. Şewqa xwe dide çar terefê dinê ye. Eniya wêna ji kokebê heyvê ye. Çav û birûyê wêna hubra ser kaxitê ye. Pozê wêna nikûlê kewê ye. Dev û lêvê wêna pelekî ji pelê quranê ye. Hinarê wê mîna sêvê Meleyê ye, sor û sipî dike mîna pêla berfa çiyê ye. Diranê wê mîna birincê

Qerecdaxê ye. Fîstan nexişandiye ji pelê gulê ye. Çar bûhus û çar tiliya fîstên dikeve erdê ye. Dertê ji golê ser mêrgê ye<sup>129</sup>

Dema dilê keç/jineke Kurd dikeve yekî, li ser bangîn dibe cara pêşîn di van stranan de, ew memikên xwe pêşkêşî lawikê xwe dike, destûrekê derdixe, hemû tirsê ji ser xwe davêje û memikên xwe pêşkêşî "helalîyê canê xwe" an jî "xelqê delal " û "xelqê têlî" dike, jin van dilketîyan di kategorîke taybetî de (xelqê delal, xelqê telî) cîwar dike, dilketîyê xwe ji ser her kesîre dibîne:

Di helbesta Dewrêşê Evdî de mijara memikan wusa derbas dibe:

*“Minê destmala sorgul-gulî anî,*

*Çifta zer memika navda girêda*

*Û ber delalê dilê xwe pêşkêş danî.”<sup>130</sup>*

Tu beşeke bedena jinê wek memikan motîveke xurt û rengîn nîne. Di nav vê tema evînê de jî, motîfa memikên jinan cîhekî bi taybetî pêk tîne. Çend stranan de em rastî motîfa lêvan jî tînin, lê belê lêv wek memikan ewqas ne balkêş in, di planeke duwemîn de dimînin û gelek caran bi peyva ramûsanê ve dikevîne zikê hev, gazî hev dikin. Hejmara van stranan ku li ser memikan şax vedane, di zargotina Kurdî de digihêje dereceke bilind. Kêm-zêde her straneke Kurdî ya ku li ser evînê-vîyanê hatîye gotin, tê de qala memikan tê kirin. Ev stranan di nav folklorê Kurdî de bingehên edebîyateke erotik pêk tînin. Bêguman nîşanên pêl û cereyaneke erotik bi tehrêkî baştirîn di stranan Kurdî de xwe nîşan dide. Di van stranan de hemû motîf û nîgarên derbareyî memikan bi zimaneke gelek bilind, folklorik û giranbiha ve tînin peşkeş kirin:

Çavê Min li Rênga Te Qerimî

Lawiko, were de tu were,

Bira serê min qurbana serê te be,

Şevêk şevên van payîzan,

Mêvanê sîng û berê dosta xwe be.

---

<sup>129</sup> h. b. r. 75.

<sup>130</sup> Alakom, **Di Folklorê Kurdî de Serdestiyêke Jinan**, r.104.

Memik nîşana, zanav, kîfîya (huvîyet) jinan e. Bi salan di nav her çiqê hunerên cuda de memik wek nîşana bereket û bedewîyê hatîye hesibandin. (wek tanricaya Kîbele ku ji bo bereketî dihat binavkirin ) Ji der fonksîyona memikan ya mijandina zarokan, fonksîyona memikan ya herî mezin bêguman diyarkirina jinbûn, xweşikbûn, cinsiyetbûn, wek baqê gulên ku dema mirov serê xwe dixê nav, bîn dike, bi bîn û nermikîya wan mest û serxweş dibe, memik wusan di jîyîna mirovî de bandûrhîşt in û roleke gelek mezin dilîzin, bi taybetî memikên keçan wek dewlemendî û zeynetekê hatine hesibandin. Ev bedewîya memikan bûye babeta metelokeke Kurdî jî: memikên qîza zeynet in/ kelaxê pîrê robet in. Di vî warî de bêjebendeke Kurdî jî me gelekî ronî dike: “Memkê Xatûnê”. Bêjebenda memkê xatûnê bi taybetî ji bo zarokên şîrîn û tiştên xweşik tê bi kar anîn Dîsa gotineke pêşîya, ev beşê bedenê, hêjayî beşê herî bedew dîtiye, wek pîvan hatîye hesabîn: dilê tirsonek sîngê gewr nabîne. Ji bo bal û dêna mêran bikşînin li ser xwe, jinan hertim mezinbûna "taxima memikan" ji xwe re kirine pîvan û nîşaneke jinîn. Bi saya memikên xweyên mezin, jinan xwastine jîyîna seksuel hin jî seksueltir bikin.

Di zimanê Kurdî gelek peyvên ku cîhê memikan digrin, hene. Bikaranîna van peyvan, angorî fonksîyona memikan li gelek cîhên Kurdan diguherin. Peyva memik ji peyveke Latînî tê: ango ji peyva mamma. Di gelek zimanan de ev peyva li cîhê dê/dayîk jî tê bikaranîn, dema zarok gazî dayîkên xwe dikin, dibêjin "mamd"...Ji ber ku memikên mêran kor bûne, pêşte neçûne, piçûk û bêfonksîyon mane, çawa em dibînin pêwendîyên peyva memik û mêran qet tune ne. Di hin zimanan de xwarinên ku ji bo zarokan amadebûne, tên firotanê jî, bi "mama" tên bi nav kirin. Bi kurtî bigehên van hemû peyvan diçin digêjine peyva "mamma" (dê/dayîk). Di zimanê Kurdî de çend peyv hene ku gelek dişibînin peyva mamma, wek mak (zaravê Kurmancî), mad (zaravê Dimilkî). Ji ber ku zimanê Kurdî, zimanekî Îndo-Ewropî ye, çawa em dibînin qet nebe koka van hemû peyvan wek hev e. Di zimanê Farisî de jî, çawa tê zanin li şuna qê/dayik peyva marder tê bikaranîn, ew jî nêzîkî peyva mamma ye. ( ev peyv di zimanê Îspanî/Îngilizî jî tê wateya “da/dê”). Ev peyva Latînî angorî avahîya zimanê Kurdî, bi alîkarîya formê diminutif (bi saya paşpirtûk) bûye: memik. Di zimanê Kurdî de li şuna memik carcar jî ev peyvan tên bi kar anîn: çiçik, bistan, sîng, pêsîr, paşil, sîngber, guhan, hingilPeyvên pêsîr û paşil her çiqas li şuna memik tên bi kar anîn jî, ev peyvan zêtir wek beşeke bedenê an jî bona kincên li dorberê memikan, derbas dibe, wek "pêsîra

xwe bigre!" (ango bişkokên li dorberê memikan bigre), an jî "perên xwe têxe paşila xwe!" (wek cîhekî parastina tiştan). Di çend stranên Kurdî de emê çawa paşê jî bibînin wek mîsal mirov rastî îfadên wek "paşil tijî xurmeye" û "paşil tijî êmîş e" tên... Li vira peyva "xurme" û "êmîş" bi tehrekî sembolîk memikên jinan îfade dikin. Angorî cîh û dema karanîna van peyvan maneyên wan jî tên guhirîn. Bi vî tehrî mirov dikare jibo mêran jî peyvên pêşî û paşîl bi kar bîne. Li çend cîhan mîsal wek dorberê Qonyayê li şuna zarok dema jîr ji memikên dîya xwe dimêje, ew dibêjin "pêşî dimije"...

Di gelek stranên Kurdî de em rastî îfada "sîngû ber" tên, ji vê îfadê em jê derdixin ku qala memikan tê kirin. Peyva sîng hem ji bo beşê bedenê yê jorîn (ji qirikê heta nava mirovan), hem jî, ji bo cotê memikan tê bi kar anîn. Di gelek zimanan de hem ji bo vê beşa bedenê, hem jî ji bo cotê memikan tenê peyvek tê bi karanîn, lê belê di Kurdî de gelek peyv hene. Çawa em dibînin di zimanê Kurdî de carcar ev beşan bi du peyvan ve tên bi navkirin: sîng û memik, ev peyvan wek du peyven hevnaverok (sînonîm) jî tên bi kar anîn. Bi kurtî bi peyvên memik û sîng wek du peyvên evîne di stranên Kurdî de zêtir derbas dibin.<sup>131</sup>

### 2.3.3. Saray-Qesr

Di mesnewiyên evîne de mekan bi temayên eşq û baweriye ve giredayî ne û bawerî jî her dîsa di çarçoveya evîne de diyar dibe. Beriya niha jî me qala evîndariyê û bajarvaniyê kiribû ku ji bo evîne derek an jî nîşaneyek e<sup>132</sup> Di nav gelê qesrê de evîne û girêdana dildar ne tiştekî hêsan û bê zahmet e. Her tim weke Bekoyê Mem û Zîne asteng, xiniz, cisizek dertê pêş. Mijara evîne de bi taybetî kî dertê pêş, taybetiyê yekî tune, mîr, keybanû, şehzade an di nav qesrê de yekî din. Ev yek bi destê folklerê jî heta îro di derbarê ciyên dîrokî ciyên bermayî bi çîrokekê ve hatiye xemilandin hatiye gotin. Gelo rastîya ev çîrokên gelerî, devkî çikas rast û dirûstin em nizanin lê belê an şivan an prensesek an kralek an jî xatûnek buye mijara evîne û bi devê havîrdorê wê derê hatiye gotin, helbest li ser hatine nivîsandin.

<sup>131</sup> Alakom, **Di Folklorê Kurdî de Serdestiyêke Jinan**, r.102.

<sup>132</sup> Selîmiyê Hîzanî, **Yûsuf û Zuleyxa**, Ayhan Gevêrî (wer.), r. 163

Dîsa mekân bi cîh bûnê ve tekîldare. Dema hewirdorê însanan tîjî be agirê evînê wî kesî bi hêsanî dorpeç dîke û dixê nav tora xwe. Çîma? Ji bo ku ew kes naşibe yên din. Bi taybetiyek xwe dertê pêş an jî cuda dibe.

#### 2.3.4. Zindan

Yek ji leîf-motîf û mekanen çîroke jî zindan e. Di jiyana Êsîf de piştî çalê, qonaxa duyemîn zindan e ku Êsîf heft salên xwe tede derbas kirine... Di çîroke de zindan wek mekan nahete teswîrkin, tene tekiliya Êsîf digel hebsiyên dihete vegotin û di hebse de te'birkirina xewnan û diyalogen Êsîf digel Xebbaz û Şerabdarî diborin. Le di edebiyata klasîk de hebs û zindana ku Êsîf tede mayî sembola sebr û teziyê ye. Herwisa di jargona Îslamî de jî ew zindan wekî "medreseya Êsîfîyê" derbas dibe.<sup>133</sup>

Di vê kefteleft, şer û tekoşîna xelasîyê de, çend hêzên çîrokî jî timê amade ne, tên hewariya evîndaran, keç-xortan, alîkariya wan dikin, wek seccade, milyaket xalîçên firoke, teyrê sîmir, şiva qudrêtê jin an jî keça dêw.<sup>134</sup> Lêbelê vê babetê de yê ku digihije hewara Zembîlfiroş ne yek ji van e. Bi emre Xwedê Milyaket(ferîşte) Cebraîl digihije hewara lehengê me. Gelo ev yek li gor naqlên Îslamî rast e an na. Dibe ku tiştêkî wusa qewimiye lê belê çawa? Di nav çanda kurdan de ev gotin henin : "Xwedê wî filitand an xilas kir, Xizir gihiştîyê, Ber mirinê bû lê sadqa destê wî bû... hwd" Li gor mijarê jî em bi xwe dikarin bibêjin ku ji ber evîna Xwedê ya Zembîlfiroş Xwedê wî parastîye. Ji bo vê jî Cibraîl gihiştîye hewara wî û wî xilas kiri ye. Lê hewca nake Zembîlfiroş Cibraîl bibîne. Helbestê de gihiştina Cibraîl şîroveya nivîskar e ku kesên bawermend bi piştgiriya Xwedê tene xilaskirin.

---

<sup>133</sup> h. b. r.166.

<sup>134</sup> Cindî, **Hikayetên Civata Kurdan V**, r 98-106.

## BEŞA SÊYEM

### JI ALİYÊ DEM, WAR Ê LEHENGAN VE RASTIYA ÇÎROKA ZEMBÎLFIROŞ

#### 3.1. SERDEM Ê WARÊN QEWIMÎNA ÇÎROKA ZEMBÎLFIROŞ

Nivîsa Şemo Qasim ya bi wergera Hallocî Larê de wusa derbas dibe:<sup>135</sup> Yek bi zaravê soranî û ji Mamoste Mela Ehmedê Kurê Mela Mewludî Şinwî hatiye wergirtin û ya duyem bi zaravê Badînî ji Mamosta Şêx Beşîr Efendî kurê Şêx Mehmedê Sahirî wergirtiye û ev herdû deqe Mamosta Gîw Mukriyanî kiriye pirtûk bi navê Zembîlfiroş derxistiye û li sala 1967 hatiye çapkirin. Ev serhatiyê hunermendê kurd Mirad Xanê Bayezîdî bi helbest û awayekî ciwan vehandiye û daniye. Li dorûberê sala 1190 koçî beramber 1785 zayînî ji zardevê derwêşan wergirtiye û Şêx Beşîr Efendî kurê Şêx Mihemed Tahirî ev helbestê pêşkêşî Gîw Mukriyanî kirye, piştî ji binemala Mirad Xanê Beyazîdî wergirtiye.

Dema ku mirov van herdû deqan dixwîne hizra yekbûna çîrokê dike lewma Mirad Xan kurteyek kiriye zarê soranî ku ji 35 beyta pêk hatiye. Belê bi zarê badînî jî 132 beytan pêk hatiye û herdû beyt Mamosta Mirad Xanê Beyazîdî kiriye beytên hozanî.

Li Silîva qelayek heye, îro jê re dibêjin Qelaya Zembîlfiroş. Xirabe û bermahiyên vê qelayê heta niha jî mane. Angorî hin vegotinên devkî Zembîlfiroş xwe ji vê qelaya bilind avitiye û paşê jî miriye. Ev yek ne li gor destnivîsa li gor devkî hatiye vegotin. Ji bermahiyên dîrokî yek dikare bêje ku ev destan an çîrok li ku derê derbas bûye ber nusxayên destnivîsî. Hin çavkaniyên arkeolojîk hene ku cî û warê bûyerên destana Zembîlfiroş wek Silîva/Ferqîn nîşan didin. Yek ji van çavkaniyan di sedsala 18 an de ji aliyê Mirad Xanê Beyazîdî de hatiye nivîsîn. Ev berhema di derbarê Zembîlfiroş de gelek salan wusan wek destnivîs maye. Destnivîs cara pêşîn di sala 1967an de wek pirtûk li Iraqê ji aliyê Giw Mukriyanî ve tê weşandin ev şaxa dawîn, ne şaxeke folklorîk e, wek şaxeke edebî ji aliyê Miradxanê Beyazîdî ve hatiye nivîsîn. Li ser vê pirtûkê piştî çend salan lêkolîneke dirêj di sala 1979an de hatiye weşandin.<sup>136</sup> Di vê nivîsê de tê dîyarkirin, Zembîlfiroş yek ji wan mîrê Merwaniyan e, navê wî yê rastîn jî Seîd e.

<sup>135</sup> Şemo Qasim, Hallocî Lare(wer) Çîroka Zembîlfiroş û deqeke nebelavkirî ji beyta wê Şemo Qasim Dinayî, 28.03.2009, <http://serhed.org/modules.php?name=News&file=article&sid=699>, (d.d.03.04.2014).

<sup>136</sup> Edîtoriya, "Bejeya Kurdan", *kov. Pale*, s. 2, hj. 3, sal 1979, r.31.

Angorî vê dîtînê Seîd yek ji kurê Ebu Nasir Ehmed e.<sup>137</sup> . Çawa tê zanîn paytextê vê mîritiyê Silîva (Mayafarikîn, Sîlvan) bûye. Hin şaxên Zembîlfiroş yên folklorîk bi xwe jî hene ku nîşan didin wekî bûyerên vê destanê li Silîva derbas bûne.<sup>138</sup>

Çawa tê xuyan hin zaniyariyên arkeolojîk, dîrokî, edebî û folklorîk nîşan didin ku destana Zembîlfiroş cara pêşîn li Silîva hatiye gotin û hêdî hêdî li deverên mayin belav bûye. Heta niha gelek şaxên destana Zembîlfiroş hatine weşandin.<sup>139</sup>

Destpêk û dawiya çîroka Zembîlfiroş bi taybetî li gor xemilandina Miradxanê Bazidî pêk tê. Dema em naveroka çîrokê mêze dikin destpêk naverok û dawiya çîrokê bi awayek zelal fehm dikin lê belê hulgulî û naverok ya Feqiyê Teyran ne li gor Miradxan e. Destpêk kuçeyekê dest pê dike û encama çîrokê jî malê diqe de. Zêdetir li ser îtaet û taetê disekine, sebra Zembîlfiroş li ber xwesta Xatûnê disekine û çîrokê li ser vê dixemilîne. Lê belê dema em her du çîrokan mêze dikin hin motîfên sereke dertên pêş: “evîn, namus, îtaet û bawerî.”

Zembîlfiroşa MB û FT her çikas bi naveroka çîrokê vebije jî li ser vê çîrokê gelek tişt ji aliyê hozanvan û dengbêjan<sup>140</sup> ve hatiye zêdekirin. Pênaseke dengbêjan û dengbêjiyê ya hevgirtî nîn e. Gelek folklorzan û lêkolîner dîroka dengbêjiyê digihînin Homeros. Ew jî, wekî dengbêjê kurdan yê navdar Evdalê Zeynikê, kor bûye.<sup>141</sup> Em nizanin ka çi jê hatiye birîn an zêdekirin lê em zanin ku çîroka Zembîlfiroş heye û yek mesneviyên di nav kurdan mesneviyek xweş û balkêş e.

---

<sup>137</sup> h. b. r. 31.

<sup>138</sup> Muhsîne Helimoğlu Yavuz, **Diyarbakir Efsaneleri**, İstanbul, weş. Cumhuriyet, r.142.

<sup>139</sup> Alakom, **Di Folklorê Kurdî de Serdestiyeke Jinan**, r.85-87.

<sup>140</sup> Di warê danasîna dengbêjan de W. Jwaîdeh dibêje ku, ji kesên ku çîrok û destanên Kurdî ji ber xwe ve dibêjin re, li Başurê Kurdistanê “helbestvan”, li Bakurê Kurdistanê jî “dengbêj” dibêjin.

<sup>141</sup> Tekin Çiftçi, “Di Çarçoveya çanda devkî de di nav civaka Kurdan de dengbêj û saziya dengbêjiyê”, *International Journal of Kurdish Studies*, ISSN:2149-2751, Çile 2015, r.118.

## 3.2. LEHENG Û NASNAVÊN DESTANA ZEMBÎLFIROŞ

Du aqtorên vê çîrokê yê grîng henin û yê din hawirdorê wanan de diçin û tîn ev her du lêheng; Zembîlfiroş û Xatûn ê. Zembîlfiroş, mirovê ku dest ji dinyayê berdayî, sembola evîna xemgîn, şervan û qehremanê nefsa xwe û di rêya axîretê de sofî û zahidekî bêhempa. Xatûn, bi can û dil, dilberdayîya Zembîlfiroş, jinemîra bêbext û bêmixab, di dilê xwe de evîndareka çardehsalî. Çîrok bi xwe hawirdorê van her du lêhengan dizivire aktorên ku bi avayek eşkere tenê ev her du lêhengin. Ji bilî Zembîlfiroş û Xatûnê navên din dernayên pêş.

Di çîrokên ku him FT him jî MB nivîsandiye ne navê Zembîlfiroş ne jî yê Xatûnê eşkere bûye. Her du lêheng jî bi rengdêrên xwe dertên pêş. Mesneviya Zembîlfiroş li ser “îffet û baweryê” tê şîrovekirin û leheng jî bi şaxsiyetên xwe ve dernayên pêş. Ji destpêkê heta dawiyê ji tevgerên Zembîlfiroş em dikarin wateyek din vê çîrokê<sup>142</sup> mêze bikin.

Piştî her du lêhengan dê û bavên Zembîlfiroş, Mère Xatûnê, Jina Zembîlfiroş, Cariye hevîrdorê van her du lêhengan dizivirin.

### 3.2.1. Zembîlfiroş

Zembîlfiroş an selikfiroş bernavka lêhengê me ye. Kurdî: zembîl, zembeq, duşem(b)... lê farisî: zenbîl, zenbeq, dûşenbe<sup>143</sup>... tê binavkirin. Zembîl an selik<sup>144</sup> amûra bi çîtik, lew û tureyên mêmê yê tenik ve tê veçînîn an honandin, gelek caran destikê wê heye, xwarin, fêkî an ji bo tîştêk pê tê keşandin re tê gotin.<sup>145</sup> Yê vî karî dikire jî zembîlfiroş, zembîlçêker zembîlfiroşî, zembîlî, zembîlsaz, zembîlsazî, zembîlvan, zembîlvani<sup>146</sup> tê gotin.

Zembîlfiroş di nav destenên Kurdî yek ji destanên evîni ya bala me herî dikişîne ye. Sedema vê jî bêguman cîh guhertina dildêr û dildar e. Ciyê dildêr û dildar guheriye û ev yek jî ji çîrokên din zêdetir balê kişandiye û têsîrê li ser dengbêj û stranbêjan

<sup>143</sup> Farabî, **Büyük Türkçe Sözlüğü**, İstanbul, TDK, 2005, r. 3994.

<sup>144</sup> Zana Farqînî, **Ferhenga Enstîtuya Kurdî ya İstanbulê**, İstanbul, 2010, r. 788.

<sup>145</sup> Komîsyon, **Büyük Türkçe Sözlük**, www.tdk.gov.tr.,02.07.2014.



kiriye. Gelo wek destanên evînî yen wek Memê Alan û Zîna Zêdan, Sîyabend û Xecê, Ker û Kulik, Binefşa Narîn û Cembelîyê Hekkarê, Mem û Eysê, Sêva Hecî, Menşa Elîyê Selim Axa, Kela Dimdimê, Filîtê Quto, Bişarê Çeto, Saliho de mijar hema hema bêjin bi rolên aqtorên xwe ve heman in encax li hember Zembîlfiroş. Ji der van destanan çend destanên mayîn jî, bi taybetî di nav Kurdên Îranê de belav bûne, paşê hatine berev kirin, gelekî balkêş in, wek Ferx û Xatun Astî, Şor Mehmûd û Merzingan, Mehrû Wefa, Behram û Gulandam.

Lêkolînavê Almanî Oskar Mann cara pêşîn bi firehî çend destanên Kurdî hem berev kirin, hem jî ew wergerandin zimanê Almanî, wek du pirtûk çap kirin,<sup>147</sup> wek Laz û Xezal, Nasir û Malmal, Qer û Gulîzer, destanên heta niha nebrevkirî weşandin. Bêguman gelek destan û serpehatiyên gel yê mayîn jî hene ku dikarin di vê babetê de alîkarîya me bikin û me ronî bikin. Bi taybetî çend destanên ku di nav gelên rojhilatê de belav bûne, wek Leyla û Mecnûn, Êsif û Zelîxa, Rustemê Zal gelek destan hatine ketine zimanê Kurdî. Ji der şaxên destanên Kurdî, çawa em dibînin çend şaxên van destanan yê edebî jî, paşê ji aliyê nivîskarên Kurd de hatine amade kirin. Rûberîhevkirina şaxên folklorik û edebî jî angorî her destanekê dewlemendî û rengînîkê pêşkêşî me dike. Ji aliyê din çend destanên ku di zimanê Kurdî de zêde belav nebûne, ji aliyê Kurdan de hatine wergerandin, jîyîna folklorîk û edebî di nav Kurdan de ji bêtamî û rijîtîyê parastine, wek destana Ferhat û Şîrîn... Angorî çend çavkanîyan, Ferhat bi xwe ji malbateke Kurdî hatîye. Lê destan bi xwe gelo di nav Kurdan de çima ewqas belav nebûye? Bersîva vê pirsê jî gelek balkêş e. Dengbêj û destanbêjên Kurd, gelek destanên rohilatê bi motîfên Kurdî ve dewlemend kirine, xemilandine, li gelek cîhên Kurdistanê şaxên van destanan peyda bûne. Ji van destanan û şaxên wan beşek hatîye berev kirin, êdî bûne kerîkî edebîyata Kurdî ya anonîm.<sup>148</sup>

Di vê hikayetê de çawa ku hemû şexs û kes li dor Zembîlfiroş xwedî rol in, herwisa epîzod, motîf û sembolên hatine bikarînan jî li dor wî têne gotin. Di helbesta FT de Zembîlfiroş “lawek rewal” û bi “Husnê Êsif” dihêt nasandin:

Zembîlfiroş lawek rewal bû

Husneka Êsif li bal bû

<sup>147</sup> Oskar Man, *Die Mundart Der Mukri-Kurden*, Enstituya Kurdî Ya Parîsê, Almanya, 1906, r. 35.

<sup>148</sup> Alakom, *Di Folklorê Kurdî de Serdestiyeke Jinan*, r.69.

û di helbesta MB Zembîlfiroş destpêkê de beriya rêya xwe biguherîne bi “kurê mîr” û bi xweşikî/bedewiya xwe dihêt nasandin:

Zembîlfiroş kurê mîran e

Laweku bejin rîhan e

Di vê çîrokê de dersa muhîmtir ew e ku kesê sebrê bike digehîje daxwaza xwe. Zembîlfiroş li hember daxwaza Xatûnê ber xwe dide sabr dike û bi serfirazî mikafata Xwedê di dawiyê de dibîne. Dilpaqijî, helalî û namûs, çawa em dibînin kakilê felsefeya jîyîna Zembîlfiroş pêk tînin.<sup>149</sup> Xatûnê bi rêyek nemeşrû murada wî dike lê ew ji vê rêyê ya xeyrîmeşrû de xwe nêzîkî Xatûnê nade. Dîsa jî Xatûnê dev ji Zembîlfiroş bernade rê û rêbazên cuda wî nêzîkî xwe dike da kû jê sûdê werbigre. Bi tu awayî xortê Xwedantirs xwe nêzîkî wê nake û jê dur dikeve da ku xwe ber mirinê jî diavêje. Welhasil bi her awayî ew temsîl temsîla gelek tiştan e, lê yên ku herî derdikevine pêş ev in: “iffet” û “sebr e”

Tiştê ku Saîd ji zîlam û mêrên dî cudatir dike helbet iffet û sebra wî jî be, li dor van herdu taybetiyan xususiyeteke wî ya din heye: “îqtidar”. Di helbesta MB:

Zembîlfiroş kurê mîran e

Laweku bejin rîhan e

Xwedan koçek dîwan e

Dest çîrokê dike û serpêhati bi vî awayî dest pê dike. Ew bi xwe jî li hember xwesta Xatûnê jî jê re dibêje:

Lawik dibêt ey xatûnê

Navêtin min malê dinê

Qayil nabim bi gotinê

Dûr im ez li qisêt nexoş

Ev yek jî nîşan dide ev bi xwe desthilatdar e çawa ku edebiyatê digel jiyane têkilî heye, mesnewiyên evîndariyê jî têkilî bi jiyana rojane ve hebûn. Herwisa ji mesnewiyan dihête fêmkirin ku ew metn/mesnewî bi giştî ji bo du tiştan dihatine

---

<sup>149</sup> h. b. r.85.

xwendin/nivîsîn: yek, ji bo keyf û şahî û borandina wextekî xweş (wekî rola sînema yan jî romana îro); du, ji bo fêrkirina eşq û evîndariyê... Wêca nemaze di mesnewiyên şehzadeyan de ew rola duyê derdikeve peş ku siltanan li hember eşqa şehzadeyân xwe hişyar kirine ku “ew daf û kemînek dijwar e.” Wêca bi van mesnewiyan ve hem şehzadeyên xwe ferî eşqê kirine hem jî dane zanîn ku heta eşq nehête zanîn, şehzade nikarin biçine şûna babên xwe û neşên bibine siltanê welatan. Lewra lazim e pîşiyâ dersa eşqâ bibînin/hîn bibin Zembîlfiroş jî ji hikimkirinê bi daxwaza xwe dur dikeve dawiyê de dîsa wedigere li ser teht û mîrîtiya xwe û li gor vê ev kevneşopî di jiyana Zembîlfiroş de dibe karakterek pê hempa:

Zembîlfiroş bû hakim e

Zor adil û zor alim e

Nehêla zilma zalim e

Şev derwêş û paşa bi roj

Çawa ku di çîrokê de, wekî di mesnewiyên din de jî derbas dibe, vehonandinek “mêrane” heye, mêr xwedan îqtidar e û li hember daxwazên şehwetê û yên jinan divê ew bibe hakimê nefse û da bi wê ve jî bibe ezîz û xwedî îffet: her wekî Zembîlfiroş. Lewra yê xwedan îqtidar mêr e û ji ber wê jî lazim e yê bibe xwedî îffet jî her ew e...

Dîsa di mesneviya MB cîh û war eşkere ye. Zembîlfiroş dema ji dê û bavên xwe destûrê dixwaze û bi rê dikeve li dora Merdîne cîh dibe.

Heta ku çûne Mêrdîne

Koxek dî li çolê bi tenê

Gotî werin da biçîne

Çêtire ji qesreka xoş.

Û di dawiya mesneviyê de diyare ku Zembîlfiroş li Amedê/Diyarbekir tê rê kirin.

Heta gihîşte Diyarbekrê

Peya bûn ew li derê qesrê

Ji vê derê diyare ku Zembîlfiroş di navbera Merdîn û Diyarbekrê ma ye û li gor çavkaniyên di destê me de ev bi xwe li Farqînê / Silîva<sup>150</sup> cîh bu ye. Lê rastî Zembîlfiroş li ku derê bi cîh bûne ne teqez e, sê-çar navên ku bûyer li wê derê derbas bune henin. Lê belê çavkaniyên di dest de û li gor destnivîs û dîroka bajeran em dikarin ihtîmalek mezin bûyer li Farqînê derbas bûye, navê van ciyan wuha ne: Farqîna Diyarbekir, Gundekî Hezoya Batmanê, Sîrkûtika Kurdistana Başûr û Devera Barzan...

1. Farqîna Diyarbekir: Ciyê ku dibêjin hîkayeta Zembîlfiroş lê derbas bûye a herî meşhûr Farqîn e. Niha li vî bajarê kevnare bi navê “Birca Zembîlfiroş” bircek heye. Dibêjin Zembîlfiroş xwe ji vê bircê avêtiye xwarê. Û li Farqînê ji taxa li bakurê goristana Şêx Xelîl re “Taxa Zembîlfiroş” tê gotin. Li gor rîwayeta herî bi qewet hîkayeta Zembîlfiroş di dema dewleta Merwanîyan de li Farqînê derbas bûye.

2. “Hezo”ya Batmanê Gundê “Kurêrewal”: Ji aliyê Batmanê ve li ser rîya “Kozluk” wek 10 km nêzikî navçeyê, gundek heye ku; jê re “Kurêrewal” tê gotin. Navê gund bi Tirkî “Agaçlık” e... Li gundê “Kurêrewal” jî tirbeh û meqama Zembîlfiroş heye. Lê belê ne çêkirî ye. Dora goristanê bi keviran pêçane û kifş kirine. Li gor gundî dibêjin; Zembîlfiroş nexwestiye mezargêhê wî wek tirbehê bête çêkin. Ji lew careke teşebbus hatiye kirin, lê mani’ derketine, çênebûye. Ji xwe navê gund jî ji hîkayeta Zembîlfiroş tê. Lewra li gor di helbestan de derbas dibe: “Zembîlfiroş lawkê rewal e”... Li gor ehlê wan dera dibêje: Jina Mîrê Farqînê dema Zembîlfiroş selika difroşe, wî dibîne û aşîqê wî dibe. Dike nake nikare wî bixapîne. Jinik dibîne nabe, ji Farqînê bi pey Zembîlfiroş dikeve heta ku têne gundê Kurêrewal. Dîsa xeberdanên di nav bera wan de dewam dikin. Zembîlfiroş dibîne ku nabe destê xwe ji Xwedê re vedike û dibêje: “Ji ciyê ku ez vî gunehî bikim, tu min bixe bin erdê.” Li ser vîna erd wî diqurpîne. Niha tirbeha wî li wî gundî ye. Her sal di meha Gulanê de rojên îne ji aliyê milletê herêmê ve xusûsen ji aliyê “Darêgozîniyan” ve tê ziyaret kirin.

3. Kurdistana Başûr, Nehya “Batîfa” Herêma “Sîrkutik”: Herêmeke ku dibêjin hîkayeta Zembîlfiroş lê derbas bûye jî, li Kurdistana Başûr herêma ‘eşîra “Guliyân”, nehya “Batîfa”, mentîqa “Sîrkutik” e. Ev cî di navbera Zaxo û Duhokê de ye. Nêzikî “Kelha Şa’banî” ye. Li gor ehlê wan dera dibêjin hîkayeta Zembîlfiroş di dema sultanê Behdînan de yê di kelha Şabanî de hikum kiriye derbas dibe. Hîkayeta ku

---

<sup>150</sup> Muhsîne Helimoglu Yavuz, **Diyarbakir Efsaneleri**, r. 142.

li wir tê gotin wek a li herêma Diyarbekir tê gotin e. Li wir hinek kes dibêjin Xatûnê Zembîlfiroş daye girtin, xistiye zindanê. Rojekê Zembîlfiroş bi behaneya ‘îbadetkirinê zincîrên xwe dide vekirin û direve. Lê belê çiyekî ku tê re bireve nabîne. Zembîlfiroş bê çare dimîne û xwe ji bircê qesrê davêje. Dibêjin Zembîlfiroş xwe ji “Kelha Şa’banî” ve avêtiye û melaîketan ew girtiye, anîne li Sîrkûtikê defn kirine.

4. Kurdistana Başûr, Devera Barzan, Şikefta Zembîlfiroş: Li mentîqa Badînan “Devera Rêkan” gundekî bi navê “Sîta” heye ku dikeve beranberî “Devera Barzan”. Li wê derê çiyayek heye ku jê re “Çiyayê Şîrînê” tê gotin. Di demên borî de di wî çiyayî de merivekî Kurd bi navê “Xelîl Xoşewî” hebû ku li hember desthilatdariyê serhildabû. Şikeftê di wî çiyayî de heye ku dergehê wê ji jor ve ye. Ev Xelîl Xoşewî û hevalên wî di wê şikeftê de hatine kuştin. Li gor ji hinek Kurdên Başûr hat zanîn, gelê wê herêmê, bi taybet jin û mîrên kal ji wê şikeftê re “Şikefta Zembîlfiroş” dibêjin. Lê belê ne eşkere ye, bê ev nav bi çî awayî li wê şikeftê hatiye danîn û çîroka wê çî ye.<sup>151</sup> Ev gotin bi ya mamoste Zeynelabidîn Zinar ve jî hevdu digre ango li gor wî jî gora wî Başûrê Kurdîstanê ye.<sup>152</sup>

Disa di van xebatan de xuya dike ku Zembîlfiroş yek ji mîrên Merwaniyan e. Kurê Ebu Nasir Ahmed e ku navê wî Seîd e.<sup>153</sup> Navê wî yê dirust Mîr Saîdê Kurê Mîr Hesên Paşayê Diyarbekir e.<sup>154</sup> Rastî di pirtûka Şerefxan ya bi navê Şerefname de navê mîrek derbas dibe û navê aslî yê Zembîlfiroş re hevdû digire. Di Şerefnamê de wusa derbas dibe: “Saîd bin Nasruddewle Ahmed / Saîd kurê Nasruddewle Ahmed”

Demeke dirêj waliyê Amedê bû. Her tim alikariya gel dikir, kar û barên wan mijûl dibû, kesên fakîr û belengaz bi saya wî rehet bûn, şefqeta wî jî bi wan re gelek zêde bu. Gel di nav ewlehî û bereketê de vê heyamê derbas kirin. Saîd kurê Nasruddewle<sup>155</sup> Ahmed sala 465(1073) çû ber dilovaniya Xwedê.”<sup>156</sup>

Di helbestê de ev yek wusa derbas dibe:

<sup>151</sup> Zivingî, **Zembîlfiroş**, r. 34.

<sup>152</sup> Zeynelabidîn Zinar, -Nivîskar- **Zembîlfiroş Çawa Jiyaye**, Ankara, 06.02.2014.

<sup>153</sup> Rdênî, **Beyta Zembîlfiroş**, r. 11-20.

<sup>154</sup> Qasim, **Çîrokên Malpera Serhat**, 2013 r.73.

<sup>155</sup> Bernavka “Nasruddewle” ji aliyê halifeyê Abbasî El-Kaadîr Bîllah Ahmed bîn Îshak bîn-El-Muktedîr Bîllah Cafer hat dayîn. Ahmed b. Mervan demeke dirêj li Amedê hikumdarî kir. Ev heyam di nav ewlehî û bereketê de derbas bû. Di nav Abbasi û Tirkan de bi ewlehi jîyan. (Şerefname, Şerefhan, wer. M.Emîn Bozarşan, Istanbul, Deng, 2010, r. 25).

<sup>156</sup> Şerefhan, **Şerefname**, wer. M.Emîn Bozarşan, Deng, 2011, r.26.

Heta gihîşte Diyarbekrê

Peya bûn ew li derê qesrê

Kurî maç kir destê babê

Âlim diken medhê Xwedê

Lewma Mîr Saîd jiyana xwe guhart û xerqê feqîra kire ber xwe û jiyana mîrîtiyê ji xwe dûr kir û bajarê Dîyarbekir bi cî hişt û berev bajarê Mêrdînê çû li maleka veder jiyana xwe û xêzana xwe bi rê ve bir û di wî kulkî da qemîş dîna û selk û zembîl çêdikirin û li bazarê difrotin û bi behayê wan nan bo xêzana xwe dikir.<sup>157</sup>

Zembîlfiroşa devkî/folklorî de derbas dibe ku ev bi xwe “Xortê Abbasi”<sup>158</sup> ye. Ji bo dewlêta Mervaniyan Destana Diroka Kurd û Kurdîstan de wusa derbas dibe:

Li qurne a neh û dehan.

Amed, Bitlis, Tatvan, Silvan

Li wê sazû hukma Merwan

Kurdên gernas, şêr û şervan<sup>159</sup>

Di pirtûka “Folklorê Kurdan” ya Ordixanê Celîl û Celîlê Celîl de derbas dibe, Zembîlfiroş, navê wî Benamên bû, navê kurê Aqûb p’êxember lêkiribûn, birê Usibê Neviya, beyt’ê da ji awa tê gotinê;

Zembîlfiroş, lawkê delal,

Ew bi k’ulfete, e’rz û h’eyal,

H’evê h’usinê Usib li bal<sup>160</sup>

Lê belê ji rastiyê dûre Zembîlfiroş bi xwe Êsîf pêxamber be. Ango tu çavkaniyek tune ku derhaqê vê yekê de mijarê zelal bike û rast derxe. Mijareke din jî nusxeyên cuda de ev yek bi tu awayî bi Zûleyxa û Êsîf Pêxamber ve nayê ba hevdu. Lêhengê çirokê diyarin û bi tu awayî xwe nagihînin qissa Êsîf Nebî. Belê Êsîf Nebî kî ye?

<sup>157</sup> Şemo Qasim, **Çirokên Malpera Serhat**, r.74.

<sup>158</sup> Ahmed b. Mervan demeke dirêj li Amedê hikumdarî kir. Ev heyam di nav ewlehî û bereketê de derbas bû. Di nav Abbasi û Tirkan de bi ewlehi jiyana, mîrê Tirkan Tugrul Beg bi xwe jî wî mîrê Amedê nas kir. (Şerefname, r. 25).

<sup>159</sup> Rıza Çolpan, **Destana Diroka Kurd û Kurdîstan**, Sydney/Australia, weş. Dersim, , 1995, r.80.

<sup>160</sup> Ordixanê Celîl, Celîlê Celîl, **Zargotîna Kurdan**, Moskov/Rusya, weş. Naûka, 1978, r.189.

Kurê Ye'qûb û Rahîle ye. Pêxember bû, bab û bapîrên wî jî herwisa pêxember bûn. Êsif di Qur'anê de wekî kurê Ye'qûb tê nasandin paşî wekî lehengekê derdikev pêş. Ew jî bi dîtina xewna wî ye. Di vê çîrokê de Êsif bi hin nav û sifetan tê tewsîfkirin wekî "Mahê Ken'an", "Êsifê pak", "Êsifê xûb" û "zî-cemal"... Di gelek metnan de ji bo tewsîfa Êsif metafora "roj"ê tête bikarînan. Bi vî şiklî ve jî xuya dibe ku ji destpêka çîrokê heta dawiyê ew her dem "ciwan" e û ciwanî û keşxebûna wî "mukemmel" e û ew heta mirinê wisa tê nasandin. Lê piştî ku Êsif ketiye zindanê û jê derketiye Zelîxa wek "pîrejinek" kirêtbûyî tê nasandin ta ku Êsif pê re zewicî. Li vir jî, wekî di gelek mesnewiyên din de derbas dibe, bedewî yan jî ciwanî ligel "dînperweriyê" yan jî "xwestina eşqa meşrû" ve girêdayî ye. Lewra di wan mesnewiyan de fona îslamê muhîm e ku gava leheng ji "rêya xirab" ber bi ya heq ve zivirî, ciwanî ji nû ve tê û eşqa meşrû peyda dibe. Wêca li vir Êsif her dem di nava daîreya meşrûiyetê de ye ku ew hem pêxember e hem jî xwe nêzîkê tiştê "heram" û "nemeşrû" nekiriye. Bi vî şiklî jî wesfê wî yê din peyda dibe: "iffet." Kirasê Êsif li paş ve tê dirandin lewra ew temsîla eşqa Xwedayî dike û li gor Qur'anê û hin vehênokan wî meyla Zelîxayê kiribit jî, Xweda ew parastiye. Bi her awayî ew temsîla gelek tiştan e, lê yên ku herî derdikevine pêş ev in: "iffet" û "sebr."<sup>161</sup>

Ji ber vê xweşikiya rûyê Zembîlfiroş bi cindîtiyek cuda her wek Êsif Nebî ji ciwanên dî cuda ye. Ev yek beriya ku rê guhertinê jî xwe nîşan dide û bi vê xweşikbûna xwe ve balê dikişîne. Weke hin lêkolîner û mufessîran rûyê Êsifî bi metafora neynûkê îzeh kirine. Yanî cemala Êsifî ayîneyek e ku di wê de nûra Xwedayî û evîna îlahî tecellî dikir. Ji ber vê Zembîlfiroş bi xweşikî û bedewbûna xwe bi "husnekî Êsif li bal bû" ve tê nasîn. Bi tu awayî lê nayê kirin ku ew bi xwe Êsif Nebî be. Ji bilî vê mesneviya FT di dema ji Xwedayê xwe daxwaz dike wî ji vê zexmetê biparêze qala Êsif Nebî jî dike:

Êsif wekî 'ebdal kirî

Lê înan ser siltenetê

<sup>161</sup> Selîmiyê Hîzanî, **Yûsuf û Zuleyxa**, Ayhan Geverî (wer), r.77.

### 3.2.2. Xatûnê an Gul Xatûn

Xatûn; navdêr, şabanî, qralîçe, stî, xatûn, melîke. Jinên di nav civakê de xwedî ast an jinên mîr û beg an.<sup>162</sup>

Di helbesta MB navê wê wek “Gul Xatûn” tê binav kirin. Di helbesta FT de nav ne diyar e tenê bi pênasaya xwe ve tê naskirin.

Xatûn an li gor MB Gul Xatûn ê. Bi bedewî, xweşikî û desthiletariya xwe ve navû deng e. Wek Zelîxaya Misrê a jina Potîfarî ye. Her çi ji dil xwestî be bi dest xisti ye, gotina yekê nebûye dubare. Di vê çîrokê de Xatûnê temsîla eşq û evîndarî û rindiyê ye. Li gor MB ev bi xwe xweşik û bedewiya xwe nav û deng e. Jiber ku desthilatdar e û dest digihîje hemû cihan tu asteng ji xwe re nabîne û tiştê ji Zembîlfiroş dixwaze bi hêsanî bilev dike.

Xatûnê jinek hêzdar û bedew e. Di çîroka Zembîlfiroş li hemberî daxwaza xwe tiştê pêşkeşî Wî dike vê yekê bi avayek zelal radixe ber cavan.

Gelek caran mêrxasên jinîn, mêrxasên mêrîn dixin bin bandûr û kontrola xwe, mêran ji xirabiyê, ji rojên reş diparêzin, rîyên rast nîşanî wan didin. Heta niha rûberîhevkirina destanên Kurdî zede nehatine pêkanîn. Ne tenê rûberîhevkirina wan, ev berhemana îro çawa em dibînin hê nehatine berhev kirin, derbasî li ser kaxiz jî nebûne. Ji ber van dijwarîyan, îmkana û mecala li ser van berhemana kar kirin, lêkolîn çêkirin jî bêguman jar û qels dikeve an jî pêk nayên. Dema mirov van berhemana rûberî hev dike, mirov rastî zaniyarî, agahdarî û encamên gelek giranbiha tê. Ji ber ku ev hezaran sal e, ev berhemana li ser zar-zimanê gel digerin, gel jî bawerî, gotin û ceribandînan xwe yê bi salan tevî van berhemana kirine, ew dewlemend kirine, tehr û rengêkî nûh dane wan, di dawiyê de ev berhemana bûne dewlemendîke folklorîk.<sup>163</sup>

Tiştêkî balkêş ev e Xatûn desthiletar e. Bi destê xwe ji Zembîlfiroş re wezîrî û mîrîtî dide. Di destanên Kurdî de gelek caran em rastî rêça rûçik û sûretên civata maderşahî - civata ku bandûra dayîkan- jinan lê zêde ye- tên. Di çend destanan de serdestiya jinan zêtir e, ew xwe nadin hincirandin, êşandin û zêrandinê. Ew di her wargê jîyînê de xwedî maf in, serbest in. Di folklorê kurdan de ev yek her tim bi awayek eşkere dertê pêş. Dema mirov destana Memê Alan û Zîna Zêdan (Mem û Zîn) mêze

<sup>162</sup> TDK, Büyük Türkçe, [http://www.tdk.gov.tr/index.php?option=com\\_bts](http://www.tdk.gov.tr/index.php?option=com_bts), 02.07.2014.

<sup>163</sup> Alakom, **Di Folklorê Kurdî de Serdestiyeke Jinan**, r.67.



dike, tiştê bala mirovan zêtir dikşîne ser xwe, bêguman pirsra azadîya jinan e. Zîn, di vê destanê de nîşana azadîyê ye. Ev keça Kurd, ji bo ku bigihêje mirazê xwe, li dijî birayê xwe mîrê Cizîra Botan, fend-fêl, dek-dolavên Bekoyê Eyan bi xurtî radiweste, van pêwendîyên nemirovî bi mirina xwe ve protesto dike. Ev serhildana keçekê li dijî mîrekî karekî ewqas piçûk û hêsan nîne. Dîsa jî ew ya xwe dike, ji bo evînê ker-gêj dibe, di dawîya destanê de çawa em dibînin, ew vê dinyayê protesto dike û jê bar dike, can dide. Berçav û serrast dikin. Ji alîyê din jina birayê mezin Hesên, ew jina bi navê Stî hemû îmkanan ji Mem re amade dike, Hesên, Mem dibe "hela jinan", nasîya wî û jinan dide hev. Di destanê de rola Stîyê tim û tim qenc û pozîtîf e. Hesên û jina wî dixwazin ji hev evînîya van herdu dilketîyan re bibin alîkar, tu alternatîfeke mayîn nabînin. Di vê beşê destanê de hurmeteke mezin ji bo jinan peyda dibe. Dema Zîn biryarê xwe diguhirîne – Çeko berdide, dilê wê dikeve Mem ev biryara dijayetîkê di nav vê malbatê de peyda nake. Hemû ev yekan nîşan didin ku, gotin "gotina jinan" bûye. Bi kurtî tema jinan di nav çîrokên Kurdî cîhekî fireh digire.

Dema em van çîrokan bi çavekî rexnegirî analîz dikin, jin di du warî de gelek aktîfîn. Ji alîkî de ew bi xurtî li dijî neheqîyên li wan bûyî, radiwestin, şer dikin, ji alîkî de jî wek pêşeng û rêber bi zanebûn û famdarîya xwe ve rê nîşanî mêran didin, di nav çîrokan de motîfa jinên tekoşer peyda dikin. Ew tevî raberzînen "jin tabî ê mêr e an mêr tabîê jin e" dibin, ew di çend çîrokan de îspat dikin, nîşan didin ku, timê "jin ne tabîê mêr e", ew gelek hewl didin ku nîşandin wekî mêr jî dikarin tabîê jinan bibin. Çawa tê zanîn karên ku jin di nav malê de dikin bêhejmarin, ne tenê karên malê, li der malê jî jin timê mijûl in, di warê bicîhanîna karên der û hûndur de sebira jinên Kurd bêsînor e. Di çîroka Mêr Neşên Bibin Kevanî de dema zilamekî cotkar bi jina xwe ve pevdiçe, mirûzê xwe dike wekî şiv tune, rojekê jin dibêjê de were tu bi karên malê ve mijûl bibe, ez li şuna te herim cot, dema jinik êvarê vedigere mal, mêze dike ku çi malwêranî. Mêrê wê poşman dibe, rojtira din dîsa diçe li sercotê xwe<sup>164</sup>

Di çîroka Qirx Saçlîyê de em rastî jineke wusan tekoşer tên. Ew terkeseî dinê dibe, di rê de rastî gelek kesan tê, ev kesen çav ber didin wê, dixwazin bi wê re bizewicin, dest davêjjine wê, lê belê Qirx Saçlî her carekê rêkê dibîne, pêşîra xwe ji vê koma mêran wan xelas dike. Carekê rastî padîşahekî tê, sî û neh jinê wî hebûne,

---

<sup>164</sup> M. Emîn Bozarşan, **Pêkenokên Geli**, Swed, weş. Deng, 1988.r. 30-32.

dixwaze Qirx Saçlîyê jî bixwaze jinê xwe bike çilî. Qirx Saçlî, padîşah dixapîne û sî û neh jinên wî jî hildide direve, diçe. Vê carê rastî komeke çil mêran tê. Ev çil mêr dixwazin, bi van çil keçan re bizewicin. Qirx Saçlî, bi keçên hevalên xwe ve lê dixin koka van çil mêrî tînin, paşê dikevîne rîya xwe. Rojekê tînin cîhekî dibînin ku padîşahê wî welatî mirîye, teyrê dewletê difirînin, angorî edetên wan salan, teyr serê kê danîya, ew dibû padîşahê wî welatî. Vê carê teyr tê datîne sere Qirx Saçlîyê, Qirx Saçlî dibe padîşah, wan sî û neh keçikên din jî dike wezîr, wekîl û karên mayînan dide wan, meclîseke tenê ji jinan pêkhatî ava dike. Di dawîya çîrokê de, ew kesên ku berê di rê de rastî wê hatibûn, dest avîtinê wê, angorî kirinên wan Qirx Saçlî tîne cezayan dide wan, kesên bi heq û neheq ji hev cuda dike<sup>165</sup> Çîroka Qirx Saçlîyê nîşan dide ku jin dikarin di heqê her tiştî de derkevin, serkevin û bigihêjin serfirazîyê. Di çend çîrokên Kurdî em rastî jinên wusan tînin ku li dî jî dijminên xwe seferber dibin, karên xwe bi serfirazî diqedînin, digihêjin armancên xwe Çend çîrokên Kurdî jî jin hene, nîşan didin ku jin dikarin gelek caran lîstikên mezînan bin serê mêran, li ser tilîke xwe van mêran bidin lîstinê. Di Çîrokên Jina Bêter<sup>166</sup> û Masîyên Bejî<sup>167</sup> de, em rastî jineke wusan tînin, dikare mêrê xwe bide bawer kirin wekî di nav zevîyan de jî masî dikarin peyda bin û mêr jî bawer dike. Bêterîya jinan carcar digihêje sînorekî wusan, îrada wan bi mirinê jî dawî nabe ji van jinan re dibêjin koma jinên serhişk. Rojekê mêrek û jina xwe diçin nav zevîyê, dinêrin kiroşkek ji nav zevîyê revî çû. Jinik dibêje, ew rûvî ye, mêr dibêje na jinik ew ne rûvîye, ew kiroşke. Mêr çî dike-nake nikare jina xwe bide bawer kirin, dawîya dawî dema mirina jinikê tê û mêr jê re dibêje ew kiroşk bû jin disa qebûl nake û dibêje na ew ne kiroşke rûvîbû.<sup>168</sup>

Bi kurtahî di çîrokên Kurdî her çiqas li pêşberî miraz, bext û dilşahîya evîndaran gelek dijwarî, tengasî û asteng peyda dibin jî, ew dîsa bi serfirazî vedigerin tînin, digihêjin hev. Bi taybetî jin ji ber van dijwarî û tengasîyan tu wext stûyê xwe xar nakin, timê aktîf in. Di gelek çîrokan de ew tînin hûrê rawiran dixin serê xwe, dikevîne dilqê keçelan, ji ber ku kes şikê nebe wan, ew herîmkanên xelasîyê diceribînin. Motîfa “jina keçelok” ji alîkî de aktîfbûna jinan nîşan dide<sup>169</sup> Di vê kefteleft, şer û tekoşîna xelasîyê de, çend hêzên çîrokî jî timê amade ne, tînin hewarîya evîndaran, keç-xortan, alîkarîya wan dikin,

<sup>165</sup> Alakom, **Di Folklorê Kurdî de Serdestîyeke Jinan**, r. 36.

<sup>166</sup> Ordixanê Celîl û Celîlê Celîl, **Zargotîna Kurda**, r. 221.

<sup>167</sup> Bozarşan, **Pêkenokên Gelî**, r.60-64.

<sup>168</sup> Ordixanê Celîl û Celîlê Celîl, **Zargotîna Kurda**, r.221.

<sup>169</sup> Hecîyê Cindî, **Hikayetên Civata Kurdan**, Rusya, Apec, 1998, r 72-78.

wek secade, xaliçên firoke, teyrê sîmir, şiva qudretê jin an jî keça dêw<sup>170</sup>... Ev yekîfî, destbirakî û dostayetî, çawa em dibinin wusan xurt e, ku di dawîyê de, zora wî dêwê herî xurt, Canpolat jî dibe, heft derîyê wî yên pola jî êdî kêrî tişteki nayên, wek mêrê rojên teng Mîrze Memûd çawa wê keçika bedew Çilkezîyê ji destê Canpolat xilas dike, Çilkezîyê digihîne mirazê wê, em dibînin ku dawîya her çîrokekê de mizgînîya şahîyê bi lez diçe digihêje dê-bavan, mirov dikare bêje ku dawîya her çîrokekê de dîlanek heye.<sup>171</sup>

Di destana Laz û Xezal de, em rastî civateke wusan tên ku li ser jinan tu zordestîke wusan berbiçav, nayên dîtin. Xanzad, piştî mirina bavê xwe dibe seroka eşîra Balekîya, hejmara malbatên vê eşîrê hezar û hefsed bûye, hemû rêvabirina karên eşîrê dikeve li ser milên wê. Ev yek jî nîşan dide ku di salê gelek kevn de serdestîke jinan hebûye.

Di Destana Laz û Xezal de vê carê strukturekî pêwendîyên cuda peyda dibe. Vê carê du keç (Xanzad û Xezal) dibin evîndarê Laz. Ji der pevçûna ser keçan vê carê em rastî pevçûn an jî rekabeteke li ser xortan tên. Herdu keç jî bi aktîfî tevî vê rekabetê dibin, giranî û bandûran nîşan didin. Ji ber vê yekî jî, ev destana ji destanên Kurd yên mayîn parîkî cudatir e. Laz û Xanzad kurap û dotmamên hev in, nîşanîya wan dibe, piştî mirina bavên Laz û Xanzadê, rêvabirina karên malbatên eşîra wan dikeve li ser milê Xanzadê (nîşanîya Laz). Ji ber ku Laz vê nîşanîya xwe ber dide vê carê dibe evîndarê keçeke ji eşîreke mayîn, navê wê Xezal e. Dilê wangelekî dikeve hev, nazewicin, lê bi hevra radizên, bi hevra dimînin. Di navbera van herdu keçan de bivê-nevê dilsarîk peyda dibe, lê belê herdu jî heta mirina Laz pêwendîyên xwe, silavên xwe ji wî qût nakin. Ev herdû keç her çiqas ji hevdu sar bubun jî, li dijî hev in û naxwazin Laz ji destê xwe derxin jî, dîsa jî roja mirina Laz, di şîna wî de beşdar dibin, bi tevayî hildidin, dikine gora wî, paşê Xanzad lédixe diçe nav eşîra xwe, Xezal li wir dimîne.

Destana Laz û Xezal, ji alîkî de wek destana Ferx û Astî ye, di herdu destanan de dijayetîke sêserî heye. Di destana Ferx û Astî de struktura mêr-jin-mêr, di destana Laz û Xezal de struktura jin -mêr-jin, pêwendî û bûyerên ku di van destanan de hene, di bin bandûra xwe de dihêlin, ji hev cihê dikin. Ji alîyê din di herdû destanan de evîndarîke romantîk heye, herdu destan wek stran, dilok û helbestan gelek lîrik in. Ji alîyê din, di salên kevn nav civata Kurd de ji bo ronîkirina cîhê jinan, gelek hînkari û rênîşandar in.

<sup>170</sup> h. b. r. 98-106.

<sup>171</sup> h. b. r. 17-42.

Ev hemû babet û çîrokên ku me anîn ber hev aktîfbûna jinên dîrokî û çîrokan de aktîfbûna jinan e. Jin, li hember zilm û zordariyê de lehenga bêdeng an evîndariyê de lêhenga bi nav û deng e. Dibe ku rol an cîh were guhertin lê belê bandora jinan ya li ser dîrokê qet naguhere. Bi aktîfbûna wê an jî bêdengiya mazlûmanî... Çîroka Zembîlfiroş de jî ev wusa ye. Him mesneviya Feqî him jî ya Mîradxan de peznê Xatûnê jiber vê yekê ye. Li gor her du alîman ve kirariyên Xatûnê li gor adet û kevneşopiyan tevgerên nayên qebûlkirin in lê belê bi devê van alîman peznê Xatûn dîsa bi bedeviya wê ve hatiye nivîsandin û xemilandin. MB mesneviya xwe de zêdetir bi devê Zembîlfiroş xweşikî û bedewiya Gul Xatûnê tîne ziman:

Xatûna gerden bi morî

Dem wekû sorgula sorî

Sîng û ber ji heddî borî

Tirsa min ji rebbê jorî

Xatûnê erê xatûnê

Tu bejin darî zeytûnê

Çav weke agra bitûnê

Tirsa min ji roja nexoş

Xatûna şeng û şepal e

Çav rewşa ya çav xezal e

Rû sor e gerden bi xal e

Min berde da biçme mal e

Ev mesnewi ji mesnewiyên din bi evina jinê ve cuda dibe. Lehenga sereke ya evîndar jin e. Jin di evîne de rol-model e û di reya eşqê de ew êş û janan dikşîne. Ev rewş bereksê evîndariya lehengên mesnewiyên din e. Lewra di meseleya eşqê de tîpê aktîf mêr e û jin pasîfin; mer aşiq û jin maşûq in. Lê di Zembîlfiroş de muqabilê vê

çarçoveya qedîmî tevn û seyra çîrokê berevajî ye. Ew jî giringî û xweşikiya çîrokê zedetir derdixê pêş. Her çikas Xatûnê xweşikiya xwe li gor namûsê ne kiribe jî.

Di destana Zembîlfiroş de jina mîr bi awayekî eşkere evîna xwe ji Zembîlfiroş re dibêje û piştî ku daxwaza wê qebûl nabe, ji bo ku bigihêje meqsed û miradê xwe gelek dek û dolaban dizivîrîne. Tiştê balkêş ew e ku tevgera Xatûnê, bi qasî ku ji Destan/kilamê tê fêmkirin, ji aliyê civakê ve raberî tu astengiyan nehatiye. Bi ser de civakê hinekî barê tesewîfê jî lê bar kiriye( ev yek ne li gor mesnewiyên MB û FT ne li gor devkî hatiye şîrove kirin) û pîştgirî daye tevgera Xatûnê. Bi kurtî em dikarin bibêjin ku civata kurd her ne wek hev e. Li gor rewşên civakî, aborî, demê, bawerî û siyasî statûya jinan guheriye. Bi taybetî pêdiviyên rojane tevgera jinan diyar kiriye. Jinên ku di nava bajaran de jiyane, heke ji malbateke dewlemend bûne, rewşa wan ji jinên çîna jêrîn baştir bûye. Jinên gundî ji jinên axa û began azadtir bûne. Vê rewşê bandora xwe li stranan jî kiriye. Stranên ku li ser evînê hatine afirandin de bêtir jinên xwediyê statûyeke baş li pêş in. Edulê, keçika Zor Temir Paşa ye, Asê, jina Sîd Axayê Feyzo ye, Zembîlfiroş, jina mîrê Farqînê ye û hwd.<sup>172</sup>

FT di helbesta xwe de bedewiya Xatûnê bi zimanê şaxsê sêyemîn tîne ziman. Çavek din dikeve çîrokê û bedewiya bêhempa ew bi xwe vedibêje. Ev kes jî bi xwe “Feqî” ye. Em dikarin bêjin ku di behrên MB devê Zembîlfiroş her çikas xweşikî û bedewiya Xatûnê derketibe pêş jî bi destê FT Zembîlfiroş napeyîve medha cariyê qey tu dibê yekî din tîne zimên:

Ew carîye pir lîp û bend e

Law bi bal mîran vexwende

Dît şîpalek lep ji qende

Qet kes nedabû wesfetê

Zembîlfiroş dikeve hundir bi vexwendina cariyê û tiştî dibîne bi destê nivîskar ve balkeş e. “Qet kes nedabû wesfetê” ji xweşikiya xwe tu tîstek nedabû yekî din.

Xatûnê bi riya şehwetî û xwesta lezzetî Zembîlfiroş dixwaze. Lê belê qet xort xwe nêzîkî wê nak e. Em dikarin li vê derê bibêjin gelo Xatûnê çima bi Zembîlfiroş re

---

<sup>172</sup> J.S. Musaelyan, **Poema Kurdî û Şaxên Wê Yên Edebî û Folklorî**, wer. Rohat Alakom, Stockholm/Swêd, weş. Nûdem, 1994, r.86.

nazewice. Li gor Feqiyê Teyran ev yek ne li gor ûsul û adetê ye. Li gor hin çavkanî û şîroveyan mêrê Gul Xatûn mirî ye ji ber vê yekê daxwaza Xatûnê ne ku xapandina merê xwe ye. Desthilatdarê Farqînê keybanûya Gul Xatun bi xwe ye. Merê Xatûnê şer de can da ye û Xatûn bi xwe ma ye. Ya duyemîn jî ewe ku li gor bawerî usul û adetê daxwaza Xatunê ne tişteki rast e. Ji bo keyf û nefsa xwe tevdigere û xwesta demekê dixwaze ji Zembîlfiroş. Li vê derê tişteki balkêş jî ewe. Heke Xatûnê jinebî be çima Zembîlfiroş re nazewice? Bersiva vê yekê jî em dikarin wusa bidin: Xatûn Zembîlfiroş yekî parsek û xîzan dibîne ji ber vê yekê wî ne li gorî asta xwe dibîne ji ber vê yekê daxwaza zewacê nake. Ev şîrove li gorî weryanta Feqiyê Teyran e.<sup>173</sup> Di naveroka FT de em vê yekê dibînin ku Xatûnê qet naxwaze bibe jina Zembîlfiroş tenê derdeke wê heye ew jî “min bi te daye evîne, da bibînim ji te lezzetê” ye. Demek bihûrbar de tozek lezzet, şehwet û nefse...

Em helbesta MB de gotinên Gul Xatûnê bi awayek eşkere dibînin ku Xatûn dixwaze bi wî re bimîne. Ji bo teklîfa xwe bide pejirandin sê rêyan diceribîne.

1. Maqam, mal û milkê xwe dide ber wî

Xatûn dibêt lawê derwêş

Kerem bike tu were pêş

Selka mezin bi zêr bikêş

Ya biçûk qîmta bibêj

Piştî li hember bersiva Zembîlfiroş Xatûnê israra xwe didomîne:

Tu were guh bide min

Li te helal bibit xanî min

Dê te kim merûyek mezin

Bi qesr û maleka xoş

Were ey lawê feqîr

---

<sup>173</sup> Ali Karadeniz, “Di nav berhemên dîvanê de çîroka Zembîlfiroş” Ankara, (d.d. 04.06.2014).

Rûnê ser doşeka mîr

Têkvede zulfê herîr

Ez paşî dê te kim wezîr

Rûpelên pêş de emê vê yekê zelaltir bikin ango Xatûnê desthilatdareke cawa ye ku Zembîlfiroş dikare bike wezîr. FT vê yekê dibêje û mijara jinebîbûna Xatûnê de delîlek berbîçav jî radixe ber çavan. Heke Xatûn Zembîlfiroşekî parsek dikaribe bike wezîr, wê demê gotinên ku dibêjin “desthilatdar bi xwe Xatûnê ye” rast dertînin.

2. Xatûn, dema Zembîlfiroş qanî nake rêyek din dicerîbîne û jê re dibêje ji vê baweriyê dur bikeve û vê dema xweş ji dest hunda neke:

Qiyametê bike ji bîr

Li dest neke ev roja xoş

...

Xatûn dibêt birû qeytan

Dilê min qet naçît selkan

Me-j te divêt keyf û seyran

Hem kirdinî keyfeka xoş

Dilê min wî bo te sotî

Naçî tu bê bezmeka xoş

Her sê behran jî Xatûnê derd û kulê xwe tîne zimên, lê dema Zembîlfiroş dîsa nez nabe rêya sêyemîn dicerîbîne: gef, tehdît û tehde... Ev yek jî gotinen Zelîxaya Mîsrê tîne bîra mirovan.

Xatûn dibêt ez we nakim

Te li zîndanê hepsa kim

Jin û biçûkan fena kim

Yan dê cem bî şev û roj

Ev her sê rêyên tên ceribandin ne reyên bi usulin. Em vê yekê çîroka Yusûf û Zelîxayê de jî dibînin. Zelîxa beriya her tiştî bi xweşikî Ûsif re tevdigere lê dema daxwaza wê nayê cîh tevgerê xwe duguherîne heta ku bide kabulkirin wî dawêje zîndanê û tehde lê dike. Lê belê ciyê Xatûnê li hember Zelîxayê ciyek cuda ye. Li gor jêderkên me bi dest xistiye dema Xatûnê, gel misilman e û li gor dîne Îslamê daxwaza Xatûnê gunehê mezîn e. Ji bilî vê ev daxwaz, ne li gor adet û usulê ye ku heke werê bîhistin ji bo wê pisgirêkek şerm e. Lê belê çavê nefse reş e û qet dawîya daxwaza xwe nafikire hetta vê yekê cariyeyên xwe re wedibêje:

Dibêjîte xweha me şîrîn e

Lez bike tu bilezîne

Xwedanî sela ji bo min bîne

Selikê wî qewî cindî ne

Xudamî lezkir lezandî

Xwe bi derwîşî gihandî

Ew ji bo qesrê weşandî

Xatûnê xwe xemilandî (MB)

Di mesnewiyên din de çawa ku ji bo maşûqa xwe Mecnûn, Ferhad û Mem dinalin û dikevine her cur êş û azarê, Xatûnê jî di vê mesnewiyê de beramberê van aşiqan, “aşîqa jin” e. Bi vî awayî ve cinsiyeta “tîp”a lehenga mesnewiyan diguhere ku jinek li pey mêrekî diçe<sup>174</sup>, wekî ku Zelîxa ketiye pey Ûsif.

Di van çarmalkiyande xuya dibe Xatûnê ji xulaman dixwaze da ku wî selikfiroşê han bînin qesrê. Di çarmalkiyên Feqî jî bi vî awayî ye:

Muhebbetê keç mubtela kir

Sir li carîya aşkera kir

Lawekî qelbim cuda kir

Min ji ‘eşqan xew netê (FT)

---

<sup>174</sup> h. b. r. 82.



Ev jî nîşan dide tirsaxatûnê ji ber gajinç û gotinan nîne, ew tenê dixwaze. Ev daxwaz her çikas li gor asta wê tiştêkî nebaş bê jî. Dema em Zelîxayê meze dikin dibînin ku di Qur'anê de derheqê baweriya Zelîxayê de tiştêk nehatiye gotin ka ew li ser dîne Êsif bû yan ne. Lê di vê çîrokê tê gotin ku wê bawerî bi put û seneman dianî û gava ew negihîştîye Êsif wê ew pût li erdê daye û şikandiye. Bi vî şiklî xuya ye ew ne li ser dîne Êsif bû. Feqet helbestvanên klasîk van çîrokan di çaroveya dema xwe ya Îslamî de dibînin û li gor wê şîrove dikin. Lewra beriya ku Zelîxa, Êsif bibîne, li Misrê xerîbiya malbata xwe dike û wisa -wek jineke Misliman- dia diket:

Der Misrê xerîb mame mehcûr

Hîvî tu'yî ya Xeffar û Xeffûr<sup>175</sup>

Feqet her çawa be Xatûnê tîmsala eşq û vînek bêhempa ye li hember Zembîlfiroş e. Qet dev jê bernade û heta ber mirinê ve jî diçe( ev yek li gor folklorê ye) Di mesnewiyên din de çawa ku ji bo maşûqa xwe Mecnûn, Ferhad û Mem dinalin û dikevîne her çêşîd êş û azarê, Xatûnê jî di vê mesnewiyê de beramberê van aşîqan, "aşîqa jin" e. Bi vî awayî ve cinsiyeta "tîp" a lehenga mesnewiyên diguhere ku jinek li pey mêrekî diçe, wekî ku Gulxatûn ketiye pey Zembîlfiroş. Divê em vî tiştî jî ji bîr nekin ku eşq li aliyekî, estetîk jî di van metnan de muhîm e ku çawa di mesnewiyên din de lehengên jin ên wekî Leyla, Şîrîn û Zînê -yanî maşûq- sembola rindî û estetîkê bin, di Zembîlfiroş û Gul Xatûnê de jî yê simbol "Zembîlfiroş e".

Divê nehête jibîrkin ku mesnewiyên evînî li gor geheştin yan jî negeheştina aşîqan -yanî li gor wusletê- dihêne dabeşkirin. Li gor nêrîna vê eşqê, ya ku di edebiyata klasîk de, wuslet û giheştin taybetmendiyek zêf û bêkêr e ku vê eşqê bêqîmet dike. Lewra eşq gava bi firqetê ve bi negihîştinê ve encam da hingî ew eşq pîroztir dibe. Lê ev nêrîn piranî di metnên tesewwufî de tene dîtin û mesnewiyên ji bo şehzadeyan hatine nivîsîn -yanî lehengên wê yê aşîq şehzade bûn- piranî bi gihiştinê ve xilas dibin. Lê di mesnewiyên evînî yê lehengên wan ne şehzade ne, gihiştin û wuslet ji bo dinyaya dî dimîne; wekî Mem û Zîn, Leyla û Mecnûn... Feqet divê bête zanîn ku evîndariya şehzadeyekî, ku ew namzedê siltaniya welatekî ye, lazim e bi wusletê bête encam dan, da ku ew evîndarî nekeve devê kesekî.<sup>176</sup>

<sup>175</sup> Hîzanî, Selîmiyê Hîzanî, **Yûsuf û Zuleyxa**, Ayhan Geverî (wer), r. 81.

<sup>176</sup> h. b. r. 84.

### 3.2.3. Mîr

Lehengê din “Mîr” e. Di çîrokê de du “Mîr” henin. Yek bavê Zembîlfiroş yê din jî mêrê Xatûnê ye. Bi her du cînavka ve mîr xwedî rehm û desthilatdariyê ye. Dema Zembîlfiroş digirî diya Zembîlfiroş dibê bakine padîşah û wezîran. Li vê derê Mîr dikeve çîrokê heta dawiya çîrokê jî navê wî derbas nabe. Dawiya çîrokê de cardin dikeve çîrokê û teht û siltenatê dide ber Zembîlfiroş. Li gor “Pirtûka Serhadê ya Şemo Qasim” navê wî yê esil “Ahmet b. Mervan” e. Di Şerefnameyê ev kes wusa tê nasandin: Di dema halifeyê Ebbasî El Kaadîr Bîllah Ahmet bîn Îshak bîn El –Muktedîr Bîllah Cafer navê wî bilind bû û li hemû deran belav bû. Hetta halîfe ji ber vê yekê navê wî kir “Nassruddevle”. 80 sal dewleta xwe di nav ewlehî û firehiyê de rêve bir û bi awayek azad 52 sal desthilatdar bû. Siltanê Selçukiyan Tugrul Beg re sefirek şand û îtaata xwe anî zimên, ji bilî vê gelek diyarî û xelatan ji jê re şand hetta di nav diyariyan de berdelî buhayek mezin ji kralê Deylemê yaqûtek jî hebû. Wezîr Fahruddevle b. Cuheyr ku wezîriya halifeyê Ebbasî jî kiribû bû wezîrê Ahmed b. Mervan sala 453(1061 M) bi ecelê xwe mir.<sup>177</sup>

Mîrzade ji dema xwe şîyar dibe xanima wî gazî dê û bavê wî dike:

Lez diket û dilezînit

Dak û baban pê b-hesînit (MB)

Zembîlfiroş dema xewna xwe jina xwe re dibêje û jin wî qanî nake vê yekê radigihînin deya Zembîlfiroş. Dema civatê dayîk û bav rûberî hev kirine, dane pêşberî hev, civatê li alîyê dayîkan cîh girtîye: “dê ji bav şîrîntir e”. Çima gelo ev bawerî bi salan wek gotineke pêşîya li ser zar-zimanê mirovan gerîyaye? Bi çend gotinên mayîn ve civatê bersîva vê pîrsê jî daye: “Dê hejandîye, dê mêjandîye. Zarok li ser milê dê mezin dibin. Zarok ya dê ye, ne ya bavê ye”.<sup>178</sup>

Di warê mezinkirina zarokan de keda dayîkan zêde ye, ev peyvên zêrîn ji bo dayîkan hatine gotin. Ji alîkî de her çiqas her jin dayîk nîn be jî, ev peyv bi tevayî ji bo jinan jî hatine gotin. Çawa em dibînin ew rûmeta ku civatê daye dayîkan, ewqas nedaye bavan, civatê angorî keda mirovan adalet belav kirîye: “bav dimire zar nizanin bavê wan mirîye, dê dimire stûyê wan xar dibe.”

<sup>177</sup> Şerefname, r.25.

<sup>178</sup> Alakom, *Di Folklorê Kurdî de Serdestiyeke Jinan*, r.47.

Dayik rabû dilezînit

Cewab bo padşa dighînit (MB)

Û dayîk di nav zar û bav de ciyê pirê digre, buyerê digihîne bavê Zembîlfiroş. Nişana rastiye ji li vê derê axaftina wan diyar dike ku ev her tim di nav malbatan de heman e. Di metnên FT em rastî Mîr nabin ev beyt û nav bi tevayî ji ya Miradxan hatine girtin.

Û mîrê din yê mîrê Gul Xatûnê; ketina çîroke leqayî malbata Zembîlfiroş destpê dike:

Yek ji wan şeklê mîran bû

Ewî siwarek meşand bû

Ev rizqe bo cemand bû

Biçûk dixwe bi dilêkî xoş

Mîradxan vî mîrî yekî dil rehm û camer dide nasandin. Mîr di dema ji seferê tê leqayî malbata Zembîlfiroş dibe û mîr ji vê xalê pê ve dikeve çîrokê. Nan û xwarin dide zaroyê Zembîlfiroş û dixwaze vê malbata belengaz bîne qesrê ciyek ji wana re çebike:

Min fikre derwêş bibînim

Ew û ‘eyal bicêmînim

Wan li qesrek xoş daînim

Da ew bijîn bi halek xoş

Beriya vê gotinê mîr ji rûyê xwe diyar dike ku ji rewşa vê malbate tahmsar buy e:

Gul Xatûn ji tirsê dibêjt

Mîrê min çi erd li te dîşt

Ne rehtiya te ji kê bît

Te dibînim zor dil nexoş

Mîr dibêjt jinê ye

Dema ez hatim ji rê ye

Eyalek min dî li çolê ye

Zarû girî û bîrsî û nexoş

Min got lew ‘eyalê kî ye

Bîrsî û rûsî li wê ‘erdî ye

Gotin bab derwêş Xwedê ye

Derketye selkan bifroş

Zembîlfiroş ciyê ku jê reviya ye dîsa bi destê mîr tê di nav qesrê de cîh dibe, li nik Xatûnê.

### **3.3. DI FOKLORÊ DE QONAXÊN CUDA YÊ ÇÎROKA ZEMBÎLFIROŞ**

Folklor; têgeheke Îngilîzî û zanistî ye. Cara yekemîn di sala 1846an de ji aliye W.J.Thoms ve hatiye bikaranîn. Ji folk (gel) û lore (zanist) pêk tê. Ango folklor zanista gel e. Gelê Alman ji bo vê zanistê peyva “volksunde”, îtalyan, “le tradîzonî popolari” bi kar tînin. Folklor carna wek edebîyata devkî, carna jî wek bi zargotin jî tê bi nav kirin, edebîyateke kollektîf e, xelkê bi xwe ev edebîyata efrandîye, nivîskarên vê edebîyatê tune ne, ev edebîyata bi salan li ser zar-zimana maye, xwe parastîye, xwe nûh kirîye, dewlemend kirîye, bûye malê xelkê Kurd. Folklor a Kurdî jî, çawa em dibînin ji van qonaxan re derbas bûye, hatîye gihîştîye van rojên îroyîn û beşeke çanda mirovahîyê pêk anîye.

Ger em kilamên dengbêjan wekî mînakeke vegotina destanî a mesel û çîrokan hîlbijêrin û bihesibînin, em ê karibin bêjin, yekem vegotinên pexşanî a çîrokî –ku li ser kaxiz nehatine dariştin-kilamên dengbêjiyê ne. Di edebiyat devkî de hemû aktorên ku di berhemana de cîhê xwe digirin, bi kirinên xwe kesayati û hebûna xwe derdixin pêş. Ango kes an mohra xwe li berhema ku tê de qala wî dihate kirin, dixistin. Ji ber ku di pratîka mirovan de hebûna wana veşartî bû. Hebûna mirovan nasnama wana bi xwe bû. Di vir de kirin û exlaqê kesan tomar kirîbû. Di wan kontekstan de mirov dibûn "mîrovê baş an jî xerab." Bi vî hawayî jî di edebiyata devkî de modela başî û xerabiye dihate avakirin. Çawa be û çilo be jî mirov di dawî de, weke ku Îngilîz dibêjin; "Human being " bû,

weke ku ereb jî dibêjin "Benî Âdem " bû. Ango tiştên ku di edebiyata devkî de hebûn, di civatan de jî hebûn, dîsa tiştên ku di civatan de hebûn derbasî berhemên edebiyata devkî dibûn. Ew transformasyona hanê bi gelek sembolan dihate nixumandin, bi gelek minakan dihate zelal kirin, bi gelek metodan girikî dibû. Ji bona ku mirov karibûya berheman baş tê bigehêje, divabû mirov weke wergerwanê bûyeran, weke kilita kodan, weke psikologan, erê, weke mirov ku jiyane karibin bi tevahî fêmkirin, tevger bikira. Di vî warî de metodên hermenevtîkî, bi hemû haweyan dikaribûn bibin alikar ji bona ku ev edebiyata devkî piralî were fêmkirin. Hermenevtîk, metodê wergerkirina teoriyê ye, îdeolojiyê ye, kulturê ye, felsefê ye û ya civatê ye. Ango bi zimanekî din hermenevtîk, rast fêmkirina fenomenên kulturî ye, weke îdeoloji û felsefe, dîsa ew fêmkirina helwesta mirovên çalak e, weke jiyana û pratîka mirovan. Metodê hermenevtîk alîkariya mirovan dike ku ew xwe bixwîne û alîkariya xwendina kodên civatê bike.

Edebiyata nivîsandî li ser hîmê edebiyata devkî bilind dibe. Mînakên pêşî yê edebiyata cîhanê devkî ne, dûra ew bûne nivîskî. Îngilîz, Yûnan, Alman, Erebi, Faris û hwd, bi sed salan berê berhemên xwe yê devkî kirin nivîskî. Ji bona mînak em dikarin xebata Birayên Grîmm, Wilhelm Grimm (1786-1859) û Jacob Grimm (1785-1863) ku di warên çirokên geleri de hatiye kirin, bînin bîra xwe. Her dû birayan, çirokên gel ku nehatibûn nivîsandin komkirin û dûra ew nivîsandin. Îro xebata Birayên Grîmm di warê çirokên geleri de, weke klasîkên cîhanê tene pejirandin. Dîsa xebata nivîskarê Skotlandî Walter Skott (1771-1832) di mijara edebiyata devkî û transformasyona wêna de, xebata Homerosê Yunanî û hwd, di wî warî de weke xebatên balkêş tene binavkirin<sup>179</sup>...

Edebiyata devkî di nava civata kurdan de tixûbê eşretî, cografî û siyasî her gav derbas dikirin û li seranserê welat belav dibû. Ji bona minak em dikarin bibêjin; Meme Alan ku dû re bû Mem û Zîn, Cembeliyê Mîrê Hekariyan, Keleha Dimdimê, Hecê û Siyamend, Seyra Gulîsor û hwd... li hemû deverên Kurdistanê belav dibûn. Kurdekî Mukrî, yekî Bahdînî, yekî Sorî, yekî Torî, yekî Omerî, yekî Pencinarî, yekî Deqorî, Gabarî an jî Hesenî, li her çar aliyê welêt bi hêsanî dikaribûn beşdarî wan berhemên edebiyata devkî bibin. Di van mînakên edebiyata devkî de gelek tiştên ku dibûn bingeh ji bona sosyâlîzebûna mirovê kurd, dihatin hûnandin. Kurd bi wan minakên edebî

---

<sup>179</sup> Şerefxan Cizirî, "Çanda Qedîm", *Nûbun*, hj.84, K.Paşîn, 2007, r.70.

kesayetiya xwe bi zimanê xwe re dihûnandin û dibûn kurd bi wateya welatê xwe, hişmendiya etnîkî dibûn civatî.

Di çîrokên gelêrî de, zimanekî, heta tu bêjî sade, fesîh, xwerû û zimanê rojane a axaftin û ji hev fêmkirinê hatiye bikaranîn. Her wekî kilamên dengbêjiyê, di çîrokên gelêrî de jî, armanca sereke dan fêmkirina bûyer û çîrokê ye. Her çiqas, bi taybetî di warê bikaranîna daçekan û di warê zayenda navdêran de, aloziyek hebe jî, em dikarin bêjin, ji aliyê gramerê ve pir zêde û bi awayekî beloq şaşî tune ye. Û dema em ji aliyê bikaranîna peyvên ve jî bala xwe didinê, em dibînin ku her çiqas di hin çîrokan de peyvên ji zimanên dî hatine bikaranîn jî, ev yek zêdetir ji ber ku ew peyv di jiyana rojane de bi awayekî aktîv hatine û tên bikaranîn, qewimiye.

Li vê derê, hêleke girîng heye ji bo veqetandina zimanê nivîskî û zimanê devkî (wêjeya honakî û wêjeya gelêrî): Di zimanê çîrokên gelêrî û kilamên dengbêjiyê de 'demên hevedanî û girîft' ligel hev û di nav hevokekê de nayên bikaranîn; ji ber vê yekê di vegotinê de gihanek zêde nayên bikaranîn û bi rola xwe ranabin.

Zimanê vegotinê ê çîrokên gelêrî, zimanê rojane û axaftinê a ji hev fêmkirinê ye. Her wiha, yek ji taybetiya çîrokên gelêrî ew e ku ji ber taybetiyên xwe yên anonîmî, gelek guhertin û varyantên wan peyde bûne û hemû versiyon jî li gorî devoka herêman hatine gotin û di çîrokên gelêrî de jî, biwêj, carinan gotinên pêşiyar û qalibên Kurdî pir baş û bi xurtî hatine bikaranîn.<sup>180</sup> Me di lekolîna xwe de vê serpehatiyê bi destxet û çavkaniyên bêalî ve şîrove kir. Lê belê ev çîrok di nav gel de heta îro bi awayek zindî bi zimanê stranbêj, hozanvan û dengbêjan ve jiya ye, ji ber vê yekê hewce dike bi hin mînakên bi zimanê dengbêjî jî ev destan were nitirandin.

Heta îro ji aliyê gelek hozanvan, dengbêjan çîroka Zembîlfiroş hatiye gotin. Dengbêj jî ji bo mijar evîn û xwesta jinê ye gelek tişt lê zêde kirine an kêr kirin e. Her çikas ji destê wan hatibe ji bo çîrok rengîntir bibe serpehatiya çîrokê kişandine aliyek din, peyam/mesajek cuda lê bar kirin e. Ji ber vê yekê ye ku em dikarin bêjin derhaq çîroka Zembîlfiroş gotinên cuda cuda ji aliyê dengbêjan ve gihiştîye destê me.

---

<sup>180</sup> Dilawer Zeraq, "Qonax Bi Qonax Dirûvgirtina Kûrmancî a Vegotinê" *Toplum ve Kuram*, hj.4, Çile 2010, r.181.

### 3.3.1. Li Gorî Emînê Evdal Serpêhatiya Çîroka Zembîlfiroş

Di Pirtûka “Folklorê Kurmancan ya Heciyê Cindî-Emînê Evdal” de cara ewil di sala 1936an de ji aliyê Neşra Hukumeta Ermenîstanê ya şewrê ve li Yêrîvanê hatiye çapkirin<sup>181</sup> û li Tirkîyeyê jî ji aliyê weşanxaneyê Avestayê di Sala 2008 an li Stanbolê Hatiye Çapkirin. Di vê berhemê de li sê ciyan çîroka Zembîlfiroş derbas dibe, ji vanan du jê bi tenê helbest, yek jê jî him bi vegotin him jî bi helbestê hatiye hûnandin.

Ev dengbêj dawîya çîrokê bi hevdu gihiştinê bi dawî dike. Li gor Xudoê Qaso Xatûn digihije miraza xwe û bi kuştina mîr ve digihijin hêviya xwe. Çîrok wuha ye:

Zembîlfiroş xortekî feqîr î, belngaz bû. Bacêr da ji xwe ra selik difrotin, pê wê karê zarê xwe xuey dikir.

Rojekê jî selkê xwe hilda, soqaqêra çû, çû ber mala mîr ra derbaz bû.

Kulfeta mîr pencerê ra berjêr nihêrî, Zembîlfiroş dît. Zembîlfiroşî gelek bedew bû, dilê wê kete Zembîlfiroş. Dilekî na hevt dila heband. Benî xatûnê zû-zû kire ser cariyêd xwe/got: Herin Zembîlfiroş soqaqê bigrin, bînin. Bêjin mîr gazî te dike, wê qîsmetekî bide te.

Du cariya da pey hev, çûn cem Zembîlfiroş, gotin:

Zembîlfiroş, lawkê delal,

Te sineta selkê du al,

Hinek husnê Êsif li bal.

Zembîlfiroş selika tînî,

Soqaq- soqaq digêrînî,

Nan û avek pê distînî,

Kulfetê xwe pê didebirînî.

Zembîlfiroş, lawkê dîndar,

---

<sup>181</sup> Azîz Sambur, **Destana Zembîlfiroş û Gulxanûnê**, Stenbol, Nûbihar, 2015, r. 122.

Tu keremke, em herin mal,  
Mîr te dixaze mexsûs dîndar.

Hûn carîngê min e delal,  
Min bihîstiye mîrî ne mal,  
Selka kê ra bikim bazar?

Zembîlfiroş, lawkê feqîr,  
Te sineta sêlkê hêjîr,  
Tu gotina xwe neke ji bîr.

Cariya dîsa got: - Zembîlfiroş, tu bi me ra nekeve eynatê, were em herin, tu bihakî giran dayne ser selkê xwe. Mîrî ne timaye, wê qismetekî zef bide te.

Ewan cariya ew law danî,  
Derî dadan dergevanî,  
Law li ber bû lêp nizanî.

Zembîlfiroş hatibû ji der da,  
Silavek xatûnê veda.  
Xatûnê got: - Tu ser serî, herdu çeva.  
Hey xatûna min e delal e,  
Ezê selka kê ra bikim bazar,  
Zarê min birçî ne, dikin zar-zar.

Kuro bes e bike vê gotinê,  
Min tu ne aniyî bona selika firotinê,



Min tu aniyî bona kêfa xinê.

Hey xatûna min e gez tê,  
Were em xeberdin ji cimaetê,  
Ev xeber eslê min ra bêqeyde tê.

Zembîlfiroş, lawkê feqîr,  
Tu keremke ser doşeka mîr,  
Bikşîne qelna wezîr.

Lawik were misiletê,  
Vê şuxlî da kara me tê,  
Eslê te ra gune ne tê.

Zembîlfiroş gelekî fikirmîş bû, Xatûn benî kulfeta mîr bû, got: - Ez bi xwe jî kurmancekî tewakel, wekî ez pê ra rabim, rûnê, wekî mîr pê bihese, ez kû da jî herim, wê min bigre, kulfet û zara va me xeza bike.

Got: - Xatûna min e gerden herîr,  
Hedê min çi ye ez bêm ser doşeka mîr,  
Ez nakşînim qelina wezîr.

Zembîlfiroş, lawkê avas,  
Tu gerek xwe bikî qeyas,  
Were razê nav kurk û livas.

Lawik, were misiietê,  
Vê şuxlî da kara me tê,

Eslê te ra ew lêp ne tê.

Xatûna min e gerden tamam,

Tu şerbeta kas û du cam,

Tu serdapê li min heram.

Kuro, bes e bike filan û bêvan,

Were razê nav doşek lihêfa,

Her tim tev da gul û sêva.

Benî xatûnê bişkoşkê pêsîra xwe vekir, memkê xwe qerqaş nîşanî Zembîfroş kir,  
tevizîk canê Zembîlfiroş ra çû. Paşê Zembîlfiroş keniya, xanim şa bû.

Xatûn keniya xwe mitele kir,

Sur li cariya eşkere kir,

Husna şabûnê cariya vekir.

Werin temeziya bidin ber koffa,

Bikin govend li van çiya,

Gede hatiye hedayetê.

Zembîlfiroş avek dixweste,

Çil carî ber da dadiweste,

Lê xatûnê av anî da dest e.

Gede ji dest girt av e,

Zembîlfiroş qesrê da girtî bû,  
Gelekî siqilmîş bû, hêrs bû,

Got: -Ji malê heta mezelê,  
Her rêk diçe ji bircê kelê.  
Zembîlfiroş hevraz dinêrî,  
Zef û zef difikirî,

Berjêr dinhêrî, dikewgirî,  
Kelek hatê, rûnişt girî.

Zembîlfiroş fikirî, got: - Ezê xwe bircê kelê ra bavêm. Zembîlfiroş xwe bircê qesrê ra avêt jêr, ket, hevekî rihet bû û ravû, revî.

Zembîlfiroş diçû mal e,  
Elê pê ra ceng û qal e,

Go: - Kanê risqê herdu tifale.

Jinik, min xatûnek dîvû li jor,

Ewê selik standin zor,

Ewe bi qewat bû, gele bi zor.

Pey gotina Zembîlfiroş ra Elê serê xwe xist, giriya, got: -Zembîlfiroş, ne eva du roj e tu çûy, xela ye, zarê min birçîna mirin, te çi anî serê min.

-Jinik, rave, tendûrê dade,

Dîzê bide ser mîna hercar,

Lazim e îşev bivî necar.

Elê got, "wey Xudê mala te xirab ke, te çi aniye ez daynim ser tendûrê."

"Jinik, hemîn tişteke cem min tune, tu rave dîzikê bide ser tendûrê, hine kevir bike dîzikê, bira bike qilpe- qilp. Zarû wê bi guman bin, heta dereng wê razên, îja emê sibê ravîn tişteki bikin."

Elê giriya, zûke- zûka zara bû.

Zembîlfiroş çawa got Elê usa jî kir.

Elê rabû, dîz da ser tendûrê, xêleke şevê çû, zarû razan ew bi xwe jî ravûn, birçî razan.

Nêzikî berbangê Banû Xatûn xwe hişiyar bû, nihêrî ki Zembîlfiroş tune. Rabû, kincê xwe li xwe kir, çû cem pencerê, lê nihêrî ki pencere vekiriye. Keleke girî hatê, girîa, ewê jî mîrta Zembîlfiroş xwe avît, ket soqaqê, çû here mala Zembîlfiroş.

Ezman bi steyrka tijî bû, mîna tendûra zimzimî.

Xatûn Benî çû gihîşt mala Zembîlfiroş, rabû ser kulekê, kulekê da nihêrî Zembîlfiroş wê nav ciyê jina xwe da razaye. Benî xatûnê nemerdî kir, xwe kuleka Zembîlfiroş da avît, vî çaxî tevizik hate Elê. Beniyê kincê xwe êxist, taqa kirasê xwe ket nav ciyê Zembîlfiroş, pê şa bû, devê xwe kire gerdena Zembîlfiroş, ramûsa. Zembîlfiroş westiyayî bû, xwe hişiyar nebû, Elê hişiyar bû, paşê elamî Zembîlfiroş kir. Zembîlfiroş hişiyar bû, ew û Benî hevekî hevdû şa bûn, Elê qebûl nekir.

Sive safî bû, xatûnê kincê xwe xwe kir, ewê û Zembîlfiroş xebera xwe kirin yek, xatûn vegeriya mal.

Wê sibê jî mîr ji bacarekî dinê hate mal, lê nihêrî xatûn wê ne ji mal e, şaş û metel ma.

Lezekê şûn da Benî hate mal.

Mîr got: - Xatûn Benî, vê sibê şeweqê tu ji kê derê têy

Ez çûme nava bacar.

Çima?

Seyranê.

Mîr ker bû, xatûn Benî hindur da hîşt, carî birin derva, yek, yek ji cariya pirs kir, çika çima Benî çûye digere.

Yekê got, wekî hal-hewalê Benî xatûnê ev e, dilê wê ketiye Zembîlfiroşê taxame.

Mîr carî berdan, ew çûn suxlê xwe.

Mîr hat dora xatûnê, got: "Xatûna min, ev çi ecêb, tu rast dibêjî ki ez çûme nava bajêr

Belê,

Hilbet şuxlê te çi bû nav bacêr?

Dilê min xast, ez çûm.

Mîr yekî fêldarî binî ve bû, ewî Benî arxayîn kir. Ravû çû ber dêrî, gazî sê ersawila kir, çi gilî gotinên wî hebûn ji wan ra got, berdan çûn. Sekinî êvarê tarî, wan ersawila Zembîlfiroşî dêst da anîn cem mîr.

Zembîlfiroş taqa kiras- derpê û pê wî qeyd- çidar kirî, Benî xatûn jî tezî kirin û herdu avitine zîndana bûzê.

Du sihetê din şûn da mîr û hersê ersawila va çûn zîndanê, mîr kêreke tûj girte xwe.

Wextê derê zîndanê vekirin, Zembîlfiroş û Beniyê va tê da serma dircifîn.

Çira girtin xwe, çûn hundur.

Mîr emir kir ser xulama, got: - Kirasê Zembîlfiroş jê kin. Xulama kiras jê kir.

Mîr kêr hilda çû te revî Zembîlfiroş. Rengê Zembîlfiroş ji tirsê çû, qudûmê wî ricifîn.

Mîr nêzîkî Zembîlfiroş bû, kêr avîte renê Zembîlfiroş, wa qet kir. Şewateke zor dilê Benî xatûnê ket.

Xulam wekî ku sekinîne guhdar in, wan jî qebûl nekir.

Benî xatûn piş mîr fitilî, nişkê va milê wî girt, kêr ji destê wî derxist.

Xulam revîn, derketin.

Benîê kêr bi destê rastê girt û berayê da zikê mîr. Zikê mîr qelişî, hûr û rûviyê mîr hatin xar, mîr wergeriya, ket.

Xulam revîn çûn malê xwe, elamî kesî ne kirin.

Benî çû mala xwe, berê kilîta qeyd û çîdara anî, vekir, Zembîlfiroş bire mal. himamlemîş kir, birîna wî girêda.

Ravûn ketin nav hebûna mîr, çî lazim bû hildan, çûn mala Zembîlfiroş, Elê û zara va hildan, çûn welatekî din ê dûr, çimkî meriyê qebîla mîr gele hebûn, Zembîlfiroş wê zirara xwe ji wan bidîta. Lema jî kulfetê xwe va çûn cîkî usa, wekî dengê axa û mîra lê neyê.

Dema ku mirov li berhevoka Emînê Evdal dinêre, li gorî çîrokên Zembîlfiroş tèn zanîn, hin nakokî dertên holê. Wekî mînak bihevşabûna Zembîlfiroş û Gulxatûnê bi tenê di vê çîrokê de derbas dibe. Her wiha avêtina wan a zindanê û xelasbûna wan, dîsa di her sê guhertoyên nivîsandî de derbas nabin. Dîsa tiştekî balkêş ku di vê berhevokê de dertê pêşberî me, di tu çîrokê de an jî guhertoya nivîskî de navên Xatûn û jina Zembîlfiroş rasterast derbas nabin; lê belê di vê berhevoka Emînê Evdal de ku di sala 1927an de hatiye nivîsîn, navên Gulxatûn û jina Zembîlfiroş bi awayekî aşkere derbas dibin. Li gorî vê çîrokê navê Xatûnê Benî Xatûn an jî Banû Xatûn derbas dibe. Navê jina Zembîlfiroş jî wek Elê derbas dibe. Her çiqas vê berhevokê û guhertoyên me yên nivîsandî li hev nenihêrin jî, ji bo wê rojê û di şert û mercên Qafqasyayê de nivîsandina çîrokên Zembîlfiroş girîng e û ji bo wêjeya Kurdî dewlemendiyek e.<sup>182</sup>

### 3.3.2. Li Gorî Hesên Reşîd Amêdî Serpêhatiya Çîroka Zembîlfiroş Amedî<sup>183</sup>

Di vê gotina folklorîk de tiştekî balkêş eve ku navê Zembîlfiroş wek “Şahîn” Navê bavê wî jî wek “Mehmed Emîn” tê gotin.

Hol bi coş hol bi coş, rojek ji rojê deloş wem dê bikîn medhêt Zembîlfiroş, wem dê beyan keyn heketê.

Zembîlfiroş kurê paşan e

Lawko kurê paşan e

Xwedanê koçk û eywan e

Digerîtin li keyf û sêran e

<sup>182</sup> h. b. r. 129.

<sup>183</sup> Sadiq Bahaeddîn Amêdî, *Folklorê Kurdî*, Stenbol, Lîs, 2013, r. 181-189.

Her ji eşqê û muhbetê  
Zembîlfiroş nê kurê mîr e  
Lawko wek kurê mîr e  
Digerîtin li rav û neçîr e  
Bi rêkê dît qebrekê kûyr e  
Serê wî girt heybetê  
Dibêjîtin: Madem mirin heye  
Dinya bes e, bila bimînit bo axretê  
Zembîlfiroş vezvirî mal e  
Lawkê min vezviri mal e  
Ji babê xwe fikir sual e  
Tu bo çi hukim û ehkamê digêrînî  
Xerc û xeraca ji feqîr û jara distînî  
Ma tu nizanî mirin ya heyî?  
Dinya ya puyç e ew çenda betal e  
Babê gotê: Navê te Şahîn e  
Navê babe te Mehmed Emîn e  
Tu were li cihê min rûyne  
Hukim ehkama bigêrîne  
Xerc û xeraca bi destê xwe bistîne  
Tu şole ji vê hikayetê nîn e  
Zembîlfiroş kurkê weral e  
Lawko lawkê rewal e  
Hesp û zîn zûy kirne vale  
Cuda kir 'erz û' eyale

Di dest perwiya da çû xar e  
Çû ber kela mêzê rewal e  
Sume'tê selka li bale  
Ew dest havête kursiyê vê sin'etê  
Zembîlfiroş zembîla tînît  
Lawek nê zembîla tînît  
Kolan der kolan digêrînît  
Xatuyn di pencerê da dibînît  
'Eqil diçît sewda dimînît  
Xatuynê gote xidamê  
Dê rabe here ji bo Xwedêwo  
Here lawkî bibêjwo  
Mîrî du zembîl ji te divêwo  
Bi heceya vî(ê) hêcetê  
Belkî bête hîdayetê  
Xêra Xwedê ew sohbetê  
Wem da bibînin lezetê  
'Ella roja qiyametê  
Înşella dî çîne Cenetê  
Xidam sipêdek rabiye  
Wev delal sipêdek rabiye  
ji dergehê qesrê derketiye  
Zembîlfiroş li serê cadê  
Ew li binê qesrê girtiye  
Di gel Zembîlfiroş vegotiye



Mîrî du zembîl ji te xaztiye  
Zembîlfiroş destê xwe fekiriye  
Çu zembîl ji beledê  
(Jidengê) paşayî  
Di destê xwe da nedîtiye  
Zembîlfiroş vezivirî mal e  
Çêkirin du selkên ‘al e  
Havêtine burc û hewal e  
Li dergehî bi serkefte mal e  
Dergehvan der pê vedan  
Kilîl û mîftah helînan  
Ya Rebî çi fend û fêl  
Ya Rebî çi fend û lêl  
Di dîwana mîr bê hesêb  
Kevtin derê vê muhbetê  
Xatuyn dê min ji rê betê  
Xatuyna dibêjitê:  
Zembîlfiroş kurkê derwêş e  
Lawko lawkê derwêş e  
Tu kerem ke were pêş e  
Qîmeta selkê xwe bêje  
Ya mezin dê ser bi ser li ber zêra kêşim  
Ya biçûk bi wê qîmetê  
Zembîlfiraş dibêjitê:  
Xatuynê qet nê we nîn e

Qîmeta selka çû nîn e  
Destekî li malê bikêrîn e  
Tu rizqekî bo min bîn e  
Wez ê bi rizqê xwe razî me  
Ax nê wez ê razî me  
Bi wê qîsmetê  
Xatuyna dibêjitê:  
Zembîlfiroş kurkê feqîr e  
Lawko lawkê feqîr e  
Kerem ke li ser doşeka mîr e  
Bo te têkim qelunya mîr e  
Têk vedet zulf û helîl (herîr) e  
Dê ji nûy bînî lezetê  
Xêra Xwedê ew sohbetê  
‘Elella rojeka qiyametê  
Înşella dê çîne Cenetê  
Zembîlfiroş dibêjitê:  
Xatuynê qet we nîn e  
Rûyreşê qed nê we nabit  
Şerbeta li nav tasê cam bît  
Venaxwim li min heram bît  
Nahême hîdayetê  
Wez nahême meslehetê  
Wagirê Xwedê bi ruhê ketê  
Tu bes bike vê hikayetê

Nê qiyameta li diwî pê me tê

Te wez birme hilaketê

Xatuyna dibêjîtê:

Zembîlfiroş kurkê ‘Ebbasî

Lawko lawkê ‘Ebbasî

Wextê tu bi bedenê kirasî

Hatîve mi tu bo xwe niyasî

Dê were hîdayetê

Dê tu were meslehetê

Xêra Xwedê ew sohbetê

Wem da bibînîn lezetê

‘Elella rojka qiyametê

Înşella dê çîne Cenetê

Zembîlfiroş dibêjîtê:

Xatuynê qet nê we nîn e

Rûyreşê qet wê wenabît

Mecme’ a zêr bi nîşan bît

Xas û ‘am li nav deynan bît

Nane genim li rexan bît

Wez naxwim li min heram bît

Nahême hîdayetê

Wez nahême meslehetê

Agirê Xwedê bi ruhê ketê

Tu bes bike vê hikayetê

Nê qiyameta li duy pê me têtê

Wez birme helaketê

Xatuyna dibêjtê:

Zembîlfiroş kurkê biyanî

Lawko lawkê biyanî

Tu kerem ke were xanî

Her min tu ji bo dilê xwe anî

Ax dilê min ay dilo (hey dilo)

Her mi tu ji bo dilê xwe anî

Dê were hîdayetê

Dê tu were meslehetê

Xêra Xwedê ew sohbetê

Înşella dê çîne Cenetê

Zembîlfiroş dibêjtê:

Xatuynê wê neke ya dil tivêtin

Rûyreşê wê neke ya dil tivêtin

ji Xwedê bibînî fihête

Ji xatuynê ra hurmetê

Agirê Xwedê bi ruhê ketê

Tu bes bike vê hikayetê

Nê qiyameta li duy pê me tê

Te wez birme helaketê

Xatuyna dibêjtê:

Zembîlfiroş qet we nebêje

Lawko qet we nebêje

Dê te havême qeyd û zîndanêt dirêj e

Heft heyva bi ser çineve rojî û nivêj e

Xwe dê bînî zehmetê

Xwedê hêye hîdayetê

Xêra Xwedê û sohbetê

Wem da bibînîn lezetê

‘Elella rojka qiyametî(ê)

Înşella dê çine Cenetê

Zembîlfiroş dibêtê:

Xatuyna gerden bi morî

Delala gerden bi morî

Şol nabin bi kuttek û zorî

Xwe bigre heta hingorî

Belkî bême meslehetê

Xêra Xwedê ew sohbetê

Înşella tu nabînî wê lezetê

Xatuyna zêr li wenî

Ew rabû xweş xweş kenî

Law hate hîdayetê

Wev şev li min dê bit xenî

Xidamê sivik bilezîne

Rûyreşê sivik bilezîn e

Qazana navê tu bîne

Pirincek law ra bikelîne

Şîr û şekerê li ser bireşîne

Zembîlfiroş biçûyke tîfal e

Yê birsiye û waqilê wî çu nîn e  
Lew hate hîdayetê  
Nê lew hate meslehetê  
Xêra Xwedê ew sohbetê  
Wem dê ji nûy bînîn lezetê  
‘Elella rojka qiyametê  
Înşella dê çîne Cenetê  
Tu ciha dane xewa me tê  
Zembîlfiroş lawkê serbest e  
Ew mesînek ji xatuynê xwast e  
Bi wê hecetê diçîte tarek û dest e  
Xatuyna ser bi mest e  
Li ser lingekî rawesta  
Ew mesîn sivik daye bi dest e  
Zembîlfiroş ser dikevîte serbanî  
Çu erda nabînîtin ji xeyrê esmanî  
Ji pê ve dibêt ya Rebî Rebê zulcelal  
Te emanetek bo ‘eyal  
Wez ê xwe di burcêt kelê da pavême xar  
Kurkê Xwedê xwe divêt  
Lawkê Xwedê xwe divêt  
Xwe li burcêt kelê da tavêt  
Le pîsa kurî û fêt  
Cibraîl perkê sivik  
Gehiştê ‘ebdê kurk

Dana bo ‘erdî nermik  
Xatuyna van şaliya  
Wey şemala şev tariya  
Meşya bo di gel cariya  
Min nezanî law xwe tavêt  
Ya Rebî çu lê nehêt  
Xatuynê rûndik bo dêt  
Zembîlfiroş rabû çûve mal  
Jê sual kirve ‘erz û ‘eyal  
Gotî: Pa kanê qîmeta selkêt me yêk ‘al?  
Zembîlfiroş dibêjtê: Mirov hebûn aqil li cor  
Selik ji min sitandin bi kuttek û zor  
Min hilpirastîni Xaliqê li jor.

‘Erz û ‘eyal dibêjnê: Em rabûyn me tenuyr dadabî, nan û av pê ve hatin kate û kebab. Kurik bû hatî bêhed e bêhesab. Weko Zembîlfiroş çûye mal vê carê ‘eyalê wî pirsyar jê kir bo selikêt wî. Ew caba xwe da camêrî:

Îna ma bi pirsyara ve kanê ev mirove ji kî ve hat?

Ka yê ji kî ye? Ekî gotî: Babo wê he xanîkê wî ye, Zembîlfiroş e zembîlka çêdiket difroşit.

Heko min gu(h) lê bûy, dibêjin: Xatuynê palek girt, lexmek li nav hewşa qesra xwe kola di bin erdê ra bir heta gihandî xanîkê Zembîlfiroş derêxist. Mabeyna mexrib û ‘eyşa dibêjin:

Xatuyn radibitin gelek çekêt zêrî bi xwe ve diket, di lexmê da diçîte xwarê, Zembîlfiroş yê çûye mizgeftê. Jinka wî ya rûniştiye xwarê cilkêt biçûkêt xwe paşe diket. Dibêjin: Hin dît xatuynek di xanîkê wê da bi jor kevt. Jinik jina Zembîlfiroşî pêşve rabû.

Xatuynê gotê: Xuyşkê zehmetê nekêşe, heke tu dê çakiyekê di gel min key, eyalê xwe ji xanî derbêxe ev şeve ez a dilmayî me ji mala xwe, min nevêt kes bizanît ez

li kîrê me, çend çekêt xwe yê zêrî ez dê deme te, hema ‘eyalê xwe di gel xwe bibe, di gel bangê sipêdê da tu bîne di xaniyê xwe ve ez dê çim. Jinika Zembîlfiroş çekêt wê yê zêrî, bo xwe helgirtin ‘eyalê xwe da ber singê xwe ji xanî derkevt.

Xatuyin rabû nivînkêyt Zembîlfiroş rayêxistin çû ser cihê wî, heke ronahî jî hebît vemirand û raza, lihêfk bi ser û çavê xwe dada, xwe bê deng kir heta Zembîlfiroş hatyeve.

Dibêjin, Zembîlfiroş hateve her wekî her neqil qesta cihê xwe ki, ezbenî serî, tarî ye, wextê zanî gehişte ser cihê xwe rawestiya, xwe şeland, lihêfk bilind kir, xwe berda dirêj kir da serê xwe danite ser balîfkê, dibêjin:

Xatuyinê, pê xwe û destê xwe vêkra havêtine Zembîlfiroş da ku Zembîlfiroş bigirît, xirêna xirxalêt di lingê Xatuyinê hat.

Dibêjin: Zembîlfiroş lihêfk havê xwe û revî.

Wextê lihêfk avê xwe û revî, Xatuyin berda bi dûyê, ha li vêrê ha li wêra he, Xatuyina bizavê diket destê xwe bigehîntê. Heko min gu lê bûy, dibêjin hêştê Xatuyin negehiştîyê, ezbenî serî Zembîlfiroş negirtiye, hêj xanî xilas nekiriye, Zembîlfiroş berê xwe dayê sipêde beyan bû, nimêja sipêdê ferz bû, yê direvîtin bizava wî ye da Xatuyin negehtê.

Du’ a ji Xwedê xwaztin, got: Ya Rebbî tu hind muhletê bideye min destê vê zalimê negehîte min heta ez nivêja sipêdê bo te eda bikem. Yê dervî (drevit) li ser milê xwe zivirî ka Xatuyin nêzik bûye, ho berê xwe dayê Rebêalemê hate keremê pêsitûyinkê pê Xatuyinê girtin.

Heko min gu lê bûy, dibêjin: Zembîlfiroş du rek’etê nivêja sipêdê kirin, cotekê sunnet, ezbenî serî di dîv ra kirin. Serê xwe dana çû sucdeyê, du’ a ji Xwedê xwaztin, got: Rebî tu emanetê xwe ji min bistînî, tu min şehmizar nekey destê vê zalimê da.

Rebil’alemîn, dibêjin emrê hezretê ‘Ezraîlî kir ruha wî qebiz kir. Bi emrê Xaliqî nurhe jê bilind bû. Wextê Xatuyinê dît ku nurhe jê bilind bû, xwe avête ser termê wî, şehde da hate ser dîne heq. Ewê jî bo xwe du’ a ji Xwedê xwaztin, Xwedê emanetê xwe ji wê jî sitandin. Ez hatime ve rehmet li day babê guhdara.



### 3.3.3. Li Gorî Mele Êsif Mihemmed Serpêhatiya Çîroka Zembîlfiroş

Dê dil were wesa bê coş

Ay dil were dîsa bê coş

Carek ji cama mey meloş

Kir qiseta Zembîlfiroş

Da seh bikin hikayetê

Zembîlfiroş lawek delal bû

Daîmen ew rast û heq bû

Sin'etê wî heq sedeq bû

Qîmetê selkan wereq bû

Ew yede zembîl bi deste

Birne bazarê bi qest e

Nan û av pê dihat qest e

Raziye bi vê qismetê

Her dema selkan ku tînî

Li suyk û bajêra digerînî

Xatuynek li burcan dibînî

Dil li canê wî dihebînî

Ketî benda muhbetê

Muhbetê geç mubtela kir

Sor li carê aşkera kir

Wekî qelbê min xweda kir

Min ji 'işqan xew netê

Ew letîfa îxtiyar e

Cariyek ji wer da hinare

Tu here bêjê bijare  
Çêdket meslehetê  
Çêdiket semikên di çake  
Bîne dergahê biha ke  
Mîr zêde heqî eda ke  
Şoleke xêr te tê  
Lew virê bû çûbû mal e  
Çêkirin selikên delal e  
Anî dergah û hewal e  
Rizq ew e heq bidetê  
Zembîlfiroş lawkê biyanî  
Kerem bike were xanî  
Dergeh dida dergehvanî  
Çî bela bû law ketê  
Rebeno fi'lan nizanî  
Li derecan lêl çûye banî  
Xatuyna wî li serê xanî  
Çavkirî vê(î) dergehvanî  
Derî dada mifte hilatî  
Min tu înayî ji bo vî canî  
Kes bi derdê kesê nizanî  
Ji kerban agir berden xanî  
Xatuyne wez tobedar im  
Rebenê wez tobedar im  
Li ser emrê Ellah nikarim

Bes bikevê sohbetê  
Te ez birim helaketê  
Agirê Xwedê wê li pay me tê  
Nêzîke roja qiyametê  
Zembîlfiroş lawkê Derwêş e  
Kerem bike were pêş e  
Qîmetê selkên xwe bêje  
Ya biçûk li ber zêra bikêşe  
Ya mezin qîmetî bêje  
Xatuynê we ye we nîn e  
Qîmetê selkan çu nîn e  
Lepekê arî tu bîn e  
Ev şola şola me nîn e  
Xidamê lezke bilezîn e  
Qazana biçûyk tu bîn e  
Pirinçekê bo wî bikelîn e  
Filfil û darçîn lê bireşîn e  
Biçûyke aqil çu nîn e  
Bila bixwet aqil cemîn e  
Belkî bêt meslehetê  
Lew dibît qencî tamamî  
Her wekî şekrê û zucamî  
Ser bi têt li min heramî  
Tirsim ji me'na ayetê  
Gul dibêt lawê verêwan

Were nav reyhan û sêvan  
Şekrê bim ji du lêvan  
Şubhê tasa şerbetê  
Ew dibêt zulfê herîr e  
Ma ku pîroz kit li mîr e  
Çi hedê lawê feqîr e  
Bes bide vê sohbetê  
Te ez birim hilaketê  
Agirê Xwedê wê li pey me tê  
Nêzîk e roja qiyametê  
Hey hewar sed hewar  
Min ne xalet û ne xal  
Biçûyk û ‘erz û ‘eyal  
Hemî birsîne li mal  
Ketim hukmê zulmetê  
Gul dibêt lawê ‘Ebasî  
Serkolê pê ling pêxasî  
Te ne derpê û ne kirasî  
Tu biçî ser pişta Gamasî  
Ji destê min nabî xilasî  
Zembîlfiroş: Xatuyna gerden bi morî  
Şol nabin bi kuttek û zorî  
Xwe bigre heta hingorî  
Çi emir kir padşahê jorî  
Xatuyna leb leb û seng e

Xwe xemlandî heftê reng e  
Got: Ya Reb tu bikel direng e  
Zembîlfiroş lawkê serbestî  
Mesînê ji xatuynê xwastî  
Xatuynê mesîn da destî  
Dê ji bo te kim xizmetê  
Lew rabûye der mencilê  
Rabû çû serbanê kelê  
Ciyek nebû pê da helê  
Mabû di fikr û hîretî  
Zembîlfiroş yê rabû ye  
Du'a ji Xwedê wê xwastî ye  
Xwe di kelhê da avêtî ye  
Hêdî bi axê ketî ye  
Gul xatuynê pê nizanî ye  
Zembîlfiroş wê çûyî ye  
Qesta mala xwe kirî ye  
Biçûykên wî hatin pêşî ye  
Kanê heqê selkêt me yê cindî ye  
Te nur helbû ji qudretê  
Te'am çêbû ji ni'metê  
Biçûykêt xar neçûn hilaketê  
Rehme li babê cema'etê

Xatuyn ma li hêviyê ku Zembîlfiroş wê çûyî serbanê kelhê, hindî ma li hîviyê nehat xwarê. Nehat xwarê, wextê vemaye çû da berê xwe bidetê ka carê eve kuyve çû, wekî berê xwe diditê mesîn wê li wêrê Zembîlfiroş wê çûyî nizanîtin kuyve çû. Têtin

çend odê qesra xwe hemî sehkirin ku belkî xwe têve veşartbitin, xwe têve neveşartibû, derket ji derve pirsra şivanan û gavanan kir, go:

Wella Zembîlfiroş wê lê hêve çûyî, rêyek nîşan da ku wê li hove çûyî. Ew radibin têtin mal taxim libasekê eslî dikitin ber xwe, tijî zêrê Osmanî dikitin û dikevitin dîv pirs û pisyaran duyv Zembîlfiroş heta gehiştî bajêran, di li vî bajêrî li wî bajêrê henê heta çûyî bajêrê Zembîlfiroş, tê da pirsra mala Zembîlfiroş kir, go: Li kê derê ye? Xwedan xêrekî got: Wa he mala wî, hema miqabilê xaniyê wî. Ma li wêrê heta bû mexriba tarî, ma li wêrê.

Adetê Zembîlfiroş ew bûy, diçû cami'ê heta 'eyşa nivêja xwe dikir heta demê nivistinî, dima li cami'ê nedizivirîve. Wextê dît Zembîlfiroş çû bo qesta cami'ê dikir, ew çû nik jina wî, çû gotê: Bila ev şeve mêrê xwe bide min, ev taxma libasê min bila bo te bit. Ev sed zêrên Osmanî bila ev jî bo te bin, hema ev şeve bi tinê mêrê xwe bide min. Rabû jina wî, jina Zembîlfiroş cilikê xwe dane xatuynê û xatuynê êt xwe ji ber xwe kirin dane jina Zembîlfiroş, ew zêrên zerên Osmanî hemî dan jina Zembîlfiroş, ew xatuyn mal li şuyina jina Zembîlfiroş di xanî ve û jina Zembîlfiroş çû malekê ji malêt cîranan, wê şevê heta dibît sipêde.

Ew jî heta demê nivstinê, ewê jî cihê xwe xwe deyna wêrê û çû nav cihê xwe ra, hingê ew cilkê di ber bûn ji ber xwe kirin ew cilkê jina Zembîlfiroş daynê, deynan bin serê xwe, ew çû di nav ciha da. Nanivît belê xwe dirêj kir, ma li huyviya Zembîlfiroş heta ji ceme veaerit û bêt û demê nivstinê ya li hîvyê, dê ma li hîvyê heta Zembîlfiroş têtin. Berê çû fanos û lempe û çira nebûn hema ji tariyê hat destperkî destperkî axir cihê xwe dît. Ew jî xwe veşeland çûnav cihê xwe ra, li nik hesêba wî jina wî ye.

Çû nik xatuynê, xatuynê di nav ciha da ye, nizanitin xatuyn di navra ye. Wextê çû di nav cihê ra, xatuyn me'lum e nenivistiye, xwe hove lêda hove lêda, hove wêve, axir wesan çêkir Zembîlfiroş ew şol li gel kir, cumae di gel kir. Wextê cumae di gel kir, pê Zembîlfiroş bi xirxaleka xatuynê ya di piya kevt, got: Ah Xwedê eve ne jina min e, diyar e jina min çu cara xirxal li piyê wê nedîtine. Ew rabûy serxwe, axir ji nav cihê derkevt, ew site û bersite hebûyn, site û bersitê xwe jenîn. Hinde puyşîna der kir di nav kayê ra da ber tîfan, berê çira nebûyn, axir pîçek ronahî çêkir. Ho berê xwe detê hinde cilkê jina wî wê li bin serê wê xatuynê, hindek jî wê li bin serê wî, got: Elhenidilile we lilla ew e, eve cilkê jina min in. Keyfa wî hatê go qatî ne, heta agirê xweşkir, vêça

(vêca) li ser çavê wê havêt dît ku, eve ew xatuyne ya bi kelhêve mayî, pê ve nusayî ew ketî di zulmeta wê da. Aha eve ew xatuyne, ji nûy vê carê hema xatuyin hêla li wêrê û qesta rûybarî kir, ma li wêrê li ser wî rûybarî heta bûye sipêde, êdî eben ji rûybarî dernekevt, yê di avê da, hêj şev tarî nivêja xwe ya siharê kir ew têt diçêt nik îmamî got: Min ev qebehete wê kirî, hal û meselê min eve ye, bêhemdî serê min e min nizaniya. Imamî gotê: Bo te çu nîn e, însaallah ne guneh e, çunko te nizanî, hema here tu efû. Hat bo nik jina xwe gotê: Bo çî te ev qubahete ji min çêkir? Ew te ho kir? Te ev xatuyne melteqayê (berhingari) min kir? Ew tu derketî ji mal ve te eve çikir?

Xatuyinê gotê: Eve hinde zeman e tu selkan difroşî ew hinde heq bi dest te nakevît, bo te hal nabit, awa ev çend zêrên hin zer û sed zêrên Osmanî, avêtin wêrê. Ev çend heqê hewê day me, ez temah kirim ew ev taqim libasê tu dibînî hinde jê hatî, ê xatuyina min, wê dayî min, min ê kirî ber xwe, vêca ji temahê min jî we kir, eve ve ew rehmet li dey babên guhdara. Eve bû qiseta Zembîlfiroş.

### **3.3.4. Nivîsandina Şemo Qasim ya ku Wergera wê Hallocî Larê Kiriye**

Min vê carê nivîsareke li ser Çîroka Zembîlfiroş'ê, ji pîtên aramî veguhast ser pîtên latînî û “malikên li ser çîrokê û deqa nebelavkirî ya vê çîrokê ne tê de”, li hin cihan min destkarî di rastnivîsiya vê babetê de kir.

Ev nivîsar a berêz Şemo Qasim e û di jimareya 23 ê ya Kovara Lalişê de hatiye belavkirin. Kovara Laliş ê kovareke çandî ye û ji aliyê bingehê Laliş ê bi zimanên kurdî(kurmanciya bi pîtên latînî û aramî) û erebê li herêma Kurdistanê tê derxistin û di jimareya 28 ê ya 2008 an a kovarê de çend gotarên bi zimanê Îngîlîzî jî hatin belavkirin.

Eve hûn ew deqê nebelavkirî ji beyta Zembîlfiroşî ku serhatiya wî hate gêran û li ser zarê husta Cemo Mecêwrê Xetarê (Xaterê gund e) hatiye veguhastin û wî ji hustayê xwe wergirtiye.

Ey meclisa pir zewq û xoşî

Guh bidene suhbetek xoşî

Dikeyn behsê Zembîlfiroş

Yadîl were... yadîl were  
Hinciyê bi te înit bawere  
Neşf'et lê ye ne mehdere

Yadîl were... carek bicoş  
Camê dila şerbet 'inoş  
Dil îqîna Zembîlfiroş

Zembîlfiroş lawkê rewale  
Wê çêdket zembîlêt male  
Şevê û rojê axret xeyale  
Zembîlfiroş zembîla tîne  
Kolan kolan digerîne  
Xatûn li ser banê dimeyzîne  
Qelpê dilê wê diqetîne

Xatûnê mifte lakir  
Çû hindir û sur li cêriyê eşkera kir  
Go vî derwêşî qelb û dilê min cuda kir

Çi xatûneka bi xêlî û sipîçare  
Ewê cêriya xo dihinare  
Da wî derwêşî bînite bale

Çi cêriyeka bi qulp û bende



Go ya derwêş mîr wê te dixwende  
Wê bide selka te zor behamende

Zembîlfiroş dibê bila we bî  
Cêriyê tu selka ji mîr re bibe  
Çi Xwedê qismet kirî bila ew be

Çî cêriyeka bi bend û wilêbe

Ku derwêş neka çu hisêbe

Dîtina mîreka ne 'ecîbe

Cêryaî derwêş anî

Dergeh da destê dergevanî

Lawkî bi fêniyê nedizanî

Dergevanê dergeh dadave

Derwêş qutbû ji ejnî gave

Ewî nedizanî pîşiya wî dave

Xatûnê got:

Zembîlfiroş hey lawkê biyanî

Ez rastî bêjme te tu pê bizanî

Min tu ji muhceta dilê xora anî

Zembîlfiroş got:

Xatûnê ez tobedarim

Ez xudan mal û 'eyalim

Li ber mîrê mezin ez gunehkarim

Xatûnê got:

Zembîlfiroş lawkê feqîra

Tu keremka li ser textê mîra

Axretê tu bike ji bîra

Zembîlfiroş got:

Xatûnê gerdan şîbabê

Em dê çine nav ax û tirabê

Tirsa min ji roja hîsabê

Ez nakem vê xilmetê

Min dil nebû bo vê fikretê

Tirsa min ji qiyametê

Xatûnê got:

Hey Zembîlfiroş lawkê mirêva

Keremke li nav baxçê sêva

Dîşlîm bike bi herdû lêva

Zembîlfiroş got:

Xatûnê gerden tenikê

Reşkeziyê te wek marê di selkê

Wê ditên û diçin li qasekê

Xatûnê gerdenzerê

Em her dê çine nav ax û berê

Tirsa min ji roja mehşerê

Xatûn çû û çû bi kar kir

Qolê zêra li ber eniya xo bar kir

Kalemêrê heftê salî dîn û har kir

Zembîlfiroş got:

Xatûnê tuye aqil temamî

Ye şîrînî wek şerbeta camî

Ji serî û binî tu li min heramî

Xatûnê got:

Zembîlfiroş lawekî xase

Bes bike zehmet û qase

Tu ji destê min nabî xilase

Zembîlfiroş got:

Xatûnê li sehtê û gavê

Ez da tehiyatekê bigirim bi avê

Wê nedizanî ew dê çite ser banî û xo havê

Çi xatûneka sermeste

Û av ji cêriyê dixweste

Go ezê bikem li deste

Zembîlfiroş got:

Eve gunneheka mezine  
Tu avê bikey li destê mine  
Ew gunnehkariya her bo mine

Derwîşî seh kire mezelê heta mezelê  
Û 'erdek nebû xo lê veşerê  
Derwêşî da dercêt serê

Zembîlfiroş çû serbanê qesrê û destê xo berejêr kirin:

Derwîş bere jêr fikirî  
Û bere jor rênî û berda girî  
Got yarebî tu min xilaskey ji vî agirî

Banga min rebî xeqîqetê  
Min xilas bihey ji vê zehmetê  
Yarebî bang û hawarêt min ji ba te tê  
Banga min Xwedê û melekê cebare  
Yêt wekî Eyubê kurma xware  
Yêt wekî Îbrahîm û Sare

Yêt wekî Nemrudê Luqat Tenare  
Yêt wekî Hebîbê Necare  
Xwindkarî jê dixwast barek arê mişare

Maliyê gotê; hey Hebîbê Nekar

Were binve wek her car  
Xwedê mestire ji şah û xwindkar

Banga min xwediye êkî bi tinê  
Yêt wekî Nebî Nuh sefine gêran li dinê  
Li serê çiyayê lê sekinî Cudî bi tenê

Xwedê gotê Cibraîl û teyrê sivik

Tu here ber burca kinik  
Zembîlfiroş danê erdê tenik

Pê nekey çû zehmetê  
Demê dikefte wê qadê  
Bang û hawarêt wî ji ba ma tê

Kelha xatûnê mermer hezare  
Zembîlfiroş xo dihavîte xware  
Û tiştêk jê nedibû azare  
Zembîlfiroş dihate male û çu nemalbû li xeyale  
Maliyê vêra dikire şer û qêl û qale  
Tu çuyî bi selik û tebeq û tu hatî vale  
Emê bi çi xwey di têrken van 'îyale

Zembîlfiroş dibêje maliyê:  
Ez çûme pir fişekala  
Min cêriyayek dî pir lêb û hewala

Digel xatûneka bi xêlî û spîçare

Qesreka bi mermer hezare

Bo demekî ez têda kirim hesare

Û min ji ser qesrê xo dihavête xware

Û bi qudreta Xwedê tiştekan li min nedibû zirere

Ew maliya bi sitûmûrî

Got ya derwêş hinciyê li te bike zurî

Me ew sparte rebê jûrî

Zembîlfiroş got:

Maliyê agirekî dade li hêre

Û her wekî duhî û pêre

Xwedê dizane bi şer û xêre

Maliyê agirekî dada bi kuçik

Melek Cibraîlê emîn hate nik

Çendîn tam û tiruşk havîtine zik

Wexta maliyê derê beroşê vekir

Ma şaqis û hizra rebê xo kir

Zarok komkirin dinav wan kir

Li vir beyt tê birîn û nêzîkî deh malikên din jî mane û dest me neketin. Bi hêviya min rojekê ez bikarim peyda bikim.

Belê hustayê ji mi re gotî bi serhatî ev ya mayî veguhast. Digot Zembîlfiroş bar kir û qesta cihekî xewle kir li dewrûberê Mêrdînê û rojekî Mîrê Mêrdînê lê bûye mîvan û nas kir û vegerande Diyarbekir û bû mîrê wê deverê.

### 3.3.5. Helbesta Dengbêj Hiznî

Pirtûka Zembîlfiroş a Necatê Zivingî de helbesta ku dengbêj Hiznî dixwîne bi sernavek cûda hatiye dayîn. Sedema vê yekê jî Zivingî bi vî awayî vedibêje: Me helbesta “Dengbêj Hiznî” cûda neqand ji ber ku ji yen din cudahiyên we pir in û digel kêmasiyên xwe hîkayetê xweş teswîr dike.<sup>184</sup>

Necatê Zivingî di 2012an de pirtûkek bi navê “Analîz û Vekolînek Li Ser Hîkayeta Zembîlfiroş” çap kiriye û di vê berhema xwe de, di çarçoveya her sê guhertoyên ku me jî di xebata xwe de bingeh girtiye, hîkayeya Zembîlfiroş vedibêje û li gorî hin taybetiyan şîrove û nêrînên xwe aniye ziman. Zivingî, zêdetir bi nêrîneke tesewwîfî nêzî mijarê bûye û ji hêmanên çîrokê û ji lehengên wê raveyên îrfanî bi dest xistiye. Wekî mînak, Zivingî di beşa 5em de li ser Xatûnê vê şîroveyê dike: “Xatûn dinya ye; ku bi xemla xwe dixwaze însan ji rê derxe.” Zivingî ji serî heya binî li dora fikar û kovanên mîna “îmtîhana dinyayê, fanîbûna jiyane, tirsê ji Xwedê, mirina ku her tim peyama hişyariyê mirovan, xerabiyên ji nefsê û xelasiya ji gunehên wê, zehmetiya îmtîhana dinyayê, domdariya îmtîhanê ya heta mirinê û hwd. pirtûka xwe li dora hizir û ramanên cuda hûnandiye.<sup>185</sup> Serpêhatî wuha ye:

Zembîlfiroş zembîla tîne

Rebeno zembîla tîne

Kolan kolan digerîne

Qesr û baniya datîne

Gul xatûn burc da dibîne

<sup>184</sup> Necat Özdemir, **Zembîlfiroş**, r.36.

<sup>185</sup> Azîz Sambur, **Destana Zembîlfiroş û Gulxanûnê**, r.159.

Aqil bir sewda dimîne

Qerwaşê li dû dişîne

Di rîda de mi-b te hiltîne

Xeberê lawik jê nîne

Tu were ser vê qîssetê

Ji xwe re bike xêra tetê

Xêra bighîne cennetê

Dûr e roja qiyametê

Xatûnê ez tobedarim

Girtiyê Rebbê Cebbarim

Dinyayê şigul nikarim

Heşrê de ez şermezarim

Zembîlfiroş lawkî derwêş e

Rebeno lawkî derwêş e

Kerem bike tu were pêşe

Qîmeta zembîla bêje

Ya mezin zêrbe bikêşe

Ya biçûk qîmet bibêje

Şixwe bike cilkê qirêje

Li xwe bike cilkê qumêş e

Kerem bike dîwana mîr e

Rûnê li ser doşeka mîr e



Pal bide balgiya mîr e  
Bikişîn qelûna mîr e  
Dest bide zulfê herîr e

Xatûna gerden bi morî  
Şigul nabin bi kotek û zorî  
Min te sipart padşahê jorî  
Ya Rebbî tuyî Gefûrî

Zembîlfiroş lawkê Ebas e  
Rebeno lawkê Ebas e  
Te tena derpê û kiras e  
Ji destê min nabî xelas e

Te bavêm zîndana kûr e  
Te bavêm zîndan dirêj e  
Tê de bimînî çil mêje  
Li te her rojî û limêj e

Tu were ser vê qissetê  
Ji xwe re bike xêra te tê  
Em xêra biçne cennetê  
Dûr e roja qiyametê  
Xatûna zêr li enî  
Delala zêr li enî

Li hev ketin toq û benî  
Fekrî gerya hur hur kenî  
Qerwaşê tu bilezîne

Rebenê tu bilezîne  
Beroşa biçûk tu bîne  
Birincek lib lib bikelîne  
Rûnê malê serda îne

Ji pêl Zembîlfiroş ve bîne  
Têr bixwe aqil bicvîne  
Birçine aqil tunîne

Xatûna bes û temamî  
Delala qenc û temamî

Şerbetîne tasê Şamî  
Venaxwim tu 1-min heramî  
Zembîlfiroş lawkî serbest e  
Rebeno lawkî serbest e  
Misîne avê dixwest e  
Gul xatûn rabû da dest e  
Kelha mîrê kire qest e  
Ew kelha mîrê rewal e  
Bilind e çend rim hewar e  
Di binî de nar û bizmar e

Hila kir xwe avêt xwarê

Cibraîl tilk û çeleng e

Digirî her yek û tang e

Girtiye bi kemlê xortike

Danîbû erda nermike

Reben qet nedî zehmetê

Reben qet nedî zehmetê

Ditirsî ji qiyametê

Şerma wî-j Rebbê ‘izzetê

Zembîlfiroş rabû reviya

Rebeno rabû reviya

Xatûnê li dû geriya

Tax û taxu 1-pey geriya

Mal û malo li pey geriya

Liqay mala Zembîlfiroş bûye

Cilê xwe bi cilê jina wî re gorandiye

Xirxal û morê jibîr kiriye

Îvarê dereng Zembîlfiroş bi mal de hatiye

Kete xir û xirbagîye

Xirên xirxalan hatiye

Go îsal heft sale min kulfeta xwe aniye

Min xirxal û morîk pê ve nediye

Zembîlfiroş rabû reviya

Xatûnê li dû daniye

Qesta ser kaniyê kiriye  
Destmêjek sivik girtiye  
Du riket sunnet kiriye  
Xatûnê li pişt sekiniye  
Ji halê xwe re rabû giriye

Go: Ya Rebbê izzetê  
Tu rûhê min bistînî vê saetê  
Min xilasbikî ji vê hurmetê  
Da min nebe helaketê  
Şerma min ji Rebbê izzetê

Xwedê Teâlâ wê an û saetê  
Erd qelaştî Zembîlfiroş navda çûyî ye  
Devê erdê hat girtîye  
Xatûnê li ser sekiniye  
Ji halê xwe re hûr giriye

Go: min çi bi serê vî xortî de aniye  
Go: Ya Rebbê izzetê  
Tu ruhê min jî bistînî vê saetê  
Xwedayê teala rûhê wê jî sitande wê saetê  
Her dû bûne bûk û zavê axretê  
Rehme li dê bavê hazira û cemaetê<sup>186</sup>

---

<sup>186</sup> Orjînalê beytên wê jiber ku li ser textê wusa hatiye nivîsandin me jî neguherand.

### 3.4. HEVBEŞIYA ÇÎROKA ZEMBÎLFIROŞ Û ÇÎROKA ÛSIF Û ZELÎXE

Di nav destanên evînî de du çîrok hene ku ji yên din cudatirin. Yek Zembîlfiroş û ya din jî Ûsif û Zelîxa ye. Ev her du helbest bi aşîk û maşuk ji helbestên evînî yên din cuda dibe. Ango jin aşîk mêr jî maşûk e. Gelo cîh guhertin bandoreka çawa li ser çîrokê listiye.

Xatûna ku navê wê di destana Zembîlfiroş de derbas dibe gelekî li Zelîxa çûye, dirûvê wê lê dikeve, wek hev in. Zelîxa jî wek Xatûnê jina mîrekî ye, mîrê Misrê. Dema Ûsif, kurê Aqûb pêxember dibin Misirê, dilê Zelîxe gelekî dikeve Ûsif. Di şaxên Ûsif û Zelîxa yên folklorî de, çawa em dibînin ku dema Zelîxa, Ûsif ji xwe re dikire dibe Ûsif rîya revê digere, lê bele ji destê vê jinikê xelas nabe. Zelîxa tîne vê carê Ûsif şikyatî mîrê xwe dike, mîr jî tîne wî dike zîndanê. Ev destana di nav Kurdan de gelek belav bûye, gelek şaxên wê yên edebî û folklorîk hene.

Li Quranê de derbas dibe “çîroka herî xweş”<sup>187</sup> Ûsif ê Zelîxa wekheviya her du çîrokan vebêje. Derbarê Ûsif û Zelîxayê de pirtûkek berfireh Ayhan Geverî di sala 2013 an de çap kir û di pirtûka xwe de qala çîroka Zembîlfiroş kir. Di pirtûka xwe de wûsa dibêje: “Dibe ku Zembîlfiroş ji ber çîroka “Ûsif û Zelîxa”yê hatibe çêkirin yan jî ew ji ber serpêhatiyeke dî ya rastî ketibe edebiyata devkî. Lê her çawa be ev herdu çîrok pir nêzîk hev in, hetta wekî Remezana Alan di nivîsa xwe ya bi navê “Ûsif, Buda û Zembîlfiroş”ê de gotî “Zembîlf[i]roş, qeşengiyê de Ûsifê Kurdan e”<sup>188</sup> Herdu hikaye bi naverok û motîfên xwe ve gelek dişibihin hevdu.

Remezana Alan, li ser wekhevî û nezîkbûna wan herdu çîrokên navborî û serpehatiya Buda, muqayeseyên balkeş dike. Lê em beyî ku li ser herdu çîrokan tehlîlen kûr bikin em dişen di navbeyna herduyan de çend wekheviyan rez bikin.

Beriya her tiştî ji bo mijara me, em tenê vê benda hikayeta Zembîlfiroşê ya destpêkê bidin, hingî em dê tekiliya wê çîrokê ligel Ûsif û Zelîxayê çetir fêm bikin: Ev yekê jî bi “husnê Ûsif” li bal bû ye. Her du lehengê me jî bi bedewî û xweşikîyê de bal dikişînin ser xwe. Di navbera herdu hikayetan de motîfên wekhev ne tenê bedewiya Ûsif û Zembîlfiroş e. Herwisa di herdu vegotinên de cinsiyetên aşîq û maşûqan jî eynî

<sup>187</sup> Komisyon, **Quran-î Kerîm**, Sûre Yûsuf, Ayet 3, weş. DÎB, İstanbul, 2013, r.236.

<sup>188</sup> Selîmiyê Hîzanî, **Yûsuf û Zuleyxa**, Ayhan Geverî (wer.), r. 35.

ye. Di Êsif û Zelîxayê de çawa Zelîxa aşiq e û li dûv Êsifi îffeta wê dikeve devê jinen Misre; herwisa Gulxatun jî jina mîrekî ye û dile xwe didete Zembîlfiroşê selikfiroş/zembîlfiroş. Çawa ku Êsif li hember Zelîxayê, kole û bende ye û ji çîneke nizimtir e, Zembîlfiroş jî li hember Gulxatunê -li gor “çîn”en civakî- kesek nizimtir e. Lewra herdu mêr jî ji mal-bavên xwe, ji wetenên xwe yên eslî derketine û ji “sewiye”yên xwe yen eslî ketine...

Di herdu hikayetan de jî jin di evîndariye de serdest e, yanî aşiq (lehenga aktîf) jin e, maşûq jî (lehengê pasîf) mêr e. Ev xusûsiyeta van hedu çîrokan li gor evindariyên Rojhilatî yên adetî tiştek xerîb û cuda ye. Lewra çî Ferhad û Şîrîn be, çî Leyla û Mecnûn hwd. be -istisnayên wê hebin jî- bi giştî yê aşiq mêr e û ya maşûq jin e. Lê ev têkilî di Êsif û Zelîxayê û Zembîlfiroşê de berevajî ye. Di “Êsif û Zelîxa”yê de Êsif kurê Pêxemberekî ye û ji ber hesudiya birayên xwe ji rutbeya xwe ya eslî ketiye û -di qismê pâşî yê çîrokê de- bûye koleyê wezîrê Misrê û jina wî. Di Zembîlfiroşê de jî Zembîlfiroş kurê mîr û begekî ye lê piştî ku “mirin”ê bi çavê xwe dibîne, xwe ji dewlemendî û jiyana dinyewî dûr dixê û dibe derwêşek selikfiroş. Ew jî li gor jiyana civakî ji rutbeya xwe ya eslî dikeve û dibe firoşê zembilan.

Li gor hinek varyantên Zembîlfiroşê yên devkî, babê Zembîlfiroşî ji ber lavînî û bedewiyê kurê xwe ji çavan dûr mezin dike û nahêle ew ji malê derkeve derve. Yanî çawa ku Êsif sembolê “lavînî” û “cindîtî”yê ye Zembîlfiroş jî eynî wisa lav û bedew e. Wekî lavîniya maşûqân mêr, bedewiya aşiqên jin jî rengê hev didin; lewra Zelîxa bedewtira jinan e û Gulxatun jî bedewa wextî ye û di varyantên hikayetê de wesfên wê wekî yên Zelîxayê têne gotin.

Taybetmendiyek dî jî ew e ku mêr yanî maşûq xerîb in û ji derve têne mekanê evîndariyê yê çîrokê. Êsif ji Ken‘ana “mala babê xwe” tête Misrê û Zelîxa wî li bazarê dibînit. Eynî wisa Zembîlfiroş jî piştî biryara derwêşbûnê ji “mala babê xwe” derdikeve û tê ber derê seraya Gulxatunê. Ew wekhevîyên mekanî gelek muhîm in ku li gor qinaeta me di berevajîbûna cinsiyetên aşiq û maşûqan de mekan egera sereke ye. Lewra jin li pey mêran nakevin lê mêrên bedew tên dikevîne ber piyên wan herdu jinan, ku ew “hatin” serencam û aksiyona herdu çîrokan kifş diket. Yanî herçend Zelîxa heta bazare çûbe jî, ew jî wekî Gulxatunê, ji mala xwe (ji bajare xwe) derneketiye, lê ew mêrên dilber ji şehrek dî hatine û ketine ber piyên wan.

Di herdu hikayetan de jî dîtin û aşiqbûn bi “bazar”ê destpê diket. Zelîxa di xewna xwe de bibîte aşiqê Êsif jî wê cara ewil ew li bazarê dîtiye û bi dîtina ewil zaniye ku ew Êsifê wê ye. Herwisa Gulxatunê jî cara ewil Zembîlfiroş di bazara selik û zembîlan de dîtiye. Yanî di van herdu bazaran de jî muşterî û bikir jin in. Ew jî taybetmendiyeke e ku van herdu çîrokan ji çîrokan dî yen evîndariyê cuda diket. Lewra Zelîxa jî Gulxatun jî xwedanpere û xwedanhêz in ku dixwazin dildarê xwe bikin.

Zelîxa çawa ku Êsifî diêxite pişt heft deran û wan deran li ser wî qifil dike lê Êsif dîsa jî daxwaza wê pekneanî û li ser we Zelîxa jinen Misre bi evîna xwe agahdar dike; Gulxatun jî “deri li ser pêve dide” û gava dibîne Zembîlfiroş daxwaza wê bi cih naîne ew jî wekî Zelîxayê cariyeyên xwe bi evîndariya xwe dide dihesîn:

Lawekî qelbim cuda kir

Min ji ‘eşqan xew netê.

Di herdu çîrokan de jî jin daxwaza wesletê ji maşûqên xwe dikin lê herdu mêr jî ji ber tirsê Xweda daxwaza jinan paşve dizivîrin. Di herdu çîrokan de jî gunehkar jin in û evîndariya jinan li ser şehwetê hatiye avakirin. Lê zîlam xwedanîffet û namûs in û li hember teklîfa jinan hem Êsif hem jî Zembîlfiroş dixwazit mekanê terk bikin da ku bişêt xwe ji guneh û zînyê xilas bikin. Bi vî rengî jî tekiliyek di navbera “guneh” û “jin” û “mekanî” de heye.

Ji bo ferqên herdu vegotinan jî em dikarin wan tiştan rêz bikin: Me li jor bi zarê Remezan Alan gotibû ku Zembîlfiroş, Êsifê Kurdan e. Lê Kurdbûn ne tenê wesfê lehengê çîrokê ye, herwisa çîroka wî lehengî û Gulxatunê jî bi rengê Kurmancî û îslamî hatiye raçandin. Ew jî ferqek e di navbera vê çîrokê û Êsif û Zelîxayê de. Lewra di çîroka Zembîlfiroşê de digel ku behsa pêxemberan li gor neqlên Qur'anê hatiye behskirin, navê “Kurmancan” derbas dibe:

Keç dibê lawê rast ne

Mîr li Kurmancan qiyas ne

Wekî ku mekanê vê çîrokê bajarên Kurdistanê ne ên wekî Silîvan û Zaxo, leheng jî kesayetiyan Kurmanc in. Lê di Êsif û Zelîxayê de mekan Ken‘an û Misr e û leheng jî

ehlên ji wan memleketan in. Herçend Qur‘anê piştî Tewratê hikaye vegotibe jî mekan û kesayetiyan çîrokê neguherandiye. Lewra di Êsif û Zelîxayê de ew kifş û mûeyyan in û ew çîrokê çîrokek Semîtîk û Efrîqayî ye. Lê di Zembîlfiroşê de em navê “Zembîlfiroş” jî nizanin, nizanin ka Gulxatûn kî ye û Mîr û yê din kî ne. Belê ev zehmetiyeke û diyarkirina navan teqez ne mimkune. Lê ya rast hin nişaneyên çîrokan heye ku navên lehengan diyar dike û derbarê wan de hin agahiyan bi me dide nasandin. Ji ber wê jî muqayeseyek bi her awayî ve ya rast û durist li ser herdu hikayetan zehmet e.

Ji aliye din ve dema ku Êsif daxwaza wesleta Zelîxayê paşve dizivîrînit û hewl dide ku ji destê wê xilas bibe, rastî mêrê Zelîxayê dihêt; lê Zembîlfiroş ji bo ku xwe ji destê Gulxatûnê xilas bike xwe ji kelê dihavête xwarê û Hz. Cebrail tê hewara wî û wî xilas dike. Lê Êsif wisa xilas nabê û ji ber iftirayan dikevê zindanê.

Di revîna herdu lehengên mêr de jî ew gazî Xweda dikin ku Xweda wan xilas bike. Çawa ku Hz. Cebrail tê hewara Zembîlfiroş herwisa Êsif jî dengekî xatîf (wehyê) dibîhîze û jê dixwaze ku ligel wê jinikê zinayê neke. Ew jî her bi hatina milyaket Cibraîlî ve pêk tê. Bi vî awayî herdu çîrok li dor “harîkariya îlahî” jî wekî hev hatine vehonandin.

Êsif û Zelîxa ji bilî mesnewîbûnê li gor vegotina Qur‘an û Tewratê çîrokek dirêj û têkilhev e. Lewra di herdu metnên muqeddes de jî çîrok pirreng e û leheng zehf in û mijar ne tenê bi evîndarî yan jî îffetê ve girêdayî ye. Jibilî van motîfan, hestên lehengên dî jî hene û di çîrokê de ne tenê du kes hene. Evîndariya Zelîxayê û hikayeya Êsifî bîgeh be jî serpêhatiyên lehengên wekî bira, bab (Ye‘qûb) hwd. jî muhîm in. Yanî kadroya çîrokê berfireh e. Lê di Zembîlfiroşê de kadro gelek teng e û ji bilî Zembîlfiroş û Gulxatûnê kesek dî bi kesayetiya xwe ve nîne. Ku ew jî cudayiyek mezin e di navbera herdu vegotinan de .<sup>189</sup>

---

<sup>189</sup> h. b. r. 35-40.



## BEŞA ÇARAN

### GUHERTOYÊN ÇÎROKA ZEMBÎLFIROŞ

#### 4.1.DESTXETÊN NIVÎSKÎ

Çîroka Zembîlfiroş heta îro gelek cara hatiye nivîsandin. Di destê me de nixayên hene yê Feqiyê Teyran û Miradxanê Bazidî ne. Destnivîsa Miradxan de em dikarin bêjin pirsgirêk nîne lê belê di destxetên Feqiyê Teyran û Meleyê Bateyî de peyvên cuda hatine bikaranîn. Em dikarin bêjin van nixayan de li gor naverokê cudatiyek nîne, tenê firehbûn an jî diyarbûn heye.

Dema ku em destxetên nivîskî û yê folklorîk-dengbêjî mêze dikin cudatiya di navbera serpêhatiyar de wusa diyar dibe:

Destpêka çîroka Zembîlfiroş ne wek hev in. Lewra varyanta MB û ji hin dengbêjan ve Zembîlfiroş, di destpêkê de wek kurê Mîrek bi hukim û hebûn tê nasandin. Ew piştê derbasi jiyanê feqirî dibe û ji ber baweriyên xwe bi keda destê xwe jiyana xwe didomine. Ev mijar, di berevokên FT û MB de ne xuyaye, ango çîrok bê seri ye.

Hin varyantan de jina zembîlfiroş wek jineke dilsoz tê xuyan. Gava Xatûnê tê mala Zembîlfiroş, lavayiyar ji jina wi dike û derd û evina xwe jê ra dibêje, dilê jina Zembîlfiroş pê dişewite û bi vî awayî destûr dide Xatûnê da ku di nav nivînên wê da rakeve. Lê di hin çîrokên Zembîlfiroş de jina Zembîlfiroş timatiya malê dinê dike û ji bo pere û zêr û zîv Xatûnê di nav nivînên xwe da dide razandin. Di hin beravokandê jî jina Zembîlfiroş teqez vê yekê qebûl nake û tê avêtin girtûgehê.

Ne wekhevîya dawîya çîrokê ye. Di hin varyantan de Zembîlfiroş di nav qesrê de û li ba Xatûnê tê hepis kirin. Mirê Farqînê, ango mîrê Xatûnê ne li mal e. Lê ev mijar di berevoka Heciyê Cindi ("Epikên Kurdi") da rengê din stendiye, ango Zembîlfiroş bi fermana Mirê Farqînê tê zindankin û kuştina Mirê Farqînê bi destê Zembîlfiroş tê nişandan!.. Newekhevîyeke din jî, di varyantên "Zargotina Kurda" da heye. Di varyanta yekem de, dema ku Zembîlfiroş pê dihise ku Xatûn di nav nivîna wi de ye hema wê demê dibe teyrekî sipî û ji kulekê direve diçe. Berî çûndina xwe ji Xatûnê ra dibêje, "kengê te solek û gopalek hesin qetand, tê paşê minî bibinî. "

Herweha heft sal derbas dibe û rojeki Xatûnê, li navsera çiyayek rasti Zembilfiroş û sê horiyên ba wi dibe. Xatûnê û Zembilfiroş li wê derê dibin xwişk û birayê hev û piştê Xatûnê diçe heqîya xwe. Bi kurti pişti heft salan xatûnê dimre û Zembilfiroş bi destê xwe wi vedişêre.

Li vê derê jî, derbarê mirina Zembilfiroş de tevlîhêviyek heye. Ji aliki ve peyvên "teyrekî sipî", "sê horî" îşareta mirinê û cennetê ne, lê li ali din pişti heft salan hevditina Xatûnê û Zembilfiroş li navsera çiyayek saxiya Zembilfiroş dide xuyan. Pirsaxwişk û biratiya herduyan jî, evina Xatûnê ya yekalî bê mane dike û vê evinê ji qîmet dixîne, ango lêzêdekirineke ne baş e.

Di nav guhertina çîrokan de cudatiyek din reva Zembilfiroş e. Di hin weryantan de Zembilfiroş bêçare dimîne û xwe ji kelê davêje xwarê (navê "Kela Zembilfiroş" a Farqînê jî, xasîma ji ber vê bûyerê ye). Lê li gor hin varyantan Zembilfiroş, pişti kuştina Mirê Farqînê deriyê zindanê vedike û bi peyati direve. Ev kuştin li felsefa tesewifi ya çirokê nayê, ji karektera qehremanê çirokê ra jî ters dikeve. Herweki ku di varyanteki O.Celil û C.Celil de jî, Zembilfiroş li baxçê qesra Xatûnê dizîya zil an ji şiveterkan dike, dergevanên Xatûnê wî digrin û tînin balê û herweha Xatûnê wî dibîne û dibe bengiyê wî. Xatûnê jê dixwaze ku, Zembilfiroş dotira rojê zembilên xwe yên sipehi bîne. Zembilfiroş zembilan tîne, dizî têr nake ica li pêşberî pencera Xatûnê "mîz" dike û Xatûnê, wi ji pencerê dibîne... Kuştin, dizî û li pêş penceran mizkirin qet ne tiştên di cih da ne û li ser çirokê siyeke tarî çêdikin, bedewiya efsaneyê xera dikin û pênasê nebaş didin Zembilfiroş. Ew Zembilfiroşê dilpak û rastparêz, dixê kirasekî diz û tolaz... Çirokên kevn di dirêjahiya sedsalan de, li ser zarê çirokbêjan gelek nexş û motivan werdigrin. Ev tiştêkî xuristî ye, eger bi taybetî jî bi devkî gihiştibe serdema me û destnivîsarên wan ne li meydana bin. Gelek caran ev nexş û motîvên nû yên ku li çirok û hwd. Tê zêdekirin dewlemendiyeke xweser didin berhemên folklorî. Qesd ji dewlemendiyê ew e ku, eger bingeha berhemên kevin hatibin parastin û bingeha parastî restore bûbe, hatibe nexşandin. Dewlemendiyeke weha karê tamedî xweştir jî bide meriv. Na eger wek minakên "Zargotina Kurda" be, karê tama heyî jî bikuje, berhemê asimîle bike û ji eslê wi dûr bike.

Di varyantên Zembilfiroş ên "Epikên Kurdi" û "Zargotina Kurda" da, Zembilfiroş, rengkî balkêş distîne!.. Ango, Zembilfiroş wek Ezidî tê xuyan û ev rengê

han di hersê veryantên Kurdên Sovyet de jî dertê pêş. Lê di varyantên Kurdistanê de, ew bi felsefa tesewifî ya Islami tê rawekirin. Eger ev efsane ji ali Melayê Batê yan jî Feqiyê Teyran hatibe nivîsandin, şek tune ye ku ew bi rûheki islami hatiye afirandin. Li gor raya min ev mijara balkêş, xusûsiyetekî Kurdan ê din jî radixe pêş çavan. Ev xusûsiyet jî ev e, ku olên cuda nebûne sedemê nakoki û berberiyên navbera Kurdan. Ango, di jiyandina bermahiyên neteweyî de, dîn çî dibe bila bibe, bi ruhê Kurdîti çîrok û hemû berhemên gelêrî hatine parastin, hatine hezkirin û her yek ji wan bê zordayinê van berheman wek malê xwe hembêz kirine û jiyandine. Bi gotinekî din, rîhê Kurdîti raserî olên Kurdan (musulmanî, êzîdîti, filehî, cihûti, elewitî û wd) bûye.

#### 4.1.1. Zembîlfiroşa Feqiyê Teyran<sup>190</sup>

1.

Ey dil were disa bi coş

Carek ji cama mey binoş

Bikim qîsseta zembîlfiroş

Da seh bikin hîkayetê

2.

Zembîlfiroş lawek rewal bû

Bi kulfet û ehlî 'eyal bû

Husneka Êsif li bal bû

Heqq e rezzaqê qismetê

3.

Ew qewî lawek feqîr bû

Daîma Xudê di bîr bû

Di pîşê selkan jîr bû

Dest dikir bi wê sin'etê

<sup>190</sup> M. Xalid Sadînî, **Feqiyê Teyran Jiyan, Berhem û Helbestên Wî**, Stenbol, Nûbihar, r.399- 410.

4.

Şuxlê wî selk û tebeq bû

Daîma ew rast û heq bû

Qîmetê selkan wereq bû

Her bi destê meşxeletê

5.

Kulfetî qismet li wî bû

Ji tişt û mal çî wî bû

Di pîşê selkan qewî bû

Her bi destê meşxeletê

6.

Her roj bi dest zembil di best

Dibirine bazaran bi qest

Xarin û nan dihat bi dest

Razî di bû bi qismetê

7.

Rojekê selkan ku tîne

Xatûnek jor da dibîne

Bi dil û can dil hebîne

Ketîye benda muhebbetê

8.

Muhebbetê keç mubtela kir

Sir li carîya aşkera kir

Lawekî qelbim cuda kir

Min ji ‘eşqan xew netê

9.

Ew letîfa bê îxtîyar e

Carîyek jorda hinare

Tu here bêje bi zar e

Ma bibin ser meslehetê

10.

Ew carîye di xewfa Xudê ne

Law bi vê hîlê di bîne

Mîr ji te selkan dibîne

Lê dikitin hîletê

11.

Tu çêke selkan di carke

Bîne dergahî beha ke

Mîr heqê te dê eda ke

Şuxlek xêra te tê

12.

Law rabû çûye malê

Çêkirin selkên delalê

Anîne dergehî rewalê

Riziq ev e heq bide tê

13.

Selik birin bi jêr hinarê

Dît carîyek hate xarê

Mîr jî tê divê dîdarê

Dê bide te qîmetê

14.

Go bila qîmet bo wî be

Ew nizanît bena û lîb e

Çûna bal mîran çi be?

Ewê nizanît haletê

15.

Law bi wî lîpî nizanî

Bê fikir ew çûye banî

Derke dada dergevanî

Ev çi bela bû law ketê

16.

Wî ku dî der pêve dav e

Xeyriye lê reng û çav e

Go: yeqînî ev hîle dav e

Ez dê bibînim zehmetê

17.

Ew carîye pir lîp û bend e

Law bi bal mîran vexwende

Dît şîpalek lep ji qende

Qet kes nedabû wesfetê

18.

Lawî rast bi Xudê re

Pir ji wî qencî digere

Min ji te navê pir zêde

Min xilas ke ji zehmetê

19.

Xatûn di bê çare tu nin e

Qerm neke were nivîne

Min bi te daye evîne

Da bibînîm ji te lezzete

20.

Law di bê tirsîm ji abcorî

Du heram bîne dîyarî

Agirek wê li me bibarî

Ez û tu bikin tewbetê

21.

Keç di bê lawê bîyanî

Ez dibêm da tu bizanî

Min ji bo ya dil tu anî

Tu nizanî muhebbetê

22.

Law ji xatûnê dibêje

Tu mexaz ya dil divête

Da ji Heq nebin fihête

Rûspî bin qîyametê

23.

Keç dibê bavêj xiyalan

Were nêv doşek û balan

Bên bike zilfan û xalan

Dûre ji ya axretê

24.

Law dibê zulfê herîr e  
Ma pîruz be ew li mîr e  
Çi heddê lawê feqîr e  
Dest bidet vê muhebbetê

25.

Keç dibê lawê firîvan  
Were nav ruhan û sêvan  
Şekirê bimêj bi lêvan  
Şubhê dama şerbetê

26.

Law dibê qet nabe tamamî  
Her wekî şekir di camî  
Ji ser û pê li min heramî  
Tirsim ji me'na ayetê

27.

Keç dibê lawê rewal e  
Ger te hacet zêr û mal e  
Her çi te xwast min kir helal e  
Bes bike vê hucetê

28.

Law dibê ezî têr im  
Zêr û mal çi wê xwendêr im  
Ez ji tirsê heq newêrim  
Ne ku be'îd bim ji rehmetê



29.

Keç dibe lawê rast ne

Mîr li kurmancan qiyas ne

Te ji destê min xelas ne

Bo li te didim muhletê

30.

Law huccet kir te hingav e

Çim teharete kim bi av e

Keç nizanî wê xwe tav e

Dûr e ji qebahetê

31.

Xatûn pir şox û mest e

Law bi dil û can dixweste

Mesînek da bi dest e

Ji bo te bikim xizmetê

32.

Law derket ji menzelê

Dê çûye ser banî kelê

Qet çare nebû tê da herê

Dema dî fikir hîletê

33.

Dema ku dî dil kir girî

Dil şewitî ew pir girî

Rû da û evraz fikirî

Ban kire Şahê qudretê

34.

Bang kire padîşahê mubîn

Go: ya delîl û kazirîn

Tu şad dikî qelbê hezîn

Xelas dikî ji zehmetê

35.

Ya xaliqê zehmet kesîr

Ya alimê bi qelb û zemîr

Hemî sirran tu pê xebîr

Fettah î babê şefqetê

36.

Fettah tu yî mifteh bi dest

Tu xaliqî her çi ku hest

Yek car bi te min pîst dibest

Da min nabî hilaketê

37.

Serbîs bi şaran birî

Eyub wekî kirman dirî

Ûsif wekî ‘ebdal kirî

Lê înan ser siltenetê

38.

Wan îbrahim avête nar

Pêt û piring lê bûne sar

Vêda birin te ji boy nar

Te xilas kir ji zehmetê

39.

Musa di nêv behra ‘emîq  
Te lê vekir duwanzde terîq  
Fîr’ewn di nêv maye xerîq  
Te daye bezayê sîrketê

40.

Yunus wekî Hûd da belhand  
Yek weslke jê nexland  
Dîsan bi dinê wesland  
Min sidq û bawer bite tê

41.

Bawer bikin vê gotinê  
Tofan ku hat girte dinê  
Nûh û gemî man bi tenê  
Tu yî xaliqê vê heyatê

42.

Deşt û çîya têk bûne behr  
Wan asî û xelqê di xwer  
Cumle di nîv de mane qehr  
Tu yî layiqê wehdane tê

43.

Te xilas kirin ew hemî  
Dizanim ku tu ne naîmî  
Ez dê xwe bavêm vê demî  
Hewl û qudret ji bal te tê

44.

Lawî rast e bi cebbar e  
Dil yek e nabe dibare  
Xwe ji burcê avête xar e  
Zû hate nêva Hêşetê

45.

Ew xaliqê her ‘ilim li nîk  
Wî gote Cebrail çapîk  
Here ‘ebdê min bigire sivik  
Qene li bike sîyanetê

46.

Ew Cebrailê pir çelenk  
Hate xarê ji banê felek  
Law li hewa girt û gelek  
Ji wîra diket înayet

47.

Cebraîl hatî ji kerem  
Law li hewa girt bi şerm  
Daîne ser erdî bi nerm  
Dûr kir ew ji delale tê

48.

Lawê rast pak wucûd e  
Ew ser bir bi sucûd e  
Şukur kir ji Wedûd e  
Lê xilas kir ji zulmetê

49.

Şukr û minnet ew ra dixwest

Dîsan bi mal rabû bi qest

Mîran selik kêşa ji dest

Zembîl sitandin bi zulmetê

50.

Jinê hebû 'eqlek ji dor

Her çi selik standin bi zor

Me sipare padîşah ji jor

Eda bikit di qîyametê

51.

Jinê ku ev gotin kire

Bi yeqîn ew ji mîr qanî'tir e

Ew ji ya Xudê çû bû hazir e

Tu 'alim î bi xeyba nîyetê

52.

Jin dibê tu were êre

Em agirek bikin lêre

Wekî dûh û wekî pêr e

Betal nekin vê 'edetê

53.

Jinê tendûr hilkir di mal e

Derî girt ew çûn ji bal e

Da cîran nekin fikr û xeyal e

Me navê zatî şuhbetê

54.

Jinê tendûr helkir sivik

Zadek nebû bavê kûçik

Derî girt û çûbû jinik

Tendûr nûr bû ji nî'metê

55.

Tendûr pir bû bi nan û aş

Derî girt û çûbûye paş

Xaliq ji ba xwe qismet mî'aş

Tendûr ser bû ji nî'metê

56.

Cîraneke wan hate ser

Agirek ji wan xwest bi xeber

Dema ku wan kir lê nezer

Tijî bû te'amê cennetê

57.

Xêr da ewan ku bê hesab

Înane der nan û kebab

Şefqet li wan kir ew Wehhab

Têr bû ji zad û mihmetê

58.

Ger bi roj e ger bi şev e

Ta'et bikim hûn bi xwe ve

Her çi rast e ceza ev e

Da hûn nebin ji axretê

59.

Ya Muhemmed xemxwarê ummetê

Her çi ji min bawer ne tê

Ne musteheqqê şefa'etê

Mexreb dûr e roja axretê

60.

Ey 'Mîm û Hê' xweş defter e

Her çi ji min ne bawer e

Ne ji ummeta pêxember e

Her musteheqqê şefa'etê

#### **4.1.2. Zembîlfiroşa Melayê Bateyî**

Berhevoka Albert Sosin:<sup>191</sup>

Ey dil werin dîsan bicoş,

Carek ji caran mey binûş,

Bikin qiseta Zembilfiroş,

Da seh bikin hikayetê.

Zelbîlfiroş lawkê rewal bû,

Bi kilfet û ehl û eyal bû,

Husnekî Êsif li bal bû,

Heq rizaqê qîsmetê.

---

<sup>191</sup> Prof. Qanatê Kurdo, **Tarîxa Edebyata Kurdî**, Stokholm, Enstîtuya Kurdî Ya Parîsê, 1983, r. 65.

Qewîn ew lawê feqîr bû,  
Dayme xwedê debîr bû,  
Pêşê xweda jêr bû,  
Ew bi dest hebû sene'ete.

Şixulê wî selik û tebeq bû,  
Qîmeta selkan wereq bû,  
Dayma ew rast heq bû,  
Pê debirî kilfetê.

Ew bi dest zembîl bi dest,  
Dibirê bazarê bi qesd,  
Xwarin nan dihat bi dest,  
Razî dibû qîsmetê.

Her dema selkan ku tîne,  
Xatûnek jorda dibîne,  
Bi dil û can dihebîne,  
Dil kete pêla muhbetê.

Muhbetê keç mubtela kir,  
Sur li carîya aşkera kir,  
Lawukî qelbim cuda kir,  
Min ji eşqa xew ne tê.



Law rast bû bi xwedêra,  
Pir ji wê qenca dikêra,  
Go min ji te navê tu zêra,  
Tu min xilaskî ji zehmetê.

Xatûn dibê ev xeber tunîne,  
Şerm meke, were nav nivîne,  
Min bi te day evîne,  
Da em bibînin heşmetê.

Taw dibê tirsim ji xebere,  
Dev hereme, têne riyare,  
Agirek bi wanda dibare,  
Narî cama şerbetê.

Xatûn dibê tu lawê beyanî,  
Lew dibem da tu bizanî,  
Min tu ji bo dilê xwe anî,  
Da em bikin misilhetê.

Law bi xatûnêra debetê,  
Tu mixazîya dil devete,  
Daym ji heq nekin vehetê,  
Rû spiyin d axretê.

Xatûn dibêje bavêje xeyalan,  
Were ser doşek û palan,  
Bihn ke zulf û xalan,

Law dibe zilfê herîre.  
Pîroz be lawê mîre,  
Çi hede lawê feqîre,  
Tev bide vê misilhetê,

Xatûn dibê lawê verêvan.  
Were nav reyhan û sêvan,  
Tu şekir bimêj bi her du lêvan,  
Şibhe cama şerbetê,

Law bidê tu qenca tamamî.  
Her wekî şekir di camê ,  
Bi ser û p'eyan tu li min heramî,  
Tirsim ji roja axretê.

#### **4.1.3. Zembîlfiroşa Mîradxanê Bazidî.<sup>192</sup>**

Ey meclîsa pir zewq û xoş / Guh bidine sohbetek xoş / Dikeyn behsî Zembîlfiroş  
Zembîlfiroş kurê mîran e  
Laweku bejin rîhan e  
Xwedana koçek dîwan e

---

<sup>192</sup> Gîw Mukriyanî û Şêx Bêşîr Şex Mihemed Tahîr Rkawî Brîfkî, Yadgarî Mirad Xanî Bayezîdî, Çîroka Zembîlfiroş, Necatê Zivîngî (wer) Hewlêr, weş. Kurdistan, 1975, r. 81-130.

Li keyf û seyran şev û roj  
Şev û roj keyf û xoşî ye  
Bi 'îşq û reqs û şahî ye  
Çû 'acizî di dil da niye  
Ne dîtye sa'etek nexoş

Şevêkî şevî îni bû  
Xewnek 'ecaîb dîtî bû  
Li naw xewê da girî bû  
Dil û hênava lê hate coş

Jina wî lê kire pirsyar  
Bo çî digrî tu ey nazdar  
Ji ber çî ev tirs û hawar  
Ji ber çî rabûyî mendehoş

Şazade d-bêjît nazenîn  
Min dî xewnek xoş û şîrîn  
Qesr û qisûr hemû zêrîn  
Tu 1-nav da horî perdepoş

Li xew hatim bême qesran  
Ez û tu pêkve bikin seyran  
Li min horî bû dergewan  
Lew ez hişyar bûm mendehoş

Go derkewe tu neê pêş  
Herî li dinê bibe derwêş  
Nehêle qet roj û nivêj  
Bibe feqîrek hirqepoş

Nehêle qet dilê feqîr  
Hişyar be li nebiye mîr  
Xo neêxiye qeyd û zincîr  
Li qiyameta te dikew nexwoş

Tu dizanî mirin heye  
Ev qesr û bag e bo te ye  
Mulkê dinê bê feyde ye  
Çakî bike bo cihê xoş

Min gir rîk agir dîtiye  
Li cehennemî derketiye  
Canê min 1-xew da sotiye  
Lew dergiryîm ez şev û roj

Li dinê dikeyn xerabî ye  
Zilm û dizî û hîzî ye  
Nabînin ruhma Barî ye  
Diçîn cihek qewî nexwoş

Jin dibêjît bîbya çavan  
Ji dil berde xewf û tirsan  
Bab hakimê heft iqlîman  
Xudan genc û eskerek boş

Rabe herî keyf û seyran  
Tu berde tol û tajiyan  
Bikûji asik û kîviyan  
Keyf bike bi dilêkî xoş

Li deste esker sed hezar  
Keyf bike wekî her car  
Dil min sot te ey nazdar  
Bi acizî û dil nexwoş

Şazade dibêjî ey hîrmet e  
Li min neke van nesîhet e  
Rûha şîrîn emanet e  
Diçîn gorek teng û nexwoş

Ku li feqîran hikmê bikim  
Li nav qebrê ez dê çi kim?  
Ciwaba Xwedê ez dê ku dem?  
Roja âlem lê mendehoş

Nazenîn mîrî dibînît  
Rundka xwînê dibarînît  
Lez diket û dilezînît  
Dak û baban pê b-hesînît

Dibêjte dayka mîrî ye  
Kurê te hewlek dînî ye  
Dunya 1-ber çavan sar bîye  
Digirîtin ew şev û roj

Rabe tu daykê b-lezîne  
Babê wî pê bihesîne  
Hekîm û cingîran bîne  
Belê ney dîne û ney nexwoş

Digirît ji tirsaxwedê ye  
Ditirsît ji ber xewfî ye  
Dil nabet mulkê dinê ye  
Qewî dil teng ew bêhoş

Dayik rabû dilezînît  
Cewab bo padşax dighînît  
Wezîran li xwe dicivînît  
Kurê gaz diket dibînît

Dibêjîte ey kurê min!  
Were rûnê li cihê min  
Li ser xwe dane tacê min  
Hukmê bike 1-milletî boş

Were rûnê cihê babî  
Hukmê bike li vî xelqî  
Bistîne tu xerc û bacî  
Dilê dujminan bisoj

Ji paşî gotin û ciwaban  
Ji ber xatra dayk û baban  
Siwar bû bo keyf û seyran  
Bi dilêkî qewî nexwoş

Binêrîne hukmê Xwedê  
Siwar bû ew biçîne keyfê  
Mirîyek dî li nav darmeytê  
Li ser milan dibin bo qebrê

Pirsiyar kir ev mirî kî ye?  
Gotinê kurê walî ye  
Cihêl bû xort û cundî ye  
Vê sibê bê derd mirîye

Şazade 1-hespê peya bû  
Daremeyît li ser mila danabû  
Heta qebran hilîna bû  
Ji çavan têt rûndikî boş

Meyt helîna heta qebran  
Jibîr wî çû keyf û seyran  
Nêçîr û kuştina teyran  
Ketibû halek pur nexwoş

Çav bi qebra kûr ketiye  
Gor xaniyek teng dîtiye  
Her dem dikete qîrî ye  
Şêt û eydaw mendehoş

Zembîlfiroş kurê mîr e  
Çûbûwe ser qebreki kûr e  
Bîra mirnê hate bîr e  
Çûwe malê dilnek û nexwoş

Çûwe mal û gote babî ye  
Min navêt malê dinî ye  
Dibim ebdalê Xwedê ye  
Ez dibime selikfroş



Bab aza ke gerdina min  
Bide min eyal û jin  
Madame her heye mirin  
Min nevêt çû halî xoş

Babî bihîst û dizanî  
Li lawkî diket qîrînî  
Bi naxwoş digel axeftî  
Bi aczî û qet nexwoş

Bab dibêjît ez bi Xwedê  
Nadim te mindal û jinê  
Bigîrî wan li derê xelqê  
Rûs û bîrsî îş nexwoş

Zembîlfiroş ma hîyrî  
Bi herdu çavan diket girî  
Bab hêvî dikem li min negrî  
Berî te nakem emrî

Hêvî dikem min aza ke  
Iyal li min ne cuda ke  
Ev riya min qewî çak e  
Ew şûl baş e ya dil pê xoş

Sondî dixwim b-enya babî

Narûnim ez li ser textî

Li kes nakim gedr û zulmî

Dê bim feqîrek xirqepoş

Li riya Xwedê dê bim ebdal

Sela dibigîrim mal û bi mal

Da xwo bikin rizqek helal

Pê bijînim jin û mindal

Xelq û alem pîr û wezîr

Hemû vêkra dibêne mîr

Bila biçêt xwo biket jîr

Da tam biket halê feqîr

Mir im bide destî jinê

Bila biçê bigerê-1 dunê

Îro naêt axaftinê

Zû dê tewe bi halek nexoş

Padşa dibêjît jinka wî

Dê bî feqîr ligel mêrî

Yan dê rûnê li ser textî

Xatûn li nav ev qesra xoş

Jin dibêjît tacî sera ne  
Jina bê mêr bo xweda ne  
Feqîr e li ber dera ne  
Qurban bim Zembîlfiroş

Wextê babî guh lê bûye  
Qe-j deve jina kurî ye  
Rûndek ji çehvan barî ye  
Girî bû bi dilek nexoş

Zembîlfiroş rabû ser pê  
Maç kirî destê babê  
Xatir xwest ji hemû xelkê  
Bi keyf û bi dilekî xoş

Rabû çûwe hirim sira ye  
Ramûsî dest û pîyê day e  
Jê diken hîvî w reca ye  
Tu bo me bikî dua ye

Lawek ji qesrê derketye  
Eyal û jin ketne dû wî ye  
Li xelqê biwîte şîn û girî ye  
Nema qet kesek dilxoş

Zembîlfiroş derket ji mal  
Nema li dil gem û xeyal  
Digel wî ye jin û eyal  
Çûn da bixwin rizqek helal

Çûn li rêke çend rojekan  
Bi şev û roj çêkit selan  
Çêket zembîlî ciwan  
Heta çûn bajêrek boş

Heta ku çûne Mêrdînê  
Koxek dî li çolê b-tenê  
Gotî werin da biçinê  
Çêtire ji qesreka xoş

Eyal le kol danandin  
Zembîl û sela helandin  
Kolan bi kolan gêrandin  
Li ber derkan tev şev û roj

Hindêk dane bi rûn û ar  
Hindêk da bi fêqî û girar  
Rizq xir kir heta îvar  
Zîvirî mal bi dilêkî xoş

Rabû li roja paşî ye  
Zembîl li xwo hilandîye  
Li kolana diket gazî ye  
Gul Xatûn ji dûr dîtiye

Xatûn ji dûr ve dibînît  
Heyran û bê hoş dimînît  
Perde li ber xo d-hilînît  
Gazî diket Zembîlfiroş

Dibêjîte xweha me şîrîn e  
Lez bike tu bilezîne  
Xwedanî sela ji bo min bîne  
Selikê wî qewî cindî ne

Xudamî lezkir lezandî  
Xwe bi derwîşî gihandî  
Ew ji bo qesrê weşandî  
Xatûnê xwe xemilandî

Xatûn dibêt lawê derwêş  
Kerem bike tu were pêş  
Selka mezin bi zêr bikêş  
Ya biçûk qîmta bibêj

Tu were guh bide min  
Li te helal bibit xanî min  
Dê te kim merûyek mezin  
Bi qesr û maleka xoş

Were ey lawê feqîr  
Rûnê ser doşeka mîr  
Têkvede zulfê herîr  
Ez paşî dê te kim wezîr

Lawik dibêt ey xatûnê  
Navêtin min malê dinê  
Qayil nabim bi gotinê  
Dûr im ez li qisêt nexoş

Xatûn dibêjît ey feqîr  
Were razê li textê mîr  
Qiyametê bike ji bîr  
Li dest xo neke ev roja xoş

Law dibê xatûnê xoş mirhetê  
Agirê Xwedê bi canê te ketê  
Qiyameta li du pey me tê  
Ez lew nakim xiyanetê

Heta xwe di erdê rakim  
Xiyanetê 1-kesî nakim  
Dilê Xwedê ji xwe nakim  
Bo xatra rojeka xoş

Xatûnê min-bes bêşîne  
Wellah min teme' bi te nîn e  
Qîmeta selkan çû nîn e  
Bide min eyal birsî ne

Min heye eyal û jin  
Birsî ne wê li hêvya min  
Rehmê bike tu-b halê min  
Tu min berde hêj maye roj

Xatûn dibêt birû qeytan  
Dilê min qet naçît selkan  
Me-j te divêt keyf û seyran  
Hem kirdinî keyfeka xoş

Rabe zû were ser textî  
Têkvede ev canê sipî  
Dilê min wî bo te sotî  
Naçî tu bê bezmeka xoş

Xatûna gerden bi morî  
Dem wekû sorgula sorî  
Sîng û ber ji heddî borî  
Tirsa min ji rebbê jorî

Xatûnê erê xatûnê  
Tu bejin darî zeytûnê  
Çav weku agra bitûnê  
Tirsa min ji roja nexoş

Xatûna şeng û şepal e  
Çav rewşa ya çav xezal e  
Rû sor e gerden bi xal e  
Min berde da biçme mal e

Rehmê bike tu bi feqîran  
Berde ji benda xwo esîran  
Pîroz bî tu bo emîran  
Ey rûreş a mest û serxoş

Xatûnê ez tobedar im  
Ez xudanê jin û eyal im  
Jar û bîrsî ne li mal im  
Bes e ey namûsfroş



Bes e tu min bes bêşîne  
Qet min teme bi te nîn e  
Feqîrîn ji dûr hatîne  
Feqîr im selikfroş

Xatûn dibêt ez we nakim  
Te li zîndanê hepsa kim  
Jin û biçûkan fena kim  
Yan dê cem bî şev û roj

Zembîlfiroş ma bê hêvî  
Destê xwe serfiraz kirî  
Dua ji rebbê xwe xwestî  
Xelaskî min bi dilkî xoş

Hêj min nimêj nekiryê  
Misîn hilgirt çû banî ye  
Xwe li ser banî avêtiye  
Ji ber xatûna namûsfroş

Xwedê emr kir Cebraîl  
Lawî ji dest jinka melûl  
Me duaya wî kiryê qebûl  
Wî rake danî erdek xoş

Kete erdê dil bi xiyal  
Peyda nekir rizqê eyal  
Bi destxalî zîvrîye mal  
Çûwe nav eyal bi dil nexoş

Dil bi kovan zîvirî bû  
Bo naw eyal meşî bû  
Dil eciz û dest xalî bû  
Qani bi emrê rebbî bû

Bi acizî gehîşte mal  
Dît zor bi keyf jin û mindal  
Xwarinek zor xweş li bal  
Ma heyyirî û mendehoş

Gote jinê ev çi bîye  
Ev xawn ji kêrê hatîye  
Jina nazik diket kenîye  
Dibêjît Xwedê hinarye

Zembîlfiroş dibêjît jinê  
Ez hîr im li wî gotinê  
Were bo min bêje bi tenê  
Rast bêje ev sifre çi ye

Jin dibêjît ebdê Xwedê  
Sê siwar derketin li vê malê  
Gotin ev mindalê kî ye  
Ji birsa nivîstne bê hoş

Yek ji wan şeklê mîran bû  
Ewî siwarek meşand bû  
Ev rizqe bo cemand bû  
Biçûk dixwe bi dilêkî xoş

Bikeyn behsê Gul Xatûnê  
Lawik ji dest çû mab tenê  
Girî ji ber dil sotinê  
Ji dest derkeft Zembîlfiroş

Got xadim û xizmetkaran  
Hulûn pêkve ber dîwaran  
Binêrne çol û beyaran  
Peyda bikin selikfroş

Lezî bikin hûn bilezin  
Zembîlfiroş bo min bînin  
Bi xoşî wî neêşînin  
Didime we malekî poş

Xatûna dil bi acizî  
Mîr dîte ji dûr ve hatî  
Qewî dilteng û tarî  
Zêde dilteng û nexoş

Gul Xatûn ji tirsî dibêjît  
Mîrê min çî erd li te dîşît  
Ne rehtiya te ji kê bît  
Te dibînim zor dil nexoş

Mîr dibêjît jinê ye  
Dema ez hatim ji rê ye  
Eyalek min dî li çolê ye  
Zarû girî û bîrsî û nexoş

Min got lew eyalê kî ye  
Bîrsî û rûsî li wê erdî ye  
Gotin bab derwêş Xwedê ye  
Derketye selkan bifroş

Babê wan Zembîlfiroş e  
Ji ber Xwedê daîm bê hoş e  
Feqîrekî xirqepoş e  
Na nivîyan şev û roj

Îro hêja ne hatiye  
Nizanin çî-b ser hatiye  
Ê sag e ya ne mirî ye  
Ji ber wî ketne bê hoş

Min fikre derwêş bibînîm  
Ew û eyal bicêmînîm  
Wan li qesrek xoş daînîm  
Da ew bijîn bi halek xoş

Gul Xatûn dibêjîte mîrî  
Lew gulaman nahisîrî  
Cihêkê nêzîk bijêrî  
Tê da danê Zembîlfiroş

Mîr dibêjît gulaman gazî kin  
Qesrek nêzîk da xalî kin  
Eyalê derwêş razî kin  
Ev şev hêj nebiye roj

Gulam û bende dilezînin  
Derwêş û eyalî tînin  
Di nav qesrê dadnişînin  
Nêzîkî xatûn dilxoş

Gul Xatûn mîrî dibînit  
Nizanî çî rê bibînit  
Çawa xwe vêra bighînit  
Bigehêtê Zembîlfiroş

Adar çû û hate Nîsan e  
Bû wextê keyf û seyran e  
Mîr gaz diket pehlewan e  
Da biçîne raweke xoş

Gul Xatûn wekî zanî ye  
Mîr ji bajêr derkeftiye  
Gote xudam û carîye  
Gaz kin jina Zembîlfiroş

Gul Xatûn rabuye ser xo  
Jina derwêş îna dev xo  
Cilka wê kirdîne ber xo  
Wê hebs kir li hodek xoş

Jinik dikete girî ye  
Ji ber eyal û mêrî ye  
Ya reb çî-b ser me hatîye  
Ji dest xatûna belafroş

Xatûna b-hîle w hewal e  
Xwe xemland derket ji mal e  
Bo şûlek pîs û betal e  
Bîr nehat li pê ket xerxal e

Zembîlfiroş ji der hatîye  
Mal û mindal nivîstîye  
Jin li ber ciha dîtiye  
Çû ser ciyê bi dîlkî xoş

Dest avête destê jinê  
Xerxal dîtîbû li pê  
Lawîk ji tîrsa Xwedê  
Kir qîrî mendehoş

Got xatûna dev bikenê  
Ey rûreşa wekî tenê  
Pîsa mirara goşt genê  
Ey bê heya hetekfroş

Here derkev ji mala min  
Lew min bêje ka jina min  
Nebe sebeb miraqa min  
Bi halekî şer û nexoş

Xatûn dibê ey wekî xo

Nebe sebê hepsa xo

Hulo b-qetêne şula xo

Bi xoş edeb in bê hoş

Hind tu sagî heta bêt mîr

Dê te êxim bend û zincîr

Jin û mindal dikem esîr

Qe nabînî saetek xoş

Xatûn rabû derketiye

Bi diltengî w acizî ye

Jina wî bo hinarî ye

Be rûndek û dilek nexoş

Zembîlfiroş dibêjîte jinê

Li vî rîtî îşev bimênê

Subey dê çîn ji Mêrdînê

Dê cihek dil pê bit xoş

Li wan hat û roja nû ye

Mîr ji seyranê hatiye

Dibêjîte gulam û cundî ye

Herin bênin Zembîlfiroş



Herin bo min derwêş bênin  
Paşazade bixemlênin  
Sorken hewû bi siwar bênin  
Bi muzîqe w def û xiroş

Nû emrek bo min hatiye  
Zembîlfiroş li min xwestiye  
Nû ew kurê padşahî ye  
Ji ber dîne xwe hatîye

Heta gihîşte Diyarbekrê  
Peya bûn ew li derê qesrê  
Kurî maç kir destê babê  
Âlim diken medhê Xwedê

Li bajêrî bo şahî ye  
Govend kete nav şarî ye  
Li siwaran û tivengçî ye  
Te digo qiyamet rabîye

Xort û cihêl diken keyfê  
Îxtiyar biken medha Xwedê  
Kur hate xizmeta babê  
Zor bi keyf û bi dilkî xoş

Zembîlfiroş bû hakim e

Zor adil û zor alim e

Nehêla zilma zalim e

Şev derwêş û paşa bi roj

Hikim gêra derrik zeman

Wî xizmetkir zor bi eman

Mirin bi kes nadet peyman

Hemu vêkra diçîn cihekxoş

Sed û newet sal borî ye

Paşî hezara hicrî ye

Miradxan dibêt serhatiye

Bi şir bi gotineka xoş

## ENCAM

Serpêhatiya Zembîlfiroş bi hin aliyên xwe yên naverokî ve dişibe jîna Budayê Hîndû, Îbrahîm Ethemê Belhî, Êsîfê Misrî lê bi encama xwe ji wan vediqete. Buda û Îbrahîm Ethem di ciwaniya xwe de dewlemend û xwedî erk in. Piştî rêya xwe diguherin û dikevin rêya heq û heqîqetê. Yûsîf Nebiyê Misrî ji Kenanê vediqete diçe Misrê. Dikeve binemala ezîzê Misrê û çîrok heta bi ezîzbûna Êsîf Nebî dewam dike. Herî zêde jî ev çîrok dişibe serpêhatiya Zembîlfiroş ku rola maşûq û aşiq diguhere. Yê dil dide jin e, yê dildar jî mêr e. Jiber vê yekê ev her du çîrok di nav çîrokên evînî de cihekî taybet digirin. Lê bi encamên xwe her du çîrok ji hevdû vediqetin, dûrî hev dikevin. Sedema sereke jî ew e ku Zelîxa digihîje mirazê xwe lê di nivîsên edebî yên Zembîlfiroş de Xatûn nagihîje armanca xwe.

Jiber çî? Ango Zelîxa xwedî milk, saltanat û bedewiyê ye. Beriya her tiştî Êsîf di destê Zelîxa de mezin bûye û heta ciwaniya Êsîf jî li bal dimîne. Dema xwesteka xwe ya şehwetî vedibêje, ew ji hevdû vediqetin. Zelîxa pêşiya pêşî milkê xwe anga mêrê xwe winda dike. Piştî hêdî hêdî malê xwe, bedewiya xwe û herî dawî jî çavê xwe li ber Êsîf de anga maşûqê xwe de winda dike. Ew bi tu awayî evîna xwe ji dest nade; berovajî wê zêde dike. Ev jî evîna wê ya rasteqîn nîşan dide. Ango siltanâtî, dewlemendî, bedewî, şehwet li ber çavên evînê perde ne û hewceyî pê heye ku ev perde yek bi yek ji ber werin rakirin. Lê bele evîna xwe li xwe naşkîne, kêr nake û di dilê xwe de xurt dike. Di dawiyê de digihîje maşûqê xwe. Ev encam ji bo Xatûna Zembîlfiroş ne heman e. Jiber ku xwesteka xwe tenê di asta şehwetê de dihêle û gavan ber bi evîna kamil, evîna rastîn ve navêje. Hemû hewldan û xîreta xwe bi tenê ji bo daxwaza şehwetî pêk tîne, gav bi gav ji maşûqê xwe dûr dikeve. Bi encam û evîna dilxwaz mînakeke wekî çîroka Zembîlfiroş tune.

Me di beşa ewil ya tezê de giringiya vê çîrokê şîrove kir. Ji ber ku cara ewil Feqiyê Teyran ev serpêhatî nivîsandiye me di beşa ewil ya tezê de cîh da Feqiyê Teyran. Ji ber vê heyam, nav û bernavkên Feqiyê Teyran bi awayekî bêalî û berfireh hatin analîzkirin. Derhaqê Melayê Bateyî de ku wî bi xwe jî ev serpêhatî nivîsandiye guman û gengeşiyek heye. Hin lêkolîner û nivîsakarên îroyîn derhaqê vê yekê de gotine ku Çîroka Zembîlfiroş ji aliyê Meleyê Bateyî ve nehatiye nivîsandin. Hin jî wek Prof. Qanatê Kurdo, Abdulreqîb Yûsîf ku angaşten xwe bi çavkaniyên arşîva A. Jaba ve

girêdidin, dibêjin helbest ya Meleyê Bateyî ye. Ji bo ev yek were zelalkirin jî di beşa ewil de heyam û dema wan hate zelalkirin û eşkere bû ku Feqî, beriya Bateyî jiyaye û cara ewil helbest jî bi destê wî hatiye nivîsandin. Ji aliyê din ve çîrok cara ewil bi awayekî edebî bi destê Mîradxanê Bazidî li Hewlêrê hatiye nivîsandin. Çîroka Mîradxan him rengîntir him jî berfirehtir e. Him nav him jî cîh û war tê de diyar in.

Mijarek dinê jî di destxeta Mîradxanê Bazidî de jî navê diyar “Mîr Seîd e”. Di lekolîna me de navê lehengê Zembîlfiroş wek Bazidî jî di dawiya helbesta xwe de gotiye “Mîr Seîdê Amedî” ye. Di nav mîrên Merwaniyan de mîrek heye ku jê re gotine Mîr Seîdê Kurê Mîr Hesên, Îbn-î Nasr Ed-Dewle Ehmed Îbn Merwan. Di dîroka Merwaniyan de em vê yekê dibînin ku dema birayê Mîr Seîd, Mîr Nîzameddîn li Ferqînê Mîrê Merwaniyan e, Mîr Seîd jî li Amedê Mîr û Begê bajêr e.

Ev çîrok di nav kurdan de jiber ku leheng “jin” e gelek berbelav bûye. Di tezê de mijara Zembîlfiroş çawa di stran û helbestên devkî de hatiye guhertin, lêzêdekirin û kêmkirin diyar e. Di van stran û helbestan de jî diyar e ku dildar û dildêr çawa ber bi bêgunehiyê ve têne kişandin û şaşiyên Xatûnê têne ruxandin. Ev yek jî vê yekê diyar dike ku li hember evîne şaşî û guneh tunene û evîn bi her awayî digihîje xaweyna bêgunehiye.

## ÇAVKANÎ

Adak Abdurahman, Yusuf Baluken û yd. “Gora Feqiyê Teyran”, **kov. Nûbihar Akadm**, Sal I, hj.1. 2014.

Adak, Abdurahman, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk**, İstanbul: Weş. Nûbihar, 2013.

Alan, Ramazan, “Ûsif, Bûda û Zembîlfiros”, **Kov. War**, hj. 2, Stockholm: 1997.

Alakom, Rohat, **Di Folklorê Kurdî de Serdestiyeke Jinan**, Stockholm: Weş. Nûdem, 1994.

Alakom, Rohat, “Silîva: Bajarê Ku Heft Car Xerab û Heft Carî Ava Bûye”,  
<http://www.kovarabir.com/tag/zembilfiros/>, (d.d. 05.01.2014).

Aras, Arif, **Siyabend û Xacê**, Îzmîr: Weş. Ûlkem, 1993.

Beyazîdî, Muradxanê, **Adetên Kurdîstan**, Hollanda: Weş. Den Haag, 1967.

Bozarşan, M. Emin, **Mem û Zîn a Ehmedê Xanî**, İstanbul: Weş. Deng, 2010.

Bozarşan, M. Emin, **Pêkenokên Geli, Ji Dînan Dîntir**, Uppsala : Weş. Deng, 1988.

Celîl Ordixanê û Cemîlê Celîl, **Zargotina Kurda**, Moskova: Weş. Naûka, 1978.

Cizîrî, Şerefxan, “Edebiyata Dewkî”, Dihok/Iraq: **Kov. Nûbûn**, hj.84, 2007.

Cindî, Heciyê, **Hikayetên Civata Kurdan**, Rusya: Weş. APEC, 1998.

Cizîrî, Melayê, **Dîvan**, Ali Karadeniz(amd.), İstanbul: Weş. Nûbihar, 2010.

Çiftçi, Tekin, “Di Kilamên Evînî Yên Dengbêjan De Temaya Jinê”(teza ne çapkirî),

**Zanîngeha Mardîn Artukluyê**, Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê, 2012.

“Çîrokên Gel”, **Kov.Roja Nû**, Uppsala: hj. 27, 1986.

Çolpan, Rîza, **Destana Dîroka Kurd û Kurdîstan**, Sydney/Australia: Weş. Dersim, 1995.

Dêreşî, Sait, **Dîwana Feqiyê Teyran**, Ankara: Weş. Lîs, 2011.

Edîtorîa, “Bêjeyên Kurdan”, **kov. Hawar**, Şam, hj. 33, 1941.

<http://serhed.org/modules.php?name=News&file=article&sid=699>. (d.d. 03.04.2014)

Farqinî, Zana, **Ferheng**, İstanbul: Weş. Enstîtuya Kurdî, 2010.

Ferheng, tdk.gov.tr, (d.d.25.05.2014).

